**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR**

**MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**

# DÎWANA FETHÎ

# (EDÎSYON, METN, KRÎTÎK)

**Cîhan TURAN**

**141302102**

**Şêwirmendê Tezê**

**Doç. Dr. Nusrettîn BOLELLÎ**

**BÎNGOL - 2017**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**

# FETHÎ DİVANI

# (EDİSYON, METİN, KRİTİK)

**Cihan TURAN**

**141302102**

**Tez Danışmanı**

**Doç. Dr. Nusrettin BOLELLİ**

**BİNGÖL-2017**

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)
Serok :…………………………………….
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav )

(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin
Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

Prof. Dr. Orhan BAŞARAN

Rêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

## NAVEROK

NAVEROK……………………………………………………………………..

KURTE………………………………………………………….................VII

ÖZET…………………………………………………………………......VIII

ABSTRACT.. …………………………………………………..................IX

PÊŞGOTIN..…… ……………………………………………………………..X

LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN..……… ……………………………………….XII

KURTEBÊJE..……………………………………………………………XIII

**DESTPÊK..……...…………………………………………….....................1**

1.Ehemiyet û Armanca Mijarê………………………………………………1

1.1.Naveroka Teza ku Hatiye Amedekirin……………………………………..2

2.Berhevkirina Nusxeyan û Danasîna Wan……………………………….........2

2.1.Berhevkirina Nusxeyan………………………………………….........2

2.2. Danasîna Nusxeyan……………………………………….................3

2.2.1. Nusxeyên Seyda Ehmed Yalar…………...……………………………3

2.2.1.1. Nusxeya Yekemîn a Seyda Ehmed Yalar……………………………...3

2.2.1.2. Nusxeya Duyemîn a Seyda Ehmed Yalar………………………………4

2.2.2 Nusxeya Zeynel Abîdîn Amedî……………………………………………..5

2.2.3. Nusxeya Mehmet Yalar………………………………………………..5

2.2.4. Nusxeya X(Bênav) ……………………………………………………...6

2.2.5. Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî…………………………………………7

3.Rê û Rêbeza Hilbijartina Nusxeya Bingeh û Amadekirina Metna Dîwanê…………..7

3.1. Rê û Rêbeza Hilbijartina Nusxeya Bingeh…………………………………7

3.2.Rê û Rêbeza ku di Dema Amadekirina Metna Dîwanê de Hatiye Şopandin…………………………………………………………………10

4. Çavkaniyên Sereke……………...……………………………………….13

**BEŞA YEKEMÎN....................................................................16**

**JIYAN Û BERHEMÊN FETHÎ..........................................................16**

**1.JIYANA FETHÎ.................................................................... 16**

1.1. Nav û Mexlasên Fethî..........................................................16

1.2. Malbata Fethî....................................................................18

1.3. Dîroka Ji Dayikbûn û Wefata Fethî.........................................18

1.4. Rêwitiya Hecê ya Fethî.......................................................18

1.5. Eskeriya Fethî....................................................................19

1.6. Zewaca Fethî.....................................................................19

1.7.Rêwîtiya Fethî Ji Bo Xwendinê û Muderrîstiya Wî.......................19

1.7.1.Rêwîtiya Fethî Ji Bo Xwendinê..............................................19

1.7.2. Muderrîstiya Fethî.............................................................20

1.7.3. Seydayên Fethî.................................................................22

1.8.4. Telebeyên Mela Ebdulfettahê Hazroyî.....................................24

**2.BERHEMÊN FETHÎ.................................................................29**

2.1. Berhemên Wî yên bi Kurdî....................................................30

2.1.1. Dîwan............................................................................30

2.1.2. Qesîdeya Qelem...............................................................30

2.1.3. Eqaîd.............................................................................30

2.1.4. Leyla û Mecnûn ...............................................................31

2.1.5. Tercumeya Bed'ul Emalî .....................................................31

2.1.2. Berhemên Erebî.................................................................31

2.1.2.1.Qesîdeya Tayî(Mulimmatul-ahzan) ........................................31

2.1.2.2. Qesîdeya Alfabetîk...........................................................32

2.1.2.3. Hediyyetu 's- Sibyan.........................................................32

2.1.2.4. Tehyîcul-Qulûb ...............................................................32

2.1.2.5. Lexez û nîşankirina dîrokê……………………………………………..32

2.1.2.6. Manzûmeyên Derheqê Nahîv, Sarf û Qira'atê de…………………...33

**BEŞA DUYEMÎN……………………………………………………………………34**

**VÊKOLÎNA DÎWANÊ JI ALIYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE……………………….34**

**1. TAYBETIYÊN TEŞEYÎ……………………………………..……………………..34**

1. 1. Şiklê Tertîbê…………………………………………………………………..34

1.1. 1. Rêz û Hejmara Helbestan………………………………….. ………35

1.2. Teşeyên Nezmê…………………………………………………………...37

1.2.1. Qesîde………………………………………………….........................37

1.2.2. Xezel……………………………………………….....................39

1.2.2.1.Xezela Musemmet…………………………………………………....39

1.2.3. Mesnewî…………………………………………….................41

1.2.4. Murebba…………………………………………….......................42

1.2.5. Muselles…………………………………………….................43

1.2.6. Muxemmes……………………………………………..………..43

**2. TAYBETIYÊN RUXSARÎ………………………………..……………………....44**

2.1.Wezn…………………………………………………..…………………44

2.1.1. Îmale………………………………………..…………………46

2.1.2. Med……………………………………...……………………..46

2.1.3. Zihaf……………………………………...…………………47

2.1.4. Wesl……………………………………...……………………..48

2.2.Serwa………………………………………………...……………48

2.3. Paşserwa…………………………..……………………………….51

**3-TEHLÎLA HÊMANÊN DI DÎWANÊ DE……………………………………..54**

**BEŞA SÊYEMÎN…………………………………………………..………………..86**

**KESAYETIYA FETHÎ YA EDEBÎ ……………………………………………..86**

**1. ZIMAN Û ŞÊWAZ……………………..……………………………………...87**

1.1. Ziman………………..………………………………………..…………87

1.1.1.Devoka Botan û Bahdînan……………...……………………………90

1.1.2.Devoka Serhedê……………..…………………………………….....91

1.1.3. Peyv û Ravekên Kurdî yên Resen ……………..…………………… 92

1.1.4. Hêmanên Erebî û Farisî……………………...……………………... 94

1.1.4.1. Hêmanên Erebî………...…………………………………………...94

1.1.4.2 Hemanên Farisî…………...………………………………………...96

1.1.5. Cotepeyv……………...…………………………………...………96

1.2. Şêwaz……………………..…………………………………………...97

**2. EDÎBÊN KU TESÎR LI SER FETHÎ KIRINE………..…...……………………98**

2.1. Melayê Cizîrî……………..……………………………………...……99

2.2.Ehmedê Xanî……………………………………………...………...101

2.3. Melê Mihemedê Licêyî(Hadî) ……………...………………………..102

2.4. Şêx Evdilqadirê Hezanî……………...………………………………103

**3. NAVEROKA HELBESTÊN FETHÎ………………………….……………....104**

**4.HÛNERÊN EDEBÎ……………....……………………………………………. .108**

**5. TIŞTÊN KU DERHEQÊ FETHÎ DE HATNE GOTIN……………………….119**

**BEŞA ÇAREMÎN……………………......……………………………………. 121**

**METNÊ DÎWANÊ YÊ BI TENKÎD……………….…...…………………....121**

**ENCAM……...……………………………………………….……………300**

**ÇAVKANÎ………......……………………………………………………303**

**PÊVEK………..………………………………………………………….306**

**KURTE**

Hêj tê nîqaşkirin û fikrên cuda tên gotin ka Edebiyata Klasîk a Kurdî çi wextî bi kîjan helbestvanî dest pê kiriye. Lê tiştekî eseh heye ku Wêjeya Klasîk a Kurdî nexasim ji qerna 16emîn û vir ve bi gelek helbestvan û berhemên van helbestvanan cihê xwe di nava wêjeya klasîk de girtiye. Wêjeya Klasîk a Kurdî ji wê qernê vir ve roj bi roj bi berhemên bi qedr û qiymet û hêja gihaştiye asteke bilind û roj bi roj kemiliye û dewlemend bûye. Her wiha hebûna xwe di qerna modernîzmê de jî domandiye.

Mela Ebdulfettahê Hezroyî jî yek ji wan şairên Wêjeya Kurdî ya Klasîk e. Hezroyî bi helbestvaniya xwe û bi berhemên xwe di dawiya qerna 19emîn û di destpêka qerna 20emîn de cihê xwe di wêjeya klasîk de girtiye û bi edîbbûna xwe balan kişandiye li ser xwe. Mela Ebdulfettahî Hezroyî bi helbestên xwe yên ku bi zimanên Kurdî, Farisî û Erebî nivîsandiye nîşan kiriye ku di dawiya sedsala 19emîn û di destpêka qerna 20emîn de jî hêj Edebiyata Klasîk a kurdî berdewam dike.

Hazroyî helbestên xwe bi zimanên Kurdî, Farisî û Erebî nivîsandiye. Me di vê xebata xwe ya bi navê DÎWANA FETHÎ de tenê helbestên wî yên Kurdî ji hêla metn, edîsyon û krîtîkê ve nirxand û me 5 destxetên dîwana wî muqayese kir. Ji bilî van me hewil da helbestên di dîwanê de, şêwaz û zimanê helbestvan bivekolin û bi heman awayî me hewil da jiyan û berhemên wî, rêwîtiya wî ya ilmê, muderrîstiya wî rave bikin.

Em hêvî dikin ev berhema hêja ya ku me xebata xwe li ser kiriye cardin qedr û qiymeta Wêjeya Kurdî ya Klasîk nîşan bide da ku bibe wesîleya jibîrnekirina qedr û qiymeta berhemên klasîk.

**Peyvên Sereke:** Dîwan, Dîwana Fethî, Mela Ebdulfettahê Hezroyî, Edebiyata Klasîk a Kurdî.

**ÖZET**

Klasik Kürt Edebiyat'ının ne zaman ve hangi şairle başladığına dair hâlâ tartışmalar yapılmakta ve farklı şeyler söylenmektedir. Fakat bilinen bir gerçek var ki o da Klasik Kürt Edebiyatı özellilkle 16. yüzyıldan itibaren değerli birçok şair ve bu şairlerin eserleriyle klasik edebiyat alanında boy göstermiştir. Klasik Kürt Edebiyatı 16. yüzyıldan bu yana günbegün değerli ve kıymetli eserlerle yüksek bir seviyeye ulaşmış ve günden güne olgunlaşıp zenginleşmiştir.

Molla Abdulfettah Yazıcı da Klasik Kürt Edebiyatı şairlerinden bir şair olup şairliği ve eserleriyle 19. yüzyılın sonlarında ve 20. yüzyılın başlarında Klasik Kürt Edebiyat'ında yer edinip, edipliğiyle dikkatleri üzerine çekmiştir.

Molla Abdulfettah Yazıcı, Kürtçe, Farça ve Arapça ile yazdığı şiirlerle, Klasik Kürt Edebiyatının 19. yüzyılın sonlarında ve 20. yüzyılın başlarında hâlâ varlığını sürdürdüğünü göstermiştir.

Hazrolu Molla Abdulfettah Yazıcı, şiirlerini Kürtçe, Farça ve Arapça dilleriyle yazmıştır. Fethi'nin Diwan'ı adlı çalışmamızda onun sadece Kürtçe şiirlerini edisyon, metin ve kritik bakımından değerlendirip, divandaki şiirleri 5 yazma el nüshasına göre karşılaştırdık. Ayrıca divandaki şiirleri, şairin üslup ve dilini tahkik edip, şairin hayatını, eserlerini, ilim yolculuğunu ve müderrisliğini açıklamaya çalıştık.

Ümidimiz odur ki çalışmamızın konusu olan bu kıymetli eserin birkez daha Klasik Kürt Edebiyatı'nın değerinin ortaya çıkmasına ve de klasik eselerin değerlerinin unutulmamasına vesile olmasıdır.

**Anahtar Kelimeler:** Divan, Fethi Divanı, Kürtçe Divanlar, Hazrolu Molla Abdulfettah, Klasik Kürt Edebiyatı

## ABSTRACT

There are still debates about when and with which poet does the classical Kurdish Literature begins and different things have been saying. But there is a known fact that Classical Kurdish Literature, especially since the 16th century, has appeared in the field of classical literature with many poets and with the valuable works of these poets. Classical Kurdish literature has reached a high level with precious and valuable works since the 16th century and it has matured from day to day.

Molla Abdulfettah Yazıcı is a poet from the Classical Kurdish Literature poetry. He took his place in Classical Kurdish Literature in the late 19th century and early 20th century with his poetry and attracted attention with his poesy.

Molla Abdulfettah Yazıcı has shown that Classical Kurdish Literature continues to exist in the late 19th and early 20th centuries, with poems written in Kurdish, Persian and Arabic.

Molla Abdulfettah Yazıcı, from Hazro, wrote his poems in Kurdish, Persian and Arabic languages. In our work named ‘Fethi's Divan’, we evaluated only his Kurdish poems in terms of editions, texts and critics, comparing the poems of the divans according to the 5 handwritten manuscripts. Apart from these, we tried to determine the poems in his divan, the style and language of the poet and explain the life of the poet, his works, the journey of education and his profession.

This valuable work, which is the subject of our work, is once again a means to be the understanding of Classical Kurdish Literature and not forgetting classical works.



Keywords: Divan, Fethi’s Divan, Kurdish Divans, Molla Abdulfettah, Hazro, Kurdish Classical Literature

## PÊŞGOTIN

Edebiyata Klasîk a Kurdî xwedî dîrokeke him dûv û dirêj him jî kevnar û dewlemend e. Bi heman awayî wek edebiyata her milletî di nav xwe de gelek helbestanvan û berhemên wan ên bi qedr û qiymet dihewîne ku ev yek jî dewlemendiya Edebiyata Klasîk a Kurdî nîşan dide.

Ji van helbestvanên ku bi berhemên xwe yên giranbaha Edebiyata Klasîk a Kurdî kemilandine, dewlemend kirine û gihaştandina astake bilind yek jî Mela Ebdulfettahê Hezroyî ye ku ew bi vê dîwana xwe cardin wek wan helbestvanên klasîk ên Kurdî nîşanî me daye û bi me daye fêmkirin ku Edebiyata Klasîk a Kurdî di serdama modernîzmê de jî hebûna xwe domandiye.

Dibe ku di heyamekê de medreseyên me yên ku di wextê xwe de kahniya Edebiyata Klasîk a Kurdî û berhemên Kurdî bûn hatibin qedexekirin û dibe ku ji ber vê qedexê berhem hatibin veşartin, şewitandin û tunekirin, Lê divê digel vê yekê ji bo qedr û qiymeta Edebiyata Klasîk a Kurdî derkeve holê û ji bo xwedî lê bê derketin pêwîst e berhemên klasîk çi ji serdemên herî kevin bin çi ji serdema ku medrese û zimanê Kurdî hatibin qedexekirin bin û çi jî ji vê serdemê bin, divê zêdetir bên vekolînkirin û xwedî li wan bê derketin. Ji ber vê sedemê me xwest li ser vê berhema bi qedr û qiymet xebatekê bikin da ku qedr û qiymeta vê berhema ku di serdema modernîzmê de nîşan dide hêj Edebiyata Klasîk a Kurdî hebûna xwe didomîne bê zanîn û xwedî lê bê derketin.

Em dixwazin di bin vê sernavê de qala hinekî naveroka teza ku me amade kiriye bikin. Ev xebata me ya bi navê Ebdulfettahê Hezroyî û Dîwana Wî; Metn, Edîsyon û Krîtîk ji destpêk, çar beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de nusxeyên dîwanê yên ku hatine berhevkirin tên nasandin û derheqê van nusxeyan de nirxandin tê kirin. Her wiha girîngî û ehemmiyeta tezê û li ser rê û rêbaza amadekirina tezê de agahî tên dayîn. Di beşa ewil de li ser jiyana Fethî û hemû berhemên wî tê sekinîn. Di beşa duyemîn de Dîwana Ebdulfettahê Hezroyî ji hêla teşe û ruxsarî ve hat tehqîqkirin, helbestên di dîwanê de ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin. Di beşa sêyemîn de me hewil da kesayeta edebî ya Fethî û her wiha ziman û şêwaza wî tehqîq bikin û bînin zimên. Di beşa çaremîn de jî ji metna

bi tenkîd a dîwanê re cî hat dayîn. Bi şikleke berfireh her 5 destxetên dîwanê hatine muqayesekirin û helbestên Kurdî yên di dîwanê de hatin transkirîbekirin.

Bi rastî di pêvajoya amadekirina vê tezê de min zehmetî û tehdayî da gelek kesên derdora xwe. Di serî de ez ji malbata xwe ya ku her tim di pêvajoya amadekirina tezê de piştevanî û alîkariya min kiriye re spasdar im.

Ez dixwazim bi taybet ji Mamoste Mehmet Yalar, Nusrettîn Bolellî û ji Mamoste M. Zahir Ertekîn re spasiyên xwe bînin zimên. Lewra ev her sê şexsên ji hev çêtir ji min re gelek zêde bûn alîkar.

Her wiha ez dixwazim ji Seyda Ehmed Yalarê ku telebeyê Seyda Ebdulfettahê Hezroyî ye û ji Mamoste Tehsîn Îbrahîm Doskî re jî spasdarim ku her du jî destxetên dîwanê yên li ber destên xwe bi min re parve kir.

**Cîhan TURAN**

**Bîngol - 2017**

## LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN

**TABLO** **RÛPEL**


**Tablo 1**: Rêz û Hejmara Helbestan 35

**Tablo 2**: Tabloya Qesîdeyên Dîwanê 37

**Tablo 3**: Tabloya Xezelên Dîwanê 39

**Tablo 4**: Tabloya Mesnewiyên Dîwanê 41

**Tablo 5**: Tabloya Murebbayên Dîwanê 42

**Tablo 6**: Tabloya Musellesên Dîwanê 42

**Tablo 7**: Tabloya Muxemmesên Dîwanê 43

**Tablo 8:**Tabloya Behr û Weznên Helbestan 44


**PÊVEK**


**Pêvek 1**: Destxeta Mela Ehmed Cewzî 350

**Pêvek 2**: Destxeta Mamoste Mehmet Yalar 351

**Pêvek 3**: Destxeta Zeynelabîdîn Amedî 352

**Pêvek 4:** Destxeta Bênav 353

**Pêvek 5:** Destxeta Seyda Ehmed Yalar 354

# KURTEBÊJE

amd. : amadekar

as. : aleyhî selam

bnr. : binêrin

b.n. : berhema navborî

c. : cild

DİA: Diyanet İslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê ya Diyanetê]

Hz.: hezretî

h. :hicrî

h.b. : Heman berhem

hwd. : her wekî din

j. : jimare

m.: mîladî

qs. : quddise sirrihû

r. : rûpel

s. : sal

saw. : sellellahû aleyhî wesellem

sxl. : silavên Xweda lê bin

vgz. : veguhêzer

wer. : werger

weş. : weşan, weşanxane

## DESTPÊK

Di edebiyata klasîk de ji wan berhemên herî girîng û taybet yek jî dîwan in ku ev berhemên ku bi navê dîwanê tên binavkirin him ast û qalîteya berhemê û him jî dewlemendî û pêşveçûna wêjeyê û taybetiyên serdem û heyama ku lê hatiye nivîsandin jî nîşan didin. Dîwan ji bilî van taybetiyên xwe bi heman awayî şexsiyet, ziman, uslup, şêwaz, dewlemendî û edîbbûna xwediyê xwe ango nivîskarê xwe ji kesên derdora xwe re didin nasîn.

Heta niha gelek berhemên ku aîdî edebiyata klasik in ji teref cûrbecûr nivîskar û lêkolînêran ve hatin tahqîqkirin û ev berhem dîsa bi heman awayî ji teref cûrbecûr çapxaneyan ve hatine çapkirin. Dîsa ji bilî van berhemên çapkirî di van çend salên dawî de bi wasitaya beşên lîsansa bilind ên ku hatine vekirin gelek xwendevanên jîr û hêja berhemên ku heta niha nehatine lêkolîn û çapkirin amade kirin ku ev yek jî kêfxweşiyê dide kes û mirovên ku bi edebiyata Kurdî re têkildar in. Lê belê ev xebatên ku heta niha hatine kirin ne bes in, lewra tê zanîn ku hêj gelek berhemên ku weke giyayên ku nederketine ser rûyê erdê û di bin keviran de mane û şîn nebûne hene. Divê ew berhemên bi qedr û qiymet ên ku heta îro nehatine dîtin û naskirin jî ji bo bên naskirin û dîtin xebatên jêhatî bên kirin da ku qedr û qiymeta Edebiyata Klasîk a Kurdî çêtir bê zanîn û zêdetir xwedî lê bê derketin.

### 1.Ehemîyet û Armanca Mijarê

Weke ku me di nivîsa xwe ya jor de anî zimên, heta îro gelek berhemên ku aîdî beşa edebiyata klasik in hatina çapkirin ku ev dîwana Ebdulfettahê Hezroyî ango Fethî jî yek ji wan dîwanan e. Cara yekem ji teref Mamoste Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li ser vê dîwanê xebat hat kirin. Mamoste Doskî, di 20ê Mijdara sala 2012an de vê dîwanê bi Weşanxaneya Spirezê da çapkirin. Ev berhema ku hat çapkirin di nav xwe de helbestên Ebdulfettahê Hezroyî bi şiklekî berhevkirî dihewand. Me di vê xebata xwe de hewil da, da ku em vê berhemê ango dîwanê bi temamê hûrgiliyên wê bidin naskirin. Di xebata ku me kir de me destxetên cûrbecûr yên dîwanê berhev kir û me hewil da di warê 'Metn û Lêkolîn' û 'Edîsyon û Krîtîk'ê de xebateke lê hêjayî derînîn holê.

### 1.1. Naveroka Teza ku Hatiye Amedekirin

Ev xebata me ya bi navê Ebdulfettahê Hezroyî û Dîwana Wî; Metn, Edîsyon û Krîtîk ji destpêk, çar beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de nusxeyên dîwanê yên ku hatine berhevkirin tên nasandin û derheqê van nusxeyan de nirxandin tê kirin. Her wiha girîngî û ehemmiyeta tezê û li ser rê û rêbaza amadekirina tezê de agahî tên dayîn.

Di beşa ewil de li ser jiyana Fethî û hemû berhemên wî tê sekinîn. Di vê beşê de qala van tiştan tê kirin; Fethî di pêvajoya perwerdehiya xwe de li kîjan medreseyan xwendiye, li kîjan gundî û li ber destên kîjan seyda û aliman ders tahsîl kiriye, seydatiya wî çawa ye, feqiyên ku li ber destên wî dersê wergirtine kî ne û Fethî çi berhem nivîsandiye.

Di beşa duyemîn de Dîwana Ebdulfettahê Hezroyî ji hêla teşe û ruxsarî ve hat tehqîqkirin, helbestên di dîwanê de ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin. Her wiha tehlîla hêmanên di dîwanê de bi şikleke hûrgilî hat kirin.

Di beşa sêyemîn de me hewil da kesayeta edebî ya Fethî û her wiha ziman û şêwaza wî tehqîq bikin û bînin zimên. Ji bilî van me qala naveroka helbestên Fethî kir û me cûreyên hûnerên edebî yek bi yek bi mînakan nîşan da.

Di beşa çaremîn de jî ji metna bi tenkîd a dîwanê re cî hat dayîn. Bi şikleke berfireh her 5 destxetên dîwanê hatine muqayesekirin û helbestên Kurdî yên di dîwanê de hatin transkirîbekirin.

## 2. BERHEVKIRINA NUSXEYAN Û DANASÎNA WAN

### 2.1. Berhevkirina Nusxeyan

Me berî niha anîbû zimên ku cara yekem ji teref Mamoste Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li ser vê dîwanê xebat hatiye kirin û bi tîpên Erebî cara yekem di 20ê Mijdara sala 2012an de ji Weşanxaneya Spirezê û dîsa di heman salê de bi şiklê latînîzekirî di Weşanxaneya Nûbiharê de hatiye çapkirin.Ev berhema ku Mamoste Doskî amade kiriye û daye çapkirin tenê ji helbestên ku wî bi xwe gihaştiye wan pêk tên. Me di vê xebata xwe de xwest ku vê xebata ku berî niha hatiye kirin gavek pêşdetir ve bibin û bi vê armancê me dest bi xebata xwe kir. Di destpêka vê xebatê de pêşî em ketin pey wan

temamê nusxeyên ku hene. Di netîceyê de pêşî bi alîkariya mamosteyê min ê hêja Mamoste Mihemed Zahir û bi wesîleya lêkolîna ku me kir em gihaştin 5 nusxeyên vê dîwana Ebdulfettahê Hezroyî. Nusxeya ewil me li Bûrsayê li cem Mehmet Yalar peyde kir ku ew bi xwe jî ji telebeyên Ebdulfettahê Hezroyî ye û li ber destên wî ilm tahsil kiriye û ev nusxe ji teref wî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Nusxeya duyemîn jî me li Diyarbekirê li ba Seyda Ehmed Yalarê ku birayê Mehmet Yalarî ye peyde kir ku ew bi xwe jî ji telebeyên Ebdulfettahê Hezroyî ye û vê nusxeya li cemê jî, wî bi xwe nivîsandiye. Her wiha me li cem Seyda Ehmed Yalar nusxeya sêyemîn ya Zeynel Abîdîn Amedî jî temîn kir. Dû re piştî lêkolîneke hûr em gihaştin du nusxeyên din ên dîwanê. Ev her du nusxe li bajêra Dihoka Kurdistana Başûr li ba Mamoste Tehsîn Îbrahîm Doskî hatin temînkirin ku yek ji van nusxeyan ji teref Mela Ehmedê Cewzî ve hatiye nivîsandin û ya din jî bê nav e û me ji ber vê yekê vê nusxe wek nusxeya X'ê bi nav jiriye.. Me di xebatê xwe de helbestên bi Erebî û Farisî yên Ebdulfettahê Hezroyî tevlî xebata xwe nekir, me ji nusxeyan tenê helbestên Kurdî berhev kir û lêkolîna xwe li ser van helbestan domand.

### 2.2. Danasîna Nusxeyan

Berî ku em derbasî danasîna nusxeyan bibin pêwîst e bê diyarkirin ji ber ku nusxeya dîwanê yê muellîf bi xwe tunebû me temamê xebatên xwe li ser nusxeyên ku gihaştine ber destên me kir. Di encama muqayesekirina nusxeyan de me helbestên nû yên Ebdulfettahê Hazroyî yên ku di xebata Doskî de tunene bi dest xist û her wiha me hewil da bi wasitaya vê xebatê kêmasiyên dîwana ku berî niha hatiye çapkirin ji holê rabikin û metneke tekûz û kamil derxînin holê.

#### 2.2.1. Nusxeyên Seyda Ehmed Yalar:

Di destê Seyda Ehmed Yalar de du nusxeyên cuda yên ku helbestên Ebdulfettahê Hezroyî tê de hene hebûn. Em ê van her du nusxeyan di du beşên cuda de binirxînin û hewil bidin bidin nasîn.

##### 2.2.1.1. Nusxeya Yekemîn a Seyda Ehmed Yalar:

Mustensîx: Seyda Ehmed Yalar

Dîroka Nivîsandinê: ?

Hejmera Rûpelan: 99

Hejmera Helbestan:12 helbest

Helbesta Destpêkê: Hewar e hey hewar e min ji vê qêrîn û ġewġayê

Nema min quwwet û ṭaqat ji hicra wê dilaray

Helbesta Dawiyê: Ez xemê dilber meranî ten ne canî mande est

An xeyalî kî geşte ve ez în yek nişane mande est

Ev nusxe ji cem Seyda Ehmed Yalar hat temînkirin û tev de ji 99 rûpelan pêk tê. Di vê nusxeyê de tenê tevde 12 helbestên bi Kurdî yên Ebdulfettah hene. Wekî din çend helbestên Farisî û Erebî yên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî jî di vê nusxeyê de hebûn. Di encama lêkolîn û tehqîqeta ku hat kirin de hat dîtin ku ev nusxe seranser tenê helbestên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî di nav xwe nahewîne. Ji bilî helbestên wî helbestên gelek seyda û helbestvanên din ên navdar di vê nusxeyê de li ber çavan dikevin. Her wiha di nusxeyê de ji bilî helbestan gelek nivîsên ku di derbarê mijarên cuda de bi şiklê pexşanê hatine nivîsandin jî hene.

### 2.2.1.2. Nusxeya Duyemîn a Seyda Ehmed Yalar:

Mustensîx: Seyda Ehmed Yalar

Dîroka Nivîsandinê: ?

Hejmera Rûpelan: 21

Hejmera Helbestan: Tevde 6 helbest

Helbesta Destpêkê: Dil yek e dê dilber yek bit dilrûbayê her zeman

Dil newazî gah gahî cewr û mihnet her zeman

Helbesta Dawiyê: Serî hilda li me yek marê ejder

Dirêje jehrekî qatil seraser

Ev nusxe jî ji cem Seyda Ehmed Yalar hat temînkirin û tev de ji 21 rûpelan pêk tê. Di vê nusxeyê de tenê tevde 6 helbestên bi Kurdî yên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî hene. Wekî din çend helbestên Farisî û Erebî yên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî di vê nusxeyê de jî hene. Di dîwanê de helbestên kesên mîna Camî û Şemsî Tebrîzî jî hatin dîtin. Di encama lêkolîn û tehqîqeta ku hat kirin de weke nûsxeya din de hat dîtin ku ev nusxe jî seranser tenê helbestên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî di nav xwe nahewîne. Ji

bilî helbestên wî helbestên gelek seyda û helbestvanên navdar ên ku bi zimanê Kurdî, Farisî û Erebî hatine nivîsandin di vê nusxeyê de jî li ber çavan dikevin.

**2.2.2. Nusxeya Zeynel Abîdîn Amedî:**

Mustensîx: Zeynel Abîdîn Amedî

Dîroka Nivîsandinê: 30ê Tîrmeha 2004an

Hejmera Rûpelan: 123

Hejmera Helbestan: 50

Helbesta Destpêkê: Dema salarê mulkê subhegahî

Ku rûniştî li textê padişahî

Helbesta Dawiyê: Ey Fethiyê keremkar

Delal û xûb û zîba

Ev nusxe ji teref Zeynel Abîdîn Amedî ve di sala 2004an de hatiye nivîsandin û tevde ji 125 rûpelan pêk tê. Ev nusxê ji xeynî helbestekî tevde 50 helbestên ku aîdî Seyda Ebdulfettahê Hazroyî ne di nav xwe de dihewîne. Her wiha di nusxê de helbesteke bi navê 'Ey Fethiyê keremkar' ya Evdillah Efendî heye ku ev yek jî li ser mersiya Seyda Hecî ango Seyda Ebdulfettahê Hazroyî hatiye nivîsandin. Ev nusxe seranser helbestên bi Kurdî di nav xwe dihewîne; ango tê de helbestên bi Erebî û Farisî yên seyda tunene.

**2.2.3. Nusxeya Mehmet Yalar:**

Mustensîx: Mehmet Yalar

Dîroka Nivîsandinê: 1977

Hejmera Rûpelan: 56

Hejmera Helbestan: 29

Helbesta Destpêkê: Hel îla 'eynîl wîsalî bîlfûadî en nufûz

Em 'ala beydayî hicrîn yestemîrr û canê ma

Helbesta Dawiyê: Hezar hemd û sena her wext û her dem

Ji bona zatê Rebbê ‘erşê e‘zem

Ev nusxe li gor agahiyên ku li ser kaxiza destpêkê ya nusxeyê hatina nivîsandin di sala 1977an de hatiye nivîsandin. Ev nusxe ji teref Mamoste Mehmet Yalarê ku telebeyê li ber destê Seyda Ebdulfettahê Hazroyî bû ve hatiye nivîsandin. Mamoste Mehmet Yalar piştî ku medrese qedandiye û icazeta xwe standiye di sala 1977an de vê destxetê nivîsandiye. Nusxe tevde ji 56 rûpelên bi rêkûpêk pêk tê ku di nusxê de 29 helbestên bi Kurdî hene. Her wiha di nusxê de gelek helbestên bi Farisî û Erebî yên Seyda Ebdulfettahê Hezroyî hene. Helbest li gor rêza elîfbetka erebî nehatine nivîsandin. Lê taybetiyeke vê nusxê heye ku di wan nusxeyên din de ev taybetî tuneye. Ew taybetî jî ev e; Qesîdeya Qelem a ku navdartirîn û girîngtirîn helbesta Seyda Ebdulfettahê Hazroyî ye tenê di vê nusxeyê de heye. Ev taybetiya vê nusxê jî qiymeta nusxê zêdetir dike.

### 2.2.4. Nusxeya X(Bênav)[1]

Mustensîx: ?

Dîroka Nivîsandinê: ?

Hejmera Rûpelan: 205

Hejmera Helbestan: 43

Helbesta Destpêkê: Munebbeh be ey ‘arifê bo el-kemal

Bibêjim ji bo te beyanel delal

Helbesta Dawiyê: Ji derd û mihneta dewran

Dibêjim ez meded Seyda

Ev nusxeya ku me wê wek nusxeya X bi nav kiriye mixabin ne dîroka wê ne jî mustensîxê wê diyar e. Ev nusxe tev de ji 205 rûpelan pêk tê û tê de tev de 43 helbestên bi Kurdî yên Fethî hene. Bi heman awayî ji bilî helbestên ku bi Kurdî hatine nivîsandin gelek helbestên Ebdulfettahê Hezroyî yên ku bi Farisî û Erebî hatine nivîsandin jî di nav de hene. Helbestên di destxetê de ne muretteb in.

[1] Ji ber ku mustensîxê vê nusxê nediyar e me vê nusxê wek nusxeya X bi nav kir.

### 2.2.5. Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî

Mustensîx: Mela Ehmedê Cewzî

Dîroka Nivîsandinê: ?

Hejmera Rûpelan: 240

Hejmera Helbestan: 50

Helbesta Destpêkê: Ey felek zalim felek ez ji destê cewret çûn konem

Xandan berbadî darem hesreta men çûn konem

Helbesta Dawiyê: Der derûnem ah û hesret nale nalim huzn û şîn

Sal û mah im roj û gav im rengê doj im ġemcivîn

Ev nusxe ji teref Mela Ehmed Cewzî ve hatiye nivîsandin. Dîroka nivîsîna nusxê nediyar e. Di berhemê de tevde 50 helbestên bi Kurdî yên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî hene. Dîsa ji xeynî van helbestên bi Kurdî gelek helbestên bi Erebî û Kurdî yên Hazroyî di nusxê de hene. Di nusxeya Cewzî de ji bilî helbestên Hazroyî helbestên çend şairên mîna Ehmedê Xanî jî hene. Ji destpêka rûpelê heta rûpelan 26an çend heb helbest hene ku ev helbest ne yê Fethî ne. Helbestên di dîwanê de ne muretteb in. Her wiha di nusxê de piştî rûpela 209an pê ve destxet tê guhartin û di van de çend helbestên din ên Fethî hene ku ev yek weke ku diyar dibe bi destxeteke cuda hatine nivîsandin. Di encama lêkolîna ku me kir de derket holê ku ev helbest îhtîmal e ku ji teref Cewzî ve nehatibin nivîsandin û dû re li nusxê hatibin zêdekirin. Çend helbestên ku di vê beşê de ne bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin û yên Fethî ne. Mirov dikare bibêje ji hêla kamilbûnê ve nusxeyeke tekûz û kamil e.

## 3. Rê û Rêbeza Hilbijartina Nusxeya Bingeh û Amadekirina Metna Dîwanê

### 3.1. Rê û Rêbeza Hilbijartina Nusxeya Bingeh

Me berî niha di bin sernava danasîna nusxeyan de qala hinek taybetiyên nusxeyên li ber destên xwe kiribû. Em dixwazin cardin û bi şikleke hûrgilî qala taybetiyên nusxeyan û sedema wek nusxeya bingeh hilbijartina nusxeya Mela Ehmedê Cewzî bikin.

Dema ku em temamê nusxeyan bidin ber hev em ê bibînin ku di nusxeya Mehmet Yalarî de 27, di ya Ehmed Yalarî de 23, di ya Zeynel Abîdîn Amedî de 50, di ya Mela Ehmedê Cewzî de 50 û di nusxeya X'ê de jî 43 helbest hene.

Dema ku mirov li gor zêdebûna hejmera helbestan tevbigere dê nusxeya ku Amedî karibe wê ji bo xebata xwe wek nusxeya bingeh bihilbijêre. Lê belê ger ku nusxe bên muqayesekerin wê demê dê bê fêmkirin ku ji bo hilbijartina nusxeya bingeh pîvana esas ne zêdebûna hejmera helbestan e; berewajî tekûz û kamilbûna helbestan e. Lewra ger dema ku em parîkek li ser destxeta Amedî lêkolînê bikin em ê bibînin ku çend kêmasiyên girîng ya nusxeya Amedî hene. Ji van kêmasiyan re wek mînak: Di helbesta bi navê 'Ya Reb ev çi seda bû' ya di nusxeya Amedî de 5 çarînên dawî yên vê helbestê nînin, her wiha dîsa hinek beytên helbestên bi navê 'Felek Yek Koremarek Ejdaha ye' û 'Were Ey Dil Mektebxaneya 'Eşq' yên di nusxeya Amedî de kêmasî hene. Her wiha ji hêla dîtin û diyarkirina qaliban ve jî çend helbest bi qûsir in. Di dema lêkolîn û muqayesekirina destxetan de tiştek bala me kişand ku ew jî ev bû; dema ku em helbestên di destxetên Amedî de dinêrin em dibînin ku wî van helbestan ne tenê ji ber destxetekê berawajî ji ber çend destxetan zêde kiriye.

Me di destpêka xebata xwe de di warê bijartina nusxeya bingeh de nusxeyên Mehmet Yalar û Ehmed Yalarî ji xwe re wek nusxeya bingeh nehilbijart. Lewra ev her du nusxe jî him ji hêla hejmara helbestan ve û him jî ji hêla tekûzî û bêkêmasiyê ve bi qûsir bûn û gelek helbestên dîwana Fethî di van nusxeyan de tunebûn. Lê belê ma van her du nusxeyan di warê diyarkirina nusxeya bingeh de wek rêber û pêşîvan bi kar anî. Lewra ev her du bira di xortaniya xwe de di medreseya 'Ebdulfettahê Hezroyî de li ber destên wî bi xwe ilm tahsîl kirine û helbestên wî nivîsandine. Wek mînak Mehmet Yalar piştî ku îcazeta xwe ya medresê distîne di sala 1977an de helbestên Hazroyî dinivîsene ku ev yek jî ji hêla reseniyê û tekûziyê ve nusxeya wî bi qedr û qiymet dike.

Piştî ku me nasîna van 3 nusxeyan kir re em ê bi şikleke hûrgilî li ser nusxeyên bi navê Mela Ehmedê Cewzî ku me wê wek C'yê bi nav kiriye û li ser nusxeya X'ê ya ku mustensîxê wê nediyar e birawestin. Lewra di warê hilbijartina nusxeya bingeh de em di navbera van her du nusxeyan de du dilî man. Ji ber vê yekê em ê li jêrê qala hinek taybetî û cudahiyên van her du nusxeyan bikin da ku bê fêmkirin me çima yekî ji wan ji xwe re wek nusxeya bingeh hilbijartiye.

Di nusxeya X’ê de tev de 43 û di ya Mela Ehmedê Cewzî de jî tev de 50 helbestên Kurdî û her wiha helbestên Erebî û Farisî yên Fethî hene. Di van helbestan de weke helbestên wan nusxeyên din kêmasiya riste û beytan an hema hema tune ye an jî gelek kêm in.

Di destpêkê de tê zenkirin ew her du nusxe yan weke ku ji heman çavkaniyê avê vexwarine yan jî yek li ber ya din hatiye zêdekirin. Lewra dema ku her du nusxe tên muqayesekirin tê dîtin ku rêza helbestên di her du nusxeyan de ne bi heman rêzê ne. Wek mînak di nusxeya C’yê de piştî helbesta ‘Munebbeh be ey arifê bo el-kemal’ helbesta ‘Elegar telebkarî’ tê û ev yek di nusxeya X’ê de jî wisa ye. Ev wekhevî di her du nusxeyan de heta dawiyê berdewam dike. Ji ber vê yekê tê zenkirin yek ji van nusxeyan li ber a din hatiye zêdekirin. Lê belê ne wisa ye, lewra dema ku bi şikleke baş lê vekolan ew ê bê dîtin ku her du nusxe jî li ber hev nehatine zêdekirin. Lewra di her du nusxeyan de kêmasiyên cuda hene. Wek mînak: Di nusxeya C’yê de di helbesta bi jimareya 6an de malika 9emîn û di helbesta 37emîn de malika 9emîn tune ye. Lê ev malik di destxeta X’ê de hene. Bi heman awayî di destxeta X’ê de jî helbestên bi jimara (51, 16, 17, 24, 45, 20) ên di metna ku me amadekiriye de tune ne. Ji ber van sedeman mirov dikare bibêje ev her du nusxe li ber hev nehatine zêdekirin.

Peyvên ku di destxeta C’yê de hatine nivîsandin di nusxeya X’ê de di formateke cuda de hatine nivîsin.

Wek mînak:

| C | X |
|---|---|
| Duşmenan | Duşminan |
| ‘Ursal | ‘irsal |
| Nezm | nezim |
| Û | we |
| Gerandin | gerandî |
| Axiriyyet | axiriyet |
| Pir | pur |

Piştî puştî

Di navbera di du destxetan de taybetiyeke cuda heye ku ew jî mustensîxên nusxeyan e. Weke ku me gotibû mustensîxê nusxeya C'yê Mela Ehmedê Cewziyê ku ji telebeyên Fethî ye û ya X'ê jî ne diyar e.

Wek encam em dikarin bibêjin di encama rê û rêbaza ku hat şopandin û di encama xebat û lêkolîna ku hat kirin de derket holê ku di nava nusxeyên ku di destê me de ne nusxeya ku me wê wek nusxeya Cewzî bi nav kiriye û nusxeya ku mustensîxê wê nediyar e ji hêla tekûzî û kamiliyê û ji hêla bêqûsiriyê ve hema hema wek hev in.

Li jor jî me taybetiyên van her du nusxeyên ku em li wan dudilî man anî zimên. Ji ber hinek taybetiyên ku me li jor qala wan kir û ji ber ku nusxeya X'ê mustensîxê wê ne diyar e û bi heman awayî ji ber ku Mela Ehmedê Cewzî bi xwe jî wek Mehmet Yalar û Ehmed Yalar li ber destê seyda ilmê tehsîl kiriye û telebeyê wî bûye me nusxeya Mela Ehmedê Cewzî ji xebeta xwe re wek nusxeya bingeh hilbijart û me xebata xwe li ser nusxeya wî ava kir.

### 3.2. Rê û Rêbeza ku di Dema Amadekirina Metna Dîwanê de Hatiye Şopandin

Di pêvajoya amadekirina metna bi tenkîd de û her wiha di pêvajoya muqayesekirina 5 nusxeyan de gelek rêbaz hatin şopandin da ku ev yek xebata me birêkûpêktir û tekûztir bikin. Em hêvî dikin ku ev yek jî bibe wesîleya xebateke pê bawer û lê hêja. Em ê li jêrê xal bi xal cih bidin rê û rêbaza ku di dema amadekirina metna bi tenkîd de hatiye şopandin.

1-Ji ber ku nusxeya orjînal yanî ya muellîf bi xwe negihaşt li ber destên me, di dema amadekirina metna krîtîk de di nava her pênç nusxeyan de ya herî dirûst û tam me ji bo damezrindina metna bitenkîd hilbijart ku ew nusxe jî ya Mela Ehmedê Cewzî bû. Me sedema hilbijartina vê nusxê ya wek nusxeya bingeh di beşa 'Rê û rêbeza hilbijartina nusxeya bingeh' de diyar kiribû.

2-Piştî ku me nusxeya Cewzî wek nusxeya bingeh hilbijart û metna xwe ya dirûst saz kir re, veca me dest bi nîşandana cudahiyên di nusxeyên din de kir. Me van

cudahiyan di jêrenotan de nîşan da. Di dema nîşandana van cudahiyên di nusxeyan de ji bo tevlîhevî çênebe û ji bo cudahiyên di nusxeyan de eşkere bên dîtin me navek da her yek nusxeyê ku ev binavkirin jî wisa ye: M (Nusxeya Mehmet Yalar), A (Nusxeya Ehmed Yalar), Z(Nusxeya Zeynel Abîdîn Amedî), X(Nusexeya X), C (Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî)

3- Ji ber ku di latînîzekirina metnên orjînel yên Kurdî-Erebî herfên di elîfbetka Kurdî ya latînî de tune ye, me elîfbetka transkripsiyonê ya navneteweyî bi kar anî ku ev elîfbetk di weşandina berhemên bi krîtîk de tê bikaranîn.

**Elîfbeya Transkrîpsiyonê:**

| | |
|---|---|
| ث | s̱ |
| ح | ḥ |
| ذ | ẕ |
| ص | ṣ |
| ض | ḍ, ż |
| ط | ṭ |
| ظ | ẓ |
| ع | ‘ |
| غ | ġ |
| ء | ’ |

4-Di dema hazirkirina metnê de me wezna her helbestekê li pêşiya wê danî û her wiha me behra wê weznê jî destnîşan kir.

5-Di amedekirina metnê de tevde 5 destxet hatin muqayesekirin. Di dema vê muqayesekirinê de dema ku helbestek, misreyek yan jî beytek kêm bê yan jî ji nusxeyeke din hatibe girtin di jêrenotê de hat nîşandan.

6-Peyv, beyt an jî risteyeke ku ji bilî nusxeya bingeh di temamê nusxeyên din de wek hev be di jêrenotê de bi şêwaza (M), (A), (X),( Z) hat nîşandan.

7-Di muqayesekirina nusxeyan da ger ku li gor nusxeya bingeh tîpek jî kêm hatibe nivîsandin an jî tîpek jî bi şikleke cuda hatibe nivîsandin ew jî hat destnîşankirin.

8- Me ji bo her helbestekê hejmarek danî, bi heman awayî ji bo dîtina malikan hêsantir bibe û ji bo xebateke akademîk derkeve meydanê di her helbestê de jî jimare li ser her malikekî hat danîn.

9- Di dema analîzkirin û nirxandina metna dîwanê de mînak hatin dayîn, ji bo ev mînak bi hêsanî di nav helbestan de bên dîtin û ji bo çêtir bê fêmkirin me di dawiya mînakan de di kevanê de jimare danîn. Hejmera yekem a di kevanê de hejmara helbestê û ya duyemîn jî hejmara malikê ye.

Wek mînak:

Xweda neẓm kirye di kilamê mubîn
Muqeddem Birahîm û Îsḥaq çunîn (1/21)

10- Seyda Ebdulfettahê Hezroyî dîwana xwe bi sê zimanan ango bi Kurdî, Erebî û Farîsî helbest nivîsandiye. Di dema amadekirina metna bi tenkîd de me tenê cî da helbestên bi Kurdî. Ango me xebata xwe seranser li ser helbestên wî yên bi Kurdî kir.

11-Di encama lêkolînê de çend helbestên ku berî niha nehatine çapkirin hatin keşifkirin ku ji van helbestan ya herî balkêş helbesta bi navê ‘Qesîdeya Qelem’ e.

12-Ayet û hedîsên di helbestan de di nava dunikê (“ ”) de hatine nivîsin.

13-Ji bo xebata me birêkûpêktir û tekûztir bibe di warê hevokên Erebî de û di warê weznên helbestan de me ji kesên ehlê wî karî alîkarî teleb kir.

14- Ji bo dîwana ku me berhev kiriye û me tenkîda wê kiriye çêtir bê fêmkirin û hêsantir karibe têgihiştin me xebata xwe kir sê beşan. Beşa yekem a ‘Beşa Eqîdê’ ye ku

di nav de helbestên ku li ser mijara eqîdê hatine nivîsandin hene, beşa duyemîn 'Dastana Leyla û Mecnûn' e û beşa sêyemîn û ji helbestên ku xezel, qesîde û murebbe na pêk tê.

15- Di teksta tezê ya ku hatiye amedekirin de nasîna navên şexs, bajêr, navçê, gund û gundikên ku derbas dibin li gor çavkaniyan di jêrenotan de hatin ravekirin.

16-Helbestên Kurdî yên dîwanê ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin û hejmara helbestan, nimreya wan, ji çend beytan pêk tên, teşeyên nezmê yên helbestên dîwanê wek; qesîde, mesnewî, xezel û hwd. û nimûneyên wan di dîwanê de hatin tespîtkirin. Temamê ev tiştên ku hatin tespîtkirin wek tablo hatin nîşandan.

17- Helbestên dîwanê li gor tertîbekê nehatibûn nivîsîn. Ji ber vê yekê me hemû helbestên wî yên bi Kurdî li gorî rêza tîpên elîfbaya Erebî bi rêz kir.

18- Me di xebata xwe de du gotarên Mehmet Cevat Ergîn bi kar anî, ji bo di jêrenotan de di nîşandayîna van çavkaniyan de tevlîhevî dernekeve em mecbûr man ku kodnavan li van gotarên wî bikin. Me bi dorê ji gotarên wî re navên 'Gotar 1emîn' û 'Gotar 2emîn' an li wan kir û me van kodnavan di dîpnotan de bi kar anî da ku tevlîhevî derneyê. Navên ku me li gotarên wî kirine ev in:

Gotara 1emîn: Mehmet Cevat Ergin, Hazrolu Seyda Hacı Abdulfettah Yazıcı, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi,* Diyarbakır 2006, c. VIII, h.1.

Gotar 2emîn: Mehmet Cevat Ergin, Son Yüzyılda Silvan'ın Yetiştirdiği Âlimler, Uluslararası Silvan Sempozyumu, Mardin: Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012.

**4. Çavkaniyên Sereke**

Di dema pêvajoya amadekirina xebata li ser Dîwana Fethî de ji gelek çavkaniyan sûd hat wergirtin. Em van çavkaniyan dikarin wisa bisenifenin:

-Pirtûk

-Gotar û Hevpeyvîn

-Xebatên ku di warê Wêjeya Klasîk a Kurdî de wek tezê hatine amadekirin

-Çavkaniyên Dijîtal

-Ferheng

-Nusxeyên Dîwanê

Piştî ku me van çavkaniyên ku di dema amadekirina tezê de me ji wan sûdê wergirtiye bi rêz kir re êdî em dikarin hinekî qala van çavkaniyan bikin.

Di dema amadekirina beşa “Jiyan û Berhemên Fethî” de ji xebatên bi navê “Mehmet Cevat Ergin, Hazrolu Seyda Hacı Abdulfettah Yazıcı”, “Mehmet Cevat Ergin, Son Yüzyılda Silvan’ın Yetiştirdiği Âlimler, Uluslararası Silvan Sempozyumu”, “Mehmet Yalar, Hazrolu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği, Uluslararası Silvan Sempozyumu”, “e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi -www.e-şarkiyat.com- ISSN: 1308–9633 h: III/Nisan 2010” http://sarkiyatarastirmalari.dergipark.gov.tr/download/article-file/115949” û “e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi -www.e-sarkiyat.com- ISSN: 1308-9633 Sayı: VI, Kasım 2011, http://dergipark.gov.tr/download/article-file/115982” sûd hat wergirtin. Di nava van xebatan de du kesên bi navê Mehmet Yalar û Ehmed Yalar hene ku ev her du kesayet birayên hev in û her wiha li ber destên Seyda Ebdulfettahê Hazroyî ilmê tahsîl kirine. Her wiha agahiyên ku di xebata Mehmet Cevat Ergîn de derbas dibin li gor ku ew dibêje ji xwendevanên Seyda Ebdulfettah Hazroyî hatine wergirtin. Agahiyên di van çavkaniyan de di dema amadekirina beşa ‘Jiyan û Berhemên Fethî’ de ji me re gelek bûn alîkar û mirov dikare bibêje ku di vê beşê de çavkaniyên me yên sereke ev xebatên ku me navên wan li jorê birêz kiribûn bûn.

Her wiha di dema amadekirina beşa duyem û ya sêyemîn de me zêdetir ji xebatên bi navê “Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, “M. Şefik Korkusuz, Tezkire-i Meşayih-i Amid”, “Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects, Kurdish Studies, j. 2, no: 2, Cotmeh 2014.”, İskender Pala, Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü” , “Ethem Cebecioğlu, Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü” û “Cem Dilçin, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi,” sûdê wergirt.

Her wiha me di dema amadekirina metna bi tenkîd a dîwanê de 5 nusxe bi kar anîn. Ji van nusxeyan sê nusxe yên telebeyên Seyda Ebdulfettah Hazroyî bûn ku navê wan jî ev e: Mehmet Yalar, Ehmed Yalar û Mela Ehmedê Cewzî. Her wiha ji bilî van sê nusxeyan nusxeya Zeynelabîdîn Amedî û ya ku mustensîxê wê nediyar e û ji teref me ve wek X’ê hatiye binavkirin jî di xebatê de hatin bikaranîn.

Wek encam ji bilî van çavkaniyan her wiha ji gelek çavkaniyên ku me navê wan li vê derê birêz nekiriye û me wan di beşa çavkaniyê de nîşan daye sûd hat wergirtin ku ji van hinek kitêp û gotar in, hinek ferheng û tez in û hinek jî çavkaniyên dijîtal in.

## BEŞA YEKEMÎN

## JIYAN Û BERHEMÊN FETHÎ

Jiyana Mela Ebdulfettahê Hezroyî, bi fêrbûn û fêrkirina ilmê re hêj ji temeneke biçûk dest pê kiriye ku ji ber vê yekê ev xala despêkê ya tahsîlkirina ilmê jiyana wî dewlementtir dike. Me di vê beşê di bin sernavê 'Jiyan û Berhemên Fethî' de hewil da vê jiyana wî têr û tijî bînin ziman. Binbeşa yekem derheqê jiyana Fethî de û binbeşa duyemîn jî derheqê berhemên ku wî nivîsandiye de ye. Temamê agahiyên ku me derheqê jiyana wî de berhev kirine û em ê bi we re parve bikin bi taybet ji malûmatên telebeyê wî yên bi navê Mehmet Yalar û Ehmed Yalar û ji xebatên Mehmet Cevat Ergînê akademîsyen hatine wergirtin ku dema me van agahiyan parve kir em ê di jêrenotan da çavkaniyên wan jî diyar bikin.

### 1. JIYANA FETHÎ:

#### 1.1. Nav û Mexlasê Fethî

Navê helbestvanê me Ebdulfettah û paşnavê wî jî Yazici ye. Li derdora xwe û li herema ku lê dijiya bi navên Mela Ebdulfettahê Hazroyî û Hecî Seyda dihat naskirin. Mehmet Cevat Ergîn di nivîsa xwe ya ku derheqê wî de nivîsandiye de sedema van unvanên wî wiha îzah dike: "Ebdulfettah Yaziciyê ku wek Seyda Hacî tê naskirin piştî ku perwerdehiya xwe ya medresê xelas kir re dest bi dayîna dersê kir ku ji ber vê yekê unvana "Seyda" ya ku li heremê ji bo alimên mezin tê bikaranîn, ji ber ku di emreke piçûk de çû hecê jêre "Hecî Seyda" û ji ber ku birayê wî bi navê Evdirrehman Yazici ji Begên Hazro re katiptiyê dikir paşnavê 'Yazici'yê wergirt."[2]

Mela Ebdulfettahê Hazroyî di temamê helbestên xwe yên ku bi Kurdî, Erebî û Farisî nivîsandiye de mexlasa **Fethî** bikaraniye Wek mînak:

Bes e **Fetḥî** ji ḥeddê xwe meçe der
Te'alellah ji vê neẓma delal e (38/12)

[2] Mehmet Cevat Ergin, Hazrolu Seyda Hacı Abdulfettah Yazıcı, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Diyarbakır 2006, c. VIII, j.1, r. 110.

Dil da'ima dilber divê
Ṭûṭî di leb şeker divê
**Fetḥî** perî peyker divê
Qeṣd û murada mihr û mah (36/11)

Me di xebata ku derheqê wî amade kir de tevde li ser 5 nusxeyan xebitî. Ji bilî du helbestan di temamê van helbestên di nusxeyan de Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî her tim mexlasa Fethî bi kar aniye. Li gor nusxeyan, Seydayê Ebdulfettahê Hezroyî ji bilî mexlasê Fethî di helbestêke xwe de sifeta Aşiq û di helbesteke din de jî mexlasa Baqî bi kar aniye ku ew jî ev in:

Di çarîna dawî ya helbesta jêr de Mela Ebdulfettahê Hezroyî ji dêla mexlasa xwe ya 'Fethî' de sifeta 'Aşiq bi kar aniye ku vê malûmatê Mamoste Mehmet Yalar da me.

Ey **'Aşiqê** hezîn e
Carek were bibîne
Bê ah û bê enîn e
Xalê li rûyê geş bû (39/18)

Weke ku di malika jêr de jî tê dîtin Seyda Ebdulfettahê Hezroyî di şûna mexlasê xwe de mexlasa bi navê Baqî bi kar aniye.

Nehin kes bêkes û bêçare û bêdil wekî **Baqî**
Meke ya Rebb ewî meḥrûm ji luṭfa şêx û seydayê (45/13)

Mamoste Mehmet Yalar di derheqê hikmetê bikaranîna vê mexlesê de wisa dibêje: " Evdilbaqî lawê Şêx Muhammed Selîmê Hezanî ye. Evdilbaqî ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî teleb dike da ku bi mexlesa wî qesîdeyekê binivîsîne. Ji ber vê yekê seyda di helbesta xwe de vê mexlesa Baqî bi kar aniye.[3]

[3] Min vê meselê ji Mamoste Mehmet Yalar guhdar kir.

### 1.2. Malbata Fethî

Bavê wî Hecî Mihemed e û diya wî jî qîza Mela Ehmed[4] e. Hecî Mihemed eslê xwe ji Qulpê ye. Di derbarê jiyana bavê Seydayê Ebdulfettahê Hezroyî de Mehmet Yalar[5] wiha radigihîne:“ Malbata Seydayê Yazici, eslê xwe ji Qulpa Diyarbekirê bûne. Li gor rîwayetan, bav û kalên wî berî niha çend qernan ji Qulpê koçî Genca Bingolê kirine û piştî demekê jî ji wê derê koçî Licêya Diyarbekirê kirine. Piştî nîvê qerna 19emîn bavê wî Hecî Mihemed li Hazroya ku ew di zaroktiya xwe de ji bo tahsîlkirina ilmê çûbûyê tehsîla xwe nîvrê dihêle û li wê derê dest bi tîcaretê dike. Li vê derê bi qîza seydayê xwe Mela Ehmed re dizewice û jê 2 qîz 3 kur tev de 5 zarokên wî çêdibin.”[6]

### 1.3. Dîroka ji Dayikbûn û Wefata Fethî

Seyda Ebdulfettahê Hezroyî weke ku ji navê wî jî diyar e eslê xwe ji Hezroya Diyarbekirê ye. Seyda hêj dema ku biçûk bû dest bi tehsîla ilmê dike. Di derbarê dîrok û cihê salbûna Seyda Ebdulfettahê Hazroyî de Mehmet Yalar wiha neqil dike: “Seyda Yazici di h. 1310/ m. 1892an de li Taxa Camiya Hazroya ku di wextê xwe de girêdayê Farqînê bû hat dinyayê. 2 jê qîz 2 jê lawik tevde çar xweşik û birayên wî hene û ew bi xwe di nav malbatê de zarokê herî mezin e. Seyda weke kevneşopiya heremê hêj 10-12 saliya xwe de dest bi tahsîlkirina ilmê dike.”[7] Seyda piştî ku 12 salan telebetî û 52 salan jî muderrîsî dikî re di Sibata sala m.1975an de li Hazroyê wefat dike.

### 1.4. Rêwitiya Hecê ya Fethî

Mela Ebdulfettahê Hazroyî hêj di xortaniya xwe de digel xalê xwe Ebdullah Düşünücü, rêya hecê girtiye û bi sed zehmetiyê vê rêwîtiya xwe ya hecê qedandiye. Derheqê vê yekê dîsa Ergîn wiha radigihîne: “ Di sala 1908an de dema ku 16 salî bû digel xalê xwe yê bi navê Ebdullah çûye hecê. Di ya rastiyê de Seyda niyet kiribû digel xalê xwe ji Hazrro heta Diyarbekir pê re were, lê îhtîmal e ji ber ku negihaştina kafîleya hecê û ji ber şertên nebaş ên wê heyamê, xalê wî jê xwastiye ku heta rêwitiya hecîbûnê

---

[4]Seydayê bavê Ebdulfettah Hazroyî ango Seyda Hecî Mihemed e.
[5]Beriya sala 1977an li ba Seydayê Ebdulfettah Hazroyî telebetî kiriye.
[6] Mehmet Yalar, Hazrolu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği, *Uluslararası Silvan Sempozyumu*, Mardin: Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012, r. 460.
[7] Yalar, *h.b.,* r. 461.

xilas bibe pê re be û bi vê wesîlê Seyda Hazroyî çûye hecê û ji ber vê yekê jî bi navê Hecî jî hatiye binavkirin.”[8]

### 1.5. Eskeriya Fethî

Mela Ebdulfettahê Hazroyî eskerî nekiriye. Lewra seyda di wextê xwe de li Farqînê beşdarî îmtîhanekê dibe da ku bikeve nava sefên îlmiyê. Di encama vê îmtîhanê de seyda bi ser dikeve û naçe eskeriyê. Ergîn derheqê nekirina eskeriyê ya Fethî de agahiyên ku ji telebe û kesên derdora wî berhev kiriye di gotara xwe de wisa parve dike: “ Seyda di sala 1920an de li Farqînê ji ber ku tevlî îmtîhanekê dibe û di îmtîhanê de bi ser dikeve û dikeve nav çîna îlmiyê ji eskeriyê muaf dibe. Li gor agahiyên ku hatine ragihandin di îmtîhanê de jê hinek hûnerên edebî hatine pirsîn û jê hatiye xwestin ku helbesteke ku van hûneran di nav xwe de bihewîne ji wan re bibêje. Wî jî ji ber vê telebê bi alîkariya rihê xwe ya helbesvantiyê hema helbestek xwendiye û xocayên di juriyê de vê helbesta wî pir ecibandine û wî pîroz kirine.”[9]

### 1.6. Zewaca Fethî

Seyda Ebdulfettah Hazroyî du caran zewiciye. Pêşî bi qîza xalê xwe Ebdullah Düşünücü re zewiciye, lê qet zarokên wî çênebûne. Piştî ku xanima wî di sala 1944an de wefat kir re bi qîza Şêx Muhammed Selîmê Hezaniyê (qs) ku întîsabî wî kiribû re zewicî û heta dawiya emrê xwe pê re zewicî ma. Encax ji vê zewaca wî ya duyemîn jî qet zarokên wî çênebûn.[10]

### 1.7.Rêwîtiya Fethî ji bo Xwendinê û Muderrîstiya Wî

#### 1.7.1.Rêwîtiya Fethî ji bo Xwendinê

Seyda Ebdulfettahê Hezroyî piştî ku cara ewil di 10-12 saliya xwe de li ba xalê xwe dest bi tehsîlkirina ilmê kir re heta 12-14 saliya xwe yanî heta sala 1924an vê tehsîlkirina ilmê didomînê. Derheqê vê heyama tehsîlkirina ilmê ya Hezroyî de Mehmet Yalar wiha radigihîne: “Di vê çarçovê de cara ewil li ba xalê xwe Mela Ebdullah[11] dest

---

[8] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 110.
[9] *h.b.*, r. 110.
[10] *h.b.,* r. 111-112.
[11]Wek bi navê Mela Ebdullahê Hezroyî (Düşünücü) tê binavkirin. “Mela Ebdullahê Hezroyî di sala 1875an de li Hazroya Diyarbekirê hatiye dinyayê û di emrê xwe ya biçûkaniyê de li ba bavê xwe dest bi tehsîla ilmê kiriye û ji gelek aliman ders wergirtiye. Piştî wextekî dîsa li ba bavê xwe tehsîla xwe xelas kiriye û ji bavê xwe îcazeta xwe

bi tehsîla ilmê dike û piştî demekî derbasî gundê Tilalo dibe û li wê derê ji Mela Faîqê[12] xalê bavê xwe ders wergirtiye. Dû re jî ji vê derê veqetiyaye û derbasî Licê bûye û li wê derê li ba seydayên navdartirîn ên heremê yên bi navê Mela Ebdullahê Meylanî û Mela Muhammed Hadî[13] tehsîlkirina ilmê domandiye. Seyda dû re demekê derbasî gundê Ceznêya Hezoya Êlihê bûye û li wê derê li ba Mela Reşîd[14] ders standiye. Herî dawî seyda li Farqînê li ba Mela Huseynê Qiçik[15]ê ku wek reîsul ulema dihat naskirin ders standiye û li cem wî tehsîlkirina ilma medresê qedandiye û ji seydayê xwe îcazeta xwe wergirtiye."[16] Seydayê Hecî, digel destûrnameya xwe ilmê, destûrnameya Terîqeta Neqşîbendî jî wergirtiye.[17]

### 1.7.2. Muderrîstiya Fethî

Mela Ebdulfettahê Hezroyî di 10-12 saliya xwe de dest bi tahsîlkirina ilmê kir, piştî ku tahsîla medresê qedand re di sala 1916an de ango di 24 saliya xwe de dest bi muderrîstiyê kir. Derheqê vê mijara muderrîstiya Seyda de, telebê wî yê bi navê Mehmet Yalar wiha diyar dike: "Seyda piştî ku tahsîla xwe ya medresê xelas kir re di sala 1916an de ango di 24 saliya xwe de vegeriya Hazro. Piştî vê vegerînê, bavê wî li taxa Camiya Hazroyê li ser cihekî ku wek girekî bû jê re medreseyek çêkir û Seyda li vê derê dest bi muderrîstiyê kir. Ji vê dîrokê pê ve muderrîstiya wî heta sala 1967ên ku min jê îcazeta xwe wergirt 52 salan bênavber berdewam kir. Ji vê dîrokê pê ve ji ber nexweşiyên

standiye. Di sala 1947an de li Diyarbekirê wefat kiriye." Mehmet Şefik Korkusuz, *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, weş. Kent, İstanbul 2004, r. 222-223.

12 "Mela Faîqê Licêyî. Li Tilaloya girêdayê Diyarbekirê îqamet dikir û ji xalên bavê Ebdulfettahê Hazroyî ye." Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 110, r.114.

13 "Di sala 1268ê Zayînî/1852wê Mîladî li Licêya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Li ba bavê xwe Sibxetullah dest bi ilmê dike. Piştî ku li medreseyên muxtelîf ilm tehsil kir re di sala 1891a Miladî li ba Mela Xelîlzade Fethullahê Sêrtî îcazeta xwe wergirtiye. Di sala 1880ên Miladî de li Licê di Mekteba Ruştiyê de mealimtî kir û di sala 1909ên Mîladî de tayînî muderrîstiya Licê hat kirin. Di 59-60 saliya xwe de li Licê wefat kir." Korkusuz, *h.b.* r. 156-159.

14 "Li gor agahiyên Zahid Yaziciyê ku birayê Fethî ye; Mela Reşîd di ronahiya rojê de ji daristanê êzing berhev dikirin û wan li ser pişta xwe dianî, êvarî jî di ber şewqa agirê wan de dersan amade dikir û piştî nîvro jî dersa telebeyan dida." Ergin, *Gotara 1emîn*, r.115.

15 "Di sala 1871an de li Deştadahla Cizîrê hatiye dinyayê. Di 3 saliya xwe de bavê xwe winda dike. Li Cizîrê ji seydayên bi navê Mela Ehmed Hemdî û Şêx Ebdullah el-Bîdarî dersê wergirtiye. Piştî ku îcazeta xwe ji Şêx Ebdullah el-Bîdarî wergirt re li Farqînê îqamet kir û heta dawiya emrê xwe di medreseyan de ders da." Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 420.

16 Yalar, *h.b.,* r. 461.

17 Necatê Zivingî, *Stêrkên Edebiyata Kurdî*, weş. Banga Heq, Stenbol 2014. r.317.

lewazîbûna hişê û tansiyona zêde dev ji dayîna dersê berda."[18] Ev medrese hêj jî li ser piyan e.

Weke ku me di binbeşa jor û di bin beşên din de diyar kir Seyda nêzî 52 salan muderrîstî kir. Di pêvajoya vê muderrîstiya wî de Seyda gelek telebê perwerde kirin. Li gor gotinên telebeyên Seyda, ew xwedî exlaqekî xweş bû û li dijî telebeyên xwe xweşbîn bû. Derheqê muderrîstiya Seyda de agahiyên herî berfireh ji teref Mehmet Cevat Ergîn ve hatiye parvekirin ku ev agahiyên derheqê Seyda de ji telebên wî yên bi navê M. Seîd Yazici, Abdulah Düşünücü, Mehmet Bîlîcî, Hulusî Kiliç û biraziyê Seyda yê bi navê Salih Yazici hatine wergirtin. Di xebata ku derheqê Seyda de hatiye amedekirin de derheqê muderrîstiya Seyda de wiha tê ragihandin: " Seyda Ebdlfettahê Hazroyî demeke divûdirêj muderrîstî kiriye. Jiyaneke wî ya ji rêzê hebû. Temamê wextê xwe di medresê de bi dayîna dersên telebeyên xwe diborand. Di dema dayîna dersê de ew zanabûna wî xwe nîşan dida û ev yek jî li ser telebeyên wî tesîr dikir. Digel alimbûna xwe şair û edîb bû jî. Li dijî tewr û helwestên telebeyên xwe hêrs nedibû û sukuneta xwe muhefeza dikir. Li dijî wan gelekî xweşbîn bû. Carekê telebeyekî wî yê ku li ber destên wî dersê werdigirt dema ku kitêba bi navê Kavl-i Ehmedê ku haşîyekê ji haşiyeyên kitêba mantiqê ya ku bi navê Îsagûcî[19] tê nasîn dixwîne, dike nake tiştekî jê fêm nake û aciz dibe û kitêbê diavêje rexekî û dibêje 'ma kitêba vî kafirî jî tê xwendin.' Û piştî vê gotinê ji medresê derdikeve. Seyda hêrs nabe û heman kitêbê bi telebeyekî din dide xwendin. Xwendevanê navborî roja din tê ba seyda û jê re teleba xwe ya xwendina kitêbê tînê zimên. Seyda ji ber vê teleba telebeyê xwe henekan pê re dike û jê re dibêje 'Gelo ma nivîskarê kitêbê bû Misliman ku tu dixwazî kitêbê bixwînî' û dayîna dersê didomîne."[20]

Seyda di dema muderrîstiya xwe de gelekî zêde telebeyên xwe ji xwe re dikir derd û gelek zêde bi wan re eleqedar dibû da ku bi şikleke birêkûpêk û kamil dersên xwe hîn bibin. Derheqê vê meselê de ev agahiya ku ji teref Ergîn ve ji telebeyekî seyda hatiye wergirtin wisa ye: " Li ba Seyda 5 kesên ku kitêba Molla Camî dixwandin hebûn û her yek ji wan nîv rûpel an jî rûpelek li pêşiya kesê din bû. Seyda ji her yekî ji wan re wexteke cûda xerc dikir û pir zêde diwestiya. Telebeyekî wî jê re got ' Gelo ji dêla ku hûn dersa her telebeyî cûda bidin xwendin temamê dersa bikin yek û pêv re bi

[18] Yalar, *h.b.*, r.461.
[19] Navê kitêba klasîk a mantiqê ya ku di merdereseyan de dihat xwendin e. Muellîfê wê Esiru'd-din Mufaddal Ömer el- Ebheri ye. http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c10/c100066.pdf 19 Hezîran 2017. 15:02:02
[20] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.116.

hemiyan bidî xwendin nabe? Lewra hemî jî heman kitêbê dixwînin û cihên ku dixwînin jî nêzî hev in. Bi vê yekê hûnê hindiktir bibetilin.’ Ji ber vê gotina telebeyê wî Seyda jê re wiha got ‘ Baş dibe, lê kesên ku çend rûpelan li pêş in, ji ber ku kesên ne bi wan re ne bigijin wan dibe ku li hisabê wan neyê. Ez ditirsim ji ber vê yekê di neqeba wan de hesûdî çêbibe û dibe ku hinek ji wan dev ji xwendinê berdin. Ji dêla ku ez bibim sedema vê yekê tercîh dikim ku zêdetir bibetilim.’ Seyda bi vê helwesta xwe heman sepana dersdayînê ji bo navbir nekeve tahsîlkirina ilmê terza dersdayîna telebeyên xwe domandiye.”[21]

### 1.7.3. Seydayên Fethî

#### 1.7.3.1. Mela Abdullah

Mela Ebdullahê Hezroyî di sala 1875an de li Hazroya Diyarbekirê hatiye dinyayê û di emrê xwe ya biçûkaniyê de li ba bavê xwe dest bi tehsîla ilmê kiriye û ji gelek aliman ders wergirtiye. Piştî wextekî dîsa li bavê xwe tehsîla xwe xelas kiriye û ji bavê xwe îcazeta xwe standiye Di sala 1947 an de li Diyarbekirê wefat kiriye.[22]

#### 1.7.3.2. Mela Faîqê Licêyî

Mela Faîqê Licêyî li Tilaloya girêdayê Diyarbekirê îqamet dikir û ji xalên bavê Ebdulfettahê Hazroyî ye. [23]

#### 1.7.3.3. Mela Muhammed Hadî

Di sala h.1268/m.1852an de li Licêya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Li ba bavê xwe Sibxetullah dest bi tahsîlkirina ilmê dike. Piştî ku li medreseyên muxtelîf ilm tehsil kir re di sala 1891ên miladî de li ba Mela Xelîlzade Fethullahê Sêrtî îcazeta xwe wergirtiye. Di sala 1880ên miladî de li Licê di Mekteba Ruştiyê muallimtî kir û di sala 1909ên mîladî tayînî muderrîstiya Licê hat kirin. Di 59-60 saliya xwe de li Licê wefat kir.[24]

[21] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.117.
[22] Korkusuz, *h.b.*, r. 222-223.
[23] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 114.
[24] Korkusuz, *h.b.,*, r. 156-159.

### 1.7.3.4. Mela Reşîd

Li gor agahiyên Zahid Yaziciyê ku birayê Fethî ye; Mela Reşîd di ronahiya rojê de ji daristanê êzing berhev dikir û wan li ser pişta xwe dianî, êvarî jî di ber şewqa agirê wan de dersan amade dikir û piştî nîvro jî dersa telebeyan dida.[25]

### 1.7.3.5. Mela Tahir

Derheqê vî melayî de zêde agahî tunene. Ergîn derheqê wî de wisa dibêje: "Dibe ku seyda ji vî melayê ku me derheqê wî de agahî berhev nekiriye dersê wergirtibe. Li gor gotinan, Mela Tahirê ku ji hêla aboriyê ve di rewşeke xirab de bû xwediyê hişeke bi hêz bû. Beriya Remezanê bi hêviya kirina melatiyê berê xwe dide Diyarbekirê û piştî hinek lêkolînan jê re melatiya camiyekê tê teklîfkirin. Mela Tahir digel ku ne hafiz e melatiyê qebûl dike û digel nehafizbûna xwe her roj cuzeke Qur'anê hifz dike û erka xwe ya melatiyê bi cî tînê. Bi vî awayî di dawiya Remezanê de temamê Qur'anê hifz dike û dibe hafiz Qur'an."[26]

### 1.7.3.6. Mela Abdullahê Meylanî

Seyda Ebdulfettahê Hezroyî pêşî li gundê Qiçika Licê û dû re jî li navenda Licê ji vî seydayê xwe dersê wergirtiye. Mela Abdullahê Meylanî di sala 1915an de ango di Şerê Yekemîn a Cîhanê de wek melayê tabûrê di cepheya Mûşê de hatiye wezîfedarkirin û li wê derê ji ber nexweşiya xwe wefat kiriye.[27]

### 1.7.3.7. Mela Seyîd Evdirrehman Yardimci

Eslê xwe Sêrtî ye. Di sala 1876an de li Farqînê hat dinyayê. Li Medreseya Kara Behlula Farqînê xwend. Di sala 1909an de îcazeta xwe ya muderrîstiyê wergirt û li medreseya ku lê xwend dest bi muderrîstiyê kir. [28]

---

[25] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 115.
[26] *h.b.*, r. 114.
[27] *h.b.,* r. 114.
[28] *h.b.,* r. 115.

### 1.7.3.8. Mela Huseyînê Qiçik

Di sala 1871an de li Deştadehla Cizîrê hatiye dinyayê. Di 3 saliya xwe de bavê xwe winda dike. Li Cizîrê ji seydayên bi navê Mela Ehmed Hemdî û Şêx Ebdullah el-Bîdarî dersê wergirtiye. Piştî ku îcazeta xwe ji Şêx Ebdullah el-Bîdarî wergirt re li Farqînê îqamet kir û heta dawiya emrê xwe di medreseyan de ders da.[29] Ev seydayê ku dû re li Farqînê îqamet kiriye di jiyana ilmî ya Mela Ebdulfettahê Hezroyî de bûye xwediyê cihekî girîng. Mela Ebdulfettah dersên xwe bi giştî jê standiye û kitêbên xwe li ba wî xelas kiriye. Di taliyê de îcazeta xwe jê wergirtiye.[30]

### 1.8.4. Telebeyên Mela Ebdulfettahê Hazroyî

Weke ku me berî niha jî qal kir Mela Ebdulfettahê Hezroyî piştî ku îcazeta xwe wergirt re 52 salan li medreseya ku bavê wî jê re ava kir muderrîstiyê kir. Seyda di nava van 52 salan de bi sedan telebe perwerde kir. Ji van telebeyên wî hinek ji wan di diyanetê de hinek ji van di zanîngehan de wezîfe kirin. Me di encama lêkolîna ku kir de gihaşt navê 22 telebeyên ku hinek ji wan wefat kirine û hinek ji wan jî hêj sax in. Telebeyên wî yên ku me navê wan tespît kiriye ev in:

#### 1.8.4.1. Mehmet Yalar

Di Çileya sala 1949-1950an de li gundê Mermera Diyarbekirê hat dinyayê. Dema ku 5 salî bû dest bi Qur'ana Kerîm kir û berî ku têkeve 7 saliya xwe Qur'anê xitim kir. Di 6 saliya xwe de li Mermerê dest bi mektebê kir û di sala 1960an de Dibistana Destpêkê ya Mermerê xelas kir.[31] Di sala 1993an de li Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Uludagê dest bi kar kir û li vê derê doktoraya xwe kir û dîsa li vê derê unvanên doçend û profesortiyê girt. Hê jî li vê zanîngehê dixebite.

#### 1.8.4.2. Abdulazîz Cafer el-Mîşkanî el Bidlîsî

Di sala 1898an de hat dinyayê û tahsîlkirina ilmê li ba Mela Ebdulfettahê xelas kir. Di navbera salên 1930-1935an de koçî Sûriyê kir û li wê derê wefat kir.[32]

---

[29] Ergin, *Gotara 2emîn*, r. 420.
[30] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 115.
[31] *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-şarkiyat.com- ISSN: 1308–9633 h: III/Nisan 2010, r.160. http://sarkiyatarastirmalari.dergipark.gov.tr/download/article-file/115949 10 Nîsan 2017. 16:11:58
[32] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.118.

#### 1.8.4.3. Îsmetullah Yîğît(Karazî)

Di sala 1904an de li gundê Fîsa Licê hat dinyayê. Piştî çend salên ku bi tahsîlkirina ilmê derbas dibe re li Karaza Diyarbekirê bi cî dibe û li wê derê wefat dike.[33]

#### 1.8.4.4. Ehmedê Meylanî

Lawê Mela Abdullahê Meylaniyê ku seydayê Mela Ebdulfettahê Hazroyî bû ye. Di sala 1913an de li Licê ji dayik bûye. Piştî ku tahsîla xwe ya medresê xelas kir re pêşî melatî dû re miftîtiya navçê kiriye û di sala 2002an de li Diyarbekirê wefat kiriye.[34]

#### 1.8.4.5. Halil Özaydın

Di salên 1902-1903an de li Diyarbekirê ji dayik bû. Li Mizgefta Mezin a Diyarbekirê di beşa Şafîiyan de dest bi wezîfê kiriye û di navbera salên 1946-1960an de 15 salan Miftîtiya Bajêra Diyarbekirê kir. Di sala 1960an de tayîna wî li Miftîtiya Meletiyê derket. Di sala 1967an de wefat kir.[35]

#### 1.8.4.6. Mehmet Saît Ergîn

Di sala 1933an de li Hazroyê hat dinyayê. Li Diyarbekirê di miftîtiyên cûrbecûr de wezîfe kir. Di salên 1997-2000an de li Farqînê miftîtî kir û li wê derê teqawîd bû.[36]

#### 1.8.4.7. Abdulvahhab Karapeçelî

Ji Gercewsa Êlihê ye. Li hinek gundan melatî kiriye, xwediyê exlaqeke xweş e û şexsiyetekî navdar e.  Ji ber ku Mela Ebdulfettah Hazroyî pir jê hez dikir wî ji bo girtina îcazetê şandiye ba murşîdê xwe Muhammed Selîm. Di sala 1960an de wefat kiriye.[37]

#### 1.8.4.8. Abdullah Düşünücü

Di sala 1929an de li Hazroya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Abdullahê Hazroyî ye. Di biçûkayiya xwe de dest bi tahsîlkirina ilmê dike û pêşî li ba bavê xwe dixwîne. Di 15 saliya xwe de ji ber ku bavê wî rehmet dike tahsîla xwe li ba

---

[33] Korkusuz, *h.b.,* r. 264-265.
[34] Zeki Dilek*, Lice,* Diyarbakır 2002, r.195., vgz: Ergin, *Gotara 1emîn*, r.116.
[35] *H.b*, r. 118.
[36] Ergin, *Gotara 2emîn*, r. 431.
[37] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 119.

Mela Ebdulfettahê Hazroyî didomîne. Li Hazro, Çinar, Keban û çend cihên miftîtiyê kiriye û herî dawî ji wezîfeya xwe ya waîztiya Rihayê teqawîd bûye.[38]

#### 1.8.4.9. Haydar Hatipoğlu

Bi rêzê waîztiya navendê ya Diyarbekirê û li miftîtiya Hazro, Sêrt, Uşak, Afyon û Îzmîrê kiriye. Ji lijneya bilind a karên diyanetê re hatiye bijartin. Dema ku di vî karî de wezîfedar bû li Medîneya ku ji bo hecê çûbûye di sala 1995an de wefat kir û li wê derê hatiye definkirin.[39]

#### 1.8.4.10. Mehmet Bîlîcî

Lawê Evdirrehmanê Hazroyî ye û di sala 1931an de li Hezroyê hatiye dinyayê. Di navbera salên 1986-1993an de Miftîtiya Farqînê kir. Li navçeya Baskîla Xarpêtê ji miftîtiyê teqawîd bû.[40]

#### 1.8.4.11. Abdulmecît Güldü

Li navçeya Stewrêya Mêrdînê wezîfeya miftîtiyê kiriye û dû re li Licê ji waîztiyê teqawîd bûye. Dû re di bin bunyeya Wezareta Çand de li Enqerê di tespîta kitêbên ku bi nivîsa kevin hatine nivîsandin de dest bi kar kir û hêj li Enqerê ye.[41]

#### 1.8.4.12. Dervîş Yazici (Hazroyî)

Di sala 1932an de li navçeya Hazroya Diyarbekirê hat dinyayê. Navê bavê wî Muhammed Zahid e. Li ba apê xwe yê bi navê Ebdulfettahê Hazroyî dest bi tahsîlkirina ilmê kir. Mela Dervîş piştî ku tehsîla xwe xelas kir re li navçeya Paloya Xarpêtê dest bi melatiyê kir. Di sala 1963an de tayîna wî derkete Rihayê û li wê derê dest bi wezîfeya waîztiyê kir û di sala 1996an de wefat kir.[42]

#### 1.8.4.13.Fethullah Tofan(Pêçarî)

Di Adara sala 1927an de li Karaza Diyarbekirê hat dinyayê. Navê bavê wî Mela Îbrahîmê Pêçarî ye. Mela Fethullah ewil li ba Mela Îsmetullahê Karazî dest bi tahsîlê dike û piştî ku ji çend seydayan dersê wergirtiye re dîsa vegeriyaye ba Mela Îsmetullah

---

[38] Korkusuz*, h.b.,* r. 224-225.
[39] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.119
[40] Ergin, *Gotara 2emîn*, r.431.
[41] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.119.
[42] Korkusuz, *h.b.*, r. 237-238.

û îcazeta xwe jê wergirtiye. Di 4ê Mijdara sala 2004an de li Diyarbekirê wefat kir.[43]Ji xelîfeyên Şêx Maşûqê kurê Şêx Masûmê Mala Seyda ye.[44]

**1.8.4.14. M. Zahîd Yazici**

Birayê biçûk ê Mela Ebdulfettahê Hazroyî ye. Di Serokatiya Karên Diyanetê de di karên cûrbecûr de wezîfe kir û herî dawî dema ku li Mizgefta Kadi ya Diyarbekirê muezzîntî dikir teqawîd bû û di sala 1981an de Diyarbekirê wefat kir.[45]

**1.8.4.15. Ehmed Ocak (Cevzî)**

Di sala 1933an de li gundê Cewza Henê ji dayik bû. Navê bavê wî Mela Ehmed e. Seyda li ba Mela Ebdullahê Koxî dest bi tehsîla ilmê kiriye û li ba gelek seydayên heremê dest wergirtiye. Li ba Seydayê Ebdulfettahê Hezroyî nêzî 4-5 salan ders xwendiye. Di taliyê de li Bismil û Farqînê li ba Mela Yehya û Mela Ebdullah tahsîla xwe temam kiriye.[46] Muellîfê destxeta helbestên Ebdulfettahê Hezroyî ye. Di sala 2000 an de li Diyarbekirê wefat kir.[47]

**1.8.4.16. Halît Korkusuz**

Di sala 1940 an de li Licêya Diyarbekirê hat dinyayê û li gelek deran miftîtî kir û di sala 2011an de li Îzmîrê rehmet kir.

**1.8.4.17. Hulusî Kiliç**

Kiliç dema ku wek mamoste li Hazro bûye û dû re jî ji Mela Ebdulfettahê Hazroyî ders wergirtiye. Li Zanîngehên Selçuk, Erciyes û Dîcleyê mamostetî kiriye.[48]

**1.8.4.18. Ubeydulllah Okuyan**

Li Solaxana Çewlîgê ji melatiyê teqawîd bû û di sala 1997an de li wê derê wefat kir.[49]

---

[43] Korkusuz, *h.b.*, r. 243-244.
[44] Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê di Dewra Mîran û Neqşebendiyan de*, weş. Nûbihar, İstanbul 2015, r.124.
[45] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.118.
[46] Korkusuz, *h.b.*, r. 230-231.
[47] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.119.
[48] *h.b.*, r. 119.
[49] *h.b.*, r. 120.

#### 1.8.4.19. Abdusselam Yalar

Ji melatiyê teqawîd bûye û di sala 1982an de li Diyarbekirê wefat kiriye.[50]

#### 1.8.4.20. Bekîr Karlığa

Di sala 1947an de li Besniya Semsûrê hat dinyayê. Di 6 saliya xwe de ji bavê xwe dersa Qur'an û zimanê Erebî wergirt. Di sala 1959an de li medreseyên Diyarbekirê hewil da ilmên dînî yên mîna zimanê Erebî û Farisî tahsîl bike. Di sala 1993an de bû profesor û di sala 2008an de jî teqawîd bû.

#### 1.8.4.21. Sabrî Înal

Ji melatiyê teqawîd bûye. Gelek salan muderrîstî kiriye û li heremê alimekî navdar bûye. Li navçeya Hezoya Êlihê di sala 2005an de wefat kiriye.[51]

#### 1.8.4.22. Ehmed Yalar

Ehmed Yalar di sala 1951-1952an de li Mermera Diyarbekirê hat dinyayê. Navê bavê wî Mela Abdusselam Mermerî ye.[52] Birayê Mehmet Yalarî ye. Ji Enstîtuya Perwerdehiyê ya Diyarbekirê mezun bûye, encax melatî kiriye û ji wê teqawîd bûye. Li Diyarbekirê dijî.[53] Ehmed Yalar telebeyek ji telebeyên Mela Ebdulfettahê Hazroyî ye û li cemê 2 destxetên ku di nav xwe de helbestên Mela Ebdulfettahê Hazroyî dihewînin hene.

---

[50] Ergin, *Gotara 1emîn*, r. 119.
[51] *h.b.*, r. 119.
[52] *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-sarkiyat.com- ISSN: 1308-9633 Sayı: VI, Kasım 2011 r.159. http://dergipark.gov.tr/download/article-file/115982 10 Nîsan 2017. 15:14:54
[53] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.120.

## 2.BERHEMÊN FETHÎ

Beriya ku em derbasî berhemên Mela Ebdulfettahê Hazroyî bibin pêwîst e em hinekî qala kesayeta wî ya edebî û helbestvantiyê û her wiha dîsa pêwîst e em qala ezm û cehda tahsîlkirina ilmê ya wî bikin.

Weke ku berî niha di encama lêkolîna ku hat kirin de derket holê ku seyda piştî ku tahsîla xwe ya medresê xelas kir di sala 1916an de ango di 24 saliya xwe de vegeriya Hazro. Piştî vê vegerînê bavê wî li taxa Camiya Hazroyê li ser cihekî ku wek girekî bû jê re medreseyek çêkir û Seyda li vê derê dest bi muderrîstiyê kir. Ji vê dîrokê ve muderrîstiya wî heta sala 1967an ango 52 salan bênavber berdewam kir. Seyda di pêvajoya tahsîlkirina ilmê de zimanên Erebî û Farîsî bi şikleke kamil hîn bû. Dema ku dîwana wî ya ku hatiye berhevkirin û wek kitêbekê hatiye çapkirin bê nihêrtin tê dîtin ku seyda ji bilî Kurdî,  him bi Erebî û him jî bi Farîsî helbestên pir balkêş û watedar nivîsandiye ku ev helbest asta hînbûn û bikaranîna zimanên ku ew hînbûye nîşanî me dide.

Ji telebeyên seyda telebeyê bi navê Mehmet Yalar derheqê kesayeta seydayê xwe de wisa diyar dike: “Seydayê me di helbestên xwe de maxlasa Fethî bi kar dianî. Di xulqiyeta seyda de rihekî şairane û hişekî pir jîr hebû. Meşxûliyeta wî ya bi ilmên edebî û tasawwufê re dibû wesîle ku ev qabiliyeta wî zêdetir û baştir bibe. Her wiha ev yek bû wesîle ku li ser terza klasîk zêdetir şiiran amade bike.  Helbestên xwe ji hêla şikl ve li gor şertên têgihiştina heyama ku lê mezin bûye bi temametî bi wezn û qafiyeya ku jê re **‘eş-şî’ru’l-amûdî’** dihat gotin li ser pergela ku bingeha wê arûz e nivîsîne. Helbestên wî ji hêla navarokê ve cûrbecûriyê di nava xwe de dihewînin.  Bi tesîra girêdayîbûna wî ya bi hêz a bi tarîqatê re him ji hêla lîrîk û him jî helbestên dîdaktîka ku jê re pend tê gotin nivîsandiye. Di vê çarçovê de tê dîtin di serî de ji murşîdê xwe re û ji şexsiyetên navdar ên ku li heremê erbabê tesewwuf û ilmê ne re methiye û mersiye nivîsandiye.”[54]

Piştî ku me nêrîn û hestên Mehmet Yalar a derheqê seydayê wî Mela Ebdulfettahê Hazroyî de parve kir re em dikarin derbasî berhemên ku Hazroyî nivîsandine bibin.

[54] Yalar*, h.b.*, r. 461-462.

### 2.1. Berhemên Wî yên bi Kurdî:

#### 2.1.1. Dîwan

Weke ku me berî niha jî diyar kiribû Seyda Ebdulfettahê Hazroyî helbestên xwe bi zimanê Kurdî, Farisî û Erebî nivîsandiye. Me di çarçoveya xebata xwe de tenê helbestên wî yên bi Kurdî nirxand. Di dîwana wî de tev de 53 helbestên bi Kurdî hene ku exlebeyê wan qesîde û xezel in û her wiha di nav de murabbe û mesnewî jî hene. Mijara sereke ya van qesîde û xezelan helbestên bi coş in ku di van de terennuma evînî tê kirin. Me van 53 helbestan ji 5 destxetên ku me berhev kirine wergirt**.**

#### 2.1.2. Qesîdeya Qelem

Ev qesîde bi tevahî ji 124 malikan pêk tê û di terza mesnewiyê de hatiye nivîsandin. Seyda Ebdulfettahê Hazroyî di vê qesîdeya bi navê ‘Qelem’ de ji bo hesret, derd û kul û tercumaya rewşa xwe qelemê dide peyvandin. Di qesîdê de her wiha zimaneke hûnerî bi kar aniye.

Bi heman awayî Seyda di vê qesîdeya ku bi şêweya mesnewiyê nûsiye de, xîtabî qelemê dike. Hesreta xwe, şikayeta xwe, hezkirinên xwe û derdên dilê xwe tînê ser zimên. Mirov dikare weke tercumeya halê wî jî binirxîne. Tê de gelek hêmanên siruştî, edebî, dîrokî û dînî hene.[55]

Berhem ji aliyê teşeyên nezmê û sîstema qafiyeyê ve bi teşeya mesnewiyê hatiye hûnandin. Hemû beytên wê di nav xwe de bi qafiye ne. Şemaya qafiyeyên wê aa,ba, ca… ye.

Destxeteke vê qesîdê li ba Mehmet Yalar e û me jî wê wek çavkanî bi kar aniye.

#### 2.1.3. Eqaîd

Tev de ji 5 helbestan pêk tê ku ew helbest ev in:

a-Divêtin Ger Bi Qencî Bî Muweşşef: 60 malik

b- Munebbeh Be Ey ‘Arifê Bû El-Kemal: 36 malik

c- Di Tewḥîda Xweda da ‘Ebdê Kemter:63 malik

---

[55] M. Zahir Ertekîn, Mela Ebdullahê Hezroyî(Fethî) û Qesîdetu’l-Qelema Wî(Metn-Lêkolîn), *Nûbihar Akademî,* Stenbol 2017, c. II, j.6, r.80.

d- Ela Ger Ṭelebkarî Ez Qa'il im:12 malik

e- Hezar ḥemd û ṣena û xweş meqale (tecwîd): 26 malik

Di van 5 helbestan de qala baweriya bi Xwedê, qala ecdadên Resûlullah(s.x.l.) û qala tecwîdê tê kirin. Di destê me de destxetên van helbestan ên Zeynelabîdîn Amedî, Mela Cewzî û destxeta bê nav a ku nivîskara wê nediyar e hene.

**2.1.4. Leyla û Mecnûn**

'Leyla û Mecnûn' wek di şiklê mesnewiyê de hatiye nivîsandin û ji 4 binbeşan pêk tê. Tevde 281 malik e û nehatiye temamkirin. Di destê me de destxetên van helbestan ên Zeynelabîdîn Amedî, Mela Cewzî û destxeta bê nav a ku muellîfa wê nediyar e hene.

**2.1.5. Tercumeya Bed'ul-Emalî**

Ev rîsaleya ku ji teref muellîfa wê ve wek bi navê el-Emalî hatiye binavkirin û exlebe jî bi vê navê tê naskirin ji ber ku dawiyên risteyên wî bi tîpa 'lam'a Erebî xelas bûye bi navê '*el-Qesîdetul-lamiye fît-tewhîd'* û bi navê *'Bed'ul-emalî'* hatiye naskirin. Ev rîsale ji teref Alî b. Osman el-Ûşî(m.575/1179) ve li ser eqaîda Maturrîdiyyeyê hatiye nivîsandin.[56] Seyda Ebdulfettah Hazroyî sadiqî şemeya wê ya klasîk maye û berhem wergerandiye Kurdî.[57] Destxeta muellîf li ber destê me heye.

**2.1.2. Berhemên Erebî**

**2.1.2.1.Qesîdeya Tayî (Mulimmatul-ahzan)**

Ev Qesîdeya bi navê *Mulîmmatul-ahzan* ango Qesîdeya Tayî tev de ji 128 malikan pêk tê û bi Erebî hatiye nivîsandin. Di destê me de destxetên Mehmet Yalar, Mela Cewzî û destxeta bê nav a ku nivîskarê wê nediyar e hene.

Destpêka qesîdê li ser êş û elemên ku ji ber wefatên Ziyauddîn Efendiyê Norşînî, lawê wî Mela Fethullah û neviyê wî Cemaluddîn hatine kişandin tên diyarkirin. Dû re jî di serî de ji Ziyauddîn Efendî û ji Muhammed Selimê Hezanî yê ku seydayê

[56] M.Sait Özvarlı, "el-Emali", *DİA,* c.11, r.74. http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c11/c110040.pdf 15Hezîran 2017. 22:55:52
[57] Yalar, *h.b.*, r. 467.

Ebdulfettahê Hezroyî ye di nav de tev de ji heşt xelîfeyên wî re û her wiha ji muntesîbên wî yên din re metih û pesin hatiye kirin.[58]

### 2.1.2.2. Qesîdeya Alfabetîk

Seyda Ebdulfettah Hazroyî vê helbesta xwe di 16 saliya xwe de dema ku çûye hecê li Medînê nivîsandiye.[59] Tev de 28 malik in. Berhem alfabetîk e ango her beyt bi herfekê dest pê dike û bi heman awayî hatiye nivîsandin. Destxeta muellîf li ber destê me heye.

### 2.1.2.3. Hediyyetu 's- Sibyan

Ev berhem bi navê *Miftahus-Sibyan* tê naskirin û texmînî li dora salên 1930î de hatiye nivîsandin. Destpêka berhemê weke ku ji navê wê jî tê fêhmkirin bi zimanekî hêsan li gor ku zarok jê fêhm bikin hatiye nivîsin. Tevde ji du beşan pêk tê. Beşa yekem li ser mijarên baweriyê beşa duyemîn jî li ser mijarên îbadetê hatiye nivîsin. Tevde ji 38 rûpelan pêk tê.[60] Destexeteke vê berhemê li ba Mamoste Mehmet Yalar heye ku ew jî bi întînsaxa bavê wî Abdusselam Yalar e. Fotokopiya vê li ba heye.

### 2.1.2.4. Tehyîcul-Qulûb

Berhem tev de ji 115 malikan pêk tê û li ser êş û elemên ku Misliman di şerê cîhanê ya yekemîn de kişandine tînê zimên. Di destê me de destxeta mulellîf heye.

### 2.1.2.5. Lexez û nîşankirina dîrokê

Bi hisaba ebcedê ya bi tîpên Erebî nîşandana sala bûyerekê ye. Ji hûnera ku di vê riyê de tê kirin diyarkirina tarîxê tê gotin.[61]

Her weke du misreyên duyemîn ên her du beytên li jêrê tê dîtin helbestvan dîroka wefatê yên kes/an bi tîpên Erebî li gor hisaba ebcedê nîşan daye û helbestên ku dikevin nava cûreya helbestên bi navê ‘Lexez û nîşankirina dîrokê’ helbest nivîsandiye.

Bibêj ey Fetḥiyê dilkul ku tarîxa wefata wan
Di sala mîm û bê dabû di piştî ġeyn û hem şînam (26/23)

[58] Yalar, *h.b.*, r.466.
[59] *h.b.*, r. 467.
[60] Ergin, *Gotara 1emîn*, r.120.
[61] Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara 2016, r. 502

Riḩleta wî da me tarîxa wefat

Ġeyn û mîm û bê û şînê hey hewar (19/25)

### 2.1.2.6. Manzûmeyên derheqê Nahîv, Sarf û Qira'atê de[62]

Seyda Ebdulfettahê Hazroyî derheqê çend mijaran de manzumeyên ku nakevin sinifa helbestan nivîsandiye. Mijarên ku wek manzum ji teref Seyda Ebdulfettah Hazroyî ve hatine nivîsandin ev in:

a-Rewşên mebnîtî û murebtiya peyvên "Qabl" û "Be'd"ê

b- Ferqa di navbera navên cins û navên piranê cins ên cemî, îsmu'l-cemî û mufred de

c- Cemiyên peyva "Şêx"

d- Rewşa navê ku tê dubarekirin

e- Beş û hejmera peyva "Kella" ya di Qur'anê de

f- Xwendina qalin û zirav a peyva "Xweda" û herfa "Ra"

[62] Sernavên menzumeyên di vê binbeşê de ji xebata Mehmet Yalar hatine wergirtin. Yalar, *h.b.*, r. 467,468.

## BEŞA DUYEMÎN

## VÊKOLÎNA DÎWANÊ JI ALIYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE

Me di vê beşa duyemîn a xebata xwe de Dîwana Fethî ji hêla teşe û ruxsarî ve di bin sê beşan de vekola. Di binbeşa yekem de helbestên Kurdî yên dîwanê ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin. Di encama vê nirxandinê de hejmara helbestan, nimreya wan, ji çend beytan pêk tên, teşeyên nezmê yên helbestên dîwanê wek; qesîde, mesnewî, xezel û hwd. û nimûneyên wan di dîwanê de hatin tespîtkirin. Her wiha dibin beşa duyemîn de jî, ji aliyê ruxsarî ve em li ser dîwanê hûr bûn. Di vê binbeşê de weznên helbestan yek bi yek hatin tespîtkirin û ka kîjan ji wan çiqas hatine bikaranîn hatin nîşandan. Ji bilî van di binbeşa sêyemîn de me bi şikleke hûrgulî tehlîla hêmanên di dîwanê de kir.

Ji aliyê îmale, med, zihaf û cureyên mîna wan bi mînakan ve hatin ravekirin û helbest ji aliyê serwa û paşserwayê ve bi mînakan hatin tehqîqkirin.

### 1. TAYBETIYÊN TEŞEYÎ

#### 1. 1. Şiklê Tertîbê

Pêwîst e ku bê qal kirin ji ber ku destxeta dîwana muellîf bi xwe li ber destê me tunebû û ji ber ku peyde nedibû me ji nava 5 destxetên dîwanê yên li ber destê xwe ya herî birêkûpêk hilbijart û me ji xebata xwe re wê wek çavkaniya sereke ango destexeta bingeh qebûl kir û pejirand. Piştî ku me helbestên Kurdî yên Ebdulfettahê Hazroyî latînîze kir re me dîwanê kire sê beş. Beşa yekem ‘Eqîde, beşa duyem Destana Leyla û Mecnûn û beşa sêyemîn jî helbestin din ên bi Kurdî. Her weke ku me berî niha diyar kiribû em li ser temamê helbestên dîwanê nexebitîn. Di dîwanê de bi Kurdî, bi Farisî û bi Erebî helbest hatine nivîsin ku me tenê li ser ên Kurdî xebata xwe kir. Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de tev de 53 helbestên Kurdî hene ku exlebeya wan qesîde, xezel û mesnewî ne. Ev helbestên dîwanê li gor tertîbekê nehatine nivîsîn. Ji ber vê yekê me hemû helbestên wî yên bi Kurdî li gorî rêza tîpên elîfbaya Erebî bi rêz kir.

Li jêrê helbestên ku di dîwanê de hatine nivîsîn, hejmara helbestên ku bi heman serwayê hatine nivîsîn û rêza helbestan, bi tîpên Erebî û latînî ne, hatine senifandin. Fethî, tenê bi van tîpên Erebî helbest nivîsandiye: (a)ا , (b)ب, (t)ت, (d)د, (r)ر ,(ş)ش, (ḍ, ż) ض (ġ)غ, (f)ف, (v)ڤ, (q)ق, (k)ك, (m)م, (n)ن, (h) ه, (w)و, (y)ى. Seyda Ebdulfettahê Hazroyî bi tîpên Kurdî yên پ (p), چ (ç), ژ (j) û گ (g)’yê qet helbestên Kurdî nenivîsîye.

### 1.1. 1. Rêz û Hejmara Helbestan

| Tîpa Erebî / Latînî | | Hejmara Helbestan | Rêza Helbestan a Di Dîwanê De |
|---|---|---|---|
| ا | a | 3 | 10, 11, 12 |
| ب | b | 4 | 13, 14, 15, 16 |
| ت | t | 1 | 17 |
| ث | s̱ | 0 | --- |
| ج | c | 0 | --- |
| ح | ḥ | 0 | --- |
| خ | x | 0 | --- |
| د | d | 2 | 18, 3 |
| ذ | ẕ | 0 | --- |
| ر | r | 1 | 19 |
| ز | z | 0 | --- |
| ژ | j | 0 | --- |
| س | s | 0 | --- |
| ش | ş | 1 | 20 |
| ص | ṣ | 0 | --- |
| ض | ḍ, ż | 1 | 21 |
| ط | ṭ | 0 | --- |
| ظ | ẓ | 0 | --- |
| ع | ʿ | 0 | --- |

| | | | |
|---|---|---|---|
| غ | ġ | 0 | --- |
| ف | f | 1 | 22 |
| ڤ | v | 1 | 23 |
| ق | q | 1 | 24 |
| ك | k | 1 | 25 |
| ل | l | 0 | --- |
| م | m | 3 | 26, 27, 28 |
| ن | n | 8 | 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35,36 |
| ه | h | 5 | 37, 38, 39, 40, 5 |
| و | w | 3 | 41, 42, 43 |
| ال | la | 0 | --- |
| ى | y | 8 | 44, 45, 46, 47, 48, 49,50, 51 |
| Mesnewî[63] | | 9 | 1, 2, 3, 6, 7, 8, 9,52, 53 |

Her weke ku li jorê tê dîtin Mela Ebdulfettahê Hazroyî bi tîpên (n)ن û y)ى yê bi her yek ji wan 8 helbest, bi tîpa (h) هyê 5, bi tîpa (b)ب yê 4, bi tîpê (w)و û (a)ا yê her yek ji wan 3 helbest, bi tîpên (d)د û(m)م yê her yek ji wan 2 helbest û bi tîpên (t)ت, (r)ر ,(ş)ش, (ḍ, ż) ض (ġ)غ, (f)ف, (v)ڤ, (q)ق, (k)ك, (h) ه û (w)و jî bi her yek ji wan helbestek nivîsandiye.

[63] Ji ber ku her risteyên beytên mesnewiyê di nav xwe de bi serwa ne û her yek ji wan ji beyta din cuda ye mirov nikare serwaya wan bi tîpên erebî diyar bike ku me jî wek navê 'Mesnewî'yê li tabloyê zêde kir.

### 1.2. Teşeyên Nezmê

Heta ji destên me tê em ê bi şikleke hûrgilî li ser teşeyên nezmê yên di helbestên Fethî de bisekinin. Helbestên di dîwanê de ji aliyê teşeyê ve ne birêkûpêk in. Di dîwana Fethî de tev de 15 qesîde, 24 xezel, 9 mesnewî, 3 murebba, musellesek û muxemmesek heye. Weke ku me li jorê jî diyar kiriye helbestvan, helbestên xwe bi 6 cûreyên nezmê nivîsandine. Em ê di vê beşê de li ser van cûreyên nezmê yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn bisekinin.

#### 1.2.1. Qesîde

Qesîde teşeyek nezmê ye ku her du misrayên beyta yekem di nav xwe de bi serwa ne, lê di beytên din de ji aliyê serwayê ve misraya yekem serbest, misraya duyem jî bi beyta yekem re hevbeş e.[64]

Di dîwana Fethî de 15 qesîdeyên bi Kurdî hene. Li jêrê yek bi yek hejmara rêza qesîdeyan û hejmara malikên wan hatine nîşandin.

Qesîde û xezel ji hêla ruxsarê ve xalên wan ên hevbeş gelek in. Nîzama serwa wan yek e. Di her duyan de jî malika metlayê di nav xwe de hemserwa ne. Lêbelê qesîde û xezel ji aliyê naverokê ve ji hev cihê dibin. Di qesîdeyê de bipiranî li pesnê desthilatdarekî siyasî yan jî kesayetekî giregir tê rawestan. Helbestvan mebesta wî ji nivîsandina qesîdeyê bi destxistina hîmayeya desthilatdar û ji wî kesî girtina alîkariya malî ye. Lê gelek caran jî derheqê pesindayîna kesayetên dînî de jî tên nivîsandin.Beyta yekem a qesîdê wekî beyta matlayê û beyta dawî weke beyta meqtayê tê binavkirin. Beyta herî xweş a qesîdeyan wekî beytul qesîd tê binavkirin.[65]Nîzama serwaya qesîdê wiha ye: aa, xa, xa, xa, xa…

Qesîde bi piranî ji pênc beşan pêk tê: nesîb, medhiye, texezzul, fexriye û di’a ne.

Ji bo hejmara malikên qesîde û xezelan rêzikeke ku hemû helbestvan pê ve hatibin girêdan tune ye. Di edebiyata Kurdî de hinek qesîdeyên ji 30 malikan dirêjtir jî tên dîtin. Di edebiyeta Kurdî de giştî ji pênc-heft beytan heta bi derdora 20-30 beytî pêk tê. Di edebiyata Kurdî de hinek beytên ku ji 30 beytî dirêjtir jî tên dîtin.[66] Mirov dikare

---

[64] Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol 2014, r. 405

[65] *h.b., r.* 406.

[66] *h.b.*, r. 405.

ji bo vê yekê qesîdeya Ellah Sehergeha Ezel a Melayê Cizîrî wek mînak bide ku ev qesîdeya Melayê Cizîrî tev de ji 284 malikan pêk tê.[67]

Êdî dema ku em li qesîdeyên ku ji teref Mela Ebdulfettahê Hezroyî hatine nivîsandin binêrin em ê bibînin ku qesîdeya herî dirêj a Fethî Qesîdeya Qelemê ye ku ev qesîde bi tevahî ji 124 malikan pêk tê. Her wiha di dîwanê de 6 qesîdeyên musemmet hene. Rêza qesîdeyên di dîwanê de û hejmera malikên wan wisa ne:

| **Rêza Qesîdê** | **Hejmara Malikan** |
|---|---|
| 3 | 63 |
| 5 | 26 |
| 10 | 19 |
| 11 | 22 |
| 12 | 24 |
| 17 | 26 |
| 18 | 20 |
| 19 | 26 |
| 20 | 41 |
| 26 | 23 |
| 27 | 28 |
| 28 | 124 |
| 47 | 18 |
| 48 | 41 |
| 49 | 24 |

[67] *Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 56.

### 1.2.2. Xezel

Ji teşeyên nezmê ya wêjeya dîwanê teşeyek e, tê wateya peyva aşiqane û xweşik a ku ji bo jinan tê gotin. Hejmera malikên wê di navbera 5-12 malikan de ye. Ji xezelên ku ji 12 malikan zêdetir hatine nivîsandin re xezela muzeyyel an jî dirêjkirî tê gotin. Her du risteyên malikên ewil di nav xwe de bi serwa ne û risteya malikên din serbest a duyem jî bi risteya malika yekem re bi serwa ne.[68]

Xezel ji aliyê rûxsarê ve di gelek xalan de bi qesîdê re hevpar e ku me berî niha di binbeşa qesîdê de qala vê yekê kiribû û me hinek hevbeşiyên wan destîşan kiribû.

Ji beyta ewil a xezelê musara ye ango di risteyên wê di nav xwe de bi serwa ne. Ji beyta ewil a ku di nav xwe de bi serwa ye re matla(cihê welidînê) û ji beyta ku piştî matlayê bê re jî husn-î matla tê gotin ku divê ev beyt ji beyta matlayê xweşiktir be. Ger ku di nava xezelê de ji yekê zêdetir beytên musarra hebin ji vê yekê re xezela zatul meralî jî tê gotin. Ji beyta herî dawî ya xezelê re makta ango qutkirin tê gotin û beyta berî maktayê jî bi navê husn-î makta tê binavkirin. Li gor vê ji beyta ku mexlasa şair lê heye re jî beyta mexlasê an jî mexlesxane tê gotin. Ji beyta herî delal û xweşik -cihê wê kû der dibe bila bibe- re beytul xezel an jî şah-beyt tê gotin.[69]

Mijara sereke ya xezelê eşq e. Lê digel vê jî xezelên ku bi mijarên cuda jî hatine nivîsîn hene. Di vê çarçoveyê de eger mijara xezelê tesewif be ew "xezela sufiyane" ye; eger hikmet û felsefe be "xezela şûxane" ye; eger çêj û zewqên dinyayê bin ew "xezela rindane" ye; eger kêf û izdaraba ji ber işqê be ew "xezela aşiqane" ye.[70]

#### 1.2.2.1.Xezela Musemmet

Xezela musemmat cureyek ji xezelê ye û hemû taybetiyên xezelê di nav xwe dihewîne. Lê di xezela musemmet de beytên xezelê di nav xwe de jî bi serwa ne ku dema mirov wan serwayan li bin hev rêz bike murabbayek derdikeve holê.[71]

Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de tev de 24 xezelên bi Kurdî hene. Di dîwanê de ji teşeyên nezmê yên ku herî zêdetir hatine bikaranîn xezel e.

---

[68]İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı Yayınları, İstanbul 2004, r. 165.
[69] Dilçin, *h.b.*, r. 105-108.
[70] Adak, *h.b.,* r. 410.
[71] *h.b.,* r. 416.

Li jêrê yek bi yek hejmara rêza xezelan û hejmara malikên wan hatine navnîşandan.

Di tabloya li jêrê de jî eşkere ye ku xezela herî kurt helbesta 29 û 30an e ku bi 7 malikan hatiye nivîsîn. Her wiha xezela herî dirêj jî helbesta 17an e ku ji 19 malikan pêk tê. Em dikarin bibêjin ku hema hemû xezelên dîwanê li gorî vê rêzikê ne:

| **Rêza Xezelê** | **Hejmara Malikan** |
|---|---|
| 13 | 11 |
| 14 | 11 |
| 15 | 13 |
| 16 | 10 |
| 21 | 12 |
| 22 | 8 |
| 23 | 19 |
| 25 | 16 |
| 29 | 7 |
| 30 | 7 |
| 32 | 14 |
| 34 | 10 |
| 36 | 11 |
| 37 | 11 |
| 38 | 14 |
| 39 | 12 |
| 41 | 17 |

| | |
|---|---|
| 43 | 11 |
| 44 | 12 |
| 45 | 13 |
| 46 | 11 |
| 50 | 10 |
| 51 | 9 |

### 1.2.3. Mesnewî

Mesnewî, di edebiyata klasîk de ji teşeyên nezmê yên ku ji malikan pêk tên formeke herî zêde berbelav û naskirî ye. Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû malikên wê bi heman qalibê erûzê tên nivîsandin û her malikeke wê di nav xwe de hemserwa ye. Ji ber ku di mesnewiyan de du risteyên her malikê di nav xwe de hemserwa ne ji vê cûreyê re mesnewî tê gotin Lewra peyva mesnewiyê di zimanê Erebî de tê wateya dido dido.[72] Her beytên wê bi serwaya cûda tên nivîsandin û bi qalibên kurt ên arûzê tên nivîsîn.

Weke ku tê zanîn di edebiyata klasîk de mesnewiyên ku hevpar in Leyla û Mecnûn û Yusif û Zuleyxa ne. Di edebiyata Kurdî de jî ev mesnewî hatine nivîsandin. Harisê Bedlîsî Yusif û Zuleyxa û Leyla û Mecnûn nivîsandine. Her wiha Mela Selîmiyê Hîzanî Yusif û Zuleyxa nivîsandiye. Ji bilî van mesnewiyên hevpar Ehmedê Xanî mesnewiya xwe navdar ya bi navê Mem û Zîn nivîsiye.[73] Em dikarin û Mela Ebdulfettahê Hezroyî jî bi navê berhema wî ya Leyla û Mecnûn di vê qategoriyê de bijmêrin.

Li gorî mijarên xwe cûreyên mesnewiyan wiha tên tesnîf kirin:

1- Mesnewiyên Aşiqane
2- Mesnewiyên Dînî û Tesawûfî
3- Mesnewiyên Hînker û Exlaqî

[72] Adak, *h.b.*, r. 417.
[73]Semih Gezer*, Dîwana Mela Yasîn Yusrî, Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Çewlîgê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Çewlîg 2015, r. 39.

4- Mesnewqiyên Qehramanî û Şer
5- Mesnewiyên ku Qala Xweşikbûna Bajarekî Dikin
6- Mesnewiyên Mîzahî[74]

Seyda Ebdulfettahê Hazroyî di dîwana xwe de tev de 9 mesnewî nivîsandine ku 3 ji van dînî û 4 ji wan aşiqane û 2 ji wan jî dîdaktîkî ne.

Rêza mesnewî û hejmera malikên wan wisa ne:

| **Rêza Mesnewiyê** | **Hejmara Malikan** |
|---|---|
| 1 | 36 |
| 2 | 60 |
| 4 | 12 |
| 6 | 92 |
| 7 | 80 |
| 8 | 87 |
| 9 | 21 |
| 52 | 97 |
| 53 | 21 |

### 1.2.4. Murebba:

Ji wan menzûmeyên ku ji her bendeke wê ji çar misayan pêk tê û ji hêla helbestvanekî ve hatine nivîsandin re tê gotin.[75] Şiklê serwayê aaaa- bbba- ccca- ddda… ye. Sê misrayên benda ewil dibe ku di nav xwe de bi serwa bin. Wê demê şiklê serwayê wisa ye: bbba- ccca- ddda- eeea…[76]

[74] Dilçin, *h.b.*, r. 178-197.
[75] Adak, *h.b.,* r. 429.
[76] Dilçin, *h.b.*, r. 212.

Di dîwana Fethî de tev de 3 murebba hene ku duduwên wan murebbayên mutetekrîr in.

Rêza 3 murebbeyan û hejmera malikên wan bi vî awayî ne:

| Rêza Murebbayê | Hejmera Çarîneyan |
|---|---|
| 24 | 8 |
| 35 | 24 |
| 42 | 3 |

### 1.2.5. Muselles

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji sê misreyan pêk tê û ji teref helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "muselles" tê gotin.[77] Temamê misrayên wê bi hev re bi serwa ne û wek şiklê nezmê xezelê tê nivîsîn.[78]

Di dîwana Fethî de tenê musellesek heye ku rêza helbestê û hejmarên malikên wê bi vî awayî ne:

| Rêza Musellesê | Hejmera Bendan |
|---|---|
| 40 | 6 |

### 1.2.6. Muxemmes

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji pênc misreyan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî vê hatine nivîsîn re "muxemmes" tê gotin.[79] Ger ku misreya çaran jî pêncemîn an jî tenê ya pêncemîn a benda ewil di dawiya bendên din de bê dubarekirin

[77] Adak, *h.b.,* r. 429.
[78] Pala, *h.b.*, r. 342.
[79] Adak, *b.n.*, r. 429.

jê re muxemmesa mutekerrîr tê gotin û ger ku neyê dûbarekirin jê re muxemmesa muzdewîc" tê gotin.[80]

Nîzama serwaya muxemmesê wiha ye:

Muxemmesa muzdewîc: aaaaa, bbbba, cccca…

Muxemmesa mutekerrîr: aaaaA, bbbbA, ccccA; aaaAA, bbbAA, cccAA

Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Melayê Cizîrî, Macin, Weda'î bi teşeya muxemmesê helbest nivîdandine.[81]

Di dîwana Fethî de tev de 2 muxemes hene ku ew jî muxemesên muzdewîc in ku rêza helbestê û hejmarên malikên wan bi vî awayî ne:

| **Rêza Muxemmesê** | **Hejmera Pêncîneyan** |
|---|---|
| 31 | 33 |
| 33 | 14 |

Wek encam em dikarin bibêjin Mela Ebdulfettahê Hazroyî di dîwana xwe de teşeyên nezmê yên bi navê qesîde, xezel, mesnewî, murebbe, muxemmes û muselles bi kar aniye û ji van teşeyên nezmê jî herî zêde teşeya nezmê ya xezelê bi kar aniye.

## 2. TAYBETIYÊN RUXSARÎ

### 2.1.Wezn

Di Dîwana Seyda Ebdulfettahê Hezroyî de bi tevahî tevde 53 helbestên bi Kurdî hene û her wiha gelek helbestên bi Erebî û Farisî jî hene. Lê ji ber ku xebata me li ser helbestên wî yên bi Kurdî ye em ê tenê van 53 helbestên ku temamê wan bi behrên erûzê

[80] Dilçin, *h.b.*, r. 217.
[81] Adak, *h.b.*, r. 429.

hatine nivîsandin binivîsînin. Em dikarin li jê re wisa van weznan bi behr û hejmara wan ve bi rêz bikin.

| Behrên Helbestan | Hejmara Helbestan |
|---|---|
| **1.Behra Hezec** | |
| a-mef‘ûlu/ mefaîlun/ mef‘ûlu/ mefaîlun | 1 |
| b-mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun | 8 |
| c-mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun | 15 |
| d-mef‘ûlu / mefa‘ilun / fe‘ûlun | 1 |
| **2.Behra Remel** | |
| a-fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun | 9 |
| b-fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun | 5 |
| c-fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun | 1 |
| d-fa‘ilatun /fa ‘ilun/ fa‘ilatun / fa ‘ilun | 1 |
| e-fe‘ilatun(fa‘ilatun) / fe‘ilatun / fe‘ilun(fa‘ilun) | 1 |
| f-fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilun | 1 |
| g-fe‘ilatun / (fa‘ilatun) / fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilun(fa‘ilun) | 2 |
| **3.Behra Muteqarib** | |
| a-fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl | 2 |
| b-fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun | 1 |

**4.Behra Muzarî**

a-mef'ûlu / fa'ilatun / mef'ûlu / fa'ilatun 2

**5.Behra Recez**

a-mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun 2

b-mustef'ilun / mustef'ilun 1

Her weke ku li jorê tê dîtin Mela Ebdulfettahê Hezroyî di dîwana xwe de tev de 5 cûr behr bi kar aniye. Dîsa li gor daneyên ku me di encama vekolînê de bi dest xistiye diyar dibe ku di temamê helbestan de tev de 16 qalibên erûzê hatine bikaranîn.

### 2.1.1. Îmale

Eger heceyeke kurt a beytekê bi mebesta ku li weznê bê, dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke dî îmale, dirêjxwendina kîteyeke kurt e. Hebûna îmaleyê ji bo helbestan wek qusûr tê qebûlkirin.[82] Wek mînak:

Dilbera mexmûr qebaya nazika hişyar û mest
Zulf û xalan **tu** xwuya **ke** da xwuya **ke** ṣorgul e (38/2)

Bi can û dil dema min te hebandî
Ji **xwe** ca**me** wekî gul min qetandî (51/1)

Di pey perdê hey**e** nûrek ne meḥdûd
Ji her lem**'e** hezaran nûrê mewcûd (52/95)

### 2.1.2. Med

Tê wateya kişandinê. Ango dema ku di navbera du kîteyên girtî de ger ku hebûna kîteyeke vekirî pêwîst be, kîteya ewil a ku dawiya wê bi dengdar û dengdêrekê xelas

[82] Adak, *h.b.,* r.399.

dibe ji îmaleyê hinekî zêdetir dirêj xwendine. Îmale li gelek deran wek qisûrekê ye; lê med wek hûnera deng e.[83] Med ji wan unsûrên ku tesîreke erênî li ser ahengê dihêlê ye.[84]Wek mînak:

**Xedd** û xalê te ‘eceb xweş cem‘ bûn
Ger çi eżżidani la yectemi‘an (34/4)

Neẓma nucûma şewûşî reş bû li me ‘eyş û xweşî
Teḥl bû li me aba xoşab kerî bi kerî **celeb celeb** (16/4)

### 2.1.3. Zihaf

Eger kiteyeke dirêj a malikekê, bi mebesta ku li kêşeyê bê, kurt bê xwendin hingê zihaf pêk tê. Bi gotineke dî zihaf, kurtxwendina dengdêreke dirêj e.[85] Wek xeteyeke erûzê tê qebûlkirin[86]

Te bi dilda**rî û** elṭa**fê** şeha**ne** bi yeqîn
Te bi serpence**yê** ḥusna ku li wî qed**dê** ḥesîn
Te bi wan weşf **û** xiṣalê we**kû** emsa**lê** nehîn
Te bi nazan ki**rî** mecrûḥ **û** birîndar **û** ḥezîn
Bi niyazan ji neçarî dike pir ah **û** enîn (31/1)

Ji ‘işqa wê şekerxayê nikarim ez teḥemmul kim
**Kû** da çû ye xuya nabe delal û xûb û zîbayê (45/2)

[83] Dilçin, *h.b.*, r. 14.
[84] Pala, *h.b.*, r. 301.
[85] Adak, *h.b.*, r.382.
[86] Ehmed Doğan, *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi,* weş. Akçağ, Ankara 2013, r.19.

Werne vê şîn û girînê hey hewar

Ḥuzn **û** şîna nazenînê hey hewar (19/1)

### 2.1.4. Wesl

Wesl, tîpa dengdar a di dawiya bêjeyekê de bi tîpa dengdêr a serê bêjeya dû xwe, bihev re xwendin e. Nexasim di erûzê de ji bo qalib lihev bê anîn wesl tê kirin û ev yek wek hûnerekê tê qebûlkirin.[87]

Wesl ne di kategoriya zîhaf û îmalê de ye û ji bo helbestvan ne qusûrê e.[88] Me li jê re çend mînak derheqê weslê de da û me di mînakên jêrê de, wesl bi îşareta "_" nîşan da. Wek mînak:

Wami**q** **_û** Xusrew çewan dê ṣebrê kin

Ew ji ‘ezra û şirînê hey hewar (19/13)

Ya Reb çi ev ṣeda bû da ‘ale**m_e**v miṣalî

‘Alem ji ber fena bû şah û wezîr û walî (49/1)

Qe**d_û** bala û ruxsar û xe**ṭ_û** xal û le**b_û** qamet

Niqab û perde û pêçe biser hatin ji ġebrayê (45/11)

### 2.2.Serwa

Serwa herî kêm wekheviya dengên dawiya du risteyan e û nivîsandina wan wek hev, wateya wan jî ji hev cuda ne û her wiha tên dubarakirin.[89] Di helbesta klasîk de ji wan herfên ku tên dubarekirin re herfên ‘rewî’ tên gotin.[90]

[87] Pala, *h.b.*, r.472
[88] Adak, *h.b.,* 384
[89] Pala, *h.b.*, r.249.
[90] Adak, *h.b.*, r.395.

Nehin qeṭ kes ku lê zex**m**ek nekir wê
Ji ṣed kes qeṭ li yek reḥ**m**ek nekir wê (50/4)

Ṭel‘eta xûban û mahp**ar**an xweş e
Muḥbeta rindan û dild**ar**an xweş e (40/3)

Em ê hewil bidin cûreyên serwayên helbestên di dîwanê de li gor dengê wan û li gor cihê wan binirxînin û nîşan bidin.

### 2.2.1. Li gorî cihê wê di ya risteyê de

Me serwaya li gor dengan di bin çar binbeşan de vekola.

#### 2.2.1.1. Serwaya Kutayî

Serwaya kutayî ew serwaya ku di dawiya risteyan de cih digire ye. Seyda Edulfettahê Hezroyî di helbestên xwe de vê serwayê bi kar aniye.

Qe bavê te li te nakit tereḥḥ**um**
Nedistîne ji bo te ṣol û yak**um** (9/3)

Hezar deryayê şehd û şekkerê n**ab**
Li ser lêvê wî bûn pur mewc û pur t**ab** (8/22)

Tîpên ku li jorê bi rengê tarî hatine nîşandan serwa û ji ber ku di dawiya risteyê de ne serwaya kutayî ne.

#### 2.2.1.2. Serwaya Navekî

Ji serwaya ku di nava risteyan de cih digirê re serwaya navekî tê gotin. Ev serwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

Bibe şeyd**a** di nav ehlê cîhanê
Bibe risw**a** di nav xelqê zemanê (7/80)

Mam di nêv ‘ecz û m**elal**ê ḥeyf û ḥeyf
‘Umrî jî berda z**ewal**ê ḥeyf û ḥeyf (22/1)

#### 2.1.2.3. Serwaya Pêşî

Ji wê serwaya ku di destpêka risteyan de cih digrê serwaya pêşî tê gotin. Ev serwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

**D**i enwara ṭebîban da me dîtî
**D**igo ṣed cur‘e bo xeste ḥelal e (38/9)

**Mu**qeyyed kir bi qeyda firqeta wê
**Mu**‘ez̠z̠eb kir bi daġa ḥesrata wê (53/43)

### 2.2.2. Li Gorî Dengan Serwa

Me serwaya li gorî dengan din 4 binbeşan de vekola.

#### 2.2.2.1. Serwaya Lawaz

Di dawiya risteyan de ji bilî redîfan wekheviya dengekî tenê ye. Di helbesta dîwanê de zêde nehatiye bikaranîn. [91] Ev serwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

Nefḥeya miskê te teşrîf kir ji seḥraya xote**n**
Ya demê ‘Îsayî ya badê ṣebayî bil-yeqî**n** (35/5)

[91] Pala, *h.b.*, r.250.

Xulaṣe ‘eyd û hem sersal û newro**z**
Diçu bê şibhe ey dildar û dilsû**z** (53/104)

#### 2.2.2.2. Serwaya Asayî

Di serwayê de wekheviya du dengan e. Ev serwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

Firṣeta keyf û surûr û naziya şekkerleb**an**
Hemçû ‘enqaye welê hicran û firqet her zem**an** (28/2)

Ṭel‘eta xûban û mehpa**r**an xweş e
Muḥbeta rindan û dild**ar**an xweş e (40/3)

#### 2.2.2.3. Serwaya Zêdebar

Di serwayê de wekheviya ji du dengan zêdetir re serweya zêdebar tê gotin. Ev serwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

Çi weqta ku bibin ew herdu r**aẓî**
Nehin hacet bi muftî û bi q**aẓî** (6/60)

Xerab be ger ji wan ef‘al û e‘**mal**
Dikin ew nav û namûsa te pa**mal** (7/21)

### 2.3. Paşserwa

Piştî serwayê û di dawiya misreyan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa(redîf) tê gotin.[92] Ji temamê herfên ku piştî herfa rewiyê tên re redîf tê gotin û temamê deng, peyv û hevokên ku piştî herfa rewiyê ya ku eslê serwayê ye tên redîf în.[93]

---

[92] Adak, *h.b.*, r. 399.
[93] Pala, *h.b.*, r. 249.

Ji ewwel ra bi S̱anî dû re **mani‘**

Ji S̱anî ra bi ewwel żu‘f e **mani‘** (2/56)

Dil ji bil qametê yarê **çi ġereḍ**

Me ji ezharê buharê **çi ġereḍ** (21/1)

Li gorî tiştên ku tên dubarekirin sê cur paşserwa hene.[94]

**2.3.1. Paşserwayên ku di Halê Qertafan de ne**

Di vê paşserwayê de tiştê tê dubarekirin tenê qertaf in. Ev paşserwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

Şayeste bike tu iḥtiram**ê**

Destbeste bike tu hem selam**ê** (52/1)

Bike ‘erżê taḥiyyat û selam**ê**

Bike tebrîk ‘îd û îḥtîşam**ê** (53/124)

Ji bo teskîna narê îftiraq**ê**

Ji bo teshîla kerb û îḥtîraq**ê** (53/21)

**2.3.2. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Bêje/Kombêjeyan de ne**

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertaf û bejêyan pêk tên. Ev paşserwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

**2.3.2.1. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Bêjeyan de**

Li ser wan ṣelat û selam**ê Xweda**

[94] Adak, *h.b.,* r.399.

Ji erżê ḥeta ‘erşê pak**ê Xweda** (1/8)

Nema êdî qewam û ṭaqet**a wî**
Nema êdî ḥeyat û raḥet**a wî** (6/27)

**2.3.2.2. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Kombêjeyan de**

Werne vê şîn û girîn**ê hey hewar**
Ḥuzn û şîna nazenîn**ê hey hewar** (19/1)

Dil ji bil qametê yar**ê çi ġereḍ**
Me ji ezharê buhar**ê çi ġereḍ** (21/1)

**2.3.3. Paşserwayên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne**

Di vê cûr paşserwayê de qertaf tune ye û piştî serwayê an tenê bêje yan jî tenê kombêje tên dubarekirin. Ev paşserwa di helbestên Seydayê Ebdulfettahê Hazroyî de hatiye bikaranîn.

**2.3.3.1. Paşserwayê ku Bê Qertaf di Halê Bêjeyê de ye**

Bi ev yaqûtê renga perdeya **leb**
Ku bûn meknûnê van xiştê ‘eded **leb** (51/71)

Eger rencûr bûma ew şifa **bû**
Eger mehcûr bûma ew liqa **bû** (53/29)

**2.3.3.2. Paşserwayê ku Bê Qertaf di Halê Kombêjeyê de ye**

Nizanî ‘alemek dî jî **li pêş e**
Ḥeqîqet ger neẓer dî ew **li pêş e** (51/81)

Hewar e hey hewar e min **ji derdê vê mesîna reş**

Dil û can û ciger kul bû **ji derdê vê mesîna reş** (20/1)

## 3-TEHLÎLA HÊMANÊN DI DÎWANÊ DE

### 3.1.Dîn

Ji temamê emel û îtîqadên ku ji teref Xweda ve bi wasiteya pêxemberan ji însanan re hatine teblîxkirin re tê gotin ku ev emel û îtîqad kesên ku li gor wan hereket dikin him li dinyayê û him jî li axretê digihijînin rizgariyê. Ev peyv dema ku di maneya baweriyê de têt bikaranîn di nav Mislimanan de wek Îslamiyetê tê bikaranîn.[95]

Her weke ku tê zanîn edebiyata klasîk a Osmaniyan, Ereban, Farisan û a Kurdan ji gelek çavkaniyan mijarên xwe werdigrin ku di nav van de bûyerên dîrokî, dîn, menqibe û gelek tiştên wisa hene. Malûm e kesên ku di edebiyata klasîk a Kurdî de helbestvantî kirine Misliman û ehlê medresê ne ku ev yek jî dibe wesîle ku dîn ango Îslamîyet ji wan re di warê edebiyatê de bibe çavkanî.

Me di vê binsernavê dîn de çi qas peyv û têgihên ku bi dînê Îslamê re têkîliya wan hene vekole û me wan tespît kir. Em ê li jêrê derheqê van tespîtan de daxuyaniya pêwîst bidin û derheqê her yek ji wan de jî ji dîwana Fethî mînakan bidin.

#### 3.1.1.Xweda

Xweda ew kes e ku afirînerê temamê alem û gerdûnê ye û her wiha afirînerê temamê mewcûdatên zindê û nezinde ye. Di Qur'ana Kerîm de di sûreta Îxlasê de Xweda da ku însan zanibin ew kî ye derheqê xwe de ji însanan re wiha ferman dike:

1-Bibêje: "Ew Xwedê, Xwedayek tenê ye(ehed e, bêheval û bêhemta ye)

2-Xweda bêkemasî semed e(her tişt hewceyê wî ye, lê ew ne hewceyê tu tiştekî ye)

3-Ne kes jê bûye û ne jî ew ji kesî bûye

---

[95] Pala, *h.b.*, r. 117.

4-Û ti tiştek weke wî nîne(ew bêhemkûf û bêhemtaya ye.)[96]

Ji ber ku Xweda di edebiyata klasîk a Rojhilatê de wek navendekî cih digre helbestvanê me Fethî di gelek cihên dîwana xwe peyva Xweda bi şiklên cûrbecûr bi kar aniye.

Wek mînak:

Çiqas enbiya û resûlê **Xweda**
Hemî pêşewa ne hemî muqteda (1/2)

**Îlahî** reḥmeta te bo me meqṣûd
Li Fetḥî tu birêj feyżê ji her der (3/62)

Bi nava cihanê şihandî yeqîn
Xweda **Xaliqê** asiman û zemîn (1/14)

Xelef bin ni'meta **Rebbê Kerîm** in
Weger ne ew 'eẕabê pur 'elîm in (7/20)

Qena'et ke mebe 'aciz ji bo wan
Ji te erḥemtir e ew **Rebbê Reḥman** (7/24)

### 3.1.2.Pêxember

Kesên nebî û resûl ên ku xeberê didin, fermanên Xwedê ji însanan re teblîx dikin re tê gotin.[97]Di edebiyata klasîk de pêxemberên Xwedê bi qisseyên wan ên di Quranê de derbas dibin bi hûnera telmîhê tên diyarkirin.[98]Di dîwana Fethî de nexasim di helbesta wî ya bi navê 'Munnebbeh be ey arifê bû el-kemal' a di qetegoriya eqaîdê de

[96] Wer. Fîkrî Amedî, *Qur'ana Kerîm û Meala Wê Ya Pîroz*, weş. Ensar, Enqere 2014, r. 604.
[97] Pala, *h.b.*, r. 370.
[98] Gezer, *h.b.*, r. 60.

navê 25 pêxemberan hatiye bikaranîn. Em ê van pêxemberên ku me navê wan di dîwanê de tespît kiriye yek bi yek nîşan bidin

#### 3.1.2.1. Îbrahîm

Pêxemberek ji pêxemberên Xweda ye û di Qur'ana Kerîm de Xweda Te'ala di gelek cihan de qala wî dike. Li gor riwayet û ayetên Qur'anê, Hz. Îbrahîm(a.s.)di nava qewmekî putperest dijiya. Her wiha Hz. Îbrahîm di nava qewmê xwe de li dijî putan û putperestan mucadele dikir ku di ayetan de derheqê wî de 'Paşê wî ew pût hûr kir. Ji bo ku jê bipirsin, pûtê herî mezin sexlem hişt.'[99] 'Ew ne ji mişrikan bû'[100] bû. Di Qur 'anê de bi vî awayî di gelek deran de qala baweriya wî û micadeleya wî ya li dijî putperestan tê kirin.

Di edebiyata klasîk de di her warî de qal jê tê kirin, hetta derheqê wî de hilliye jî hatine nivîsîn. Li gor baweriya xelkê, Hz. Îbrahîm li Rihayê avêtinê nava agir. Xelîlul Rehmanê ku li wê derê cihê agir ya ku lê bûye şînayî ye.[101]

Di dîwana Fethî de jî bi van malikên jêr qal jê hatiye kirin:

Wek mînak:

Xweda neẓm kirye di kilamê mubîn
Muqeddem **Birahîm** û Îsḥaq çunîn (1/21)

Sima'îl e û hem **Birahîm Xelîl**
Etariḥ û Naḥûrê ceddê Xelîl (4/8)

#### 3.1.2.2. Îshaq

Lawê duyemîn ê Hz. Îbrahîm e û navê diya wî jî Sara ye. Îshaq dema ku dê û bavê wî extiyar bûn bi mizgîneyeke hatiye dinyayê. Piştî wefata bavê xwe derbasî şûna wî bûye. Di edebiyata dîwanê de him ji ber ku pêxemberek e tê bikaranîn û him jî ji ber ku dema kesên navê Îshaq tê xwestin pesna wan bê dayîn ev nav tê bikaranîn.[102]

Di dîwana Fethî de jî bi van malikên jêr qal jê hatiye kirin:

Wek mînak:

---
[99] Sûreta Enbiya, Ayeta 58an
[100] Sûreta Nehlê, Ayeta 123an
[101] Pala, *h.b.*, r. 224-225.
[102] *h.b.*, r. 236.

Xweda neẓm kirye di kilamê mubîn
Muqeddem Birahîm û **Îsḥaq** çunîn (1/21)

### 3.1.2.3. Ye‘qûb

Neviyê Hz. Îbrahîm û lawê Hz. Îsahaq e. Di edebiyata dîwanê de her tim bi Hz. Yusûf re tê bîranîn.[103]

Di dîwana Fethî de him wek pêxemberekî û him jî pêxemberê ku ji ber fîraqa lawê xwe êş û eleman kişandiye hatiye bikaranîn.

Wek mînak:

Dilê bavê xwe geh şadan û xendan
Wekî **Ye‘qûb** kir geh zar û giryan (8/37)

Di pey wî de **Ye‘qûb** û Nûḥ e bizan
Di pey Nûḥ de Dawûd e bê guman (1/22)

### 3.1.2.4. Nûh

Di edebiyata dîwanê de bi tofan û keştiyê tê bîranîn. Tofan dişibe hêstirên kesê ‘aşiq. Nûh jî ew ‘aşiqê ku hewil dide da ku di vê tofanê de noq nebe ye.[104]

Di dîwana Fethî de jî bi van malikên jêr qal jê hatiye kirin.

Wek mînak:

Ez û wê keştiyê hem Nûḥekî bûn
Li ṭofana ġeman wek beḥra qulzem (28/36)

Di pey wî de Ye‘qûb û **Nûḥ** e bizan
Di pey Nûḥ de Dawûd e bê guman (1/22)

[103] Pala, *h.b.,*r. 478.
[104] *h.b.*, r. 361.

### 3.1.2.5. Dawûd

Pêxemberê Benî Îsraîliyan û ji qewmê Cihûyan e. Di edebiyatê de qala wî bi xweşikbûna dengê wî û carinan jî digel Zeburê tê bîranîn.[105]

Di dîwana Fethî wek pêxemberekî ji koma pêxemberan hatiye bikaranîn.

Di pey wî de Ye‘qûb û Nûḥ e bizan
Di pey Nûḥ de **Dawûd** e bê guman (1/22)

### 3.1.2.6. Suleyman

Suleyman pêxember kurê Dawûd pêxember e. Di 12 saliya xwe ketiye şûna bavê xwe. Him padîşah e û him jî pêxember e. Di edebiyata klasîk de sembola seltenêt, hêz, mal û milkê ye. Li bayê, cinan, perendeyan hukûm kiriye. Di helbestan de Suleyman bipiranî bi pêyva Belqis, Seba, hudhud, Asaf re derbas dibe.[106]

Di dîwana Fethî de di van malikan de derbas dibe:

Te mulkê dil seraser girt îro
Li textê dil **Suleyman** î tu Seyda (11/10)

**Suleyman** û Eyyûb û Yusûf yeqîn
Di pey wî de Mûsa û Harûn bibîn (1/23)

### 3.1.2.7 Eyyûb

Hezretî Eyyub (a.s.) pêxemberekî dewlemend bûye, mal û mulkê wî gelek zêde bûye. Xwedê ew îmtîhan kir. Her tiştê wî jê stand û nexweşiyek giran da ser, kurm ketin laşê wî. Li hemberê vê bela giran ew sebrek mezin nîşan da û di encamê de Xwedê mal û şîfa dubare da wî. Ji ber vê sebr û qerarê ye ku sebra Hz. Eyyûb li ser ziman bûye mesel. Di edebiyata klasîk de wek sembola sebr û tehemmulê tê bikaranîn.[107]

[105] Pala, *h.b.*, r. 108.
[106] *h.b.*, r. 411-412.
[107] *h.b.*, r. 143-144.

Suleyman û **Eyyûb** û Yusûf yeqîn
Di pey wî de Mûsa û Harûn bibîn (1/23)

**3.1.2.8.Yûsif**

Hz. Yûsif (a.s.) lawê Hz. Yaqûbî ye. Tev de 12 birane. Bavê wî gelekî zêde jê hez dikir. Li gor ku di Qur'ana Kerîm de tê vegotin (Yûsif/1-104) jiyan û qisseya wî bi kurtasî wiha ye: 12 zarokên Hz. Yaqûb hebûn. Yaqûb di nav wan de herî zêde ji Yûsif hez dikir. Yûsif rojekê xewnekê dibîne û vê xewna xwe ji bavê xwe re dibêje. Yûsif di xewna xwe de dibîne ku yanzdeh stêrk, hîv û roj jê re secde dikin. Piştî vê xewnê Yaqûb ji Yûsif re dibêje ku xewna xwe ji tu kesî re nebêje. Rojeke ji ber ku birayên wî lê hesûdîn dek û dolap lê kirin û wî bi xwe re birin û wî avêtin çalê û ji bavê xwe re jî gotin ku gur Yûsif xwariye. Di Qur'ana Kerîm de qisseya Yûsif wek navê 'Ahsenul Qesas' ango qisseya herî xweşik tê binavkirin. Di edebiyata dîwanê de pêxemberê ku navê wî herî zêde têt bikaranîn Yûsif pêxember e. Bi xweşikayî û bedewbûna xwe ya herî baş exlebe yar dişbînin wî, hetta yar wek Yûsifê Sanî tê wesfandin.[108] Di dîwana Fethî de Yûsif wiha derbas dibe.

Wek mînak
Di der benda cemalê **Yusûfî** kir
Di nav Miṣra kemalê **Yusûfî** kir (8/37)

Bi himmet Ġewsê Geylan î bi ḥikmet beḥrê 'umman î
Bi ḥusnê **Yusûfê Ṣanî** yî meded Seyda meded Seyda (12/21)

**Yusûfê** Ken'an ji ser textê xwe çû
Da Zuleyxayê girînê hey hewar (19/12)

Ji qeda serwe seha lebşekera 'alî meqam
Diweşit naz û teleṭṭuf ku bike meşî yû xiram

[108] Pala, *h.b.*, r. 484.

Li te ‘adet bûwe şêrîn rewiş û xûbiyê kelam
Bi cemala xwe tu **Yusûf** we di me‘na xwe îmam
Bi Zuleyxayî bi dergahê xwe carek me bixwîn (31/24)

Di mulkê ġem şehinşah im ji kerban **Yusûfê** çah im
Şeva ṭariyy û hem mah im gelo kan Ḥeżretî Ṣanî (48/20)

Suleyman û Eyyûb û **Yusûf** yeqîn
Di pey wî de Mûsa û Harûn bibîn (1/23)

### 3.1.2.9. Mûsa

Hz. Mûsa (a.s.) jî pêxember ji pêxemberên Xweda ye. Di Qur’ana Kerîm de tev de di 461 ayetan de qala Hz. Mûsa tê kirin. Her wiha Hz. Mûsa di edebiyata dîwanê de ji hêla axavtina wî ya bi Xweda re, gopala wî ya ku dibû ejderha, mucîzeya Heft Beyzayê, xeniqandina Fîrewn a di avê de û ji hêla mijarên din ve tê bidestxistin.[109]Di dîwana Fethî de wiha qala Hz. Mûsa tê kirin.

Suleyman û Eyyûb û Yusûf yeqîn
Di pey wî de **Mûsa** û Harûn bibîn (1/23)

Nefsê de‘wayê ulûhiyet dikit fir‘ewn ṣifet
El-meded ya himmeta Harûn û **Mûsayê** Selîm (27/27)

Li dil wek **Mûsayê** ser Ṭûrî bû ew
Ji di xalî nebû yek weqt û yek dem (28/34)

### 3.1.2.10. Harûn

Hz. Harûn (a.s.) birayê Hz. Mûsa ye. Di Qur’ana Kerîm de navê wî bi navê Hz. Mûsa re tê zikirkirin.[110] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

[109] Pala, *h.b.,* r. 334-335.
[110] Sûreta Şû‘arayê, Ayeta 13an

Suleyman û Eyyûb û Yusûf yeqîn (1/23)
Di pey wî de Mûsa û **Harûn** bibîn

Nefsê de‘wayê ulûhiyet dikit fir‘ewn ṣifet
El-meded ya himmeta **Harûn** û Mûsayê Selîm (27/27)

### 3.1.2.11. Zekeriyya

Hz. Zekeriyya (a.s.) ji pêxemberên ku ji Benî Îsraîliyan re hatine şandin pêxemberek e. Ji nesla Hz. Sileyman e. Di Qur'ana Kerîm de di nêzî 20 cihan de navê wî tê zikirkirin.[111] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

Di gel **Zekeriyya** û Yeḥya çunîn
We ‘Îsa û Ilyas mineṣ ṣaliḥîn (1/24)

### 3.1.2.12. Yehya

Hz. Yahya (a.s.) lawê pêxember Zekeriyya ye. Di ciwaniya wî de jê re pêxembertî hatiye dayîn. Di 30 saliya xwe de hatiye şehîdkirin. Qatilên Hz.Yahya bi ezabeke mezin hatine cezakirin û tev hatine helakkirin. Di Qur'ana Kerîm de derheqê wî de nêzî 20 ayetan heye.[112] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

Di gel Zekeriyya û **Yeḥya** çunîn
We ‘Îsa û Îlyas *mineṣ- ṣaliḥîn* (1/24)

### 3.1.2.13. ‘Îsa

Hz. Îsa (a.s.) pêxemberê herî dawî yê ku ji Benî Îsraîl re hatiye şandin e. Jê re Încîl hatiye daxistin. Di edebiyata klasîk de bi van mijaran tê bidestxistin: Hamilmayîna Meryem a bi Îsa, rewşên ne ji rêzê ya di dema welidîna Îsa de û başkirina kor û seqetan

---
[111] Pala, *h.b.,* r. 490.
[112] *h.b.*, r. 477-478.

û saxkirina miriyan û hwd. Bi laqaba 'Mesîh' tê binavkirin û jê re Ruhul-Qûdus jî hatiye gotin[113]. Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

Nefḥeya miska xoten ya 'enberê amîz ṣeba
Ya demê **'Îsa** ye ya bihna 'eṭirdaran e ev (23/4)

**Mesîḥullahî 'Îsa** dê nuzûl ket
Qetilket da **Mesîḥ** Deccalê e'wer (3/32)

Dikir wan imtiṣaṣê şîrê şêrîn
Ṣifet **'Îsa** li ber pustanê Meryem (28/98)

Di gel Zekeriyya û Yeḥya çunîn
We **'Îsa** û Îlyas *mineṣ-ṣaliḥîn* (1/24)

### 3.1.2.14. Îlyas

Hz. Îlyas (a.s.) ji wek pêxemberek ji Benî Îsraîl re hatiye şandin û neviyê Hz. Harûn e. Di Qur'ana Kerîm de di 3 cihan de navê wî derbs dibe.[114]Di dîwana Fethî wiha cih girtiye.

Di gel Zekeriyya û Yeḥya çunîn
We 'Îsa û **Ilyas** mineṣ ṣaliḥîn (1/24)

### 3.1.2.15. Sima'îl

Hz. Simaîl (a.s.), lawê ewil ê Hz. Îbrahîm e. Di gelek cihên Qur'anê de navê wî derbas dibe. Di edebiyata klasîk de zêdetir wek telmîh bi peyvên Ka'be, zemzem û qurbanê tê bikaranîn.[115] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

[113]Pala, *h.b.*, r. 235-236.
[114] *h.b.,* r. 230-231.
[115] *h.b.*, r. 238.

Di pey ‘atifa bi ser Biraḥîm bibîn

**Sima‘île** ve Elyese‘ hem çunîn (1/25)

**Sima‘îl** e û hem Birahîm Xelîl

Etariḥ û Naḥûrê ceddê Xelîl (4/8)

### 3.1.2.16. Elyese‘

Hz. Elyese‘ (a.s.), pêxemberek ji pêxemberên Xweda ye. Di Qur’ana Kerîm de digel pêxemberên din tê bîranîn.[116] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

Di pey ‘atifa bi ser Biraḥîm bibîn

Sima‘île ve **Elyese‘** hem çunîn (1/25)

### 3.1.2.17. Yûnis

Ji pêxemberên ku ji Benî Îsraîl re hatine şandin pêxemberek e. Di Qur’ana Kerîm de sûretek bi navê wî heye[117] û her wiha di Qur’anê de li nêzî 20 cihan de navê wî tê zikirkirin.[118] Di dîwana Fethî de navê wî wiha derbas dibe.

We **Yûnis** û Lûṭen û kullen metîn

Mufeżżel gerandin *‘elel-‘alemîn* (1/26)

### 3.1.2.18. Lût

Hz. Lût(as), di wextê Hz. Îbrahîm de jiyaye û bi şerîata wî amel kiriye. Lawê birayê Hz. Îbrahîm e. Di Qur’anê de di çend cihan de navê wî tê zikirkirin.[119]Navê wî di hilye û edebiyata dînî de tê bikaranîn.[120] Di dîwana Fethî de jî wek pêxemberekî hatiye nîşandan.

Wek mînak:

---

[116] Ji bo agahiya zêdetir bnr. Sûreta Enbiya Ayeta 86an

[117] Qur’ana Kerîm, Sûreta 10emîn

[118] Pala, *h.b.*, r. 238.

[119] *bnr.* Hicr/59-61, Hacc/56, Sad/13 û hwd.

[120] Pala, *h.b.,* r. 29.

We Yûnis û **Lûṭen** û kullen metîn
Mufeżżel gerandin *'elel 'alemîn* (1/26)

### 3.1.2.19.Îdrîs

Piştî Şît(a.s.)pêxember wek pêxemberekî hatiye. Ji zatê wî re 30 rûpelên ku tê de fermanên îlahî hene hatine şandin. Tê diyarkirin li ser rûyê erdê cara ewil ew ilma stêrk û tibbê belav kiriye.[121] Di dîwana Fethî de navê wî wiha tê zikirkirin.

Ewê dî bizane tu **Îdrîs** û Ḥûd
Şu'eyb û di gel Ṣaliḥê bi ah wedûd (1/28)

### 3.1.2.20.Ḥûd

Hz. Ḥûd wek pêxemberekî ku ji qewmê Ad re hatiye şandine. Di 4 sûretên Qur'anê de qala wî û pêxembertiya wî tê kirin.[122] Di dîwana Fethî de digel Îdrîs pêxember tê zikirkirin.

Ewê dî bizane tu Îdrîs û **Ḥûd**
Şu'eyb û di gel Ṣaliḥê bi ah wedûd (1/28)

### 3.1.2.21. Şu'eyb

Pêxemberê ku ji xelkê Medyen û Eyke re hatiye şandine. Bi şerîata Hz. Îbrahîm amel kiriye.[123]Di dîwanê de wiha jê tê qalkirin.

Ewê dî bizane tu Îdrîs û Ḥûd
**Şu'eyb** û di gel Ṣaliḥê bi ah wedûd (1/28)

[121]Pala, *h.b.*, r. 227.
[122] Ji bo agahiya zêdetir li Sûretên Araf, Hûd, Şu'ara, û Ahkafê binêrin.
[123] Pala, *h.b.*,r.433.

### 3.1.2.22. Salih

Pêxember e û ji qewma Semûdê ya ku warê wan di navbera Şam û Hîcazê de ye re hatiye şandin. Bi şerîata Nûh amel kiriye. Di Qur'anê de derheqê wî de 22 ayet hene.[124] Di dîwanê de wiha jê tê qalkirin.

Ewê dî bizane tu Îdrîs û Ḥûd
Şu'eyb û di gel **Ṣaliḥê** bi ah wedûd (1/28)

### 3.1.2.23. Zulkifl

Pêxemberek ji pêxmeberên Xweda ye. Di Qur'ana Kerîm de di ayeta 85emîn a Sûreta Enbiya û di ayeta 48emîn a Sûreta Sadê de tê zikirkirin. Di dîwana Fethî de jî di vê beyta jêr de hatiye zikirkirin.

Di pey wî de **Ẕulkifl** û Adem bizan (1/29)
Di pey wî de Ṣultanê herdu cihan

### 3.1.2.24. Adem

Hz. Adem li gorî dînên semawî mirovê herî ewil ê ku Xweda wî afirandiye ye. Di Qur'ana Kerîm de derheqê Hz. Adem de gelek ayet hene. Di gelek hedîsan de jî wek "ebu'l-beşer" yanî bavê mirovatiyê derbas dibe. [125] Di Qur'ana Kerîm de qala bûyera wî û ya Hz. Hawa ya ji cennetê derxistin wisa tê kirin:

Me (ji wan re got): "De hûn tev ji bihiştê dakevin erdê! Eger ji bal min hîdayetek ji we re hat, heçî kesên ku bidin pey hîdayeta min, êdî ji wan re tirs tune ye û ew ê xemgîn jî nebin."[126]

Di edebiyata dîwanê de exlebe ji vê bûyerê telmîh tê kirin û navê Hz. Adem di berheman de derbas dibe. Di dîwana Fethî de jî wiha derbas dibe.

Di pey wî de Ẕulkifl û **Adem** bizan

[124] Pala, *h.b.*,r.390.
[125] *h.b.*,, r.6.
[126] Beqera 2/38

Di pey wî de Ṣultanê herdu cihan (1/29)

Ku Şîs̱ û ibni **Adem** ‘eleyhis selam
Xwedaya bide bo me ḥusnul xitam (4/12)

### 3.1.2.25. Muhammed (s.x.l)

Muhammed Mustafayê pêxemberê Îslamê ye. Pêxemberê herî dawî ango Xatemûl-Enbiya ye. Gelek taybetiyên wî di dîwana edebiyata klasîk de bûne mijara helbestan.

Di dîwana Fethî de jî di gelek cihan de navê Hz. Muhammed (s.a.w) bi şiklên cûrbecûr hatiye bikaranîn.

Me‘aẕallah ji ev eḥwal û eṭwar
Tereḥham ya **Resûlallah** tereḥḥam (28/46)
Bi te bû rewneqa baġ û çimenê şer‘ê **Resûl**
Bi te ḥey bû demekî ey gulê gulzarê qebûl
Sosin û sunbul û nesrînê didan lafê fużûl
Tu dema bûyî nihan bûn ḥemî ew jar û melûl
Man di leb teşnekî û her we di teyhê ‘aṭeşîn (33/9)

Bi **Yasîn** û **Ṭaha** di kelamê mubîn
Wî got înneke **leminel-murselîn** (1/31)

Meh û xurşîdê eywana celalet
**Ḥebîb û seyyîdê** ewladê adem (28/4)

Taḥiyyat û ṣelat û hem selaman
Li ser **pêġember** û ṣeḥbê hemdem (28/2)

Di pey wî de Ẕulkifl û Adem bizan
Di pey wî de **Ṣultanê herdu cihan** (1/29)

### 3.1.3. Kitêbên Pîroz

Her weke ku tê zanîn Xweda Teala ji bo rêya heq û neheqiyê nîşan bidin ji pêxemberên xwe re kitêban şandiye. Pêxemberên ku ji wan re ev kitêbên pîroz hatine şandin Hz. Mûsa, Hz. Dawûd, Hz. Îsa û pêxemberê herî dawî Hz. Muhammed Mustafa (s.x.l.) e. Di helbestên Fethî de ji van kitêbên ku ji van pêxemberan hatine şandin tenê navê Qur'ana Kerîm a ku ji Hz. Muhammed re hatiye şandin derbas dibe.

Wek mînak:

**Kelamullah** û **Quran** navê wan in
Welê elfaẓê mexlûqê Xwedan in (2/52)

Bizane rewneqa **Quranê** tecwîd
Weger bê wî bitin wizr û webal e (5/6)

### 3.1.4. Çar Xelîfe

Çar xelîfeyên Îslamê Ebubekir, 'Usman, 'Umer û 'Elî ne. Di dîwana Fethî de ev her çar nav rasterast nayên bikaranîn. Di şûna van navan de navên ku li wan hatine kirin û pê wesfên wan hatine dayîn hatine bikaranîn.

Ji bo Ebûbekir peyva Siddîq hatiye bikaranîn.

Ji bo **Ṣiddîqê** ruchan zêdetir hat
Li ser eṣḥabê wek mahê munewwer (3/34)

Ji bo 'Umer navê Farûq hatiye bikaranîn.

Ji bo **Farûq** ra tercîḥ û tefẑîl
Li ser 'Os̱manê ẕînnureynê ezher (3/35)

Ji bo 'Elî navê Kerrarê Ḥeyder hatiye bikaranîn.

Tefewwuq kirye ẕûnnureyn ḥeqqa

Li ser şêrê Xweda **kerrarê Ḥeyder** (3/38)

Ji bo ‘Usman jî navê ‘Us̱manê ẕînnureynê hatiye bikaranîn.

Ji bo Farûq ra tercîḥ û tefẑîl

Li ser **‘Os̱manê ẕînnureynê** ezher (3/35)

### 3.1.5. Îmamê Rebbanî

Navê wî ya rastî Ehmed Sîrhîndî ye û di navbera salên 1564-1624an[127] de li Hindistanê jiyaye û rêberê tesewûf û alimê Îslamê ye. Di dîwanê Fethî de tenê cihekî de hatiye bikaranîn.

Ṭerîqet ra çi xweş pîr û żehîr î

Şebîhê **Quṯbê Rebbanî** tu Seyda (11/8)

### 3.1.6. Melek, Perî û Cinn

Di helbestan de ji bo xweşikî û rindiya yarê were teswîrkirin, cin, horî, perî, perîzade û melek hatine bikaranîn. Yar her tim dişibe horî, melek û perîyan hetta ji wan jî xweşiktir tê teswîrkirin.[128] Nexasim ev teswîr di mesnewiyên mîna Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa û yên mîna van de zêdetir tên bikaranîn. Di dîwana Fethî de çend cihên ku ev peyv lê hatine bikaranîn ev in:

Te bi xwûnxwarî girêdayiye nava xwe gelek

Dev û lêvê te ji zehrê tije wek marê belek

Te gelek kuştine çehvê belek û zulfê xelek

Ne tenê em ku ḥemî name çi **cinn û çi melek**

Ji lebê badeyê ẕulma te ‘eceb cur‘ekeşîn (33/2)

[127] http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c22/c220119.pdf 15 Hezîren 2017. 22:01:25

[128] Gezer, *h.b.*, r. 67.

Ji şewqa daneya ẕulfê **perîzad**
Tenêzzul kir bi sûyê damê ṣeyyad (6/6)

**Perî** pêçe ji xergahê neẕer kir
Li ḥalê wî du ṣed ah û keser kir (6/19)

### 3.1.7. Bihûşt û Dojeh (Cennet û Cehennem)

Di hinek helbestên Fethî bihûşt di formatên peyvên mîna cennet, cennetul me'wa, û cennetul-fîrdews de hatiye bikaranîn.

Wek mînak
Fena nabin ceḥîm û darê **cennet**
Ne ehlê intiqal in ehlê wan her (3/19)

Arizûyê **cennetul-me'wa** ji dil avête der
Ê bi ser da yek nesîmek hat ji me'wayê Selîm (27/6)

Ji nav me şibhetê bayê bilez çû **cennetul-fîrdews**
Bilez çû cennetul fîrdews ji nav me şibhetê bayî (44/6)

Cihên ku peyva dojehê lê hatine bikaranîn jî li jêr in:

Kesê yek qeṭreyek îman hebîtin
Di **dojeh** da muxelled nabe yekser (3/59)

Bidîta **dozexê** vê ḥeşregahê
Ji pêt û narê dozex nedikir ahê (8/58)

### 3.1.8. Ayet

Hema hema temamê helbestvanên Edebiyata Klasîk a Kurdî di berhemên xwe de cih dane ayet û hedîsan û bi ayetên ku di helbestên xwe de bikaranîne ji hinek ayet û hedîsan îqtîbas kirine. Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de jî ayet nexasim dema ku navê pêxemberan tên zikirkirin îqtîbas hatine kirin û ayet di helbestan de hatine bikaranîn.

Wek mînak:

1) إِنَّكَ لَمِنَ الْمُرْسَلِينَ

"Bêşik tu ji pêxemberan î."[129]

Bi Yasîn û Ṭaha di kelamê mubîn

Wî got *înneke leminel-murselîn* (1/31)

2) وَتِلْكَ حُجَّتُنَا آتَيْنَاهَا إِبْرَاهِيمَ عَلَى قَوْمِهِ نَرْفَعُ دَرَجَاتٍ مَّن نَّشَاء إِنَّ رَبَّكَ حَكِيمٌ عَلِيمٌ

"Ha ev delîlên me ne, ji bo ku li hemberî qewmê xwe pêk bîne me daye Îbrahîm. Em kî bixwazin wî bi payeyan bilind dikin. Rebbê te xwedî hikum û hîkmet e û zana ye."[130]

Di wê ayeta *tilke ḥuccetuna*

Di en'am û berya welew ennena (1/20)

3) وَزَكَرِيَّا وَيَحْيَى وَعِيسَى وَإِلْيَاسَ كُلٌّ مِّنَ الصَّالِحِينَ

"Zekeriya û Yehya û Îsa û Îlyas jî (gihand hîdayetê.) Ew hemû ji salihan bûn."[131]

*Di gel Zekeriyya û Yeḥya çunîn*

*We 'Îsa û Ilyas mineṣ-ṣaliḥîn* (1/24)

4) وَإِسْمَاعِيلَ وَالْيَسَعَ وَيُونُسَ وَلُوطًا وَكُلاًّ فضَّلْنَا عَلَى الْعَالَمِينَ

[129] Yasîn: 36/3
[130] En'am:6/83
[131] En'am:6/85

“Îsmaîl û Elyasa û Yûnus û Lût jî (gihand hîdayetê)  û me ew hemû li ser aleman re girt.”[132]

*We Yûnis û Lûṭen û kullen metîn*

*Mufeżżel gerandin ‘elel-‘alemîn* (1/26)

5) وَلَوْ أَنَّنَا نَزَّلْنَا إِلَيْهِمُ الْمَلآئِكَةَ وَكَلَّمَهُمُ الْمَوْتَى وَحَشَرْنَا عَلَيْهِمْ كُلَّ شَيْءٍ قُبُلاً مَّا كَانُواْ لِيُؤْمِنُواْ إِلاَّ أَن يَشَاء اللّهُ وَلَكِنَّ أَكْثَرَهُمْ يَجْهَلُونَ

“Beguman eger me mealîket ji wan re daxistana, mirî jî bi wan re biaxiviyana û me hemû tişt kom bikirina û bianîna li pêşberî wan danîna, heta ku Xwedê nexwaze wê dîsa jî bawer nekirina; lê gelekên wan vê nizanin.”[133]

Di wê ayeta *tilke ḥuccetuna*

Di en‘am û berya *welew ennena* (1/20)

### 3.2.Têgihên Tesewûfî

Di edebiyata klasîk de têgihên tesewûfî[134] cihekî girîng digre û ji teref helbestvanên klasîk vê jî gelek caran tên bikaranîn. Di dîwana Fethî gelek têgihên tesawûfî hatine bikaranîn.

Wek mînak di tesewifê de saqî tê wateya murşîdê kamil, mey an jî şerab evîna îlahî ye û saqî wê pêşkêşê murîdan dike. Meyxane an jî xerabat tekiye ye.[135]

**Mest** û **mexmûrê şerab** û **badeyê saqî** ne tev

Ez tenê mexmûrê ḥuzn û zar û giryan û keîb (14/9)

Hinek peyvên din ên ku têgihên tesewûfî ne û di dîwanê de hatine bikaranîn:

[132] En’am:6/86
[133] En’am:6/111
[134] Ji bo agahiyên berfirehtir ên derheqê peyvên tesewûfê de bnr., *Tasavvud Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ağaç kitabevi Yayınları, İstanbul 2009.
[135] Ethem Cebecioğlu, *Tasavvud Terimleri ve deyimleri Sözlüğü*, Ağaç kitabevi Yayınları, İstanbul 2009, s. 435.

Neşterê pûlan e ya mujganê xûnxwarane ev
Neş’eya **mey** ya nigahê çehvê meyxwarane ev (23/1)

Neẓma nucûma şewûşî reş bû li me ‘eyş û xweşî
Teḥl bû li me **ab**a xoşab kerî bi kerî celeb celeb (16/4),

**‘Aşiq û me‘şûq** îro ew di gel hev hem‘inan
Ez tenê dûr û ġerîb û zar û giryan û keîb (14/7)

Me gelek zarî ji **dergahê** ḥebîbê xwe dikir
Me nedî feyde ji wî ṣewt û ṣedayê ku me kir
Dest bi **ahîn û fiġanan** û hezar nale me kir
Me nema rah û **ṭerîqet** ne di bedwê ne şehir
Ji **cefa û eleman** bûne cigerxûn û birî (31/9)

Ji wan me dûr meke ya reb di **dunya** û di **‘uqbayê**
Bibên amîn gelî **yaran** dema bê dengê amînam (26/2)

Ṣah û feqîr û hem geda **zahid û ṣûfî** yû mela
Dîtine wan gelek cefa kerî bi kerî celeb celeb (16/8)

Bi wî geş bû **dil û qelbê murîdan**
Di nav **şêx** û mêla û muste‘îdan
Çi xweş gul bû melaẕa bê omîdan
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban (35/11)

Çi xweş **şah** î çi xweş **mah** î **ṭerîqet** ra tu şehrah î
Bi te çêbûne gumrah î meded Seyda meded Seyda (12/17)

Ev peyvên ku qalind hatine nîşandan tev têgihên tesewûfî yên ku ji teref Fethî ve di helbestan de hatine bikaranîn in. Mirov dikare van mînakan zêdetir bike. Lewra ji ber ku Fethî jî ehlê tesewûfê bûye van têgehan gelek zêde bikar anîye. Ev têgihên tesewûfê li gor cihê ku lê tên bikaranîn her yek wateya cuda di nav xwe de dihewînin.

### 3.3. Navên Cih û Warên Taybet

#### 3.3.1. Welat, Bajar û Gund

Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de di çarçoveya kategoriya 'Welat, Bajar û Gund' de ev nav derbas dibin:

Tûyî Rustem kurê Zalê zeman î
Wezîrê şahê **Îran** î tu Seyda (11/9)

**Hezan** îro te kir Hîzan ji beḥsa şekkeramîzan
Ji zêran ra bûyî mîzan meded Seyda meded Seyda (12/22)

Di mulkê **Romê** da rabû çi şahek
Ji efradê **Ḥebeş** xweş padişahek (8/31)

#### 3.3.2.Çem, Çiya, Newal

Di edebiyat klasîk de hêstirên çavên 'aşiq weke nehran diherike. Nîl, Ceyhûn, Aras, Firat û yên mîna van ji van cobaran çend heb in.[136]

**Nîl** e ya **Ceyḥûn** e yaxûd **Qulzema** zexxar e ya
Dîdeyê ġemdîdeyê pir eşkê xwûnbaran e ev (23/16)

#### 3.3.3. Cihên Pîroz

Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de exlebe navên cihên pîroz ên ku derbas dibin peyvên mîna cennet, cennetul-me'wê, cennetul-firdews, darê cennet û Ke'be ye.

[136] Pala, *h.b.*, r. 91.

Di dîwana Fethî de ev peyv carinan wek wargeh û cihê koçê û carinan jî wek sembola ‘eşqê hatiye bikaranîn.

Arizûyê **cennetul-me’wê** ji dil avête der
Ê bi ser da yek nesîmek hat ji me’wayê Selîm (27/6)

Ji nav me şibhetê bayê bilez çû **cennetul-fîrdews**
Bilez çû cennetul fîrdews ji nav me şibhetê bayî (44/6)

Fena nabin ceḥîm û **darê cennet**
Ne ehlê intiqal in ehlê wan her (3/19)

**Ke‘be** ya butxane ya ew mecmera Zerduşt e ya
Sîneyê bê kîneyê mecrûḥ û bîmaran e ev (23/15)

Fîlê firaq û hicran rahişt **Ke‘beya** dil
Lem edrî eyne raḥet ibbaletul-wiṣalî (49/6)

### 3.4. Însan

Di helbestên Mela Fethî de peyvên aşiq û meşûq an jî bi îfadeyeke din yar û evîndar wekî du tîp însanên cuda derdikevin hemberî me.

Di edebiyata dîwanê de peyva însanê wek ‘aşiq û maşûq xwe nîşan didin û ji bilî kêm carinan di wateya xwe ya rastî de jî tê bikaranîn. Berî ku em derbasî tîpên însanan ên di dîwanê de bibin pêwîst e em hinekî qala ‘aşq, ‘aşiq û maşûqê bikin da ku mijar zelaltir bibe. Piştî ku me tarîfa wan kir re em ê derheqê her peyvekê de ji dîwana Fethî çend mînakan bidin.

‘Aşq di Erebî de tê wateya hezkirina zêde. Aşq him di edebiyata dîwanê de him jî di edebiyata tesewûfê de bûye bingeha wêjeyê.[137]

[137] Pala. *h.b.*, r.38.

Weke bingeha edebiyatên rojhilatê, di bingeha edebiyata Kurdî ya Klasîk de jî temaya evînê serdest e. Li gor mutesewwûfan du cûre eşq yanî evin hene: Eşqa mecazî û ya heqîqî. Di eşqa mecazî de heskirina însanekî bal bi yekî din ve mewzûbehs. Lê di eşqa heqîqî de raste rast heskirin û evîna Xweda heye. Eşqa mecazî(beşerî, însanî) di rêça eşqa heqîqî de ceribînek an rawestgehek e. [138]

Peyvên ‘aşiq û maşûq ango yar û evîndar jî ji peyva ‘aşqê tên. Piştî ku me tarîfa peyva ‘aşqê kir re em dikarin derbasî peyvên ‘aşiq û maşûq ango yar û evîndar bibin.

### 3.4.1.Yar

Kesê jê tê hezkirin, di Edebiyata Klasîk a Kurdî de di çarçoveya wateya sembolên dînî de tê wateya Xweda.[139] Dibe bê gotin di helbestên Edebiyata Klasîk a Kurdî de her çiqas exlebe helbestên lîrîk di wateya mecazî de hatibin nivîsandin jî helbestên eviniyê yên ku di wateya rastî de hatine nivîsandin jî hene. Ji vê yekê re helbesta Mela Huseynê Bateyî ya bi navê “Subh û êvarî şeva tarî şemala kê yî tu?”[140] dikare bê dayîn. Lewra Bateyî vê helbesta xwe li ser gazina xanima xwe jê re nivîsandiye.

Yar ango maşûq di helbestên edebiyata dîwanê de şexsê sereke ye. Peyvên mîna can, canan, yar, dost, mahbûb, hebîb, maşûq, delal, xûb, xûban, sanem, but, nîgar, server, sultan, mah, afîtab, tabîb, dilrûba û hwd. bi rêya îstîareyê di îfadekirina yar de tên bikaranîn.[141] Dema ku li dîwana Fethî dinêrin yar ango maşûq bi van peyvan hatiye teswîrkirin:

Te dema **bedrê** kemalatê nihan kir bi niqab
Gencê fežla xwe te xef kir bi ṭilîsmatê turab
Şem‘ê **kafûrê** ‘ulûmê xwe gerand bê teb û tab
Şubhî perwane veman em ciger û sînekebab
Ger çi perwane hewadarê şemalê dikeşîn (33/11)

[138] *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, Metn û Lêkolîn*, Hayrullah Acar, weş. Nûbihar, Stenbol 2016, r.193.
[139] *Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî- Metn û Vekolîn*, amd. Bamed Serdar, weş. Nûbihar, Stenbol 2015, r.87.
[140] *Mela Huseynê Bateyî- Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, amd. M. Xalid Sadînî, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r.42.
[141] Pala, *h.b.*, r. 402-403.

Mest û mexmûrê **şerab û badeyê saqî** ne tev
Ez tenê mexmûrê ḥuzn û zar û giryan û keîb (14/9)

Ji Leyla ew du **lêvê** pur ḥikayet
Ji Mecnûn ew dilê ṣaḥib şikayet (6/39)

Bê cemala nazidara **meh liqa**
Qabile çara sukûnê hey hewar (24/19)

Nefḥeya **miskê** te teşrîf kir ji **seḥraya xoten**
Ya demê 'Îsayî ya badê ṣebayî bil-yeqîn (36/5)

Eger reş nîn bûwa **miska xoten** dê ev qeder qîmet
Çira xelqê bida miskê bi ṣed zar ey mesîna reş (20/35)

### 3.4.2. Evîndar

Evîndar kesê ku hez dikiye ango kesê ku dixwaze bigihije Xweda ye.[142] Di dîwana klasîk de şair her tim aşiq e. Ji ber vê yekê her tim hemû tişt bi aşqê re têkildar xuya dike. Aşq samîmî ye û tu eleqeya wê bi maddîyatê re tuneye. Erzaqê aşqê xemgînî û mehzûnî ye. Kesê ku ji bilî hezkiriya xwe ji talih, felek, axyar, wext û tiştên wisa jî zilmê dibînî jî aşiq e. Ji ber vê zilma ku lê tê kirin carina aşiq heta ber wextên şeveqê re digrî û ranaze. Ji bo nivîsandina tiştên ku hatine serê wî defter û dîwan ne bes in. Carinan dibe bilbil û tiştên ku hatine serê wî dibêje, carinan jî dibe dastana sera û bi aşqa xwe destanekê pêk tînê.[143]

Dema ku em li dîwana Fethî dinêrin em dibînin ku peyva evîndar ango aşiq bi van peyvan derbas dibe:

[142] Serdar, *h.b.,* r.87.
[143] Pala, *h.b.*, r. 37.

Gelek ‘Ez̠ra gelek Leyla û Şêrîn
Te kir wek **Wamiq** û **Mecnûn** û **Ferhad** (18/6)

Ji Mecnûn **bulbul**ê baġê melaḥet
Terezwa şaxesara pakê saḥet (5/49)

**Ṭûṭiyê** xweş teb‘et e ya **‘endelîbê** bê newa
Ya dil û can besteyê fitrakê nûbaran e ev (23/18)

Dikî pujmurde û bê berkî tu serwa çemenan
Ṣorgula nazik û newreste dikî camediran
Ruwê dildar û ḥebîban xef û mestûr û nihan
**Qumrî** û **bulbul** û ‘uşşaqê qewî ne‘re zenan
Her ji ber cewr û cefaya te ḥemî laşe weşîn (33/3)

### 3.4.3. Teswîrên Xweşikayiyê

Mela Ebdulfettahê Hezroyî ji ber ku exlebeyên helbestên xwe bi şikleke coş û ji hêla naveroka ve lîrîk nivîsandiye zêde zêde teswîrên xweşikayiyê bi kar aniye.

Hinek teswîrên ku me di dîwana wî de tespît kiriye ev in: rûyê dildar, neqşê çînê, mehrûya, rûyê mehliqaya, dilbera qametxweş, bedra temam, rûyê dilberan, rûyê xûban, qametê şimşad, qametelîf û hwd. hatine bikaranîn.

Ḥezîn û sîneçak û hem dilefkar
Cuda bû ew ji mahê **rûyê dildar** (6/89)

Ye‘nî şahê kişwerê qelb û dilan
Rû mis̠ala **neqşê çînê** hey hewar (19/4)

Bi rûyê pakê **mehrûya** xwe şa bû
Xew û xwarin li balê wek heba bû (7/68)

Ger ne wek **qametê şimşadê** bitin
Me ji şimşad û çinarê çi ġereḍ (21/9)

Żiyayê ṭel'eta enwer gelek qelban munewwer kir
Mu'eṭṭer bûn bi **rûyê mehliqaya** pak nûrînam (26/11)

Firqeta nazik qeda leb ġunçeya şêrîn kelam
**Dilbera qametxweş** û gul çehreya **bedra temam**
Ṣorgula bostanê qelba Ḥeżretî Nûrşîn meqam
Da dilan derd û ġem û âlâm û narê iftiraq (24/2)

Tê ji nik wî **dilbera ṣorgul xeda qamet elîf**
Hem muşerref hem mu'eṭṭer bi zulf û xalê 'enberîn(36/6)

Ger çi bê ḥed mubtela mane li **rûyê dilberan**
Ṣed hezar dilber ġulama rûyê zîbayê Selîm (27/5)

### 3.5. Rewşên Evînê

Di dîwana Fethî de gelek têgihên rewşên evîniyê hatine bikaranîn. Helbestvan bi van têgihên rewşên evîniyê di helbestên xwe de car car êş û elema ku ji ber hezkirinê dikêşe tînê zimên û carinan jî ji ber vê evînê rewşa xwe ya bêhiş û serxweşbûna xwe tînê zimên. Ji ber vê yekê hinek têgihên ku ji teref Fethî ve di dîwanê de hatine bikaranîn ev in: serxweş, medhûş, bêhiş, feryad û fixan û enîn, hezîn, zarî, efxan, xem, derd û êş, har, ze'îf, heba û hwd.

Peyva serxweş tê wateya mestbûn e,[144]peyva medhûş tê wateya şaşbûn, sawbûn û bêhişbûnê[145] û peyva bêhişê jî tê wateya evdalî, gêjî û sersembûnê.[146] Dema ku em van her 3 peyvên rewşa evînê digel malika yekem a li jêrê dinirxînin em dibînin ku ew dilbera ku wecha wê wek munewwer e tê bîra helbestvan ew serxweş û bêhiş dibe û ev jî ne bes e bi fikra wê dilberê evdal, gêj û sersem dibe. Ango ji kerba evînê ne hiş bi helbestvan ve dimîne ne jî aqil.

Dema wecha munewwer tête fikra min dibim **serxweş**
Dibim **medhûş û bêhiş** ez ji fikra çeşmÊ şehlayê (45/4)

Xef bû di nêv burca zemîn da me gelek şîn û girîn
**Feryad û efġan û enîn** çûne semayê samiyat (17/8)

Dinalim bi ṣewtek **ḥezîn** û bi **zarî**
Bi feryad û **efġan** û pir bê qerarî (50/1)

Girti li ser me ceyşê **ġem** kerî bi kerî celeb celeb
**Derd û ġem û êş û elem** kerî bi kerî celeb celeb (16/1)

Bûme ji destê **ġeman jar û żeʿîf û heba**
Hûn bi Xwedê kin bibên qiblenumaya me ka (10/1)

### 3.6. Tiştên Sirûştî

Ji hêmanên ku ji av, agir, hewa û avê pêk tên re anasirê erbaʿe yan jî çar unsur tê gotin. Alema mewcûdiyetê ji van 4 hêmanan pêk hatiye. Di edebiyata dîwanê de bi rêya tenasubê gelek zêde tê bikaranîn û wek mîzac û lehenga însên tên qebûlkirin.[147] Ev her çar hêman di edebiyata dîwanê de wek tiştên sirûştî hatine bikaranîn.

[144] Mehmet Kanar, *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, weş. Say, İstanbul 2011, r.1106.
[145] Kadir Guldiken, *Rahnama Farsça- İngilizce-Türkçe Sözlük*, weş. Rahnama Pres, Tahran 2007, r.1546.
[146] D. Îzolî, *Ferheng Kurdî – Tirkî, Tirkî – Kurdî,* weş. Deng, Stenbol 2013, r.73.
[147] Pala, *h.b.*, r. 23.

Fethî di helbestên xwe de van çar hêmanên ku ji wan re çar unsûr an jî anasirê erba'e tê gotin bi kar aniye. Em dikarin ji dîwana Fethî di vê mijarê de çend mînakan bidin.

Di zilletxaneya **xak** û ġubarê
Ji nageh bûne naçarê qerarê (9/11)

Seraser kunbeda exżer siyehpoş û mulemme' hat
Ji dûdê **agirê** dilsûz û tîrêjiyê di ahînam (26/52)

Nehin tefrîq û teḥrîq ji **av û agir**
Kesê bawer ke vê zindîqe kafir (2/26)

Ew le'l û lêvê şekerîn ew lefẓ û guftarê şêrîn
Ew qameta naziktirîn **badê** xezan ser wan ve hat (17/9)

### 3.7. Heywan

Navên hinek heywanên ku di dîwanê de hatine bikaranîn ev in: Kund, mar, 'eqreb, mar, şehmar, hudhud, 'endelîb, kumrî, bulbul, 'enqa, kelb, şêr, piling, ejdeha û hwd. Di edebiyata klasîk de helbestvan hest û ramana xwe, fikr û zikrê xwe û her wiha êş û elemên xwe bi şiklên cuda di berhema ku dinivîsê de diyar dike ku yek ji van jî li gor taybetiyên wan bi navên heywanan emelkirin e ku ev yek jî bi hunera edebî ya teşbîhê tê kirin. Helbestvan carinan ji bo sidq û qinyatiya xwe eşkere bike dibe 'kelbê dergehê'(31/13) carinan jî ji bo êşa xwe ya firaqê bînê zimên dibe 'bulbulê şeyda.'(33/5). Fethî bi vî awayî navên heywanan di wateyên cuda de bi rêya hunera teşbîhê û wekî din bi kar aniye.

Ḥeya nakî di vê wêraneya xak
Wekî **kundan** ḥerîṣê **xar û** xaşak (9/17)

Tu nabînî di ḥalê ledḥê eġleb

Ku tên kuştin xebîsê **mar** û **‘eqreb** (6/81)

Meşreb me telx kam kir xwab û neẓer ḥeram kir
Ta **hudhudî** peyam kir peyamekî çi xweş bû (41/13)

Li hev pêça xwe wek reşmarê bê can
Wekî ẕulfê xweyê **şehmarê** pêçan (6/21)

Gul xweş in sosin xweş in sunbul xweş in
Ew zî çû ew zî çû ew zî çû
**‘Endelîb û kumrî û bulbul** xweş in
Ew zî çû ew zî çû ew zî çû (41/1)

Deyne tu duṣedhezar merqî
Perwaz ke aşiyanê **‘enqa** (53/7)

### 3.8. Dem

Di warê demê de hinek peyvên ku di dîwanê de hatine bikaranîn ev in: ‘eyd, sersal, newroz, sal, weqt, mah, roj û şev, payîz, sehergah, zivistan, buhar, her weqt û her gav, her dem, adar, nîsan,  gulan û hwd.

Xulaṣe **‘eyd** û hem **sersal** û **newroz**
Diçu bê şibhê ey dildar û dilsûz (53/104)

Di baġa rû teferruc kir gelek **sal**
Bi destûra ewê zaġa reşa xal (8/30)

Neborîne li wî eḥwal û ezman
Ne **weqt** û ḥîn û **sal** û **mahê** yekser (3/14)

Ji dûdê peḥtina wan **roj** û hem **şev**

‘Eceb çehvê nucûman kor nebûn tev (8/68)

Di **payîzê** bi bakî wan delalan

Dikit pejmurde dîsa ‘aqibet hem (28/72)

Wekî koko dibêm koko **şev û roj û seḥergahan**

Ḥelandî can û dil yekser firaqa serw sîmînam (26/5)

### 3.9.Nebat

#### 3.9.1. Dar û Nebat

Çend peyvên ku di dîwanê de wek ‘Dar û Nebat’ hatine bikaranîn ev in: dar û ber, serw û şîmşad, gulgulî, sêv, hinar, incîr, selw, çinar û hwd.

Ger pêwîst be em dikarin di warê armanca bikaranîna peyvên dar û nebatê ya di helbestên klasîk de bi peyvên serw û şîmşadê wisa îzah bikin:

Serw di helbestên klasîk de ji darên ku herî zêde qala wê tê kirin darek e. Bi qameta xwe ya zirav û dirêj û dema ku ba radibe hêdî hêdî diheje herî zêde di temsîlkirina qameta yarê de tê bikaranîn.[148]Her wiha peyva şîmşadê jî di edebiyata klasîk de ‘ji ber bilindbûna qametê gerdana ayrê sembolize dike ku ev dar her wiha bi taybetiya xwe ya ku fêkî nade jî wê yara ku wislatê ji aşiqê xwe re bexş nake temsil dike.[149]

Wek mînak:

Bi qedd û bejn û balayî esef da **serw û şimşadan**

Esef da serw û şimşadan bi qedd û bejn û balayî (44/10)

Ji bilî peyvên şîmşad û serwê di Dîwana Fethî de ev peyvên jêr ên reşkirî jî wek di kategoriya ‘Dar û Nebat’ hatine bikaranîn.

[148]Kadri Yıldırım, *Baba Tahirê Uryan, Hayatı Görüşleri Dîwanı*, weş. Avesta, Stenbol 2013. r.71.
[149] *h.b.,* r. 72.

Ji ḥeraret herişî sîne û dil
Werne me ji **sêv** û **hinarê** çi ġereḍ (21/5)

Bêyî ṭiflan baġê bostan **incîr**
Tijî ez şehdê nab û şekker û şîr (28/99)

Ger ne wek qametê şimşadê bitin
Me ji şimşad û **çinarê** çi ġereḍ (21/9)

Kûh û şeḥra baġ û şax û **dar û ber** pir zîb û zîn
Ez tenê pejmurde û pir zar û giryan û keîb (14/10)

Palî ji werdan kemmilî ser ta qedem têk xemmilî
Bi wan qedd û qamê **gulgulî** fazet bicullil-muştehat(17/19)

### 3.9.2. Gul û Kulîlk

Di dîwana edebiyata klasîk de peyvên mîna gul, ġunce, sunbul, nesrîn, sosin, sorgul, reyhan, lale, binefş, çîçek, kulîlk, werd, yasemîn û hwd. ji bo delalbûn, xweşikayî û bedewbûna yarê hatine îstîmalkirin.

Devê yarê wek xonçe, rûyê wê wek gulê, bejna wê wek reyhanê, porê wê wek sumbulê tên teswîrkirin.[150] Dema ku em li hinek peyvên ku wek gul û kulîlk hatine bikaranîn binêrin di dîwana Fethî de ew rewşên evînê yên li jêr derdikevin holê.

Gul:

Peyva ku di edebiyata klasîk de herî zêde qala wê tê kirin gul e. Têkiliyeke wê dijwar bi rû û hinarika yarê re heye.[151] Tê wateya xonce ango bişkoka ku buşkiviye.[152]

[150] Gezer*, h.b.,* r. 86.
[151] Pala*, h.b.,* r.171.
[152] Huseyn Amîd, *Ferhengê Farisî 'Amîd,* Weş. Emîr Kebîr, Tahran 1391, c.3, r. 2059.

Firqeta nazik qeda leb ġunçeya şêrîn kelam

Dilbera qametxweş û **gul çehreya** bedra temam

Ṣorgula bostanê qelba Ḥeżretî Nûrşîn meqam

Da dilan derd û ġem û alam û narê iftiraq (24/2)

Ġunce:

Ġonce ji gula ku hê nebuşkufiye re tê gotin. Di edebiyata klasîk de ġonce ji dêla devê yarê de tê bikaranîn û xwe bi halê nebuşkîvînê nîşan dide. Kenîna ġunceyê tê wateya vebûna wê.[153].

Ḥeta ew gul ji **ġunce** hate bîrûn

Wekî berga gula lale di gel xwûn (7/44)

Reyhan:

Di edebiyata dîwanê de ji hêla bêhn û şeklê xwe ve tê bikaranîn. Pora yarê û pirtika bihê dişbihe reyhanê.[154] Reyhan her wiha ji bo bejn û qameta yarê jî tê bikaranîn.

Di nava baġ û bostanê leṭafet

Çi nazik tayê **reyḥan** î tu Seyda (11/4)

Lale:

Lale, di helbestên dîwanê de bi rengê xwe yê sor ji bo hinarikên yarê û histêrkên aşiq tê bikaranîn. Dixala reşahiyê ya di nava laleyê de ye birîna dilê aşiq a ku ji ber xwezîanîna hinarikên yarê û hesûdiya lê tê kirin e. Ev yek jî dibe sedema êş û daxê.[155].

---

[153] Amîd, *h.b.,* r. 168.
[154] Pala, *h.b.*, r. 376
[155] *h.b.*, r. 284.

Ḥeta ew gul ji ġunce hate bîrûn
Wekî berga gula **lale** di gel xwûn(7/44)

Sunbul:

Di edebiyata dîwanê de ji bo pora yarê tê bikaranîn. Sunbul ji wan çîçekên ku di edebiyata dîwanê de herî zêde tê bikaranîn çîçekek e. Bi bêhn û şiklê xwe dişbihe por û guliyên yarê. Sunbul û gul exlebe bi hev re tên bikaranîn. Sedema vê yekê jî xwe berdana pora sunbul a li ser hinarikên gul de ye.[156]

Ji bihna **sunbul**ê zulf û gula rû
Ji badamê du çeşmê qewsê ebrû (7/63)

[156] Pala, *h.b.*, r. 414.

# BEŞA SÊYEMÎN

# KESAYETIYA FETHÎ YA EDEBÎ

Berî niha jî weke ku me diyar kiribû Mela Ebdulfettahê Hezroyî helbestvanekî him klasîk û mutesewwûf û him jî ehlê tarîqatê ye. Bi heman awayî Hezroyî di dawiya sedsela 19emîn û di destpêka sedsala 20emîn de jiyaye. Dema ku em van hemû taybetiyên Mela Ebdulfettahê Hezroyî li ber çavan digrin û tememan van taybetiyan digel hev dinirxînin em dibînin ku Hezroyî bi van taybetiyên xwe mohra xwe ya helbestvantiyê di serdema modernîzmê de li bin dîroka Edebiyata Klasîk a Kurdî xistiye. Hezroyî ji ber ku ehlê terîqetê bû, tesîra terîqet û tesewûfê xwe bi şikleke zêde di helbestên wî de nîşan dide. Me heta ku ji destên me hat û heta ku Xweda qewet da me hewil da di bin vê beşa sêyemîn de bi şikleke hûr û kur, her wiha berfireh lêkolînekê bikin. Me beşa sêyem di bin çar binbeşan de nirxandin.

Di binbeşa yekemîn de ziman, şêwaz û devokên ku ji teref Hezroyî ve di dîwanê hatine bikaranîn û ji teref me ve hatine tespîtkirin hatin nirxandin. Digel vê, me peyv û ravekên Kurdî yên di dîwanê de bi mînakan nîşan da. Fethî zimanê Kurdî, Erebî û Farisî bi şikleke baş dizanîbûye û zimanê Tirkî jî bi qasî ku fêm bike dizanibû. Fethî ji bilî zimanê Kurdî bi 2 zimanên din helbest nivîsandine ku ji ber vê yekê ye zimanên Erebî û Farisî bandora xwe di helbestên wî yên Kurdî de xwe nîşan didin. Ji ber vê sedemê me bandora zimanên biyanî yên di helbestên Fethî de vekola û bi çend mînakan rave kir. Di bin vê beşê de ji bilî van xalan, em li ser şêwaza helbestvantiya Fethî rawestiyan û me hewil da bi mînakan şêwaza wî ya helbestvantiyê diyar bikin.

Binbeşa duyemîn li ser wêjevanên ku tesîr li ser Fethî kirine de ye. Di bin vê binbeşê de me xeyret kir da ku em wêjevan û helbestvanên mezin ên ku bandor û tesîreke mezin li ser Fethî hiştine tespît bikin. Me vê yekê yek bi yek bi mînakan diyar kir.

Di binbeşa sêyemîn de jî me helbestên Fethî ji hêla helbestên lîrîk, dîdaktîk-şîretî, hîkemî ve nirxand û me vê yekê bi mînakan eşkere kir da ku helbest û helbestvantiya Fethî çêtir bê fêmkirin.

Me di binbeşa çaremîn de jî helbestên Fethî ji hêla hûnerên edebî ve nirxand. Di bin vê binbeşa çaremîn de me hûnerên edebî yên di helbestên wî tespît kir û me ji her yekê re çend mînakan da.

## 1. ZIMAN Û ŞÊWAZ

### 1.1. Ziman

Di destpêkê de pêwîst e bê diyarkirin zimanê ku di dîwanê de hatiye bikaranîn ji gelek hêlan ve pir bi hêz û qewet e. Me berî niha di beşa jiyannameya Fethî de diyar kiribû ku Fethî di warê ziman de perwerdeyeke gelek baş sitandiye û zimanê Kurdî, Erebî û Farisî bi şikleke baş fêr bûye.

Her wiha dema ku em li dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî dinihêrin em dibînin, zimanê ku di helbestên dîwanê de hatiye bikaranîn ji zimanê helbestvanên klasîk ên din gelekî ne cudatir e û di dîwanê de gelek peyv û ravekên Erebî û Farisî hatine bikaranîn. Lê ev heqîqet jî heye dema mirov helbestên di dîwanê de dixwîne jê fêhm dike, lewra zimanê helbestan hêsan, xwerû û hêrikbar e. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje Fethî di helbestên xwe de zimanekî hêsan û herikbar bi kar aniye.

Wek mînak:

Were ey dil bi mektebxaneya ‘işq
Were ey dil bi me‘debxaneya ‘işq (9/1)

Ji derd û miḥneta dewran dibêjim ez meded Seyda
Ji daġa firqet û ḥicran meded Seyda meded Seyda (12/1)

Ji hêla edebî ve zimanê helbestvan gelek bihêz e. Fethî digel ku çar zimanan zanibûye jî di dîwana xwe de tenê sê zimanan bi kar anîye ku ew jî Erebî, Farîsî û Kurdî ye. Seyda di dîwana xwe de çawa ku helbestên xwerû Farîsî, Erebî û Kurdî nivîsandibe jî bi heman awayî di hinek helbestên xwe de du zimanan-Kurdî-Erebî- bi kar aniye.

Wek mînak:

Kulle yewmin mewtetun lî fîl-firaqi qed bedet

Her dikêşim van cefayan we ez im her derdinak (25/4)

Nehin ku kes ḥalêm bibêje ḥebîbî

Leqed ża‘e ‘umrî we żaqe iṣṭibarî (50/3)

Hunerên edebî di helbestan de gelek cih digrin û helbestvan ji dubarekirina dengan îstîfade kiriye.

Wek mînak:

Çi şahek min hebû şêrîn û şehbaz

*Bi qurban im bi qurban im bi qurban*

Ḥebîb û dilruba û rah û rimbaz

*Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban* (35/1)

Dema ku em ji hêla ravekan ve dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî binirxînin em dibînin ku cûrbecûr ravek hatine bikaranîn, lê di dîwanê de ravekên tevlîhev û nezelal û dirêj zêde xuya nakin û nehatine bikaranîn. Her wiha zimanê dîwanê hêrikbar û watebar e.

Wek mînak:

Çi xweş şah û çi xweş xan î tu Seyda
Di mulkê dil de sulṭan î tu Seyda (11/1)

Ji hicra nazenînan min dil û can û ciger kûl bû
Di dil hil bû qewî narek ji şewqa bejn û balayê (45/3)

Di dîwanê de ravek carinan qet nehatine bikaranîn carinan em li rasta ravekên ku ji 2 peyvan, 3 peyvan û 4 peyvan pêk hatine tên. Em dikarin vê yekê bi mînakan wisa zelaltir bikin.

***Carinan di hinek cihên dîwanê de ravek qet nehatiye bikaranîn.**

Wek mînak:

Dikin cewr û cefa herdem welêkin

Bi luṭf û merḥemet nakin nigahan (32/11)

*** Ravekên ku ji du peyvan pêk hatine:**

Wek mînak:

Bide min saqiya **kûza şerabê**

Mede guh van ṭebîbê bed fi‘al e (39/14)

*** Ravekên ku ji sê peyvan pêk hatine:**

Wek mînak:

Ey siracê dûrbînan ṣebr û raḥa hemnişînan

**Merhema qelbê ḥezînan** naziya şêrîn leban î (47/1)

*** Ravekên ku ji çar peyvan pêk hatine:**

Wek mînak:

**Qûtê canê ‘aşiqê miskîn** e ya yaqûtê le‘l

Ya şeker barê du lêvê van şekerbarane ev (23/2)

Herî dawî em dikarin bibêjin kurmanciya ku di helbestên dîwanê de hatiye bikaranîn, gelek dewlemend, zelal û herikbar e. Digel ku eslê xwe Hazroyî be dema ku mirov li dîwanê dîqet bike, dibîne ku gelek devokên kurmanciya jor yên mîna Botî, Hekkarî û devoka Serhedê di dîwanê de hatine bikaranîn. Di dîwana Mela Ebdulfettahê Hezroyî de helbestên ku di nav de peyvên vê devokê hatine bikaranîn hene. Em ê li jêrê

din bin sernavan de zimanê dîwanê li gor devokên Kurdî binirxîn û mînakan ji dîwanê bidin.[157]

### 1.1.1. Devoka Botan û Bahdînan

Behdînan navê wê herêma ku bi giştî ji bakûrê Misûlê dest pê dike û heta Colemêrgê diçe ye ku di nav de wek Dihok, Zaxo, Amêdî û Şeyxan jî hene. Ji devçoka vê derê re Bahdînî tê gotin.[158]

Her wiha Botan jî ji Colemêrgê dest pê dike û heta Şirnexê diren dibe. Navenda herema Botanê Cizîr e û ji devoka vê heremê re rjî Botî tê gotin.[159]

Di serdemên klasîk de, digel devoka Botî, devoka Hekkarî û Badînî rengên xwe zêdetir dane helbestê û em dikarin bêjin ku ev devokên han di edebiyata klasîk de bûne zimanê standart.[160]

Wek mînak:

Bizan hemze elîfa ku **qebûl ket**
Temamê ḥerekan wek ehl û ale (5/12)

**Dikit** texṣîṣê ḥalê mumkinatan
Ji ewṣaf û ji ezman û cihatan (2/34)

Bi enwa‘ê berahîn û delîlan
**Dibit** îmanê teqlîdê muqerrer (3/41)

Weqta ku **bête** coşê bîne dilan xuroşê
Ṣoḥbet bike bi def û saz merdane laubalî (49/21)

---

[157] Ji bo cudahiyên devokên kurmancî bnr. Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, “*Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects”, Kurdish Studies*, j. 2, no: 2, Cotmeh 2014, r. 173-175.
[158] İbrahim S. Işık, *A’dan Z’ye Kürtler Kişiler-Kavramlar-Kurumlar,* weş. Nûbihar, İstanbul 2013, r. 96.
[159] Işık, *h.b.*, r.109.
[160] Önder Beyter, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn,* Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r. 36.

**Divêtin** ger bi qencî bî muweṣṣef
Tu qenc teḥṣîlekî ke ey mukellef (2/1)

**Dimînit** ta ebed şer'a wî ya pak
Di kullî weqt û ezmanan di her der (3/26)

Hebûya carekê ger min vexwara
Ku têr av bibwa ev **ezmanê** lal e (39/2)

**Cerg** û ciger meke xwîn ḥeta bi kengî çendîn
Ẓulm û te'eb bixwendîn ẓulm û te'eb nexweş bû (10/41)

### 1.1.2.Devoka Serhedê

Serhed herêmeke Bakurê Kurdistanê ye. Bajarên Çewlîg, Erzirom, Mûş, Agirî û Qers (Serhed) li Bakûrê Kurdistanê û herêma sersînorî ya li parêzgeha Azerbaycana Rojava dikevin nav tixûbe vê herêmê. Navê xwe ji "serxet"ê digre. Digel wan, kurdên di nav Ermenistan û Nahcîwanê jî em dikarin wekî Serhed bihesibînin.

Bi giştî em dikarin bibêjin ku Serhed ji bakurê Kurdistanê herêmeke mezin e û ji bilî hin cudahiyên biçûk ên deverî devokeke kurmancî ya berbelav dihewîne.[161]

Di dîwanê de peyvên mîna, çehv, fehm kirin, wastan, xûn, ciger[162], gerek, lazim, û hwd. yên ku li herema serhedê tên bikaranîn û peyvên devoka Serhedê ne hatine bikaranîn.

Wek mînak:

Du **çehvan** da cihan teşwîş û şorî
Du burhê wî ḥesed dan kesk û ṣorî (8/16)

[161] Yakup Aykaç, *Dîwana Hezîn Metn, Lêkolîn û Ferheng,* Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol 2015, r.47
[162] Öpengin*, h.b.*,, r. 173-175.

Welêkin puştî teftêşek ‘eca’ib
Me jê **fehm kir** ku ferż e lamuḥal e (39/10)

Nedîn wan qeṭ ve**westan** û teḥeyyur
Ve**westan** qeṭ li vir nabit teṣewwur (7/37)

Neşterê pûlan e ya mujganê **xûn**xwarane ev
Neş’eya mey ya nikahê çehvê meyxwarane ev (23/1)

Li me **lazim e** bawerîkê temam
Bi pêġemberiyya nebiyê di ḥumam (1/9)

Firaqê ġem li min rakir di dil da agirek hil kir
Bi wî can û **ciger** kul kir meded Seyda meded Seyda(12/2)

### 1.1.3. Peyv û Ravekên Kurdî yên Resen

Her weke ku eşkere ye û tê zanîn di nivîsandina berhemekî de ger ku ravekên resen bên bikaranîn ev yek tê maneya ku helbestvan di qada xwe de ehlê vî karî ye û ji ber ku zimanê xwe bi şikleke kamil dikarî bide şuxilandin û ew kes di nivîsa xwe de gotinên xwe bi qewet dike. Bi gotineke din ev kes diyar dike ku ew ji zimanê xwe haydar e. Dema ku em di vê çarçovê de li berhemê ango dîwana Fethî binihêrin em dibînin ku Fethî gelek ravekên resen ên Kurdî bi kar aniye ku em ê li jê re heta ku bes be derheqê vê yekê de mînakan bidin.

Em dikarin hinek peyv û ravekên resen ên Kurdî yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn wiha birêz bikin:

Te bi xwûnxwarî girêdayiye nava xwe gelek
Dev û lêvê te ji zehrê tije wek marê belek

Te gelek kuştine **çehvê belek** û zulfê xelek
Ne tenê em ku ḥemî name çi cinn û çi melek
Ji lebê badeyê ẓulma te ‘eceb cur‘ekeşîn (33/2)

Çiku bed ṭali‘iya me heye ez dewrê felek
Dewrê dewwarê ḥesedkar e di ḥeqqê me gelek
Bûne sergeşte û pabesteyê wan zulfê xelek
Me nehin raḥû selamet ji du çeşmê di **belek**
Heye carek ku bi meqṣûd û muradê bigehîn (31/14)

Murada wî eger çi ev ji **mêj e**
Ji bo sirra dilan kes nîne meḥrem (28/12)
Çi ġeddar e çi dijwar e çi ḥîr e
Li meydan çi **rimbaz** e çi şêr e (28/55)

Du ṣed bêjin di nav çaha zinexdan
Bi **qeyda ġebġeb**ê kir qeya û bendan (8/26)

Ḥezîn û sîneçak û **dilfikar** im
Feqîr û bêkes û bêzar û bêzad (18/16)

Kelbê dergahê te me meẓherê cûdî di wucûd
Bûm **çavnêrê** li luṭfê di qiyam û di qu‘ûd
Segê dergahê xwe şa ke tu bi eṭraf û xudûd
Bi ‘uyûn û bi cufûn û zeqen û burh û qudûd
Ku ji şe’nê te ye ev reng me nehin raḥê yeqîn (31/13)

‘Erżiḥala Fetḥiyê bêçare ba ḥusnê edeb
Tu bibe wî ḥeżreta wek rewżeya **xulda berîn**(36/11)

Bidîta **dozexê** vê ḥeşregahê

Ji pêt û narê **dozex** nedikir ahê (8/58)

### 1.1.4. Hêmanên Erebî û Farisî

Her weke ku berî niha di binbeşa 'Ji Dayîkbûn û Wefata Fethî' de hatibû diyarkirin Mela Ebdulfettahê Hezroyî di sala 1892an de ji dayik bûye û di sala 1975an de jî çûye rehma Xwedê. Dema ku em li dîrokên ku seyda lê jiyaye dinêrin em dibînin di qonaxeke nêzî modernîzmê de jiyaye. Lê di dîwanê de dîsa tê dîtin ku seyda di bin tesîra vê yekê de nemaye û di berhama xwe de rê û rêbazên klasîk domandiye. Seyda bi 3 zimanan- Kurdî, Erebî, Farisî- dizanîbû û bi sê zimanan helbestan nivîsandiye. Dema ku em li dîwana wî dinihêrin carinan em dibînin ku helbestên wî seranser Farîsî an jî malik û peyvek Farîsî ye û carinan jî em dibînin ku helbestên wî seranser Erebî an jî malik û peyvek Erebî ye. Bi kurtasî zimanên Farisî û Erebî di gelek cihên dîwanê de weke helbestekê, malikekê an jî misreyekê xwe nîşanî me dide. Bi heman awayî pêwîst e ku mirov bibêje Seyda Ebdulfettahê Hezroyî tenê bi qasî ku fêm bike dizanibû Tirkî. Di helbestan de bikaranîna van zimanan qet zirarê nedaye wate û herikbariya helbestan. Lewra seyda van zimanan bi hosteyî bi kar aniye û helbestên xwe biqewet û dewlementir kiriye.

#### 1.1.4.1. Hêmanên Erebî

Di helbestên ku Fethî nivîsandine de gelek peyv, malik û hinek çarînên ku bi zimanê Erebî ne hene. Em dikarin di vî warî de ji dîwanê wisa mînakan bidin.

Zimanê Erebî carinan wek peyvekê derdikeve hemberî me.

Wek mînak:

Ne wekî zulf û ruxê yarê bitin

Me ji vê **leyl û neharê** çi ġereḍ (21/8)

**Firqeta** nazik qeda leb ġunçeya şêrîn kelam

Dilbera qametxweş û gul çehreya **bedra temam**

Ṣorgula bostanê **qelb**a Ḥeżretî Nûrşîn **meqam**

Da dilan derd û **ġem** û **alam** û narê **iftiraq** (24/2)

Cuda bû dehşeta marê **fîraqê**

Şebîhê marê bîrê marê erqem (28/82)

Nebit ger puştî ḥerfê med sebeb qeṭ

Ṭebi'ê med dibit wek **qîl û qal e** (5/14)

**'Eceb** muhran ji ber dîtin **kusûfî**

**Qemer** jî bûn siyehpoşê **xusûfî** (8/19)

Erebî carinan jî wek misre, malik û çarînekê derdikeve hemberî me.

Wek mînak:

Li diyarê te xerîb im ey tu kehful-ġureba

**Ṭale ma lem nere minkel-luṭfe Ellahu cezak** (25/1)

Nehin ku kes ḥalêm bibêje ḥebîbî

**Leqed ża'e 'umrî we żaqe iṣṭibarî** (50/3)

**Ferifqen biṣebbi ḥelîfil ġeramî**

**Be'îdun 'enilxillî ẕîl-inkîsarî** (50/4)

**Ẕubtu min nîranî hicranil eḥibbail-nicab**

**Fatenî luqyahumu iẕ dare fîlbeynil-ḥicab**

**La tu'atibnî fekem fîlqelbi minhum iltihab**

**Bi'se ḥalî bi'se ḥalî miṣle 'etşanil 'iraq** (24/3)

### 1.4.1.2 Hemanên Farisî:

Çawa ku di helbestên dîwanê de peyvên Erebî hatibin bikaranîn bi heman awayî peyvên Farisî jî hatine bikaranîn. Em dikarin bi çend mînakan van bikaranînan wisa nîşan bidin.

Wek mînak:

Yeka yek xelqê **meyxanê** dixwestin wê şeraba te
Bi can û **dil** dema dem te dihebandin ey mesîna reş(20/20)

Rehînê **în û an başem zebûnêf** her bedan **başem**
Bigirdabê ġeman **başem** meded Seyda meded Seyd (12/12)

Di gel wî her kesek der **cengcoyê**
Di gel bextê xwe ew der **goft û goyê** (6/10)

Ji **cama** bêhiş î **dîwane** û **mest**
Li pey wî ṣed reqîbê s**eng**ê der des (6/7)

Ev ġem û derdê nigar hem **şebê** hicranê yar
Salê ġem û salê **şeb** rêhtê bi ser cumle da (10/13)

**Meh û xurşîdê** eywana celalet
Ḥebîb û seyyîdê ewladê adem (28/4)

### 1.1.5. Cotepeyv

Di zimanan de hin bêje hene ji bo ku vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekî xwe, nêzî xwe yan jî dijberî xwe re tên bikaranîn. Ev cure dibe ku di her zimanî de hebe û li gorî çêna zimanê xwe xwediyê awayên cuda bin.[163]

[163] M. Zahir Ertekin, Zafer Açar, "Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, c.I, j.I, Ocak 2015, r. 82.

Dema ku em li dîwana Fethî dinihêrin em dibînin ku cotepeyv bi şikleke xurt hatine bikaranîn û ev bikaranîn weke ku li jorê hatibû diyarkirin wateya îfadeyê xurt dikin. Di dîwana Fethî de gelek cotepeyv hene. Wek mînak: êş û elem, êş û ġem, şox û şeng, şax û dar, şev û roj, bêsûc û bêgunah, wezîr û padişah, kar û bar, cerg û ceger, keyf û fereḥ, zulf û xal û hwd.

Wek mînak

Perî peçe ji xergahê neẓer kir
Li ḥalê wî du ṣed **ah û keser** kir (6/19)

Bi qedd û **bejn û balayî** esef da serw û şimşadan
Esef da serw û şimşadan bi qedd û **bejn û balayî** (44/10)

Bi der hatin ji nava **mulk û mala**
Kirin wan ‘ezmê nezhetgah û pala
Der û dîwan kirin **xalî û vala**
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban (35/21)

### 1.2. Şêwaz

Di encama lêkolîn û muqayasekirina destxetên ku gihaştin ber destên me de me tev de 53 helbestên bi Kurdî yên Fethî tespît kir. Her wiha di pêvajoya lêkolînê de hat hînbûn ku Fethî bi sê zimanan dizane û ji van zimanan Erebî û Farisî bandoreke zêde li ser helbestên wî kirine. Temamê van helbestên Kurdî bi erûzê hatine nivîsandin û her wiha di van helbestan de gelek serwa û paşserwa hatine bikaranîn ku vê yekê tesîreke neyînî li ser helbestên Fethî nîşan nedaye. Ev 53 helbestên Fethî bi teşeyên nezmê yên bi mîna qesîde, xezel, mesnewî, murebba, muselles û muxemmes hatine nivîsîn ku ev yek jî şêwaza helbestvantiya Fethî dewlementir kiriye.

Ji bilî van dema ku em li temamê dîwana ku derketiye holê dinihêrin em ji hêla şêwazê ve gelek xalên girîng dibînin ku em dikarin van xalan wisa birêz bikin:

-Bikaranîna Kurdiyeke xwerû, hêrikbar û watebar.

-Eşqa manewî û mecazî.

-Temamê helbestan bi arûzê nivîsandin û di helbestan de bikaranîna ravek, serwa û paşserwayan.

-Bi şikleke herikbar û lihev û her wiha bi şikleke ku zirar nede şikl û wateya helbestê bikaranîna peyvên Erebî û Kurdî.

-Êş û elema ku ji ber eşq, fîraq û wesletê tê kişandin.

-Bi kêşe nivîsandina helbestan û bi peyvên resen ên Kurdî emel kirin.

- Di helbestan de bi şikleke dewlemend bikaranîna hûnerên edebî.

- Bikaranîna term û têgihên Îslamî.

-Bikaranîna şêwaza çîrokî û gûftegoyê.

-Bi çand û kevneşopiya Kurdan xemilandina helbestan.

Me li jorê di çarçoveya şêwazê de hewil da şêwaza Fethî ya di dîwanê de diyar bikin. Lê divê em vê yekê jî diyar bikin ku me ji bo her xalekî ku me nivîsand ji dîwana wî mînak neda. Lewra berî niha me di xebata xwe de ji bo her xalekî ku bi şêwazê an jî xala ku me qala wê kir re têkildar e re bi malikan gelek mînak da.

Di encamê de mirov dikare bibêje Fethî bi van taybetiyên xwe di serdema mordernîzmê de, şêwaza xwe afirandiye û tradîsyona Edebiyata Klasîk a Kurdî bi şikleke xurt û pir baş domandiye.

## 2. EDÎBÊN KU TESÎR LI SER FETHÎ KIRINE

Fethî digel ku di dawiya sedsela 19emîn û di destpêka qerna 20emîn de jiyabe jî tradîsyona edebiyata klasîk bi şikleke berfireh û kûr domandiye ku ev yek bi şikleke eşkere di dîwana wî de xwe nîşan dide.

Dema ku em li tevahiya dîwana wî dinêrin û ger em lêkolîneke baş bikin em ê bibînin ku wêjevanên mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Mela Mihemedê Licêyî bi heman awayî ji ber ku ehlê medresê û terîqetê bû jî alim û zanayên mîna Şêx Evdilqadirê Hezanî, Şêx Muhammedê Selimê Hezanî û Mewlana Ebdulhey li ser wî tesîr kirine.

Em li jêrê vê tesîra ku me li jorê qala wê kir digel mînakan nîşan bidin.

## 2.1. Melayê Cizîrî

Di sala 1589an de li bajêra Cizîrê ji dayik bûye.[164] Melayê Cizîrî yekem helbestvanê Kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî dîwaneke bi Kurdî aniye holê. Navê wî ya rastî Ehmed e. Bi heseb melatiya wî ya di medreseyan de û bajarê wî Cizîrê wekî Melayê Cizîrî hatiye naskirin. Melayê Cizîrî di helbestên xwe de exlebe mexlasa Mela û her wiha mexlesên mîna Melayî, Nîşanî hwd. bi kar aniye.[165] Helbestvanên ku herî zêde lê bandor kirine Mewlana Camî û Hafizê Şîrazî ye.[166]

Melayê Cizîrî ehlê tesewûfê û edîbeke klasîk bû. Dema ku li berhemên piştî wî tê nihêrtin em dibînin ku tesîra xwe li ser gelek helbestvanên klasîk hiştiye ku yek ji van jî Mela Ebdulfettahê Hezroyî ye. Di dîwana Fethî de tesîrên Cizîrî yên ku me tespît kirin û bi şiklê nazîrê hatine nivîsandin ev in:

*Nazîreya ku bi paşserwaya çi ġereḍ hatiye kirin.

**Melayê Cizîrî**

Me ji bil ḥusn û cemalê çi ġereḍ

Bê cemalê ji peyalê çi ġereḍ

Ger ne teşbîhê du birhên te bitin

Me di ‘îdan bi hilalê çi ġereḍ

Ger ne qesta dil û canê me dikit

Me ji wê şox û şepalê çi ġereḍ[167]

---

[164] Feqî Huseyn Sağnıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 375.
[165] Adak, *h.b.,* r. 208.
[166] Rênas Jiyan, *Wêjeya Kurmancî- Pênûsên Çardehderb*, weş. Belkî, Amed 2015, r.33.
[167] *Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. Selman Dilovan, weş. Nûbihar, Stenbol 2014, r. 118.

**Fethî**

Dil ji bil qametê yarê çi ġereḍ
Me ji ezharê buharê çi ġereḍ (21/1)

Me ji destê te ye nalîn û hewar
Werne me ji ah û hewarê çi ġereḍ (21/2)

‘Eddê eyyamê firaqa te dikin
Werne me ji ‘edd û jimarê çi ġereḍ (21/3)

*Di beytên jêr de bi misreya "‘Îd e û herkes muferreḥ ew ji dîdara ḥebîb" nazîrê li helbesta Cizîrî hatiye kirin.

**Melayê Cizîrî**

‘Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e ‘îd

Ez tinê meḥrûmê dîdar im bi ṣed menzil bê ‘îd[168]

**Fethî**

‘Îd e û herkes muferreḥ ew ji dîdara ḥebîb
Ez tenê meḥcûrê yar û zar û giryan û keîb (14/1)

*Di malikên jêrê de jî bi hevoka "Dil yek e dilber dê yek bit" û "Ney ji wan im" nazîre li helbesta Cizîrî hatiye kirin.

**Melayê Cizîrî**

Dil yek e dê ‘işqê yek bit ‘aşiqan yek yari bes

Qible dê yek bit qulûban dilberek dildari bes

[168] Mele Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî,* amd. û wer. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2013, r.348.

Hin ji nik derê ve tên qesta kenişta hin dikin

Ney ji wan im ney ji wan im min derê xemmari bes[169]

**Fethî**

Dil yek e dilber dê yek bit dilrûbayê her zeman

Dilnewazî gah gahe cewr û miḥnet her zeman (29/1)

Hin di gel yaran di geşt û hin di nêv baġê wiṣal

Ney ji wan im ney ji wan im ez feqîr ḥal û ġerîb (13/7)

### 2.2.Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî ji yek wan helbestvanên Kurd ên edebiyata klasîk e. Li gor Feqî Huseyîn Sağniç Ehmedê Xanî di sala 1651an de li gundê Xanê ji dayik bûye di heman gundî de zaroktiya xwe borandiye.'[170] Peyva Xanî eşîra wî nîşan dide. Navê bavê wî Mela Îlyas û navê diya wî jî Gulnîgar e. Ehmedê Xanî him xwediyê hizra tesewifê ye û him jî pêgirtiyê Neqşebendî ye.[171]

Ehmedê Xanî di dîrokê de çawa ku bi berhema xwe ya "Mem û Zîn"ê tesîra xwe li ser gelek wêjevanên Kurd hiştibe bi heman awayî li ser Fethî jî hiştiye. Tesîra Ehmedê Xanî di dîwana Fethî de bi van malikan diyar dibe.

Şubhetî Mem ma di zindana firaq

Dil ji ḥicra rûyê Zînê hey hewar (19/10)

Di ḥebsa firqet û dûrê ji nageh ve muqeyyed bûm

Mem im îro di zindanê ku da çû gulruxa Zînam (26/4)

---

[169] Dilovan, *h.b.,* r. 108.
[170] Sağnıç, *h.b.,* r. 344.
[171] Adak, *h.b.*, r. 250-251.

### 2.3. Melê Mihemedê Licêyî (Hadî)

Di sala h. 1268/ m.1852an de li Licêya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Li ba bavê xwe Sibxetullah dest bi ilmê kiriye. Piştî ku li medreseyên muxtelîf ilm tehsil kir re di sala 1891a miladî li ba Mela Xelîlzade Fethullahê Sêrtî îcazeta xwe wergirtiye. Di sala 1880ên Miladî de li Licê di Mekteba Ruştiyê de muallîmtî kir û û di sala 1909ên Mîladî de tayînî muderrîstiya Licê hat kirin. Di 59-60 saliya xwe li Licê wefat kir.[172] Seydayê Licêyî di zanînên şer'îatê de û bi taybetîdi fiqh ûsulî da zanayekî hêja bû.[173] Melê Mihemmed Licêyî di dewra xwe de ji navdartirînê alimên heremê alim û seydayek bû û Fethî jî demek zêde li balê ilmê tehsîl kiriye. Dema ku em li dîwanên wan her duwan dinêrin em dibînin ku Licêyî bi helbestên xwe tesîra xwe li ser helbestên Fethî nîşan daye.

*Ev çarîn û beyta ku li jê re ne her du jî li ser Şêx Evdilqadirê Hezanî hatine nivîsandin. Dema ku li çarîn û beytê bê nihêrtin dê bê dîtin Fethî bi peyva "Meded Seyda" ji helbesta Licêyî re nazîre kiriye.

**Hadî**

Ev 'umrê giran maye ji dest çû bi nezanî

Rû zerd e ji firqet heme wek berka xezanî

Ya leytenî bi elwesile za al xul ciranî

Imdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî[174]

**Fethî**

Ji derd û miḥneta dewran dibêjim ez meded Seyda
Ji daġa firqet û ḥicran meded Seyda meded Seyda (12/1)

[172] Korkusuz, *h.b.*, r. 153-159.
[173] *Dîwana Mela Mihemedê Licêyî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r.18.
[174] *h.b.,* r.35

*Ji bilî ve di dîwana Licêyî de helbesteke bi navê “Ev dilbera rûmahî” heye ku Fethî bi peyvên ‘go û min go’ ji helbesta wî re ji hêla şêwazê ve nazîrê nivîsandiye.

**Licêyî**

Min go: Ji zulfê mişkîn yek merhemek dil dil ke
Go: Merhema ji misk jê tê zerer tewalî

Min go: Bi heqqê zulfeyn pêl bûse dim du le‘leyn
Go: Mahê sewm e bûse şer‘ nadîtin helalî[175]

**Fethî**

Gul hat û go gul im ez hemrengê rûyê yar î
Min go belê welakin ka qedd û qamê ‘alî (49/9)

Serwa çîmen xeram î qametek nişan da
Min go bike te’eddub ka çehvê mestê ġalî (49/10)

### 2.4. Şêx Evdilqadirê Hezanî (qs.)

Navê wî ya rastî Evdilqadir e û bi navên Şêxê Mezin, Evdilqadirê Sanî navdar bûye. Mensûbê tarîqata Neqşîbendiya ye. Şêx dema ku li gundê Resûla melatî dikir bi fermanê murşîdê wî Seydayê Tahî diçe gundê Hezana Liceya Diyarbekirê û li wê derê bi cî dibe. [176]

Dema ku em li dîwana Şêx Evdilqadirê Hezanî dinêrin em dibînin ku Hezanî bi helbesên xwe tesîr li ser Mela Ebdulfettahê Hezroyî hiştiye. Fethî ji helbestê Hezanî ya bi navê ‘Tu Seyda’ re di dîwana xwe de bi paşserwayên ‘Tu Seyda’nazîre nivîsandiye.

[175] *Dîwana Mela Mihemedê Licêyî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r.33.
[176] Korkusuz, *h.b.*, r. 37.

**Şêx Evdilqadirê Hezanî**

Ya reb ev çi nûr e dibînim, tev xal û xedd û rûwê tu Seyda
Dilkul û heyran dimînim, sewda û dil efkarê tu Seyda

Ez aşiqê te husn û cemal im, ey nazikê nazdarî tu Seyda
Can û cigerzarî dinalim, rehmê bike şefqê ke tu Seyda[177]

**Mela Ebdulfettahê Hezroyî**

Çi xweş şah û çi xweş xan î tu Seyda
Di mulkê dil de sulṭan î tu Seyda (11/1)

Bi ġemze afeta can û dilan î
Bi qamet serwê bustan î tu Seyda (11/2)

## 3. NAVEROKA HELBESTÊN FETHÎ

### 3.1. Helbestên Lîrîk:

Bi zimaneke coş bilêvkirina hest, kelecan û tiştên ku ji dil tên re tê gotin. Li gor Cem Dîlçîn ji helbestên lîrîk re 'Di edebiyata Dîwanê de nexasim xezel, murebbe, stran mînak in.'[178]

Di dîwana Fethî exlebeyê helbestan li ser evîn, fîraq û wusleta yarê hatine nivîsandin û ev yek bi şikleke eşkere di dîwanê de tê xuyakirin. Fethî di van helbestên xwe yên ku ji hêla naverokê ve lîrîk in de geh dibe bilbilek û ji kerba fîraqê dinale û geh jî bi hesreta eşqê disoje.

[177] *Dîwana Şêx Evdilqadirê Hezanî,* amd. Mela Birhanê Tarînî, weş. Nûbihar, Diyarbekir 2016, r. 18.
[178] Dilçin, *h.b.*, r. 395.

Dema ku em li helbestên lîrîk ên Fethî dinihêrin em dibînin ku Fethî carinan ji ber kerba eşqê dike ax û zar û efxan. Di vê nalenal û efxanê de tiştekî balkêş heye ku ew jî şopandina rêya helbestvanên klasîk e.

Te cerg û dil li min kir xwûn û berbad

Ji destê te hezar efġan û feryad (18/1)

Ṣorgul û bulbul di gel hev şem‘ û perwane muqîm

Ez tenê meḥrûmê weṣl û zar û giryan û keîb (14/3)

‘Aşiqan yek yek ṭerebnakê wiṣla dilberan

Ez tenê rencûr û dûr û zar û giryan û keîb (14/4)

Fethî di dîwana xwe de piştî demekê dev ji êş û elema eşq û evînê berdide û dest bi êş û elema ku ew ji ber fîrqet û wesletê dikşîne dike. Fethî di vê çarçovê de êşa fîraqa ji yarê dişbîne narê cehhennem û derd û kulên xwe ji ser vê yekê tînê zimên.

Firaqa dilberan teşbîhê nar e

Çi nar e ‘eynî wek narê cehennem (28/52)

Firaqa serwê belayê dil can hinavan ṣoht

Dil can hinavan ṣoht firaqa serwê belayê (44/2)

Fethî di helbestên ku nivîsandine de ji ber êş û elem, derd û kulên ku ew ji ber evînê û yarê kişandine êdî xwe dişbîne kesên ku berî niha ji ber êş û elema eşq, fîraq û wesletê navên wan bi nav û dend bûne.

Gelek ‘Eẕra gelek Leyla û Şêrîn

Te kir wek Wamiq û Mecnûn û Ferhad (18/6)

Helbestvan piştî astekê êdî nema xwe li ber vê êşa eşq, fîraq û wesletê digre û daxwaziya dawî anîna van yekan dike.

Ji dil derhatî ew xarê fîraqê

Nema qeṭ ṣiqleta barê firaqê (28/81)

Dilê min reftî û burdî ela ey dilbera nazik

Bes e ẓulm û cefaya te di gel vê qehr û azarî (46/3)

### 3.2. Helbestên Dîdaktîk

Ji helbestên ku ji bo fikrek bê hînkirin an jî ji bo derheqê mijarekê de şîret, nesîhet û agahî bê dayîn an jî jê ders bê wergirtin tên nivîsîn re tê gotin û hêla van ya hestê lawaz e.[179]

Di dîwana Fethî de helbestên ku ji hêla naverokê ve welk dîdaktîk bi gotineke din şîretamîz hatine nivîsandin bi zimaneke hêsan û herikbar hatine nivîsandin. Fethî di van helbestên xwe di warên cûrbecûr de şîret û nesîhetan dike. Me çend malikên ku tê de Fethî dixwaze şîret û nesîhetan bike ji dîwana wî girt û me li jê re nîşan da.

Munebbeh be ey ‘arifê bû el-kemal

Bibêjim ji bo te beyanek delal (1/1)

Qena‘et ke mebe ‘aciz ji bo wan

Ji te erḥemtir e ew Rebbê reḥman (7/24)

[179] Dilçin, *h.b.*, r. 397.

Divêtin ger bi qencî bî muweṣṣef
Tu qenc teḥṣîlekî ke ey mukellef (2/1)

Bi meṭlûba dil û canê xwe şa be
Bi meqṣûda xwe şad û dilkuşa be (8/3)

### 3.3. Helbestên Tesewûfî:

**M**ela Ebdulfettahê Hezroyî weke ku me berî niha jî gotibû ku hêj ji biçûkayiya xwe ve li medreseyên heremê dest bi tehsîlkirina ilmê kiriye û her tim întîsabê şêxekî kiriye. Her wiha mirov dikare bibêje ku ew di her tim di bin sîwana terîqeta Neqşîbendî de maye. Dema ku em di çarçoveya vê heqîqetê de li dîwana wî dinêrin em dibînin ku Fethî bi peyvên tesewûfê re gelek zêde hemhal bûye û di helbestên xwe de gelek zêde wan peyvan bi kar aniye.

Hinek têgihên tesewûfê yên ku me di dîwana Fethî de tespît kirine ev in:

**Mest** û **mexmûrê şerab** û **badeyê saqî** ne tev
Ez tenê mexmûrê ḥuzn û zar û giryan û keîb (14/9)

Çi xweş **şah** î çi xweş **mah** î **ṭerîqet** ra tu şehrah î
Bi te çêbûne gumrah î meded Seyda meded Seyda (12/17)

Ḥeyate ittiṣafa wî bi weṣfan
Dikit teṣḥîḥê ya ẕel fežl û **'irfan** (2/43)

Şahê feqîr û hem geda **zahid û ṣûfî** yû mela
Dîtine wan gelek cefa kerî bi kerî celeb celeb (16/8)

Ji wan me dûr meke ya reb di **dunya** û di **'uqbayê**
Bibên amîn gelî **yaran** dema bê dengê amînam (26/2)

Neşterê pûlan e ya mujganê xûnxwarane ev
Neş'eya **mey** ya nikahê çehvê meyxwarane ev (23/1)

Neẓma nucûma şewûşî reş bû li me 'eyş û xweşî
Teḥl bû li me **ab**a xoşab kerî bi kerî celeb celeb (16/4),

**'Aşiq û me'şûq** îro ew di gel hev hem'inan
Ez tenê dûr û ġerîb û zar û giryan û keîb (14/7)

Me gelek zarî ji **dergahê** ḥebîbê xwe dikir
Me nedî feyde ji wî ṣewt û ṣedayê ku me kir
Dest bi **ahîn û fiġanan** û hezar nale me kir
Me nema rah û **ṭerîqet** ne di bedwê ne şehir
Ji **cefa û eleman** bûne cigerxûn û birî (31/9)

Bi wî geş bû **dil û qelbê murîdan**
Di nav **şêx** û mêla û muste'îdan
Çi xweş gul bû melaẕa bê umîdan
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban (35/11)

## 4.HÛNERÊN EDEBÎ

### 4.1.Teşbîh

Teşbîh, ji du tiştên ku di naveyna wan de pêwendî heye tiştên zeîf şibandina tiştên qewî ye.[180]

Fethî di muxemmesa li jêrê di şûna peyva yarê de peyvên 'Serwê baġê şeref' û ' Bedrê ewcê teref î' bi kar aniye û hûnera teşbîhê bi kar aniye.

---

[180] Pala, *h.b.,* r. 452.

**Serwê baġê şeref î** şaxê gulistanê cemal
**Bedrê ewcê teref î** mahê di bostanê kemal
Bûne perwane û bulbul li te perwerd û şemal
Ne tenê ahê dikêşim ji ewan le'lê delal
Bendeyê zulfê siyah im ẕeqen û xeddê şirîn (31/27)

Fethî di muxemmesa li jêrê de jî êş û elem, renc û azara ku ew ji ber fîraqa yarê dikşîne tînê ziman. Dema ku Fethî qala vê êş û elemê dike xweşikbûn û bedewbûna yarê dişbîne 'bulbulê şeyda' û 'gulek nazik.' Seyda bi van her du gotinan hûnerê teşbîhê bi kar aniye.

Ji firaqa te dikêşin gelekî êş û elem
Ji xiyala te ne mecrûh ji ser ta bi qedem
Her **wekî bulbulê şeyda** ne di ġemxaneyê ġem
Tu **gulek nazik î** ey xwace di gulzarê irem
Ya tu rûḥ î û mucerred qefesa şubhê leşîn (33/5)

#### 4.2.Îstiare

Tiştekî ji bilî navê xwe bi navê tiştekî ku dişbihê bîr anîn e. Ji ber vê yekê îstîare him hûnera mecazê ye him jî ya teşbîhê ye. Ji ber vê taybetiya îstîarê divê di îstîarê de ev wesf hebin: Divê peyv ji bilî wateya xwe ya rastî ji bo tiştekî bûbe nav, divê ne mimkun be ku peyv di wateya xwe de bê bikaranîn, pêwîstiya qesda şibandinê.[181]

Fethî di her du malikên li jêrê de peyvên 'Nêrgiz' û ' Cebheta ayîneya Iskender' di şûna kesayet û yarê de bi kar aniye. Her du peyvên ku Fethî di helbestên xwe de bi kar aniye ji bo tiştekî bûne nav. Bi vî awayî gotin hûnera teşbîhê daye paş û lîbasa hûnera îstîareyê girtiye li ser xwe. Di her di malikan de ji bilî îstîareyê teşbîh jî heye.

**Nêrgiz** bi çavê mestan xweş xweş li min neẓer kir
Min go ti bê neşatî ka lefẓê wek lu'alî (49/11)

[181] Dilçin, *h.b.*, r. 412.

‘Eskerê darayê nefsê xweş perîşan e li pêş

**Cebheta ayîneya Iskender** asayê Selîm (27/16)

**4.3.Mecaz-i Mursel**

Ji bikaranîna peyvekê li derveyê maneya wê ya rastî û ji bilî qesda şibandinê re tê gotin. Di biwêjan de gelek zêde ev cûreya hûnera edebî heye.[182]

Fethî di malikên jêr de dema êş û zara ku ew dikşînê peyva ‘dil kebabê’ û dema wesfê yarê dide jî peyva ‘qamet elîfê’ bi kar tînê ku ev bikaranîn weke ku me li jorê diyar kir jî li derveyê maneya xwe ya rastiyê ye. Ev bikaranîna ji bo diyarkirina rewşa wî ya ku ew tê de ye û ji bo diyarkirina wesfa yarê ye.

Hezarê dil hezaran **dil kebab** in

Ji şewqa gulbena van keç kulahan (32/7)

Tê ji nik wî dilbera ṣorgul xeda **qamet elîf**

Hem muşerref hem mu‘eṭṭer bi zulf û xalê ‘enberîn (36/6)

**4.4.Teşhîs/Întak:**

Di edebiyatê de heywan û tiştên necandar weke ku wek însanan diaxavin nîşandayînê re hûnerê teşhîs/întak tê gotin. Teşhîs ji bo hinek tiştên razber û eşyayên ku axavtin û hestên wan tuneye; întak jî tenê ji bo heyberên ku axavtina wan tuneye tê bikaranîn. Di her întakê de teşhîs heye lê di her teşhîsê de întak tuneye.[183]

Di helbestên Fethî yên li jêrê de peyvên ‘gul, binefş û sunbul û sosin’ taybetiyên însanan girtine li ser xwe, hinek ji wan diaxivin û hinek jiwan jî wek însanan temaşayê dikin ku di vê bikaranînê de hûnera teşhîsê heye.

**Gul hat û go gul im** ez hemrengê rûyê yar î

Min go belê welakin ka qedd û qamê ‘alî (49/9)

[182] Dilçin, *h.b.*, r. 414.
[183] Pala, *h.b.,* r. 452-453.

**Binefş û sunbul û sosin** seraser tên temaşayê
Eger carek xwiyakî ey gula gulzar û nesrînam (26/7)

Di malika jêr de jî bi riya teşbîhê taybetiya feryadkişandinê ku ev taybetî ya însên e weke bilbil bi xwe jî wek însan feryad dikşîne hatiye nîşandan ku di vir de jî hûnera teşhîsê heye.

Ṣorgula xeddê te hinkî buşkuvî
Fetḥî bû **bulbulşifet feryadixwan** (34/10)

### 4.5.Tenasûb

Dudo an jî zêdetir biwêj, term an jî peyvên ku di naveyna wan de ji hêla wateyê ve pêwendî heye, bêyî ku di nav wan de tezad hebe digel hev bikaranînê re tê gotin.[184]

Dema ku em li muxemmesên li jêrê dinêrin em dibînin ku peyvên mîna baġ, çimen, gul, gulzar, sosin, sunbul, nesrîn, serw, gulistan, bostan, perwane û bulbul hatine bikaranîn ku di naveyna van de bêyî ku tezad hebe hatine bikaranîn û di naveyna wan de ji hêla wateyê ve jî pêwendî heye.

Bi te bû rewneqî **baġ** û **çimenê** şer‘ê Resûl
Bi te ḥey bû demekî ey **gulê gulzarê** qebûl
**Sosin û sunbul û nesrînê** didan lafê fużûl
Tu dema bûyî nihan bûn ḥemî ew jar û melûl
Man di leb teşnekî û her we di teyhê ‘aṭeşîn (33/9)

**Serwê baġê** şeref î **şaxê gulistanê** cemal
Bedrê ewcê teref î mahê di **bostan**ê kemal
Bûne **perwane û bulbul** li te perwerd û şemal

[184] Pala, *h.b.*, r. 448.

Ne tenê ahê dikêşim ji ewan le‘lê delal

Bendeyê zulfê siyah im z̲eqen û xeddê şirîn (31/27)

### 4.6. Lef û Neşr

Di misreya yekem a beytekê de gotina herî kêm du tiştan û di misreya duyemîn a heman beytê de jî gotina peyvên ku berewajî an jî teşbîhên wan bi kar anîn e.[185]

Di misreya yekem a beyta li jêrê peyvên qedd û bejnê hatine bikaranîn û di misreya duyemîn de peyvên serw û şimşad ên ku pêwendiya wan bi peyvên misreya yekem re hene hatine bikaranîn ku ji ber vê yekê di beytê de hûnera lef û neşirê heye.

Bi **qedd û bejn** û balayî esef da serw û şimşadan

Esef da **serw û şimşadan** bi qedd û bejn û balayî (44/10)

Bi heman awayî di misreya yekem a beyta li jêrê peyvên ehlê şer, nar û ezab hatine bikaranîn û di misreya duyemîn de peyvên ehlê xeyr, cennet û kewser ên ku berawajiya peyvên misreya yekem in hatine bikaranîn ku ji ber vê yekê di beytê de hûnera lef û neşir heye.

Ji **ehlê şerrê** ra **nar** û **‘ez̲ab** e

Ji **ehlê xeyrê** ra **cennat** û **kews̲er** (3/18)

### 4.7. Tecahulî Arîf

Ji gotina rastiyeke ku tê zanîn bi riya nukteyekê weke nayê zanîn gotin re tecahulî arîf tê gotin. Ango ne qet nezanîbûn ne jî veşartina tiştê ku tê zanîn e.[186]

Helbestvan di her du beytên jêr de rastiyeke ku di eslê xwe de tê zanîn weke ku nizane eşkere dike ku digel vê helwesta xwe di beyta yekem de hewil dide heyirîn û ecêbmayîna ji ber bedewbûna yarê û di beyta duyemîn de hewil dide pesna miska xeten bide.

Neşterê pûlan e ya mujganê xûnxwarane ev

---

185 Dilçin, *h.b.*,r. 437.
186 *h.b.,* r. 441.

Neş’eya mey ya nikahê çehvê meyxwarane ev (23/1)

Eger reş nîn bûwa miska xoten dê ev qeder qîmet

Çira xelqê bida miskê bi ṣed zar ey mesîna reş (20/35)

### 4.8.Husnu Tahlîl:

Sedama pêkhatine tiştekî rast bi xewn û xeyalan ve girêdan e. Lê divê bingeha vê sedemê bi hukmeke teqez be.[187]

Di misreya yekem a beyta li jêrê de sedema ber bi ‘edemê ango tunebûnê ve çûyîna şehd û şekerê bi şêrîniya yarê ve hatiye girêdan.

Ne ji şêrîniya te şehd û şiker çûne 'edem

Tu bizane ku melayê te me wê perdê hilîn (30/13)

Bi heman awayî di misreya duyemîn a beyta li jêrê sedema xemilîna xurşîd û tav wek nûra yarê tê diyarkirin ku di vir de jî hûnera edebî ya husu tahlîlê heye.

Tu hilîn perde hicabê me û ’alem bike zew

Ku ji nûra te ye xurşîd û hilal tev xemilîn (30/14)

### 4.9. Mubalaxa:

Di edebiyatê de ji bo tesîra gotinê bê zêdekirin tiştekî weke ku nabe an jî ji wesfê wê zêdetir an jî kêmtir nîşandan e.[188]

Di beyta li jêr de helbestvan temamê milkê alemê bi qasî nezer û nêrîneke Selîm bi qedr û qiymet nabîne. Ango nêrîn û nezereke wî ji temamê malê dinyayê bi qedr û qiymettir e. Helbestvan bi vê gotina xwe di helbesta xwe de hûnera mubaxaleyê bi kar aniye.

Mulke ‘alem ser bi ser nahêjitin yek neẓrekî

---

[187] *Dilçin, h.b.*, r. 443.
[188] Pala, *h.b.*, r. 338.

Ez kenarê goşeyê van çeşmê şehlayê Selîm (27/7)

Helbestvan di beyta jêr de jî êş, derd û xema ku ew ji ber fîrqeta hezkiriya xwe dikşîne dişbîne êş û elema ku Ferhad ji ber Şîrîn dikşîne ku ew êş û elem bi qasî hezaran çiyayên xemê tê wesfandin. Di vir de jî mubaxele heye.

Hezaran kûhê derd û ġem dikêşim şubhetî Ferhad

Nehin qeṭ kes xwedan xeyrek xeber dit ji alê şêrînam(26/3)

### 4.10.Tezad

Digel hev qalkirina şibandin an jî wesfên berewajî yên du fikr, xeyal an hestan re tezad tê gotin. Ji termên bedî ye û bi navên tibak, mutabakat, tatbîq û tekafûyê jî tê naskirin.[189]

Di van beytên jêr de bi peyvên ku hatine reşkirin tezad hatiye kirin.

Her mekan îro li wan **darul surûre** bêguman

Ez tenê di **beytul ḥuzin** da zar û giryan û keîb (14/5)

Ji **ehlê şerrê** ra **nar** û ‘ez̠ab e

Ji **ehlê xeyrê** ra **cennat** û kews̠er (3/18)

### 4.11.Tekrîr

Ji bo tesîra gotinê bê zêdekirin wan peyvên ku wate lê hûr bûne li dûv hev bi rêz kirin e.[190]

Di beytên jêr de ji bo bandora gotinê bê xurtkirin peyvên ku hatine reşkirin hatine dûbarekirin.

**Hewar** e hey **hewar** e min ji derdê vê **mesîna reş**

Dil û can û ciger kul bû ji derdê vê **mesîna reş** (20/1)

---

189 Pala, *h.b.,* r. 455.
190 Dilçin, *h.b.*, r. 452.

Werne vê şîn û girînê **hey hewar**

Ḥuzn û şîna nazenînê **hey hewar** (19/1)

**4.12.Nîda**

Di edebiyatê de ji bo diyarkirina şaşbûn, kêfxweşî, hersbûn û hestên mîna van bilindkirina dengê an jî bangkirinê ye. Di dirûva peyvên mîna "Ey, eya, ya, hey, amîn" xwe nîşan dide.[191]

Di beytên jêr de bi peyvên 'îlahî' û 'Ey dilruba' hûnera edebî ya nîdayê hatiye kirin.

**Îlahî** reḥmeta te bo me meqṣûd

Li Fetḥî tu birêjî feyżê ji her der (3/62)

**Ey dilrubaya** nazenîn ey gewher û le'lê s̱emîn

Napirsî qe li ḥalê ḥezîn karê te her cewr û cefah (37/5)

**4.13. Îstîfham**

Ji bo bal û dîqet zêdetir bên kişandin tiştê tê xwestin bê gotin bi riya pirsê vegotin e. Bi vî awayî nîşandana hest û ramanan balkêşiyê dide peyvê. Divê hêviya bersivê ji îstîfhamê neyê kirin. Lewra sedema wê hest û kelecan e.[192]

Di her du beytên jêr de bi peyvên ku hatine diyarkirin ji bo wate xurttir bibe û ji bo bal bên kişandin, hûnerê îstîfhamê hatiye bikaranîn. Weke ku ji wateya di beytan de de kifş dibe mirov tu bersivê ji pirsan hêvî nake; lewra ji ber kelecan û hestê pirs hatine pirskirin.

Gelek îro birîndar im ji hicra Ḥeżretî S̱anî

Gelek mecrûḥ û bîmar im **gelo kan Ḥeżretî S̱anî** (48/1)

Li min carek **çira** nakî tereḥḥum

[191] Pala*, h.b.,* r. 358.
[192] *h.b.*, r. 240.

Tereḥḥum pir xweş e ey serwê azad (18/15)

### 4.14. Telmîh

Bi bîr xistina bawerî, gotina pêşiyan, meselok, mijarên ilmî, qissa, bûyer an jî şexsekî/ê navdar a/ê ku ji teref hemû kesan ve tê zanîn.[193]

Di beyta yekem de ji ber fîraqê ji qisseya Mem û Zînê û di beyta duyemîn de jî qisseya Hz. Yûsufê ku birayê wî ew avêtibûn çalê telmîh hatiye kirin.

Di ḥebsa firqet û dûrê ji nageh ve muqeyyed bûm
Mem im îro di zindanê ku da çû gulruxa Zînam (26/4)

Di mulkê ġem şehinşah im ji kerban Yusûfê çah im
Şeva ṭariyy û hem mah im gelo kan Ḥeżretî Ṣanî (48/20)

### 4.15. Îqtîbas

Ji bo gotin qewî û bihêztir bibe bikaranîna ayet, hedîsan e.[194]

Di van beytên jêr de ayetên '*înneke leminel-murselîn*' '*tilke ḥuccetuna*' '*welew ennena*' û yên mîna wan ji Qur'ana Kerîm hatine îqtîbaskirin.

Wek mînak:

إِنَّكَ لَمِنَ الْمُرْسَلِينَ

"Bêşik tu ji pêxemberan î."[195]

Bi Yasîn û Ṭaha di kelamê mubîn
Wî got *înneke leminel-murselîn* (1/31)

---

193 Dilçin, *h.b.*, r. 461.
194 *h.b.,* r. 465.
195 Yasîn: 36/3

وَتِلْكَ حُجَّتُنَا آتَيْنَاهَا إِبْرَاهِيمَ عَلَى قَوْمِهِ نَرْفَعُ دَرَجَاتٍ مَّن نَّشَاء إِنَّ رَبَّكَ حَكِيمٌ عَلِيمٌ

"Ha ev delîlên me ne, ji bo ku li hemberî qewmê xwe pêk bîne me daye Îbrahîm. Em kî bixwazin wî bi payeyan bilind dikin. Rebbê te xwedî hikum û hîkmet e û zana ye."[196]

Di wê ayeta *tilke ḥuccetuna*

Di en'am û berya welew ennena (1/20)

**4.16. Kînaye**

Di edebiyatê de ji gotineke ku dê bê du wateyan bi şikleke ku mecazî bê fêmkirin bikaranînê re tê gotin. Di kînayê de him wateya rastî him jî ya mecazî heye. Lê di kînayê de wateya mecazî ji ya rastî xurttir e.[197]

Di beyta jêr de yar ango maşûq bi mîna ġunça dehanê nazik tê wesifandin. Ji vê aliyê ve bikaranîneke mecazî heye. Weke nebata ku cûreyeke ji kulîlkan e dema ku mezin dibe û bejindirêj dibe vedibe. Ji vê hêlê ve jî gotin wateya rastî di nav xwe de dihewîne. Lê dema ku li beytê tê nihêrtin tê dîtin wateya mecazî ji ya rastî xurttir û bi hêztir e.

Vekir ġunça dehanê nazik û ter

Di babê 'uzirxwahê kay simenber (6/54)

Di beyta jêr de helbestvan rewşeke dilşewat a ji ber hezkirinê diyar dike û ji bo vê yekê jî biwêjên 'çav li rê' û 'guh li …' bi kar tîne. Ev her du gotin him tên wateya mecazî û him jî ya rastî. Lê belê di gotinê de wateya mecazî bihêztir e.

Mubtela û dilfekar û derdinak û sîneçak

Çav li rê û guh li dergeh zar û giryan û keîb (13/8)

[196] En'am:6/83
[197] Pala, *h.b,* r. 276.

### 1.17. Dîrok

Bi hisaba ebcedê ya bi tîpên Erebî nîşandana sala bûyerekê ye. Ji hûnera ku di vê riyê de tê kirin diyarkirina tarîxê tê gotin.[198]

Her weke di misreyên duyemîn ên her du beytên li jêrê tê dîtin, helbestvan dîroka wefatê yên kes/an bi tîpên Erebî li gor hisaba ebcedê nîşan daye.

Bibêj ey Fetḥiyê dilkul ku tarîxa wefata wan
Di sala mîm û bê dabû di piştî ġeyn û hem şînam (26/23)

Riḥleta wî da me tarîxa wefat
Ġeyn û mîm û bê û şînê hey hewar (19/25)

### 4.18. Mulamme

Ji xezelên ku bi çend zimanan bi şikleke tevlîhev hatine nivîsîn re Mulamme tê gotin. Exlebe misra yekem a beytekê bi zimanekê û misreya duyemîn jî bi zimaneke din tê nivîsîn.[199]

Di beytên li jêrê misreya yekem a beytan bi Kurdî û misreyên wan a duyemîn jî bi Erebî hatine nivîsîn.

Li diyarê te xerîb im ey tu kehful-ġureba
Ṭale ma lem nere minkel-luṭfe Ellahu cezak (25/1)

Nehin ku kes ḥalêm bibêje ḥebîbî
Leqed ża‘e ‘umrî we żaqe iṣṭibarî (50/3)

## 5. TIŞTÊN KU DERHEQÊ FETHÎ DE HATINE GOTIN

Me di beşên ku heta niha hatin dayîn de qala gelek tiştên muhîm û pêwîst kir ku ev yek bi ya me diviyabû hebin. Em dixwazin di bin vê sernavê de jî qala hinek

[198] Dilçin, *h.b.*, r. 502.
[199] *h.b.*, r. 506.

malûmatan bikin ku hinek ji van hêj dema ku Seydayê Hecî ango Fethî sax bû û hinek ji wan jî piştî ku rehmet kiriye derketine holê.

Weke ku berî niha hatibû diyarkirin seyda Mela Ebdulfettahê Hezroyî di 10-12 saliya xwe de dest bi tahsîlkirina ilmê kir, piştî ku tahsîla medresê qedand re di sala 1916an de ango di 24 saliya xwe de dest bi muderrîstiyê kir û nêzî 52 salan vê muderristiya xwe domand û bi sedan feqî li ber destên wî mezin û perwerde bûn. Seyda her wiha merivekî jîr û jêhatî û edîb bû û ji teref derdora xwe ve jî pir zêde dihat hezkirin. Dema mirov 52 sal muderristiya wî, feqiyên ku li ber destên wî perwerdehî dîtine û ji teref derdorê ve muhabbeta ku li hember hatiye nîşandan li ber çavan bigre ew ê fêm bike ku ka Seyda alimekî çawa ye. Em dixwazin tiştên ku derheqê Seyda de hatine gotin bikin 2 beş:

### 5.1. Tiştên ku Berî Wefata Wî Hatine Gotin:

Mamoste Mehmet Yalarê ku ji telebeyên Seyda Fethî telebeyek e berî wefata wî di derheqê seydayê xwe de 2 texmîs, 3 medhiye û qesîdeyeke mulemma( misreyek bi Farisî û misreya din jî bi Erebî) nivîsandiye. Li gor destxeta li ber destê me, Mamoste Mehmet Yalar li ser her du helbestên jêrê yên Mela Ebdulfettahê Hezroyî texmîs nivîsandiye.

‘Îd e û herkes muferreḥ ew ji dîdara ḥebîb
Ez tenê meḥcûrê yar û zar û giryan û keîb (14/1)

Dil yek e dilber dê yek bit dilrûbayê her zeman
Dilnewazî gah gahe cewr û miḥnet her zeman (29/1)

Her wiha Mela Ebdulhey jî li ser helbesta bi navê ‘Te bi nazan kirî mecrûḥ û birîndar û ḥezî’ya Fethî texmîsekê nivîsandiye.

### 5.2. Tiştên ku Piştî Wefata Wî Hatine Gotin

Piştî ku Fethî di sala 1975an de wefat dike, Mamoste Mehmet Yalar bi mexlesa Hamdî li ser seydayê xwe mersiyeke bi navê ‘Rojek ji nageh em bûn agah’ dinivîsîne.

Mela Abdusselam Yalarê ku bavê Mamoste Mehmet Yalar bi xwe ye, piştî ku Mela Ebdulfettahê Hazroyî wefat kir re li ser wî mersiyekê bi navê 'Ustadê min dilrûbayê zîba' nivîsandiye ku ev helbest bi Farisî ye. Her wiha helbesteke bi navê 'Saqiya bîne kûza şerabê.'jî nivîsandiye û ev helbest jî bi bi Kurmancî ye.

Ji bilî van, Evdirrehman Efem jî mersiyeke bi navê 'Ey Fethiyê Keremkar delal û xûb û zîba' li ser Fethî nivîsandiye.[200]

[200] Fotokopiya temamê van helbestên ku me qala wan kir li cem hene.

## BEŞA ÇAREMÎN

## METNÊ DÎWANÊ YÊ BI TENKÎD

1[201]

fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl

Muteqarib + – – / + – – / + – – /+ –

1. Munebbeh be ey ‘arifê bû el-kemal
Bibêjim ji bo te beyanek delal

2. Çiqas enbiya û resûlê Xweda
Hemî pêşewa ne hemî muqteda

3. Siracê munîr in ji bo ummetan
Ṭebîb û ḥekîm in ji bo milletan

4. Feṣîḥ in belîġ in ṣiddîq in emîn
Kirin reddê xeṣman bi lefẓê şêrîn

5. Heye pir feṭanet ji bo ẕatê wan[202]
Bi ‘eql û ẕeka red kirin duşmenan[203]

6. Bi lefẓê şêrîn û kelamê feṣîḥ
Bi xelqê gihandin wî emrê melîḥ

7. Ji ‘ezl û gunahan xwedan ‘iṣmet in
Di emr û di nehyan xwedan diqqet in

[201] Ev helbest di destnivîsên (A) û (M)yê de nîne
[202] Heye pur feṭanet ji bo ẕatê wan (X), (Z)
[203] Bi ‘eql û ẕeka red kirin duşminan (X), (Z)

8. Li ser wan ṣelat û selamê Xweda
Ji erżê ḥeta ʻerşê pakê Xweda

9. Li me lazime bawerîkê temam
Bi pêġemberiyya nebiyê di ḥumam

10. Di ḥeqqê resûlan bi ʿursalê wan[204]
Li nik wî Xwedayê ku xellaqê can[205]

11. Bi nav xelqê da emr û nehyê di ḥeq
Ku teblîġê wan kir bila mal û ḥeq

12. Bizanin cemîʻê nebî û resul
Hemî ḥeqq in û ḥeqiyyê kin qebûl [206]

13. Di her qernekî da Xweda ẕatekî
Ku meʻṣûm e ez ẕenb û reyb û şekî

14. Bi nava cihanê şihandî yeqîn
Xweda xaliqê asiman û zemîn

15. Heçî lazim e ew di ḥeqqê me ʻam
Ji teṣdîqê ʻalî cenabê kiram

16. Eve ku me gotî bi dil guh bidê
Ku da te xelaṣ ke ji agir Xwedê

[204] Di ḥeqqê resûlan bi ʻirsalê wan(X), (Z)
[205] Ji nik wî Xwedayê ku xellaqê can (X), (Z)
[206] Hemî ḥeqq in û ḥeqiyê kin qebûl(Z)

17. Welêkin mufeṣṣel bizane temam
Ku ev bîst û pênc enbiyayê humam

18. Xwedayê ku anî wucûdê cihan
Di Quranê de ẕikir kirye evan

19. Ji van bîst û pêncan bigirde temam
Di peyde di gel heştê dî bûn nizam

*20.* Di wê ayeta *"tilke ḥuccetuna"*
Di en'am û berya welew ennena

21. Xweda neẓm kirye di kilamê mubîn[207]
Muqeddem Birahîm û Îsḥaq çunîn

22. Di pey wî de Ye'qûb û Nûḥ e bizan
Di pey Nûḥ de Dawûd e bê guman [208]

23. Suleyman û Eyyûb û Yusûf yeqîn
Di pey wî de Mûsa û Harûn bibîn

24. Di gel Zekeriyya û Yeḥya çunîn[209]
*"We 'Îsa û Îlyas mineṣ-ṣaliḥîn"*[210]

25. Di pey 'atifa bi ser Biraḥîm bibîn
Sima'île ve Elyese' hem çunîn[211]

---

[207] Xweda neẓim kirye di kilamê mubîn(X,Z)
[208] Di pey Nûḥî de Dawûd e bê guman (Z)
[209] Di gel Ẕekeriya we Yeḥya çunîn(Z)
[210] *We 'Îsa we Îlyas mineṣ-ṣaliḥîn (X,Z)*
[211] Sima'îl û Elyese' hem çunîn(X,Z)

26. We Yûnis û Lûṭen û kullen metîn
Mufeżżel gerandin *“ ‘elel-‘alemîn”*[212]

27. Heçî munteẓem bûn di vê ayetê
Me anîne beytê di gel diqqetê

28. Ewê dî bizane tu Îdrîs û Hûd
Şu‘eyb û di gel Ṣaliḥê bi ah wedûd

29. Di pey wî de Ẕulkifl û Adem bizan
Di pey wî de Ṣultanê herdu cihan

30. Ḥebîb û şefî‘ê di me ‘aṣiyan
Xweda ixtiyar kir ji nav enbiyan

31. Bi Yasîn û Ṭaha di kelamê mubîn
Wî got “înneke leminel-murselîn”

32. Welê lazim e em mufessir bibin
Ji tefṣîlê ra muqteṣir hem bibin

33. Eger ‘erżeke yek nubuwwetê van
Bike i‘tiraf û muqirrî bi an

34. Ku pêġember e hem resûl e yeqîn
Ne ku ḥifẓê navan xilafe hemîn

[212] Mufeżżel gerandî *‘elel- ‘alemîn(*X)

35. Ḥifẓ ke evê neẓmê pakê temîz

Ku da tu li nik her duwan bî ‘ezîz

36. Xelaṣî ji narê cehennem ṭeleb

Bike tu ji bo **Fetḥîyê** bê edeb

2[213]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Divêtin ger bi qencî bî muweṣṣef

Tu qenc teḥṣîlekî ke ey mukellef

2. Di zanîna furûżat û lewazim

Bi roj û şev bi can û dil be cazim

3. Heçî mayî’ resûl pê bûye mursel

Bigir nehya xwe ke ji menhiyê muhmel

4. Bizane wacib û hem musteḥîlan

Di gel ca’iz wiha rengê delîlan

5. Di ḥeqqê Rebbê ‘alem ẕul-celalî

Wiha reng e resûlêd xwey kemalî

6. Temam pênc e ‘eqîde ey birader

Tu guhdêre bi qelb û dil ke bawer

[213] Ev helbest di destnivîsên (A) û (M)yê de nîne

7. Du qism in ê Xweda û ê resûlan
Welê her qismekî sê new‘in ey can

8. Yekî sê new‘ê ewwel wacibat in
Ji wan ra jî bizan çar ṣinfîhat in

9. Ji mis̱lê ṣinfê ewwel ra birader
Ṣifatê nefsiye dibêjin seraser

10. Ji vî ṣinfî wucûda ẕul-celal e
Xweda mewcûd e ba ‘izz û kemal e

11. Di xaric da s̱ubûte wehm teḥeqquq
Ji bo ẕatê Wî ev ḥucb û te‘elluq

12. Bibûya ger ji me merfû‘ û mekşûf
Bidîta dê me wî bê keyf û hemkûf

13. Di gel ẕatê yek in ya ġeyr in eslem
Divê imsake iẕ la neḥnu ne‘lem

14. Li mewcûdiyeta Rebbê celîl e
Wucûda cumle mewcûdan delîl e

15. Ji bona ṣinfê S̱anî ra ṣifat in
Di selbiye dibên ev pênc ṣifat in

16. Çiku me‘nayê van tev nefî û selb in
Ji bo mayê’ ku neqs û hem xelel bin

17. Qidem ye‘nî nehîna ewweliyet

Beqaya’ Wî nehîna axiriyyet[214]

18. Xilafa ḥadiṣan ye‘nî ne miṣlî

Ne hemtayî ji bo mewlayê ‘alî

19. Tu nînin dest û çav û pa û qamet

Ne ‘erż û ṭûl û kurtî û żexamet

20. Qiyama Wî bi nefs me‘na wî ey tac[215]

Bi bal ẕat û muxeṣṣis ve ne muhtaç

21. Ġenîyye ji ẕatekî ku pê be qa’îm

Wiha reng e ji mûcid ey mula’îm[216]

22. Delîla van ḥudûṣ û baṭiliyyet

Teselsul gerdiş û hem da’iriyyet

23. Li weḥdaniyyeta ẕat û ṣifatan[217]

Di gel ef‘alê bûna ka’inatan

24. Ji ecza û ji cuz’iyyan murekkeb[218]

Nehin ẕat û ne curmê la yurekkeb

25. Te‘eddud miṣliyet der weṣf û şirket

Ji bo ġeyran di fi‘lan nînin elbet

---

214 Beqaya’ Wî nehîna axiriyet(X), (Z)
215 Qiyasa Wî bi nefs me‘na wî ey tac(Z)
216 Wiha renk e ji mûcid ey mula’im (X), (Z)
217 Li weḥdaniyeta ẕat û ṣifatan(X), (Z)
218 Ji ecza û ji cuz’iyan murekkeb(X), (Z)

26. Nehin tefrîq û teḥrîq ji av û agir
Kesê bawer ke vê zindîqe kafir

27. Dibit fasiq bi bal quwwetke nisbet
Ku tê danî Xweda ew bê muruwwet

28. Dibit cahil ku bawer ke telazum
Texelluf nîne mumkin merdê cazim

29. Dibit mu'min kesê bawer ke te'ṯîr
Ji ġeyrî ẕatê mewla nîne teqdîr

30. Texelluf mumkin e xaric dibit ev
Ji girdaba hilaka sabiqan tev

31. Ji bona ṣinfê ṯaliṯ ra ṣifat in
Me'anî ew dibên ev heft ṣifat in

32. Wucûdî ne ne 'eynê ẕatê pak in
Ne ġeyrê ẕunfiṣal we ẕunfikak in

33. Qedîm û qa'imê bi ẕatî ne qudret
Dikit îcad û i'dam û iradet

34. Dikit texṣîṣê ḥalê mumkinatan
Ji ewṣaf û ji ezman û cihatan

35. Bi ġeyrê mumkinat nakin te'elluq
Nekin da qelb û teḥṣîlan teḥeqquq

36. Şeş in mumkin meqadîr û cihat in
Wucûd û emkine weqt û ṣifat in

37. Heye li exẕa furû‘an qudreta reb
We gerne ‘aciz ev cehla murekkeb

38. Çiku exẕa furû‘an nîne mumkin
Te‘elluq girtina pê nîne mumkin

39. Bi ‘ilmî keşfê me‘lûman dibit tev
Xefa sebqa xefa jê tê nehin tev

40. Te‘elluq girtina ‘ilmî bi wacib
Bi ca’iz musteḥîlan bûye wacib

41. Dizanit cumle mewcûdat û me‘dûm
Bi tefṣîlatê wan mewlayê qeyyûm

42. Ne kespî ne bedîhî bê bidayet
Ji me‘lûmatê ra nînin nihayet

43. Ḥeyate ittiṣafa wî bi weṣfan
Dikit teṣḥîḥê ya ẕel feżl û ‘irfan

44. Te‘elluq girtina wî nîne mewcûd
Delîla van wucûda cumle mewcûd

45. Bi sem‘ û hem beṣer ey merdê me‘rûf
Dibîtin cumle mewcûdatê mekşûf

46. Welê her yek ji ya dî tir muġayir
Wekî ‘ilmî bizan lê ‘eqle qaṣir

47. Bi çav û guh nehin nakin te‘elluq
Ji bil ṣaḥib wucûd û ẕî teḥeqquq

48. Dibîne cumle mesmû‘at û mubṣer
Diket seḥ herduwan jî ew di her der

49. Kelamê wî ji herf û ṣewt û terkîb
Munezzeh tê nehin teġyîr û tertîb

50. Bina û sûre û i‘rab û muhmel
Nehin ayat û ev elfaẓê munezzel

51. Ne medlûlatê van elfaẓê ḥawî
Welê medlûl û medlûl in muṣawî

52. Kelamullah û Quran navê wan in
Welê elfaẓê mexlûqê Xwedan in

53. Mebêj bo herduwan mexlûq û ḥadiṯ
Ji bo wehma ḥudûṯa ġeyrê ḥadiṯ

54. Mu‘elleq cumle hin ey ehlê sunnet
Delîla hersiyan Qur´an û sunnet

55. Ṣifat mewqûfê fi‘l in yane ey can

Dela’il ‘eqlî û neqlî ne ẕî şan

56. Ji ewwel ra bi Ṯanî dew re mani‘[219]

Ji Ṯanî ra bi ewwel żu‘f e mani‘

57. Ṣifatê me‘newî ne ṣinfê rabi‘

Ji ewṣafê me‘anî ra tewabi‘

58. Ne mewcûd û ne me‘dûm in mulazim

Ji wan ra qa’imê bi ẕatî ne da’im

59. Ev in kewna wî ṣaḥib şîn û hem vîn

Xweda zanîn û ṣaġî ew hunerbîn[220]

60. Bihîstin dîtin û ṣaḥib xeberdan

Bigir van wacibê mewla çu merdan

**3**[221]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Di tewḥîda Xweda da ‘ebdê kemter

Dibêje neẓmekê wek ‘eqdê cewher[222]

[219] Ji ewwel ra bi Ṯanî dû re mani‘ (X), (Z)
[220] Xwedan zanîn û ṣaġî ew hunerbîn(X), (Z)
[221] Ev helbest di destnivîsên (A) û (M)yê de nîne
[222] Dibêje nezmekê wek ‘iqdê cewher (X), (Z)

2. Qedîm e xaliq e mewla ye mewṣûf

Bi ewṣafê kemalê ey hunerwer

3. Ew e her ḥey û ḥeq tedbîr û teqdîr

Ji wan ra destê qudret bûye rehber

4. Murîd e ew ji bo xeyran û şerran

Welakin nîne ražî ew ji bo şer

5. Ṣifatê wî ne ‘eynî z̠atê wî ne

Ne ġeyr in hem ji bona z̠atê ekber

6. Ṣifatê z̠at û ef‘alê wî cumle

Qedîm in lew zewal jê dûr e yekser

7. Dibên şey’e ne wek eşya û z̠at e ji

Cihatê sitte xalî ew dilawer

8. Ne ġeyrê ismî bû z̠atê musemma

Li nik ehlê beṣîret alê exyer

9. Ne cism û cewher e ne kulle ne be‘ž

Ne nûr e ne ‘ereż nînin seraser

10. Hebûna cuz’î bê weṣfa tecezzî

Di z̠ihnê da bizan ḥeqq e birader

11. Ne mexlûq e kelamê Rebbê ‘alem

Ji cinsê gotinan dûr e muqerrer

12. Li ‘erş e Rebbê ‘erşî bê temekkun

Meḥala ittiṣalê meke munker

13. Ne wech e bo Xweda teşbîh û te‘ṭîl

Munezzeh ez simatê neqṣê kemter

14. Neborîne li wî eḥwal û ezman

Ne weqt û ḥîn û sal û mahê yekser

15. Ġenî ez da û bab û cumle ewlad

Ji bil wan jî çi unsa çi muẕekker

16. Wuha reng e ji ẕî ‘ewn û neṣîran

Bû yekta ẕul-celal ê pur hunerwer

17. Cemî‘ê xelqê dimrîne û vejîne

Dide hinkan cezayê xeyr û hin şer

18. Ji ehlê şerrê ra nar û ‘eẕab e

Ji ehlê xeyrê ra cennat û kews̱er

19. Fena nabin ceḥîm û darê cennet

Ne ehlê intiqal in ehlê wan her

20. Heçî mu’min dibînin wî bi çavan

Welê bê keyf û bê idrakê menẓer

21. Ji bîr kin ni‘metan dergahê dîden

Xunik an kes ke ew şod ehlê bawer[223]

22. Ne ferż e eṣleḥ û fi‘la ṣelaḥî

Li ser ẕatê muqeddes pir hunerwer [224]

23. Li me teṣdîqê emlak û resûlan

Bizan ferż e ew in her cumle serwer

24. Temam bûne bi ṣedrê pur mu‘ella

Nebiyyê Haşimî ẕî xeddê enwer

25. Ji bo pêġemberan bê şek imam e

Ji bona eṣfîyan tacek munewwer

26. Dimînit ta ebed şer‘a wî ya pak

Di kullî weqt û ezmanan di her der

27. Di ṣidqa emrê mi‘racê rîwayet

Bû çend exbarê ‘alî ez peyember

28. Ji bo ehlê xeyrê mercuwê şefa‘et[225]

Ji bo ẕî ẕenbî ra ya Reb muyesser

29. Emîn in ji in‘izal û ‘emdê ‘iṣyan

Cemî‘ê mursel û cumle peyember

[223] Xunuk an kes ke ew başed ehlê bawer(X), (Z)
[224] Li ser ẕatê muqeddes pur hunerwer (X), (Z)
[225] Ji ehlê xeyrê mercuwwê şefa‘et(X), (Z)

30. Ne ‘ebd û mucrim û unṯa nebîne

Ji wan pêġemberî nîne muṣewwer

31. Ne me‘rûf e ji bo Loqman nubuwwet

Wiha reng e ji Ẕulqerneyn Sikender

32. Mesîḥullahî ‘Îsa dê nuzûl ket

Qetilket da Mesîḥ Deccalê e‘wer

33. Di dunyayê keramatê weliyyan[226]

Heye bê şek hebûnê neke munker

34. Bi bal rutba nebiyyan û resûlan

Gihan nîne ji bona wan muqerrer

35. Ji bo Ṣiddîqî ruchan zêdetir hat

Li ser eṣḥabê wek mahê munewwer

36. Ji bo Farûqî ra tercîḥ û tefżîl

Li ser ‘Oṯmanê ẕînnureynê ezher

37. Tefewwuq kirye ẕûnnureynî ḥeqqa

Li ser şêrê Xweda kerrarê Ḥeyder

38. Ji bo kerrarî ra feżl û tefewwuq

Li ser eġyarê ehlê xeyr û hem şer

[226] Di dunyayê keramatê weliyan(X), (Z)

39. Di be‘żek xeṣletan da kir tefewwuq

Li ser Zehra keça Ṣiddîqê ekber

40. Nekir le‘net ji bil mikṣ̱arê ġalî

Di ifsadê li Yezîdê dûnê ebter

41. Bi enwa‘ê berahîn û delîlan

Dibit îmanê teqlîdê muqerrer

42. Bi nadanê bi Xwedayê ins û canan

Ne me‘ẕûr in mukellef ey birader

43. Di ḥalê ye’s û be’sê nîne meqbûl

Ji te îman û îslam ey mukedder

44. Ne meḥsûb in ji îmanê furûżat

Ne der mahiyyeteş ey nîkê exter[227]

45. Meke ḥukmê bi kufr û irtidadê

Bi qetl û fisq û hem ‘iṣyanê ekber

46. Dibit xaric kesê niyyet ke riddet [228]

Di pey dehrek ji vî dînê munewwer

47. Welew bê i‘tiqad bit lefẓê kufrê

Bi ṭew‘ê red diket dînê peyember

[227] Ne der mahiyeteş ey nîkê exter(X), (Z)
[228] Dibit xaric kesê niyet ke riddet(X)

48. Ji dîn û serxweşan elfaẕê kufrê

Eger ṣadir bibe kufrê la teṣewwer[229]

49. Ji bo me‘dûmê mumkin mer’iyet jê

Wekî şey’etê nabit muṣewwer

50. Ne ‘eyn e weṣfa tekwînê ji bona

Mukewwen ra bizan ey necmê ezher

51. Dibit rizqê te mekrûh û ḥeram be

Wekî rizqê ḥelalê pakê ewfer

52. Di qebran dê ji tewḥîda Xweda her

Kesek bê pirskirin ya Reb muyesser[230]

53. Ji bo kuffar û ehlê fisqê ḥeq e[231]

‘Eẕabê qebrê der qebra muqedder

54. Duxûla me di firdewsa muzeyyen

Bizan feżl e ji Rebbê pakê ekber

55. Di pey be‘s̱a ji qebran dê hisaban

Bibînin nas ġenî û hem jî efqer

56. Hinek dê bidne destê rast û hin çep

Li pey pişta ewan mektûb û defter[232]

---

[229] Eger ṣadir be kufrê la teṣewwer(X), (Z)
[230] Kesek bê purskirin ya reb muyesser (X), (Z)
[231] Ji bo kuffar û ehlê fisqê ḥeqq e (X), (Z)
[232] Li pey puşta ewan mektûb û defter(X), (Z)

57. ‘Emel dê bêne kêşan û mirûra

Li ser cisra cehennem xweş ke bawer

58. Heye te’s̱îrekî pir bo du‘ayan[233]

Diket inkarê ehlê ġeyy û hem şer

59. Qedîm nîne dinê eṣlek tu nîne

Ku jê çêbûye ev dunya seraser

60. Heyîn darê ‘iqab û darê cennet

Meke inkarê wan inkare munker

61. Kesê yek qeṭreyek îman hebîtin

Di dojeh da muxelled nabe yekser

62. Îlahî reḥmeta te bo me meqṣûd

Li **Fetḥî** tu birêjî feyżê ji her der

63. Teḥîyyat û ṣelat û hem selaman

Li mewlayê me û hem cumle perwer

4[234]

fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl

Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −

1. Ela ger ṭelebkarî ez qa’il im

Di ḥeqqê te da ez qewî ma’il im

[233] Heye te’sîrekî pur bo du‘ayan(X), (Z)
[234] Ev helbest di destnivîsên (X) (A) û (M)yê de nîne

2. Eger tu su'al kî ji cudûdê ḥebîb
   Ezê dê bibêjim bizan ey lebîb

3. Ji wan namidaranê dîn perweran
   Tu Şeybe di gel Haşimê pak bizan[235]

4. Di pey wan de ‘Ebulmenaf û Quṣey
   Kilab û di gel Murre Ke‘b û Luey

5. Di gel Ġalib û Fehr û Malik Neżir
   Di pey da Kenan e Xuzeyme ‘Umer

6. Ḥuseynê Mużer hem Nizar û Mu‘ed[236]
   Di pey van de ‘Ednan û Edd û ‘Uded

7. Muqewwum û Naḥûr û hem Tîreḥet[237]
   Di gel Ye‘rub Yeşcub û nabit Eset [238]

8. Sima‘îl e û hem Birahîm Xelîl
   Etariḥ û Naḥûrê ceddê Xelîl

9. Tu Şarûx û Erxewe û Falix bibîn
   Di pey van de ‘Eyber û Şalix çunîn

10. Ku Erfexşeẕe hem di gel Sam û Nûḥ
    Di gel Lamik û Mettuşelx ceddê Nûḥ

---

235 Tu Şeybe di gel Haşimê pak zan(Z)
236 Ḥuseynê mużer hem Nezar û Me‘id(Z)
237 Muqewwim û ḥûr û hem Tîreḥet(Z)
238 Di gel Ye‘rib Yeşcub û nabit Eset (Z)

11. Xenûx û Binuberde ye Mehleyîl
Di gel Qeynen û Yaniş ibni en-nezîl

12. Ku Şîş̱ û ibni Adem ‘eleyhis-selam
Xwedaya bide bo me ḥusnul-xitam

**5**[239]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun
Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Hezar ḥemd û s̱ena û xweş meqale
Ji bo te ey Xwedayê la yezal e

2. Teḥiyyat û ṣelat û hem selaman
Li ser pêġemberan û ṣeḥb û al e

3. Xuṣûṣa ey di nav baġê risalet
Nesîmê ‘enberîn û werdê al e

4. Heta bit kunbeda dewwar û xeżra
Li ser vê ferşê wek xergeh ḥewale

5. Tu guh de min bibêjim ez beyanek
Ela yê rûḥ û canê min li bal e

6. Bizane rewneqa Quranê tecwîd
Weger bê wî bitin wizr û webal e

[239] Ev helbest di destnivîsa (A),(M)yê de nîne

7. Bixwîn yek fatiḥe bo **Fetḥiyê** jar
Hezar reḥmet li bab û da û kal e

8. Elîf û waw û ya sakin bitin ger
Ḥurûfê medd in ey zîba xiṣale

9. Eger ma qeblê ya meksûr û meżmûm
Bitin ma qeblê wawa çav ġezal e

10. Elîf herdem çiku ma qeblê meftûḥ
Sûkûna wî jî emrek bê zewal e

11. Sebeb ya hemze ye ya ḥerfê sakin
Ji bo medda evan ḥerfê delal e

12. Bizan hemze elîfa ku qebûl ket
Temamê ḥereka wek ehl û al e[240]

13. Eva dî ḥerfeke ku xweş dibit ew
Bi cezm e wek ruxê yaran bi xal e

14. Nebit ger puştî ḥerfê med sebeb qeṭ
Ṭebi'ê med dibit wek qîl û qal e

15. Bi qasî yek elîf ye'nî helînî
Ji cih piçîkê fehm ke ev meqale

[240] Temamê ḥerekan wek ehl û al e(X), (Z)

16. Sebeb ger hemze û her du di lefẕek
Bitin ev meddî ṣaḥib ittiṣale

17. Dibit med çar elîf û hem jî wacib
Sema' û su' û sî't bil-żelale

18. Sebek ger hemze û her yek di yek da
Bitin ev meddî ṣaḥib infiṣale

19. Bima utu exeẕna fî imamin
Wekî ya dî we ca'iz la meḥal e

20. Dibit geh waw û geh ya muqedder
Lehu illa bihi illa miṯal e

21. Sukûna lazimî ger dê sebeb bit
Dibit medê lazim ey nazik nihal e [241]

22. Sukûna lazimî weqfen we weṣlen
Ṯubûta wî dibîtin bê zewal e

23. Li çar new'a ne ev kelimî û ḥerfî
Muṯeqqel ya muxeffef fadrê ḥal e

24. Wekî elḥaqe elan lam mîm
Qeder çar û wûcûb bê qîl û qal e [242]

[241] Dibit meddê lazim ey nazik nihal e(Z)
[242] Qedrê çar û wûcûb bê qîl û qal e (Z)

25. Sukûna ‘ariżî ger dê sebeb bit
Dibit med ‘ariżî ey xweş xiṣal e

26. Di ḥalê weqfê da ṣabit dibîtin
Di ḥalê weṣlê da her dem muzal e

**6**[243]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

**DEȘTANA LEYLA Û MECNÛN**

**REFTENÊ MECNÛN BI CANIBÎ LEYLA WAZ DERÎÇE NUMÛDENÎ LEYLA XOD RA EZ BEHRÊ O**

1. Dema salarê mulkê ṣubḥegahî
Ku rûniştî li textê padişahî

2. Ji ṣemṣamê şehê xawer bû meḥkûk
Yeka yek nuqṭehayê leylê şebkûk

3. Wekî kafûrî bû mûyê reşê şev
Ruxê esman hemî pur nûr bû tev

4. Bi ṣed miḥnet feqîr û jar û mecnûn[244]
Bi bal yarê ve çû giryan û meḥzûn

5. Ji ‘işqa şu‘leya şem‘a civatê
Çi xweş perwaneyê berda şewatê

[243] Ev helbest di destnivîsa (A), û (M)yê de nîne
[244] Bi ṣed miḥnet feqîr û jarê Mecnûn(X), (Z)

6. Ji şewqa daneya ẕulfê perîzad
Tenêzzul kir bi sûyê damê ṣeyyad

7. Ji cama bêhiş î dîwane û mest
Li pey wî ṣed reqîbê sengê der dest

8. Gerandin wî gelek ṭiflan û ġolan
Wekî bûka di baranê li çolan

9. Ji destê wan gelek cewr û cefa dî[245]
Ji destê wan gelek derd û bela dî

10. Di gel wî her kesek der cengcoyê
Di gel bextê xwe ew der goft û goyê

11. Ji şehd û şekkerê Şêrîn bi zecrê
Mekes kengî dikit selwan û ṣebrê[246]

12. Xulaṣe ew ji destê wan xelaṣ bû
Ji zindana qefeṣ ṭûṭî xelaṣ bû

13. Mesafe ṭey kir û firqet zemînê
Ḥeta çû cilwegaha nazenînê

14. Şev û roj û mesa û ṣubḥegahan
Dikir Leylê hezar feryad û ahan

[245] Ev malik di destnivîsa (C)yê de nîne lê di destnivîsên (X), (Z)yê de heye
[246] Meges kengî dikit selwan û ṣebrê(X), (Z)

15. Ji kerb û miḥneta hicranê cansûz
Ji daġa cangudaza firqet endûz

16. Dikir herdem temennaya wiṣalê
Wiṣala dilrubaya çav ġezalê

17. Ji bextê sernigûn nedibû qe bawer
Ku bextê wajigûn pêra be yawer

18. Welê deryayê weṣlet hate coşê
Surûşê mujdexwan hate xuroşê

19. Perî peçe ji xergahê neẓer kir
Li ḥalê wî du ṣed ah û keser kir

20. Dema dî ḥalê vî bê ḥalê Mecnûn
Ji ebrê dîde barand eşkê gulgûn

21. Li hev pêça xwe wek reşmarê bê can
Wekî ẕulfê xweyê şehmarê pêçan

22. Dilê yarê li yarî hate riqqet
Sirayet kir ji wê pur luṭf û reḥmet

23. Ji burca pencera eflakê xergah
Deranî mahê ṭel‘et ṭel‘etê mah

24. Şebaka xwe veda ṣeyyadê dilber

Şebaka saḥilê deryayê çenber

25. Bi ewcê asmanê baregahî[247]
Dema Mecnûn neẕer da cilwegahî

26. Cemalek dî ji nûra la yezal e
Di xergeh da wekî heyva di hal e

27. Nema êdî qewam û ṭaqeta wî
Nema êdî ḥeyat û raḥeta wî

28. Di ẕahir da eger çi rûḥ û can dî
Hezar tîr û teber pêra qiran dî

29. Welê ʻÎsayê bihna ẕulfê dildar
Giha lez ber serê mecrûḥê bîmar

30. Eger çi murde bû ev ʻerd e dîsan
Bi lez wî bir ḥeyat gerabû nîsan

31. Bi bal fusḥet feżaya saġiyê hat
Sûyê wusʻet seraya şahiyê hat

32. Di nuzhetgahekî wek baġê cennet
Di gel hev wan kirin xweş keyf û ṣoḥbet

33. Kirin lez wan qeżayê weṣlê ma fat
Biḥukmê inne litte'xîrî afat

[247] Li ewcê asimanê baregahî (X), (Z)

34. Ji Leyla dilberî û dilnewazî
Ji Mecnûn ah û zar û ‘işqbazî

35. Ji Leyla ew du marê cedê pur tab
Ji Mecnûn ew du çeşmê çeşmê pur ab

36. Ji Leyla nûrê wek şem‘a ji nûrê
Ji Mecnûn narê wek narê tenûrê

37. Ji Leyla naz û ġunc û keyf û riqqet[248]
Ji Mecnûn kerb û derd û sûz û ḥirqet

38. Ji Leyla ṣed îşarat û bişarat [249]
Ji Mecnûn ḥeyreta lefẓ û ‘îbarat

39. Ji Leyla ew du lêvê pur ḥikayet
Ji Mecnûn ew dilê ṣaḥib şikayet

40. Ji Leyla ṣed hezaran ḥeşmet û cah
Ji Mecnûn ṣed hezaran miḥnet û ah

41. Ji Leyla şehdê noşînê melaḥet
Ji Mecnûn derdnîşînê ceraḥet

42. Ji Leyla ew du tîr endazê ebrû
Ji Mecnûn ew du amancê sipehrû[250]

---

248 Ji Leyla naz û ġunc û keyf û riqet (X)
249 Ji Leyla ṣed îşarat û beşarat (X), (Z)
250 Ji Mecnûn ew du amancê siyehrû (X), (Z)

43. Ji Leyla her neşaṭ û ‘eyşê xendan
Ji Mecnûn girye her wek derdimendan

44. Ji Leyla we‘dê weṣl û kamiranî
Ji Mecnûn paşeşê wî can fişanî

45. Ji Leyla xurremî û leb kuşayî
Ji derd û ġuṣseyê ‘alem rehayî[251]

46. Ji Mecnûn ḥuzn û tab û teb di navê
Wekî şaxa ku dûr bit ew ji avê

47. Ji Leyla ew gula gulzarê ‘alem
Sehê serwa di serwistanê adem

48. Dilarayî û dildarî û bazî
Dilaramî dilistanî û nazî

49. Ji Mecnûn bulbulê baġê melaḥet
Terezwa şaxesara pakê saḥet

50. Dilawîzî û dilxwahiyê meḥbûb
Dilamîzî û dilcûwiyê meṭlûb

51. Ji xewfa daye û xelqê siyehrû
Bi vî rengî eda kir çeşm û ebrû

[251] Ji derd û ġuṣeyê ‘alem rehayî (X)

52. Welê ḥîna nebû babê qenaet
Di ‘işqê da di gel şerma şena‘et

53. Perî çehre ji ġurfê ser deranî
Ġemê hicran ji meydanê hilanî

54. Vekir ġunça dehanê nazik û ter
Di babê ‘uzirxwahê kay simenber

55. Di girdaba bela herdem dikêşî
Ji min renc û cefa û pur dilêşî

56. Çewa çêkim nehin min ixtiyarek
Ji te şermî me ey yarê mubarek

57. Ciwamêrî ku bê nan û nemek bû
Ji mêvanê xwe şermende gelek bû

58. Tu zanî ixtiyara new‘ê duxter
Di destê bav û dê daye seraser

59. Çi weqta ku bibin ew herdu rażî
Nehin hacet bi muftî û bi qażî

60. Dilê rezvan bi dest bîn û were nav
Biçin van meywehayê sebz û pur av

61. Meke dizdî heye dizdî xiyanet
Di dizdî da nehin bihna emanet

62. Ne‘îme ṣafî û baqî di acil
Ne ḥeyf e ku mubeddel bî bi ‘acil

63. Ji min bawer ke ey yarê muwafiq
Di gel te ṣadiq im wellahî ṣadiq

64. Vexwarin badeya gulgûn şerabê
Bi vî rengî kirin xweş xweş xitabê

65. Xumarê ‘eskerê ġeflet kuşandî
Nesîmê wê bi ser wan ve reşandî

66. Neman êdî ji ḥal kes xeberdar
Ji nageh dîn reqîbek şomê xedar

67. Wekî şêrê xeran hatî bi şimşîr
Bi kîn û hem ġeżebgir hate nexçîr

68. Deva xwûna serê Mecnûn verêtin
Wekî teşne devê avê vemêtin

69. Wekî berqa hewa şimşîr hilanî
Welê berqa hewa destê wî nanî

70. Kire dest dî û dîsa bilind kir
Bi ṣed qeydan ewî jî qeyd û bend kir

71. Bi destê hemtayê dîwaneyê jar
Dema bişkeste her du destê xwûnxwar

72. Li bal kir ‘erżê ‘ecz û inkisarî
Key ku şehnişînê kohisarî

73. Eya damen nişînê necdê tewbe
Ela ey pur kemal û wecdê tewbe

74. Bi ġayet ez feqîr û naseza me
Birîndar im welê luṭfa te ‘am e

75. Ji min sûç û ji te ‘efwa celîl e[252]
Bi ḥukmê faṣfehiṣṣafhel cemîl e

76. Bi luṭf û merḥemet ew pakê cewher
Ji xwûnxwarê xwe ra go ey birader

77. Dema Mecnûn ku dî ev ah û zarî
Girî bê ḥed ji bê ḥemd û qerarî

78. Dixwazî ger tu napakî nebînî
Di gel xelqê meke ẕulm û nevînî

79. Meke îẕayê kes sin‘et ji bo xwe
Cefaya kes meke ‘adet ji bo xwe

80. Bixwazî ger tu rencê canê eġyar
Dibî ewwel bi wê rencê giriftar

[252] Ji min sûç e ji te ‘efwa celîl e (X), (Z)

81. Tu nabînî di ḥalê ledḥê eġleb
Ku tên kuştin xebîsê mar û ‘eqreb

82. Neṣîḥet lê kir û jê ra du‘a kir
Murad û meqṣeda wî jî reha kir

83. Ji meḥbes xaniya ‘ecz û şelel hat
Du destê wî bi bal kar û ‘emel hat

84. Çi xweş ev nukte ehlê dil riwayet
Wiha kir wan ji erbabê dirayet

85. Ku erżî da sema toz û ġubarî
Sema da erżî barana buharî

86. Nihayet bû nihan muhra cemalê
Xezan hatî bi ser baġê wiṣalê

87. Ruxê Mecnûn bi bayê hecrê zer bû
Bi narê firqetê dil ker bi ker bû

88. Di baġê dil nihala hîviya wî
Ziwa bû ew ji pur bê aviya wî

89. Ḥezîn û sîneçak û hem dilefkar
Cuda bû ew ji mahê rûyê dildar

90. Giran bar dil ji kûhê kerb û wecdê
Bi ṣed nakamî berda kûhê necdê

91. Ji dewletxaneya wuṣlet ‘ilim çû
Bi miḥnetxaneya êş û elem çû

92. Di gel xwe ah û derdê bê ‘eded bû[253]
Yek anî lê hezar ve him du ṣed bû[254]

7[255]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

## AĠAZÎ DASTANÊ LEYLA Û MECNÛN

1. Guherdaranê razê dasitanî
Ji durme dil bi mîzana nazebanî

2. Hinek durrê giranmaye kişandin
Li bûka qelbê guhdaran reşandin

3. Bi van eṭbaqê elfaẓê di zêrîn
Digotin wan bi ev teḥqîq û ayîn

4. Di eqṭarê ‘Ereb peydabû şahek
Xwedan ceyş û ḥeşem xweş padişahek

5. Bi çogana ‘eql ber goyê şah î
Bi taca şewketa şahî mubah î

[253] Di gel xwe ah û derdê bê ‘eded bir (X), (Z)
[254] Yek anî lê hezar ve him du ṣed bir(X), (Z)
[255] Ev helbest di detnivîsa (M) û (A)yê de nîne

6. Mubarek nav û ṣaḥib durr û gewher
Li nik ehlê dilan salar û serwer

7. ‘Eceb la’iq bi text û tacidar î
Ji necman zêdetir çetir û ‘imar î

8. Di şuhret da neẓîre şahê xawer
Di ḥusnê hemqerînê mahê enwer

9. Murad û meqṣeda wî cumle ḥaṣil
Ji bil ferzendegî pakîze ‘aqil

10. Ji bê ferzendiyê pur ġem dikêşa
Ji vî rengî elem herdem dikêşa

11. Şikûfe xweş dida nexla qeda wî
Welê nedibû ruṭeb ew ġunceya wî

12. Ṣedef ger çi ji qetre pur dibû pur
Welê nedibû ji wan yek qeṭrekî dur

13. Zemînê reḥmê dane pur dihan kir
Ne xermen belke sunbul jî nihan kir

14. Ji bona nesl û peywendî dema dem
Di zarî her bi sûyê rebbê ‘alem

15. Ġereḍ ev bû di nav baġê zemane
Bibit şaxa rûḥê wî cawîdan e

16. Bi ava reḥmetê her bête avdan
Ji çeşma her du lêvê neclê şadan

17. Kesê çû jê nema yek yadigarek
Vema meḥrûm ji Yasîn û Tebarek

18. Xweş in ewlad eger ew xweş xelef bin
Weger ew naxelef bin lez telef bin

19. Xelef bin te dikin tiẕkar û hem yad
Weger ne te dikin bêzar û berbad

20. Xelef bin ni‘meta Rebbê kerîm in
Weger ne ew ‘eẕabê pur ʿelîm in

21. Xerab be ger ji wan ef‘al û e‘mal
Dikin ew nav û namûsa te pamal

22. Weled bedxwû be bavê wî nebîne
Ruxê wî ew ji bavê xwe nemîne

23. Bihata der eger marek ji mader
Ji wî çêtir bû bawer ke tu bawer

24. Qena‘et ke mebe ‘aciz ji bo wan
Ji te erḥemtir e ew Rebbê reḥman

25. Di ḥeqqê te çi qenc e wî dide te
Eger iḥsan eger ḥirman bide te

26. Çi genca meqṣeda te ku nihan e
Eger qenc tê bifikrî qenc wisan e

27. Çi meqṣûda te ya ḥaṣil ku nabe
Bi teḥqîq ew di ḥeqqê te xerab e

28. Di vê şaxa murada beġçeya dil
Dema dem av bidî bi ava teẕellul

29. Eger fêkî bide şaxek delal e
Weger ne kufş e şaxek bê kemal e

30. Bi cidd û cehdê nava xwe girêda
Şehê ‘urban di her an û demê da

31. Li rexşê ibtihalê ew siwar bû
Li cada meqṣeda dil kar û bar bû

32. Dema yara wî dî jê ẕull û zarî
Di gel bû yar eda kir ḥeqqê yarî

33. Xweş e yarî di roja tengiyê da
Nigehdarî di ḥalê lengiyê da

34. Kirin hemreh di gel xwe wan du hemrah
Du hemrahê ẓerîf û çapikê rah

35. Ev in ew du hemrahê di şadan
Ji wan yek şem‘ û yek zîvîn şemadan

36. Bi zarî û bi yarî çûn di gel hev
Kirin xweş cistucûyê wan di gel hev

37. Nedîn wan qeṭ vewestan û teḥeyyur
Vewestan qeṭ li vir nabit teṣewwur

38. Bi roj û şev kirin teyyê meraḥil
Bi meqṣûda xwe axir bûn muwaṣil

39. Çi meṭlûba ji can û dil bixwazî
Ji wî axir dibînî serfirazî

40. Dema ṣubḥê ji meşriq ve şefeq da
Kulîlka hîviya wan xweş wereq da

41. Seḥabê qeṭrekî bi lêva ṣedef da
Qeża kir der di nav nava ṣedef da

42. Ewê meġzê di postî kir s̱ebatê
Di ẓulmet ma wekî ava ḥeyatê

43. Nebû qeṭ kes ji ḥalê wî xeberdar
Bi bal ve qeṭ neçû xiżrek ‘elemdar

44. Ḥeta ew gul ji ġunce hate bîrûn
Wekî berga gula lale di gel xwûn

45. Dema derket ji bin jêrê niqabê

Xwiya bû lawekî wek afitabê

46. Hezar aṣarê ‘işqê jê dibarî

Ji ber narê meḥebbet pur dizarî

47. Ji wî nuzhet seraya qudsiyan hat

Bi bal vî ṭengînaya xakiyan hat

48. Ġezala can ji ṣeḥraya fereḥzar

Ji nageh bû bi qeyda ġem giriftar

49. Dehê xweş xweş xerambû ṭûṭiyê pak

Di zindana qefeṣ îro ye ġemnak

50. Ji ber feqda heval û nazenînan

Çewan dê ew nekit ah û enînan

51. Ewî şuştin bi misk û hem ‘ebîrê

Wekî miskî li wî pêçan ḥerîrê

52. Ji ser serçeşmeya can şîrê dayê

Diya wî da bikit neşw û nemayê

53. Xwedan navê bi Qeys û hem ‘elem kir

Ji baġê dil rehê ġem hem ‘edem kir

54. Dema bedra ruxê wî dîtê bavê

Muferreḥ bû wekî teşne bi âvê

55. Vekir fîlḥalî dergahê xeza'in
Bi der anî gelek genc û defa'in

56. Belav kir wan li miskîn û feqîran
Feqîran sergiranî kir li mîran

57. Diya wî ger ṣed i'zazu we tekrîm
Dikir jêra di gel ṣed naz û te'ẓîm

58. Welêkin ew ji girye nedibû xalî
Di gel girye dema dem ew dinalî

59. Nikarî ew ku esraran beyan ke
Nikarî ew ku ḥalê dil 'eyan ke

60. Nekarî kes bike ibraz û meẓher
Lehîba ku di dil da bûye mużmer

61. Di meydana teḥeyyur da veman mat
Şeh û ferzînê fikra wan kiş û mat[256]

62. Heta rojek perî rûyek hilanî
Meh û muhrê kirin xweş xweş qiranî

63. Ji bihna sunbulê zulf û gula rû
Ji badamê du çeşmê qewsê ebrû

256 Şeh û ferzînê fikra ewan kiş û mat(Z)

64. Ġem û derdê dilê xwe kir feramûş
Ji dengê girye bû bê deng û xamûş

65. Dema ew mahê ṭel‘et jê cuda bû
Bi sûz û girye dîsa mubtela bû

66. Bidîta ger dikir xweş xend û bazî
Nedîta ger didî wî cangudazî

67. Ji daye bû cuda û jê berî bû
Li muhrê meh ‘eceb pur muşterî bû

68. Bi rûyê pakê mehrûya xwe şa bû
Xew û xwarin li balê wek heba bû

69. Bi qeyda zulfê dildarê xwe bû ram
Di ‘işqê can û dil kir ‘eqdê iḥram

70. Muferreḥ bû li nik vê mehcebînê
We ger ne pur dikir şîn û girînê

71. Hevalê wî hemî meşġûlê bazî
Dema dem ew bi derd û ‘işqbazî

72. Hevalê wî bi keyf û ẕewq û ṣoḥbet
Ji wî herdem xeyal û ḥuzn û kurbet

73. Hevalan ne siwar û pur bi awaz
Ji naya ḥelqê ew xweş neġme pur daz

74. Siwarê merkeba ‘eqlî cema bûn
Li meydana ḥeqîqet ew bela bûn

75. Di fitraka kumeytê dil kirin qeyd
Ġezala wî yeqîna wan kirin ṣeyd

76. Vegeryan ew ji keyfa vê ġezalê
Ji ṣeyda murġê wek wehm û xeyalê

77. Wiha gotin ku ev ṭiflê yekane
Ji nageh dî di ‘işqê bit fesane

78. Bi ‘işqa mehruxek dî mubtela ye[257]
Ji ‘alem karê wî derd û bela ye [258]

79. Bibe şeyda di nav ehlê cîhanî
Bibe riswa di nav xelqê zemanî

80. Bi ceġdê sûretî pur nabe demsaz
Dikit bazê ḥeqîqet bo xwe hemraz[259]

257 Bi ‘işqa muhrixek dî mubtela be(X)
Bi ‘işqa mehruxek dî mubtela be (Z)
258 Ji ‘alem karê wî derd û bela be (X), (Z)
259 Dikit barê ḥeqîqet bo xwe hemraz(Z)

8[260]

## MECLISÎ SUNNET NIHADEN PEDERÎ MECNÛN MIRAWRA BESTEN WE DERAN ŞEME EZ EWṢAFÎ O ÇUN DER ṢEDEF NEHIFTEN

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Çi xweş weqt e dema melhûfê ṭalib
   Inaxet ke ji şehraha meṭalib

2. Meṭayayê dil û canê hewesbaz
   Li nik ser menzila meṭlûb û dilxwaz

3. Bi meṭlûba dil û canê xwe şa be
   Bi meqṣûda xwe şad û dilkuşa be

4. Xuṣûṣa ger nihala baġê can bit
   Di baġê tazegî canê cihan bit

5. Di puştî ṣed hezar cewr û cefayê
   Bibîne jê gelek ẕewq û ṣefayê

6. Biçîne gul ji gulşaxa dilê xwe
   Bike derman ji bo daġa dilê xwe

7. Bi qedrê meqderet i‘zaz û te‘ẕîm
   Ji bo wî ra bikit hem naz û tekrîm

[260] Ev helbest di destnivîsa (M) û (A)yê de nîne

8. Veke babê nişaṭ û ‘eyş û ‘işret
Bike berba di mulkê kerb û ḥesret

9. Ne tenha gewher û gencan bikit faş
Dil û can jî bikit şabaş û padaş

10. Welêkin ew bi mîzana ḥeqîqet
Li wufqa vê terazûya ṭerîqet

11. Bi vê şer‘a şerîf û hem mumecced
Bi qanûnê xelîl û dînê Eḥmed

12. Eda ket ba hezaran fexr û minnet
Di vê rê da hezaran ferż û sunnet

13. Dema şahê ‘ereb dî kamiranî
Çinandî gul ji baġê zindeganî

14. Vebû ew ġunçeya şaxa dilê wî
Dewa bû rencîya daġa dilê wî

15. Bi deh salan gihişt ew gulbena gul
Cihan pur bihn û bû kir gulşena gul

16. Du çehvan da cihan teşwîş û şorî
Du burhê wî ḥesed dan kesk û ṣorî

17. Gelek zer bûn ji şerman çehvê nêrgiz[261]

Hilala ‘îdê bû barîk û ‘aciz

18. Hilala rû ku bû bedra cemalê

Li esman da şehê xawer zewalê

19. ‘Eceb muhran ji ber dîtin kusûfî

Qemer jî bûn siyehpoşê xusûfî

20. Qeda wî ser kişand bû taze û şad

Ji ber pejmurde bûn ev serwê şimşad

21. Ji xwe dalek duta çêkir elîfê

Li hev pêça xwe nazik lamelîfê

22. Hezar deryayê şehd û şekkerê nab

Li ser lêvê wî bûn pur mewc û pur tab

23. Te‘alellah ji kenca pur me‘anî

Çiqas kir wek ṣedef gewher fişanî

24. Gelek durran cema kir ġunçeya dev

Ji ġeyret ġunçeya gul pur weşandin tev[262]

25. Ji derd û ḥesreta van durrê meknûn [263]

Nihan bû ṣed hezar gencê di qarûn

[261] Gelek zer bû ji şerman çehvê nêrgiz(X), (Z)
[262] Ji ġeyret ġunçeya gul pur weşand tev(X), (Z)
[263] Ji derd û ḥesreta van zurrê meknûn (X)

26. Du ṣed bêjin di nav çaha zinexdan
Bi qeyda ġebġebê kir qeya û bendan

27. Gelek xiżran ji bo ava ḥeyatê
Eger çi çûn nedîn raha necatê

28. Bi marê kakilê reş reş tenînî
Ḥimayet kir ewî genca cebînî

29. Cebîn û kakilê wek roj û hem leyl
Kirin keşfa niqaba yuwliculleyl

30. Di baġa rû teferruc kir gelek sal [264]
Bi destûra ewê zaġa reşa xal

31. Di mulkê Romê da rabû çi şahek
Ji efradê Ḥebeş xweş padişahek

32. Di Romê da xeṭê reş kir ʿmîrî
Ji bo şahê Ḥebeş ra kir wezîrî

33. Ji wê Rom û Ḥebeş tev hate feryad
ʻEceb kir xanedana miṣkê berbad

34. Gerand bulbul dilê her pak û bed rû
Gulistana ʻiẕar û ʻariżê rû

[264] Di baġê rû teferruc kir gelek sal (X), (Z)

35. Ji wan her şaxekî erwaḥê zarek
Ji wan her lalekî xweş murġê zarek

36. Di der benda cemalê Yusûfî kir
Di nav Mişra kemalê Yusûfî kir

37. Dilê bavê xwe geh şadan û xendan
Wekî Ye‘qûb kir geh zar û giryan[265]

38. Kirin ṣed wek Zuleyxayê di leylê
Li bedra ṭel‘eta wî elf û meylê

39. Şehê ‘Urbanê der te‘ẓîm û i‘zaz
Vekir herdem ji bo vê menbe‘a raz

40. Bi qeṣda ixtitan û ‘ezmê sunnet
Di gel ṣed iḥtiram û fexr û minnet

41. Ṣelakî da nişaṭ û keyf û şahî
Ṣedakî da def û çeng û melahî

42. Ji ḥeddê Kufe ta derbendê Beġdad
Ji Beṣrê ta bi Mişra dewlet abad

43. Şihand qaṣid bi nav cumle qeba’il
Cema kir cumle erbabê feża’il

[265] Wekî Ye‘qûbî kir geh zar û giryan (X), (Z)

44. Vexwend salar û sadatê di ‘Urban
Gelek şehzade û rimbaz û rukban

45. Gelek pakîze û serwe simenber
Gelek dûşîze û dildar û dilber

46. Gelek şaxê gulistana cemalê
Gelek şoxê dibustana kemalê

47. Gelek meh ṭel‘et û xurşîd cebînan
Gelek şekkerleb û leb engebînan

48. ‘Uṭarud heşmetan û muşterî gûn
Li mah û muhrê rûyan muşterî bûn

49. Delalê zuhre rû reqqaṣ û şadan
Du lêve leb zuḥelha şad û xendan

50. Ji pur iqbaliya van nav zirava
Bed endîşê merîxan çûne ava

51. Meh û muhrê sema û necm û exter
Te go qey hatin ew erżî seraser

52. Belê ḥeqq e ji ev ḥiqd û ḥesûdî
Li esman çêbû ev rengê kebûdî

53. Wisan bû xweş buharek ‘alem ara
Ji ṭirsa ba û baranê muberra

54. Vekî ger tu dilê baġ û buharek

Di nav da dê bibînî pêt û narek

55. Wisan bû baġekî re‘na û zîba

Ji şaxê qamet û zulfa ḥebîba

56. Bidîta ger ewî şeddadê ġemgîn

Dida baġê Îrem şabaş û mizgîn

57. Wisan bû ḥeşregahek ji insan

Ji derd û miḥneta dil herkes asan

58. Bidîta dozexê vê ḥeşregahê

Ji pêt û narê dozex nedikir ahê

59. Wisan bû ṣeydgahek ‘aşiqane

Ji her canib ṣedayê wamiqane

60. Ḥezar Ferḥad û Şêrîn Leyl û Mecnûn

Ṣifet Fetḥî ji cama weṣlê gulgûn

61. Dema Suqraṭ û Buqraṭê di ḥażir

Ewan ev xiżmeta sunnet eda kir

62. Ġulamanê ẓerîf û çapikê reh

Çu Mikaîl wan raxist sofreh

63. Kişandin cumle enwa‘ê ṭe‘aman

Gelek elwan ji bona xaṣ û ‘aman

64. We reng danîn ṭe‘amê rengê der reng
Ku ev fusḥet feża pur bû ji wan ṭeng

65. Ṭebaqê çerxê bûn ṣeḥn û nemegdan
Bi miqdarê kewakib berx û büryan

66. Bihata ser eger xelqê di ḥeşrê
Du çendan jî ji xelqê be‘s̱ û neşrê

67. Ceḥîma cewfê pur xwar û pelîdek
Qe nedda ne‘reya hel min mezîdek

68. Ji dûdê peḥtina wan roj û hem şev
‘Eceb çehvê nucûman kor nebûn tev

69. Çi xweş bayê dilê mustesqiyan hat
Ṣedaya nûşê nûşa saqiyan hat

70. Bi cam û saġeran xelqê civatê
Vexwarin kews̱er û ava ḥeyatê

71. Seda da ġulġulan cama şerabê
Newa da berbeṭ û çeng û rebabê

72. Hinek bûn şaş û bêhoşê ṣedayê
Hinek bûn mest û medhûşê newayê

73. Di gel muṭrib çi xweş def sazikar bû
Di nav wan da gelek ney zarê zar bû

74. Gelek zîba puser wek ġunçeya gul
Li nik van xweş serayanê belabul

75. Lebê cama meya gulgûnê sade
Li ser lêva delalanê di sade

76. Ji dengê şehne û ṣewta ‘eses dil
Reḥet bûn lê ‘eses pur bûn teres dil

77. Ji tarê ṣûretê şehne gelek tar
Kişandin bo rebaba mîrê bajar

78. Bi vê reqṣê ‘eceb xweşnûd û rażî
Dilê şeyx û mêla muftî û qażî

79. Hinan kir meylê nêçîr û şikarek
Li nêçîr û şikaran bû hewarek

80. Gelek şêr û piling û fîl û kerges
Bi zincîran kirin munqadê her kes

81. Ji ṣeyda wan gelek did bûne nabûd
Tu nabînî ku ‘enqa bûye mefqûd

82. Hinan kir meylê rexş û espê tazî
Li meydanê kirin xweş le‘b û bazî

83. Simê esp û kefê payê hecînan
Tijî bedr û hilal kir wan zemînan [266]

84. Simê espan di wê cewlangeha deşt
Zemînê şeş ṭebeq kir asiman heşt

85. Hecînî jî li ‘eksa badê payê
‘Ecêb pamalê kir bedra semayê

86. Şahê ‘Ereban wiha rojê kir êvar[267]
Bi vî ṭerzî ewî kir ṭeyyê ṭomar

87. Ne rojek belkî çil rojan wiha kir
Ji baġê dil ‘urûqê xem reha kir

9[268]

## FIRUSTADENÊ PEDERÊ MECNÛN MERAWERA BEDAR'UL WEQARI MEKTEB

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Were ey dil bi mektebxaneya ‘işq
Were ey dil bi me‘debxaneya ‘işq

2. Ḥeta kengî wiha serqot û ṭazî
Di gel ṭiflan bikî ev xakibazî

[266] Tijî bedr û hilalê kir wan zemînan(X)
[267] Şahê ‘Ereban wiha rojê kir êvar(X)
[268] Ev helbest di destnivîsa (M) û (A)yê de nîne

3. Qe bavê te li te nakit tereḥḥum

Nedistîne ji bo te ṣol û yakum

4. Were vê mekteba ‘işq û ġeramê

Ji bavê xwe bibîn pur iḥtiramê

5. Tu nabînî ṭifalê Turk û Kurdan

Hinek pejmurde ne hin şad û xendan

6. Bi vê darul-weqarê hin muweqqer

Bi wê darul-ġubarê hin muḥeqqer

7. Hebûn hinkî heval û hemberê te

Hebûn hinkî delal û hemserê te

8. Dema dem hûn di gel hev pawir û puşt

Li ser nan û nemek da’im hem enguşt

9. Di seyr û cilwegahan hûn di gel hev

Di baġû ṣeydgahan hûn di gel hev

10. Bi hev ra muctemi‘ her weqt û her gav

Yekî bê yek nexwar yek qurtekî av

11. Di zilletxaneya xak û ġubarê

Ji nageh bûne naçarê qerarê

12. Di pey cem‘a wekî ḥubban di xweş e

Ketin her yek li yek eṭraf û goşe

13. Bi zindana qefeṣ hûn xwey bela bûn
Bi derd û firqeta hev mubtela bûn

14. Bisaletmendê wek şehbazê Mecnûn
Se‘adetmendê wek Leylayê gulgûn

15. Kirin se‘ya kemal û wecd û ẕewqê
Di vê darul-kemala ‘işq û şewqê

16. Şikandin ev qefeṣ hem jî rewan bûn
Bi bazê meqṣeda xwe hem ‘inan bûn

17. Ḥeya nakî di vê wêraneya xak
Wekî kundan ḥerîṣê xar û xaşak

18. Eya Mecnûn dilê dil rîş û meḥzûn
Ḥeta kengî wiha bî jar û meġbûn

19. Were vê mekteba pur şewq û meylê
Bibîn tê çav ġezalê şubhî Leylê

20. Xeyala wê bike qeyda dilê xwe
Cemala wê bike ṣeyda dilê xwe

21. Bi derdê wê ji lewḥê qelbê giryan
Bike ḥek nuqṭehayê derdê dewran [269]

[269] Seyda ji ber ku wefat kiriye ev helbest kêm maye

## 10[270]

fa‘ilatun /fa ‘ilun/ fa‘ilatun / fa ‘ilun

Behra Remel – + – – / – + – / – + – – / – + –

1. Bûme ji destê ġeman jar û że‘îf û heba

   Hûn bi Xwedê kin bibên qiblenumaya mi ka[271]

2. Qibleyê ‘alemnuma sorgulê baġê wefa

   Ḥezretî Ṣanî leqeb rehberê rahê Huda

3. Rehberê dana û xam puşt û penaha ‘ewam

   Darê beqa kir meqer beḥrê liqaya Xweda [272]

4. Beḥrê liqa ixtiyar kir şehê ‘ismet şi‘ar[273]

   Çû ji vê dunya denî yarê wefadarê ma

5. ‘Ezmê ne‘îm û cinan kir şehê Nûrşîn meqam[274]

   Kûhê ġeman dame û rûyê zerî şubhî ka

6. Ev çi muṣîbet bû hat mah ji meşriqê helat

   Xef bû di meġrib zemîn çû bustarê kiha

7. Ye‘nî şehê nîk nam neclê delalî temam

   Herdu di yek heftekê zîrê zemîn kirne ca

---

[270] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne

[271] Hûn bi Xwedê kin bibên qiblenumaya me ka (M)

272 Darê beqqa kir meqqer beḥre liqayê Xweda (Z),(M)

273 Beḥrê liqa ixtiyar kir şubhê ‘ismet şi‘ar (Z)

274 ‘Ezmê ne‘îm û cinan kir şehê Nûrşîn mekan (X),(Z),(M)

8. Çûn û bi hev şadibûn ji qeydê ġem azade bûn

Kerb û fiġan û enîn ḥeẓẓ û neṣîbê me ma[275]

9. Hişt me wî ustûxwar jar û neḥîf û nezar

Ḥesret û derd û elem şîn û girîn û buka[276]

10. Şîn û buka û girîn daye me ew meh cebîn[277]

Ṣoḥbet û feyż û ṭerîq bir bi xwe ra wî teba [278]

11. Mesken û dîwar û der man ṣedefa bê guher[279]

Ceyba xwe ya lê tijî kir ji durrê bê buha[280]

12. Rif'et û namûs û nav bir wî ji keywan tevak [281]

Daye wî keywan ḥesed ah û esef da suha[282]

13. Ev ġem û derdê nigar hem şebê hicranê yar

Salê ġem û salê şeb rêhte bi ser cumle da [283]

14. Ey şehê dil perwer em rehber û hem serwer em[284]

Daye te terka me bê sûç û gunah û xeṭa [285]

---

[275]Kerb fiġan enîn ḥeẓẓ neṣîbê me ma(M)
[276] Ḥesret derd elem şîn girîn buka (M)
[277] Şîn buka girîn daye me ew meh cebîn(M)
[278] Ṣoḥbet feyż ṭerîq bir bi xwe ra wî teba (M)
[279] Mesken dîwar û der man ṣedefa bê guher (M)
[280] Ceyba xwe ya lê tijî kir ji dilca buha (M)
[281] Rif'et û namûs û nav bir wî ji keywanê tevak (X), (Z)
Rif'et namûs nav bir wî ji keywan tevak(M)
[282] Daye wî keywan ḥesed ah û esef da seha (X),(Z),(M)
[283] Salê ġem û salê şeb girte bi ser cumle da (M)
[284] Ey şehê dil purwer em rehber û hem serwer im (X),(Z)
[285] Daye te terka me bê sûç gunah xeṭa (M)

15. Bê xeṭa û bê guneh mane di nêv qe‘rê çeh [286]

Çahê firaq û ḥeman firqetê rûyê żiya

16. Nûr û żiyaya min î şem‘ û şemala min î [287]

Bê te neşêm yek nefes ṣebir kim ez bê xefa

17. Ṣebir meḥal e ji min ‘eqil beṭal e ji min[288]

Ḥeqq e ku zarî bikim ṣubhî pepûka çiya

18. Bê te me navê ḥeyat leẕẕet û keyf e memat[289]

Belkî di bajarê mewt rastî te bêm ey żiya

19. Bêm û ṭewafa te kim can jî niṣara te kim [290]

Bêjî tu ṣed aferîn **Fetḥiyê** naçarê ma[291]

## 11[292]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Çi xweş şah û çi xweş xan î tu Seyda

   Di mulkê dil de sulṭan î tu Seyda

2. Bi ġemze afeta can û dilan î

   Bi qamet serwê bustan î tu Seyda

---

[286] Bê xeṭa bê guneh mane di nêv qe‘rê çeh(M)

[287] Nûr û żiyaya ummet şem‘ û şemala minnet(M)

[288] Ṣebir meḥal e ji min ‘eqil betal e ji min (X), (Z), (M)

[289] Bê te muhal e ḥeyat leẕẕet keyf e memat (M)

[290] Bêm ṭewafa te kim can jî niṣara te kim(M)

[291] Ev riste di destexetên (C), (X) û (Z)yê de wisa jî "Bêjî tu ṣed merhaba **Fetḥiyê** naçarê ma" hatiye nîşandan

[292] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne

3. Li ‘alem da żiyaya ṭel‘eta te
   Ḥeqîqet mahê taban î tu Seyda

4. Di nava baġ û bostanê leṭafet
   Çi nazik tayê reyḥan î tu Seyda

5. Di gulzarê ḥeqîqet da ḥeqîqet
   Gula têrav û reyyan î tu Seyda

6. Di ‘ilmê da tu Nu‘man î muḥeqqeq
   Di ḥikmet beḥrê ‘ummanî tu Seyda

7. Di rey û fikr û tedbîra umûran
   Dibêjim Aṣifê dewranî tu Seyda[293]

8. Ṭerîqet ra çi xweş pîr û żehîr î
   Şebîhê Quṭbê Rebban î tu Seyda

9. Tûyî Ristemê kurê Zalê zeman î[294]
   Wezîrê şahê Îran î tu Seyda

10. Te mulkê dil seraser girt îro
    Li textê dil Suleyman î tu Seyda

11. Li Ṭûrê qelbê ġemperwerdehê min
    Yeqîn Mûsa ibnî ‘îmran î tu Seyda

[293] Dibêjim Aṣifê Ṣanî yî tu Seyda(X), (Z), (M)
[294] Tûyî Rustemê kurê Zalê zeman(X)

12. Eger çi cilwedar in xwûb û meḥbûb
Şehê meḥbûb û xûban î tu Seyda

13. Li vê ḥusna te ḥeyran xas û ‘am in
Bi ḥusnê mahê Ken‘an î tu Seyda

14. Çi ḥacet me bi bal werda gulistan
Bi xed werda gulistan î tu Seyda

15. Li textê dilberê rûne bi şahî
Şehê şahanê dewran î tu Seyda

16. Bi çûgana cemalê tu li dil de
‘Eceb rimbazê meydan î tu Seyda

17. Çi xweş zanî tu esrarê qulûban
Belê ṣerrafê qelban î tu Seyda

18. Birîndar im tu derman ke dilê min
Ku dermanê birînan î tu Seyda

19. Ḥezîn û sîneçak û dilfikar im[295]
Ne ġemxwarê ḥezînan î tu Seyda

20. Me têrav ke ji feyża bêḥeda xwe
Ji feyżê ra wekî kan î tu Seyda

[295] Ḥezîn sîneçak dilfikar im (M)

21. Bi luṭf û merḥemet carek neẓer de
Bi luṭf û reḥm û iḥsan î tu Seyda

22. Birêj feyżek li qelbê **Fetḥiyê** xwe
Bi ḥeqqê Ḥezretî S̱anî tu Seyda

12

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec + − − −/+ − − − / + − − −/+ − − −

1. Ji derd û miḥneta dewran dibêjim ez meded Seyda
Ji daġa firqet û ḥicran meded Seyda meded Seyda

2. Firaqê ġem li min rakir di dil da agirek hil kir
Bi wî can û ciger kul kir meded Seyda meded Seyda

3. Feqîr û jar û mehcûr im ‘elîl û zar û rencûr im
Ji te îro qewî dûr im meded Seyda meded Seyda

4. Meded Seyda te nabînim birîndarek bi nalînim
Gelek bê ‘eql û pir dîn im meded Seyda meded Seyda[296]

5. Ji bo yek dane murġê dûn di qeyd û bendê bû meḥzûn[297]
Ṣifet adem gelek meġbûn meded Seyda meded Seyda

[296] Gelek bê ‘eql û pur dîn im meded Seyda meded Seyda(X), (Z)
[297] Ji bo yek dane murġê dûn di qeyd û bendê bûm meḥzûn (A),(M)

6. Ji destê nefs û şeyṭanî esîr im ez di zindanî[298]
   Kurê Zalî gelo kanî meded Seyda meded Seyda

7. Buhara weṣlê wunda ye zivistanê li min daye
   ‘Eca’ib ṣar û ṣermaye meded Seyda meded Seyda [299]

8. Xes û xarê xeyalatan kirin dil dûr ji miratan
   Ji miṣbaha kemalatan meded Seyda meded Seyda

9. Ji miṣbaha kemala xwe ji fanûsa cemala xwe
   Di dil deyne xeyala xwe meded Seyda meded Seyda

10. Xeyala xwe di dil hil ke bi wê can û ciger kul ke[300]
    Bi derdan şubhî bulbul ke meded Seyda meded Seyda

11. Ḥeta kengî wiha bim ez bi her bakî li babim ez[301]
    Kerenga nêv hewa bim ez meded Seyda meded Seyda[302]

12. Rehînê în û an başem zebûnêf her bedan başem[303]
    Bigirdabê ġeman başem meded Seyda meded Seyda

13. Ji ġeyrî te mi navê kes ne mulk û zêr û zîv û mes[304]
    Ji meḥbûban divêm te bes meded Seyda meded Seyda

---

[298] Ji destê nefsa şeyṭanî esîr im ez di zindanî(M)
[299] Ecêb ṣar û ṣermaye meded Seyda meded Seyda(A)
[300] Xeyala xwe di dil hil ke bi wê can û cesed kil ke (Z)
[301] Ḥeta kengî wiha bim ez kerenga nêv hewa bim ez(M)
[302] Bi her bakî li babim ez meded Seyda meded Seyda(M)
[303] Rehîn û în û an başem zebûnêf her bedan başem(A)
Rehîn în an başem zebûnêf her bedan başem(M)
[304] Ji ġeyrî te mi navê kes ne mulk zêr û zîv û mes(M)

14. Tu xweş zîba û re‘na yî tu xweş bedrek mucella yî

Tu xweş nûrek Xwedê da yî meded Seyda meded Seyda

15. Bi qamet serwê bala yî bi le‘l û leb şekerxa yî[305]

Çi şox û şeng û zîba yî meded Seyda meded Seyda [306]

16. Ḥebîbê rûḥ û hem can î ji derdan ra tu Loqman î[307]

Ḥeqîqet mahê taban î meded Seyda meded Seyda [308]

17. Çi xweş şah î çi xweş mah î ṭerîqet ra tu şehrah î[309]

Bi te çêbûne gumrah î meded Seyda meded Seyda

18. Tu xweş kehfa xerîban î melaẕa her feqîran î

Tu ġemxwarê ḥezînan î meded Seyda meded Seyda

19. Tu saḥib reḥm û iḥsan î penaha dîn û îman î

Tu dermanê birînan î meded Seyda meded Seyda

20. Gelek meṭbû‘ û şêrîn î rewaca dewlet û dîn î

Wezîrê şahê Nûrşîn î meded Seyda meded Seyda

21. Bi himmet Ġewsê Geylan î bi ḥikmet beḥrê ‘umman î

Bi ḥusnê Yusûfê Ṡanî yî meded Seyda meded Seyda

22. Hezan îro te kir Hîzan ji beḥsa şekkeramîzan

---

305 Bi qamet serwê bala yî bi le‘l leb şekerxa yî (A)
306 Bi şox şeng û zîba yî meded Seyda meded Seyda(A)
Çi şox şeng zîba yî meded Seyda meded Seyda(M)
307 Ji bo me rûḥ û hem can î ji derdan ra tu Loqman î(A)
Ḥebîbê rûḥ hem can î ji derdan ra tu Loqman î(M)
308 Tu heyva mahê taban î meded Seyda meded Seyda(A)
309 Çi xweş şah î çi xweş şah î ṭerîqet ra tu şehrah î(A)

Ji zêran ra bûyî mîzan meded Seyda meded Seyda

23. Ricakar im ji îḥsanê ku dîsa bême dîwanê
Bibînim te li eywanê meded Seyda meded Seyda

24. Birêjî tu bi erzanî ewê feyża wekî kanî
Li qelbê **Fetḥiyê** canî meded Seyda meded Seyda

**13**[310]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1. 'Îd e û pir bê umîd im ez ji dîdara ḥebîb [311]
Karê 'alem 'iyş û 'işret karê min ḥuzn û neḥîb[312]

2. Fîlḥeqîqet ayeta 'îdê yek e qewsa hilal
Ya mehê nû ya hilala ebrûwanê dilferîb[313]

3. Ayeta 'îda xwe ehlê şer'ê girtin mahê nû[314]
Ehlê 'işqê jî hilala ebrûwê purzeyn û zîb

4. Tev bi der hatin ṭelebkarê nîşan û ayetan[315]
Xiżrî dî ava ḥeyatê wê ma Sikender bê neṣîb

---

[310] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne
[311] 'İd e û pur bê umîd im ez ji dîdara ḥebîb(Z)
'İd e her kes muferreḥ ew ji didara ḥebîb(M)
[312] Karê 'alem 'eyş û 'işret karê min ḥuzn û neḥîb(Z)
[313] Ya mehê nû ya hilala ibrûwanê dilferîb (Z)
[314] Ayeta 'îda xwe ehlê şerqê girtin mahê nû (Z)
Ayeta 'îda xwe girtin ehlê şer'ê mahê nû(M)
[315] Ev bi der hatin ṭelebkarê nîşan û ayetan(X)

5. Ez esîrê qeyd û benda firqet û hicranê yar
Yek bi yek efradê ‘alem meḥremê weṣla ḥebîb

6. Cumle mesrûr û fereḥbexş û qerîrul ‘eynin ew[316]
Xwûnfeşan û eşkibar im ez ji ḥicran ey lebîb

7. Hin di gel yaran di geşt û hin di nêv baġê wiṣal [317]
Ney ji wan im ney ji wan im ez feqîr ḥal û ġerîb

8. Mubtela û dilfekar û derdinak û sîneçak[318]
Çav li rê û guh li dergeh zar û giryan û keîb

9. Sînesûz û dilefrûz û derdemend û der bi der
Kes nehin wek min ḥezîn û bê newa û bê şekîb

10. Ez di miḥnetxaneya êş û ġeman efġanê kunan[319]
Gah û bêgah weqt û bêweqt wek hezar û ‘endelîb[320]

11. Ḥeyf û ṣed ḥeyf û teḥessur **Fetḥîyê** bulbul ṣifet [321]
Dûr ji gulzarê wiṣal û hemnişîn zaġê reqîb[322]

---

316 Cumle mesrûr û ferehbexş û qerîrul ‘eyne ew(Z)
317 Hin di gel yaran li geştî hin di nêv baġê wiṣal(M)
318 Mubtela derdnak dilfikar û sîneçak (M)
319 Ez di miḥnetxaneya êş û ġeman efġan kunan(Z)
Ez ji miḥnetxaneya êş û ġeman efġanê kunan(M)
320 Gah bêgah weqt bêweqt wek hezar û ‘endelîb (M)
321 Ḥeyf ṣed ḥeyf teḥessur Fetḥîyê bulbulṣifet (M)
322 Dûr ji gulzarê wiṣal û hemnuşîn zaġê reqîb (Z)
Dûr ji gulzarê wiṣal hemnişîn zaġê reqîb(M)

## 14

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1. ‘Îd e û herkes muferreḥ ew ji dîdara ḥebîb
   Ez tenê meḥcûrê yar û zar û giryan û keîb

2. Ṣef bi ṣef şadan û xendan û xeraman û çeman [323]
   Ez tenê der kuncê weḥdet zar û giryan û keîb[324]

3. Ṣorgul û bulbul di gel hev şem‘ û perwane muqîm[325]
   Ez tenê meḥrûmê weṣl û zar û giryan û keîb

4. ‘Aşiqan yek yek ṭerebnakê wiṣla dilberan
   Ez tenê rencûr û dûr û zar û giryan û keîb

5. Her mekan îro li wan darul-surûre bêguman[326]
   Ez tenê di beytul-ḥuzin da zar û giryan û keîb[327]

6. Yek bi yek mest û xeraman ew li ser nehr û çeman
   Ez tenê bê hoş û teşne zar û giryan û keîb

7. ‘Aşiq û me‘şûq îro ew di gel hev hem‘inan[328]
   Ez tenê dûr û ġerîb û zar û giryan û keîb[329]

---

323 Ṣef bi ṣef şadan xendan xeraman çeman (M)
324 Ez tenê der kuncê weḥdet zar û giryan keîb (M)
325 Ṣorgul bulbul di gel hev şem‘ perwane muqîm (M)
326 Her mekan îro li wan dara li ser wê re bêguman (Z)
327 Ez tenê di beytul ḥezen da zar û giryan û keîb (Z)
328 ‘Aşiq me‘şûq îro ew di gel hev hem ‘inan (M)
329 Ez tenê zar û ġerîb û dûr û giryan û keîb(A)
Ez tenê dûr û ġerîb û zar û giryan keîb(M)

8. Her yekî wek padişahek ew li ser textê wiṣal

   Ez tenê der kûhê hicran zar û giryan û keîb

9. Mest û mexmûrê şerab û badeyê saqî ne tev[330]

   Ez tenê mexmûrê ḥuzn û zar û giryan û keîb

10. Kûh û ṣeḥra baġ û şax û dar û ber pir zîb û zîn[331]

    Ez tenê pejmurde û pir zar û giryan û keîb[332]

11. Haṣil ey **Fetḥî** di vê lehẓê nehin kes dilbirîn

    Ez tenê aşufte qelb û zar û giryan û keîb

**15**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1. Ah ji dest wê mahrûya mahitab

   Dil ji ber ah û fiġanan bû kebab

2. Dem bi dem mecrûḥê çehvê nergisîn

   Têne dil jê tîr û cewşen bê ḥisab[333]

3. Zulfê şehmar û qedê şimşadiweş

   Eṣl û binyadê me îro we kir xerab

4. Daġhayê sîne û dil munkeşif

   Naketin ṣed defter û sêṣed kitab

[330] Mest û mexmûrê şerab badeyê saqî ne tev(M)
[331] Kûh û ṣeḥra baġ û şax û dar û ber pur zîb û zîn(Z)
[332] Ez tenê pejmurde û pur zar û giryan û keîb (X), (Z)
[333] Têne dil jê tîr û cewşî bê ḥisab (A),(M)

5. Şerbeta lêvan dixwazim ez ji dil
Ġeyr ji wê îro serab in her şerab

6. Dilnewaz û pêkve naz û qendileb
Kî şirîntir dî ji ev ‘alî cenab

7. Şehd û şeker xweş dibarîne ji leb
Her dema bê lefẓ û guftar û xiṭab

8. Çeşmeya xeddê te çûn pir nûrî bû [334]
Z̠ulfê şeb rengê te xweş lê bû niqab

9. Afitab û meh li ber mahê cebîn[335]
Wek çiraġ û meh li pêşber afitab[336]

10. Qedrê xakê kû ye tu nadêrtin
Ṣed hezaran eswed û mîzan û bab

11. Kî bi derdê te bibîtin mubtelâ
Faze wellahî binessin fîlkitab[337]

12. Min ji dareynan ġema dilber divê
Raḥetî fîl-ġemmî min ġeyr irtiyab[338]

---

[334] Çeşmeya xeddê te pur tev nûr bû(A),(M)
Çeşmeya xeddê te çûn pur nûr bû(X)
Çeşmeya xeddê te çûn pur nûrî bû(Z)
[335] Afitab meh li ber mahê cebîn(M)
[336] Wek çiraġ  meh li pêşber afitab (M)
[337] Faze wellahî binessi fîl-kitab (A)
[338] Raḥetî fîl-ġem min ġeyr irtiyab(A)

13. **Fetḥiya** her dem bi ahan ra bibêj

Ah ji dest wê mahirûya mahitab

**16**[339]

mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun

Recez – – + –/– – + – / – – + –/– – + –

1. Girti li ser me ceyşê ġem kerî bi kerî celeb celeb [340]

   Derd û ġem û êş û elem kerî bi kerî celeb celeb

2. Rihtî felek bi ser me da ṭeyrik û ṭûfan û bela

   Berq û birûsk û ṣa'iqe kerî bi kerî celeb celeb [341]

3. Çêbû li 'alem inqilab hilbû di dil ṣed iltihab

   Cerg û ceger bûne kebab kerî bi kerî celeb celeb

4. Neẓma nucûma şewûşî reş bû li me 'eyş û xweşî

   Teḥl bû li me aba xoşab kerî bi kerî celeb celeb

5. Ev çi muṣibet bû çi hat semşê ji nava me hilat[342]

   Ṣubḥ û ḍuha bûne mesa kerî bi kerî celeb celeb

6. Nazik û xûb û surperî ṣahid û rind û hem zerî

   Hiştine wan me bêmefer kerî bi kerî celeb celeb[343]

---

339 Ev helbest di destnîvîsa (Z), (X) û (M)yê de nîne

340 Girti bi ser me ceyşê ġem kerî bi kerî celeb celeb(A)

341 Berq birûsk û ṣa'iqe kerî bi kerî celeb celeb(A)

342 Ev çi muṣibet bû ku hat semşê ji nava me hilat(A)

343 Hiştine wan bêmefer kerî bi kerî celeb celeb (A)

7. Ṣohtî bi narê ḥicretê kul bû ji daġa firqetê
Qelb û dil û can û ceger kerî bi kerî celeb celeb

8. Şahê feqîr û hem geda zahid û ṣûfî û mela
Dîtine wan gelek cefa kerî bi kerî celeb celeb

9. Nale û qîrîn û fiġan şîn û girîn û eleman
Çûne ḥeta mecerreyê kerî bi kerî celeb celeb

10. **Fetḥî** ji ber narê derûn bêje şebîhê erġenûn
Beyt û qeṣa'id û ġezel kerî bi kerî celeb celeb

**17**[344]

mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun
Recez – – + –/– – + – / – – + –/– – + –

1. Ya Reb çi afet bû me dî îro ji nageh ser me hat
Nûra di dil bû munṭefî xef bû ji me şem'a civat [345]

2. Şemsa sema bû munkesif bedra felek bû munxesif
Necma żiya bû munḥerif ẓulmet li me bû qat bi qat

3. Ẓulmet seraser 'ame bû ṣubḥ û ḍuha têk şam bû
Dil ḥuzn û derda şam bû ji ḥicra ḥebîba xweş-ṣifat

[344] Ev helbest di destnîvîsa (Z), (X) û (M)yê de nîne
[345] Xef bû ji me şem'a xefat(A)

4. Ḥicra ḥebîba dil kewand cerg û ciger vêkra şewand [346]

Şîşê di ṣor têda ṭewand reş kir li me ‘eyş û ḥeyat

5. Zer kir me ḥicra mehweşê avêtime keşmekeşê

Tîrek li dil danî ku jê dernakevit ḥetta memat [347]

6. Camek ji zehra miḥnetê kasek şeraba ḥesretê

Da dil bi feyẓû şiddetê fîl-ḥalî dil pê bû memat

7. Ya Reb çi derdek e‘ẓem e seyda ku şemsa ‘alem e

Îro xwiya nabe ji me xef bû di nêv burca rufat

8. Xef bû di nêv burca zemîn da me gelek şîn û girîn

Feryad û efġan û enîn çûne semayê samiyat

9. Ew le‘l û lêvê şekerîn ew lefẓ û guftarê şêrîn [348]

Ew qameta naziktirîn badê xezan ser wan ve hat

10. Ew soḥbet û feyża ‘emîm ṭeb‘ê ḥelîm û musteqîm

Ew cewher û durra yetîm beḥra fena da bû nebat

11. Ew xedd û dêmê enwerî ew xeṭṭ û xalê ‘enberî

Ew qedd û qama ‘er‘erî iro ji wan dil pur şewat

12. Dildar û şêrîn qed î ġemxwarî û luṭfa me dî [349]

Wildan û keyf û şahid î yek yek ji meydanê hilat[350]

---

346 Ḥicra ḥebîban dil kewand cerg û ciger vêkra şewand(A)
347 Tîrek qewî danî ku jê dernakevit ḥetta memat (A)
348 Ew lêv û la‘lê şekkerîn ew lefẓ û guftarê şêrîn (A)
349 Dildar î û şêrîn qed î ġemxwarî û luṭfa me dî (A)
350 Dildan û keyf û şahid î yek yek ji meydanê hilat (A)

13. Weqta dikir ṣohbet bi coş bi leẕẕet û keyf û xeroş

Eṣḥab dibûn bê ‘eql û hûş bê ṣebr û teskîn û s̱ebat

14. Fîl-cumle serxwoş ew dibûn şubhî gula geş ew dibûn

Qeṭ hay ji roja reş nebûn roja reḥîl û hem wefat [351]

15. Çu ji destê me ew xweş zeman ewqatê xweş tev bûn rewan

Ṣed ḥeyf û ḥesret min li wan ezman û weqtê xaliyat

16. Eṣḥab û ewladê kubar etba‘ û ehlê dost û yar

Man tev yetîm û ustuxwar bê melce û bê iltifat

17. Bê ṭaqet û bê tab bûn bêxwarin û bêxwab bûn

Ger çi di ṣebrê tab bûn mis̱lê cibalê rasiyat [352]

18. Ev mesken û ev xanedan eywan û dîwana şehan

Wek qalibek bê rûḥ diman hatin ji palî ra xelat [353]

19. Palî ji werdan kemmilî ser ta qedem têk xemmilî

Bi wan qedd û qamê gulgulî fazet bicullil-muştehat

20. Bû menzila rûḥaniya bû perdegaha ewliya [354]

Şemsa munîr bedra żiya bêḥed nucûm û neyyirat

21. Faqet bimen fîha extela ‘eles-semawatil-‘ula[355]

‘Elel-s̱ureyya wessuha ‘elel-cinanil ‘aliyat

---

[351] Qeṭ hay ji roja reş nebûn roja reḥîl hem wefat(A)
[352] Ger çi di ṣebr û tab bûn mis̱lê cibalê rasiyat (A)
[353] Wek qalibek bê rûḥ man hatin ji palê ra xelat (A)
[354] Ev malik di destxeta (A)yê de nîne
[355] Qaqet bimen fîha extelî ‘eles-semawati-‘ulî(A)

22. Eḥsin biha min rewżetin ‘e’ẓim biha min dewḥetin

We ya leha min buq‘etin ġaẓet leha kullil-cihat

23. Ya za’iren haẕel-meḥell qif bilettedube wel-wecl

Yelhebû men fîhî nezel kullul-usudil żariyat

24. Ya Reb bi iḥsana xwe kî şehzadeya perwerde kî

‘Umrê delalan zêde kî têr av bikî bi ava ḥeyat

25. Ava ḥeyatê nisbet e feyż û ṭerîq û ṣoḥbet e

Xemr û kebab û ‘uşret e wurd û wurûd û waridat

26. **Fetḥî** kuleybê kemterîn ji agir û pêta nehîn

Kir tesliya qelbê ḥezîn ev çend ḥurûfê qaṣirat

18

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Te cerg û dil li min kir xwûn û berbad [356]

Ji destê te hezar efġan û feryad [357]

2. Ġem û şadî eger çi tew ʿeman in[358]

Gelek ġem dî dil û carek nebû şad

3. Şehinşah î li textê nazidar î

Welê bê ‘ehd û pir bê ‘edl û bêdad[359]

---

[356] Te cerg û dil li min kir xwûn berbad (A),(M)
[357] Ji destê te hezar efġan feryad(M)
[358] Ġem şadî eger çi tew ʿeman in(M)
[359] Welê bê ‘ehd û pur bê ‘edl û bê dad (Z)

4. Şemîma zulfê şebrengê te ‘alem [360]

Tijî kir ṣed hezaran meḥfel û nad

5. Te‘ealellah çi istiġna dikî tu

Li şaxê baġê ḥusna zînet abad[361]

6. Gelek ‘eẕra gelek Leyla û Şêrîn

Te kir wek Wamiq û Mecnûn û Ferhad [362]

7. Bi qeṣda te zemanek bûn serefraz

Nedîn axir ruxê te serwê şimşad

8. Tû yî ḥażir di nav xaṭir de her dem[363]

Bi te her dem mu‘eṭṭer xaṭir û yad

9. Te dil mecmû‘ kir yek beḥrekî xwûn [364]

Meqamê xwe te kir texrîb û berbad [365]

10. Demadem intiẓara te dikêşim

Şev û ro çav li rê meftûḥ wek ṣad

11. Bi menzilgahê çehvê bêkesê xwe

Çira carek kerem nakî perîzad

[360] Şemîma zulfê şebrengê tu ‘alem (A),(M)
[361] Li şaxê baġê zînetê ḥusna abad(M)
[362] Te kir wek Wamiq Mecnûn Ferhad(M)
[363] Tû yî ḥażir di nav xaṭirê axir(A),(M)
[364] Te dil mecmû‘ kirye îro beḥrekî xwûn (A),(M)
[365] Meqamê xwe te kir texrîb berbad (M)

12. Bi pêta agirê hicranê cansûz

Te kir hicranê erwahan ji ecsad

13. Tu natirsî ji ahê derdemendan

Bi vî rengî tu lew mewṣûf û mu‘tad [366]

14. Dikarim ez ji dil ahek bikêşim

Helênim heft eflakan ji bunyad

15. Li min carek çira nakî tereḥḥum

Tereḥḥum pir xweş e ey serwê azad[367]

16. Ḥezîn û sîneçak û dilfikar im [368]

Feqîr û bêkes û bêzar û bêzad[369]

17. ‘Elîl û ustuxwar û bê newa me [370]

Nehin bo min penah û ‘ewn û imdad

18. Ji ber şewqa derûn û sûzê sîne[371]

Demadem karê min inşa û inşad

19. Şev û roj û seḥergah û meh û sal[372]

Ez û kelbê derê te tev bi hev şad

366 Bi vî rengî tu yî mewṣûf û mu‘tad (A)
Bi vî rengî tu wê mewṣûf û muṣtad(M)
367 Tereḥḥum pur xweş e ey serwê azad(Z)
368 Ḥezîn sîneçak dilfikar im (M)
369 Feqîr û bêkes bêzar û bêzad (M)
370 ‘Elîl ustuxwar û bê newa me (M)
371 Ji ber şewqa derûnsûz sîne (M)
372 Şev û roj û seḥergah meh û sal (M)

20. Mebêj **Feth̤î** kuleybê dergehê nîne

Ji der barî neke wî dûr û ib‘ad

**19**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1. Werne vê şîn û girînê hey hewar [373]

Ḥuzn û şîna nazenînê hey hewar[374]

2. Tev bi hev ra hûn bikin ah û fiġan [375]

Ah û efġan û enînê hey hewar [376]

3. Şemsê xawer mahê enwer bûne xef

Ew di nêv burca zemînê hey hewar [377]

4. Ye‘nî şahê kişwerê qelb û dilan [378]

Rû mis̠ala neqşê çînê hey hewar

5. Heżretî S̠anî di gel neclê delal

Çûne nêv darul-yeqînê hey hewar[379]

6. Bûne mêvanê Şehê Taġî ‘elem

Çûn ji mal û şanişînê hey hewar[380]

[373] Werne vê şîn girînê hey hewar (M)
[374] Ḥuzn şîna nazenînê hey hewar (M)
[375] Tev bi hev ra hûn bikin ah fiġan (M)
[376] Ah efġan enînê hey hewar (M)
[377] Ew di nêv axa zemînê hey hewa(M)
[378] Ye‘nî şah û kişwerê qelb û dilan (M)
[379] Çûne nêv darel-yeqînê hey hewar (Z),(X)
[380] Çûn ji mal şanişînê hey hewar (M)

7. Dil birin sêṣed hezar neqṣ û xelel [381]

Dan binaya ‘eql û dînê hey hewar [382]

8. Hiştine eṣḥab û yaran ustuxwar [383]

Wan di kerb û ḥuzn û şînê hey hewar [384]

9. Da seḥaba zulfê Leylayê li Qeys

Lami‘a berqa cunûnê hey hewar

10. Şubhetî Mem ma di zindana firaq

Dil ji hicra rûyê Zînê hey hewar

11. Kûhê ġem danî li Ferhadê feqîr

Wê kubara surşirînê hey hewar

12. Yusûfê Ken‘an ji ser textê xwe çû[385]

Da Zuleyxayê girînê hey hewar

13. Wamiq û Xusrew çewan dê ṣebrê kin[386]

Ew ji ‘ezra û şirînê hey hewar [387]

14. Vaye weyla bulbulê dil parepar

Gulperest û gulḥebînê hey hewar [388]

---

[381] Dil birin sêṣed hezar neqṣ xelel (M)
[382] Dan binaya ‘eql dînê hey hewar (M)
[383] Hiştine eṣḥab yaran ustuxwar (M)
[384] Wan di ḥuzn kerb şînê hey hewar(M)
[385] Ev malik di destxeta (M)yê de nîne
[386] Wamiq Xusrew çewan de ṣebrê kin(M)
[387] Ew ji ‘ezrayê şirînê hey hewar (M)
[388] Gulperest gulḥebînê hey hewar (M)

15. Ṣedhezar mecmer di nêv perwane da [389]

Wî ji miṣbaḥa evînê hey hewar

16. Tev ji hecra Ḥeżretî Nûrşîn meqam

Her dirêjin eşkê xwînê hey hewar

17. Riḥleta wî pir di qelban kir eṯer[390]

Şubhetî neqşê nigînê hey hewar[391]

18. Belkî kûh û deşt û ṣeḥra dar û ber [392]

Hatine lerz û hejînê hey hewar

19. Lew dibînim ṣorgul û sunbul tevav[393]

Ser didin ser nesterînê hey hewar

20. Rengê me'şûqan û rengê 'aşiqan [394]

Bûne rengê yasemînê hey hewar [395]

21. Ah û ṣed ḥesret ḥeta saġ im li min

Ta herim zîrê zemînê hey hewar [396]

22. Dê çi kim ya Reb di vê kaxa dinê

Bê wiṣala ḥûri 'eynê hey hewar

[389] Sedhezar ateş di nêv perwane da (A)
Sedhezar mecmer di nêv perwane dar(M)
[390] Riḥleta wî pur di qelban kir eṯer (X), (Z)
[391] Şubhetî neqşê nikînê hey hewar(M)
[392] Belkî kûh deşt ṣeḥra dar û ber (M)
[393] Lew dibînim ṣorgul sunbul tevav (M)
[394] Rengê wek yaqut rûyê 'aşiqan (M)
[395] Bûye rengê yasemînê hey hewar (M)
[396] Ta here zîrê zemînê hey hewar (M)

23. Bê wiṣala wî qe xweş nîne ḥeyat

Nîne nef'a min di jînê hey hewar [397]

24. Bê cemala nazidara meh liqa [398]

Qabile çara sukûnê hey hewar [399]

25. Riḥleta wî da me tarîxa wefat

Ġeyn û mîm û bê û şînê hey hewar[400]

26. **Fetḥiyê** bê dil ḥeta saġî bibêj

Her zeman û an û ḥînê hey hewar[401]

**20[402]**

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1. Hewar e hey hewar e min ji derdê vê mesîna reş

Dil û can û ciger kul bû ji derdê vê mesîna reş[403]

2. Dixwazim ez serê xwe qenc hilînim biçime nêv Şamê

Xelaṣ bim ez ji kerb û ġem û derdê vê mesîna reş

3. Wisan ez 'aciz û ġemgîn û meḥzûn û perîşan im

Ḥezîn û bê newa mame ji derdê vê mesîna reş

---

[397] Nîne nef'a min ji dînê hey hewar (M)
[398] Bê cemala nazidara min liqa (A)
[399] Qabile çara sekînê hey hewar (M)
[400] Ġeyn mîm bê û şînê hey hewar(M)
[401] Her zeman an hînê hey hewar (M)
[402] Ev helbest di destnivîsa (A), (M) û (X)ê de nîne
[403] Dil û can û ciger kul bûn ji derdê vê mesîna reş (Z)

4. Çi derdek e'ẓem e ya reb me bê ḥemd kiriye wî îro
   Qeża û ṣed bela bêtin li derdê vê mesîna reş
5. Eger Ḥafiẓ ḥemamê çêbike lakin mesîn ev be
   Nehin qedrê ḥemama te ji derdê vê mesîna reş

6. Dike qedrê te û ḥemam û mulk û malê te noqṣan
   Seraser yek bi yek fîl-cumle derdê vê mesîna reş

7. Bixwazî ger tu ṭaret bigrî av jê nayêtin xwarê
   Çi derdek zor  û bê derman e derdê vê mesîna reş[404]

8. Di nav desmêjê da carnan diqelbe jê diçe tev av
   Hewar e hey hewar e ji derdê vê mesîna reş[405]

9. Gerek gazî bikî şêx û li Ẕalî feryadekî rakî
   Werin dîsa di imdadê ji derdê vê mesîna reş

10. Eger ḥażir nebin dê tu di nava gend û gû da bî
    Ḥeta imdadekî bêtin ji derdê vê mesîna reş

11. Were Ḥafiẓ bi mêranî û bişkêne mesîna xwe
    Xelaṣ ke me ji kerb û derdê vê mesîna reş[406]

12. Hezaran tewbe îro ez dibêjim ey mesîna reş
    Ji fi'la xwe peşêmanim dibêjim ey mesîna reş[407]

---

404 Çi derdek zor e û bê derman e derdê vê mesîna reş (Z)
405 Hewar e hey hewar e min ji derdê vê mesîna reş(Z)
406 Xelaṣ ke me ji kerb û xem û derdê vê mesîna reş(Z)
407 Ji feṣla çû peşêmanim dibêjim ey mesîna reş (Z)

13. Hezar esteġfirullah ez dibêjim ṣubḥ û hem şaman
Peşêmanim peşêmanim dibêjim ey mesîna reş

14. Qeda û ṣed bela bêtin li wê neẓma ku min gotî
Di ẕemma te peşêmanim dibêjim ey mesîna reş

15. ‘Efû kî min ji vê neẓma ku min gotî di ḥeqqê te
Ricakar im peşêmanim dibêjim ey mesîna reş

16. Ne sûçê min bû lewra min qe wî rojê nekir te nas
Umîdwarim peşêmanim dibêjim ey mesîna reş

17. Ne weqtek tu di destê dilberan da bûyî ba i‘zaz
Xwedan qedr û xwedan ḥurmet tu bûyî ey mesîna reş

18. Cihê çay û şerab û şerbeta şêrînleban bûyî
Cema‘et tev neẓerdarê te bûn hem ey mesîna reş

19. Li te ser dabû ‘eksa rohniya ṣaḥib cemalan tev
Çi xûb û rind û zîba bûyî ew dem ey mesîna reş

20. Yeka yek xelqê meyxanê dixwestin wê şeraba te
Bi can û dil dema dem te dihebandin ey mesîna reş

21. Ji yek canib newaya ṣoḥbeta bezma delalan bû
Ji yek canib ṣedaya qelqela te ey mesîna reş

22. Hinek bûn mest û medhûşê newaya ṣoḥbeta yaran

Hinan meşġûlê meşġûl şeraba te mesîna reş[408]

23. Li me ya reb çi xweş bûn ew zeman û weqt û ew dewran

Belê Newrûz û sersal û buhar bûn ey mesîna reş

24. Berat û leyletul-qedr û hezaran ‘îd û sersalan

Di mizgînê didim billah tev ez ey mesîna reş

25. Qesem billah eger mizgîn ji wî weqtî ji bo min bê

Didim ez mal û mulkê xwe seraser ey mesîna reş

26. Te‘alellah di dil da qeṭ nebû xarek firaqê hem

Di mil da jî vebû barek firaqê ey mesîna reş[409]

27. Ji vî xweştir heye bostan û baġ û dilber û seyran

Şerab û şerbet û ‘işret cemî‘in ey mesîna reş

28. Xwest e îro li ḥalê xwe ku em bigrîn bikin feryad[410]

Ji destê me çewan xef bûn beranber ey mesîna reş[411]

29. Bi miḥad û bar û narê firqetê ez mubtela bûme [412]

Hezar ateş di dil da şu‘ledarin ey mesîna reş

30. Tu jî meḥkûmê na ehlan û nadanan bûyî îro

Di puştî ‘izz û naz û fexr û ḥurmet ey mesîna reş

---

408 Hinan meşġûf û meşġûlê şeraba te mesîna reş (Z)
409 Di mil da jî nebû barek firaqê ey mesîna reş (Z)
410 Heqq e îro li ḥalê xwe ku em bigrîn bikin feryad(Z)
411 Ji destê me çewan xef bûn seraser ey mesîna reş (Z)
412 Bi xar û bar û narê firqetê ez mubtela bûme (Z)

31. Ji deste dilberan hatî ketî destê ẕelîy û şêxwe

Xwedê ṣebrê bide îro ji bo te ey mesîna reş

32. Wihaye karê dunyayê gehê ‘izz e gehê ẕille

Gehê weṣl e gehê hecr e bizane ey mesîna reş

33. Dibêjin xelq di te‘yiba te da herdem mesîna reş[413]

Reşî kê gotiye ‘eyb e bibêje ka ey mesîna reş [414]

34. Tu nabînî ku zulf û xeṭṭ û xal û keysûyê yaran

Çiqa reş bin wiha zêde dibin xweş ey mesîna reş[415]

35. Eger reş nîn bûwa miska xoten dê ev qeder qîmet

Çira xelqê bida miskê bi ṣed hezar zar ey mesîna reş [416]

36. Belê beyta Xwedê ser ta qedem têk came jî pêra

Reş in lakin heye wan qedrê ‘alî ey mesîna reş

37. Ḥecer Eswed reş e ji lêva lêv şêrînan tev[417]

Perî bûse didin êdî nemaye ey mesîna reş

38. Ji Mecnûn qedrê Leylayê ku sewdaye bipurse tu

Binêre ka dibêje çi ji bo te ey mesîna reş

39. Were Ḥafiẓ bi mêranî hilîn ev cewhera enfes

Bike ‘izaz û te‘ẓîmek ji bona vê mesîna reş

[413] Dibêjin xelq di te‘yina te da herdem mesîna reş (Z)
[414] Reşî kê gotiye ‘eyb e bibêj ka ey mesîna reş (Z)
[415] Çiqa reş bin deha zêde dibin xweş ey mesîna reş (Z)
[416] Çira xelqê bida miskê bi ṣenda ey mesîna reş (Z)
[417] Ḥecer Eswed reş e lakin ji lêva lêv şêrînan tev (Z)

40. Wan geh geh bi ḥurmet derxe da em wê ziyaret kin[418]

Muşerref bin mukerrem bin bi rûyê vê mesîna reş

41. Bes e **Fetḥî** tu jî tewbe bike ji sûç û xetayê xwe

Bike wurdê zibanê xwe ṣenayê vê mesîna reş

**21**[419]

fe‘ilatun(fa‘ilatun) / fe‘ilatun / fe‘ilun(fa‘ilun)

Remel + + − −/+ + − −/+ + −

1. Dil ji bil qametê yarê çi ġereḍ

   Me ji ezharê buharê çi ġereḍ

2. Me ji destê te ye nalîn û hewar

   Werne me ji ah û hewarê çi ġereḍ

3. ‘Eddê eyyamê firaqa te dikin

   Werne me ji ‘edd û jimarê çi ġereḍ

4. Ger wiṣala te muyesser nebitin

   Me ji eyyamê buharê çi ġereḍ[420]

5. Ji ḥeraret herişî sîne û dil[421]

[418] Welê geh geh bi ḥurmet derxe da em wê ziyaret kin(Z)

[419] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne

[420] Me ji newrûz û buharê çi ġereż (M)

[421] Ji ḥeraret herişîn sine û dil (M)

Werne me ji sêv û hinarê çi ġereḍ

6. Zulfê şehmarê çu ‘eqreb ku li dil da[422]
   Werne me ji ‘eqreb û marê çi ġereḍ
7. Ger ne xaka derê dildarê bûwa
   Me ji vê toz û ġubarê çi ġereḍ

8. Ne wekî zulf û ruxê yarê bitin [423]
   Me ji vê leyl û neharê çi ġereḍ [424]

9. Ger ne wek qametê şimşadê bitin
   Me ji şimşad û çinarê çi ġereḍ

10. Dilkuşa ger nebe nûra li cebîn[425]
   Me ji nûra ruxê yarê çi ġereḍ

11. Dilê mecrûr cesed pêve muqeyyed
   Werne me ji cerrê ciwarê çi ġereḍ

12. Bah û zaran dilê yaran dibe nerm [426]
   Werne **Fetḥî** ji ah û zarê çi ġereḍ

---

[422] Zulfê şehmarê çu ‘eqreb ku da li dil(M)
[423] Ne wekî zulf ruxê yarê bitin (M)
[424] Me ji vê leyl neharê çi ġereż(M)
[425] Dilkeşa ger nebe nûra li cebîn (Z)
Dilkuşa ger nebitin nûra li cebîn(M)
[426] Dilê yaran bah zaran dibe nerm (M)

## 22[427]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1. Mam di nêv 'ecz û melalê ḥeyf û ḥeyf [428]
   'Umrî jî berda zewalê ḥeyf û ḥeyf [429]

2. Bê 'ezîzan ṣerfe bû 'umrê 'ezîz
   Tev di benda qîl û qalê ḥeyf û ḥeyf [430]

3. Ṣerfe kir weqta me ṣerf û neḥwê meḥw [431]
   Ṣubḥ û şam û mah û salê ḥeyf û ḥeyf [432]

4. Roj û şev bê fayde borîn nagihan
   Tev di vê fikr û xeyalê ḥeyf û ḥeyf [433]

5. Ah û ḥesret qeṭ ji bo me dest neda [434]
   Ṣoḥbeta qenc û delalê ḥeyf û ḥeyf [435]

6. Camê hicran min vexwarî yek bi yek
   Pê nedîm cama wiṣalê ḥeyf û ḥeyf [436]

7. Badê firqet qameta şubhê elîf

[427] Ev helbest ji destnîvîsa (Z)yê hatiye wergirtin û di destnivîsa (A), (X) û (C)yê de nîne
[428] Mam di nêv 'ecz û melalê ḥeyf ḥeyf (M)
[429] 'Umrî jî berda zewalê ḥeyf ḥeyf (M)
[430] Tev di benda qîl û qalê ḥeyf ḥeyf (M)
[431] Ṣerfe kir weqta me ṣerf neḥwê meḥw (M)
[432] Subhê şam û mahê salê ḥeyf ḥeyf (M)
[433] Tev di vê fikr û xeyalê ḥeyf ḥeyf (M)
[434] Ahê ḥesret qeṭ ji bo me dest neda (M)
[435] Ṣoḥbeta qenc û delalê ḥeyf ḥeyf (M)
[436] Lê nedîm cama wiṣalê ḥeyf ḥeyf (M)

Qewsê kir wek nûn û dalê ḥeyf û ḥeyf [437]

8. **Fetḥiyê** bêçare maye ustuxwar
   Hemdemê ‘ecz û melalê ḥeyf û ḥeyf [438]

**23**[439]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – – / – + –

1. Neşterê pûlan e ya mujganê xûnxwarane ev
   Neş’eya mey ya nikahê çehvê meyxwarane ev

2. Qûtê canê ‘aşiqê miskîn e ya yaqûtê le‘l
   Ya şeker barê du lêvê van şekerbarane ev

3. Erqemin ḥelqe girêdane li dor bedra felek
   Ya siyehmarê du zulf û cebheyê yaran e ev

4. Nefḥeya miska xoten ya ‘enberê amîzê ṣeba[440]
   Ya demê ‘Îsa ye ya bihna ‘eṭirdaran e ev

5. Qeṭreya ava beqa ya reşḥeya ‘eynel-ḥeyat
   Ya ‘ereq ber cebheyê meḥbûb û serdaran e ev[441]

[437] Qewsê kir wek nûn dalê ḥeyf ḥeyf (M)
[438] Hemdemê ‘ecz û melalê ḥeyf ḥeyf (M)
[439] Ev helbest di destnivîsê (A) û (M)yê de nîne
[440] Nefḥeya miska xoten ya ‘enberê amîz ṣeba (Z)
[441] Ya ‘ereqê ber cebheyê meḥbûb û serdaran e ev (X), (Z)

6. Keyber in xweş têne dil ya tîr û ya rim ya sînan

Ġemze in ya awirê çehvê siḥirdaran e ev[442]

7. Rustem û Esfendyar in ya du rimbazê Ḥebeş

Ya du fetanê xeṭ û xalê sitemkaran e ev

8. Dasê zer‘ê cane ya miḥrab e ya qews û qezeḥ

Ya hilalel-‘îde ya ebruwê dildaran e ev

9. Serweya şimşad e ya ḥerfa elîf ya neyşeker

Ya qed û balayê xweş reftar û ‘eyyaran e ev

10. Sorgul in ya badeyê ḥemran e ya sêv û hinar

Ya du xeddeynê siyehçehvan û mehparan e ev

11. Şemsê xawer ya mehê enwer li ser serwa sihê

Bûye sakin ya qed û ruxsarê ġemxwaran e ev

12. Miskê ez̠fer ya şebê deycûre ya marê di reş

Ya kemendê ṭurreyê şebrengê ṭerraran e ev

13. Caduwê seḥḥar in ev ya nêrgizê re‘na û mest

Ya du şûrê engîzê çehvê fitne berdaran e ev

14. Çahe Bîjen ya mehê Ken‘an e ya nexşeb di nav

Ya zinexcayê dil û canê elemdaran e ev

[442] Ġemze in ya awirê çehvê seḥerdaran e ev (Z)

15. Ke‘be ya butxane ya ew mecmera Zerduşt e ya

Sîneyê bê kîneyê mecrûḥ û bîmaran e ev

16. Nîl e ya Ceyḥûn e yaxûd Qulzema zexar e ya[443]

Dîdeyê ġemdîdeyê pir eşkê xwûnbaran e ev[444]

17. Dasitana weṣl e ev ya qiṣṣeya hicran e ya

Nameya cewr û cefaya dilbirîndaran e ev

18. Ṭûṭiyê xweş teb‘et e ya ‘endelîbê bênewa

Ya dil û can besteyê fitrakê nûbaran e ev

19. Quqnusê pur zar e ev ya bulbulê şeyda ye ya [445]

**Fetḥiyê** dil pare parê destê ġeddaran e ev

**24**[446]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – – / – + –

1. Eyyuhel-ixwanu mehlen werḥemunî reḥmeten

Halenî bu‘dul ḥêbîbê min zemanin firqeten

La telûmûnî fenarul-hicri zadet şu‘leten

Eḥreqetnî eḥreqetnî eḥreqellahul-firaq

[443] Nîl e ya Ceyhûn e yaxûd Qulzema zexxar e ya(Z)
[444] Dîdeyê ġemdîdeyê pur eşkê xwûnbaran e ev (Z)
[445] Quqnesê pur zad e ev ya bulbulê şeyda ye ya(Z)
[446] Ev helbest bi zimanê Kurdî û 'Erebî ye û di nusxeya (Z), (A) û (X)ê de nîne

2. Firqeta nazik qeda leb ġunçeya şêrîn kelam

Dilbera qametxweş û gul çehreya bedra temam

Ṣorgula bostanê qelba Ḥeżretî Nûrşîn meqam[447]

Da dilan derd û ġem û alam û narê iftiraq [448]

3. Ẕubtu min nîrani hicranil-eḥibbail-nicab

Fatenî luqyahumu iẕ dare fîlbeynil-ḥicab

La tu'atibnî fekem fîl-qelbi minhum iltihab

Bi'se ḥalî bi'se ḥalî miṯle 'etşanil-'iraq

4. Ḥaleti fîl-welhi wetterdadi ḥaket ḥalehu

Yeşbehul-balul ke'îbul-mustehamu balehu

La teqûlu la teqûlu keyfe haẕa ma lehu

Keyfe yeḥya men eṣabet qelbehu nare iştiyaq

5. Ḥeżretî Ṯanî şehê şehbazê meydana dila

Serwer û hem serferaz û mecme'a şeyx û mela [449]

Sosina bostan û werd û ṣorgula nêv sunbula [450]

Raḥe min dunya we e'ṭaha ṯelaṯen min ṭelaq

6. Wî bi himmet wergerand 'ezm û 'inana himmetê [451]

Çû bi bal baġê liqa û şehnişîna cennetê [452]

Da me şîn û derd û daġ û kerb û ḥuzn û ḥesretê [453]

Ḥesreten kadet biha en tebluġel-ruḥul-teraq

---

[447] Ṣorgula bostanê qelban Ḥeżretî Nûrşîn meqam(M)
[448] Da dilan derd ġem alam narê iftiraq (M)
[449] Serwer û hem serferaz mecme'a şêx mela (M)
[450] Sosina bostan werd ṣorgula nêv sunbula (M)
[451] Wî bi himmet wergerand 'ezm 'inana himmetê (M)
[452] Çû bi bal baġê liqa şehnişîna cennetê (M)
[453] Da me derd û dem şîn kir bi ḥuzn ḥesretê (M)

7. Żaqetil-erḍu ‘eleyna wel-fesîḥu intefa
Eẕleme dunya ‘eleyna iẕ żiyana inṭefa
Hametil-elbabu ṭurren iẕ dehaha ma kefa
Lideġetun ma in leha tiryaqu buldanil-‘iraq

8. Cumletul-eṣḥabi min kasil-humumi ḥa’irûn
Ber felekha neġme endazendi hemçûn erġenûn
Neġme û firyadê şan inna ileyhî raci'ûn
Îẕa eṣabethum muṣibet bîha enfekket telaq[454]

### 25[455]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel – + – –/– + – –/– + – – / – + –

1. Li diyarê te xerîb im ey tu kehful-ġureba
Ṭale ma lem nere minkel-luṭfe Ellahu cezak

2. Ya melaẕel-ġureba innî feqîrun we ġerîb
Neẓerek wer bide ḥalê vî xerîbê sîne çak

3. Min hene bê ḥed ġem û derdê ‘ecîb û pir mezin [456]
Leyse fî qelbî ḥebîbun eyyuhel-xillu siwak

4. Kulle yewmin mewtetun lî fîl-firaqi qed bedet
Her dikêşim van cefayan we ez im her derdinak [457]

[454] Ev misre di destnivîsa (C)yê de nîne û ji ya (M)yê hatiye wergirtin
[455] Ev helbest bi Kurdî û Erebî ye. Her wiha ev helbest di nusxeya (Z)yê de nîne.
[456] Min hene bê ḥed ġem û derdê ‘ecîb pur mezin(X)
[457] Her dikêşim van cefayan lew ez im her derdinak(A)

5. Ez qewî jar û ḥezîn im ṣaḥibê derd û elem

   Bi'se ḥalî bi'se ḥalî fî newake fî newak

6. Ewqedet fîl-qelbi naren şu'letun minhu 'elet

   Lew ji hicra ẕulf û xalan her ez im ġalṭanê xak

7. Mame bê ṣebr û sukûn û derdemend û mustemend[458]

   Leyse lî xillun yudarînî cewen illa hewak

8. Ġeyre ennî fî ẕîl-ewṣafî innî ha'imun [459]

   Hem birîndarê du çeşmê nazik û burheynê pak

9. Her dinalim her dikalim dil keîb im bê meded

   Beddelet ḥalî biḥalî mustehamin la yerak[460]

10. Lî fu'adun lem yezel yelhef lehu wa esefa

    Ev çi ḥuzn e çi melal e çi ye ev derdê hilak

11. El ʿeman wa ḥesreta ah û fiġanê bê ḥisab

    Ma emerrel-bu'de ya mewlayê min żeu'i senak[461]

12. Ma lena ṣebrun cemîlun eyne ġibte eyne eyn

    Nîne derman û dewa îlla wiṣala ġemzenak [462]

---

[458] Mame bê ṣebr û sukûn û derdemend û mustemend (X)
[459] Ġeyre ennî fî ẕîl-ewṣafî innî ha'im(A)
[460] Beddilet ḥalî biḥalî musethamin la yerak(X)
[461] Ma emerrel 'ebde ya mewlayê min żeu'i senak (A)
[462] Nîne derman dewa îlla wiṣala ġemzenak (A)

13. Kelbê dergahê te me ey meẓherê nûril-huda[463]

Înne lî qelben ḥezînen leyse yexlu min welak

14. Ente meqṣudî fe‘eṭfen minke miṣbaḥe duca

Ehlê reḥm û cûdî ey nazik nihala tabinak

15. Ez ji şewqa dîtina gulfamê rûyê te ḥezîn

Leyse qeṣdî we muradî minke illa en erak

16. ‘Ezẕibil-qelbe we nadi key erake ya muna

**Fetḥiya** ev te murade yesserellahu munak

**26**

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1. Hubûb kir bayê hicranê bi ser baġê dilê min da

Ji nageh ve şikand şaxa gula newreste û şînam

2. Seraser kunbeda exżer siyehpoş û mulemme‘ hat[464]

Ji dûdê agirê dilsûz û tîrêjiyê di ahînam [465]

3. Hezaran kûhê derd û ġem dikêşim şubhetî Ferhad

Nehin qeṭ kes xwedan xeyrek xeber dit ji alê şêrînam[466]

4. Di ḥebsa firqet û dûrê ji nageh ve muqeyyed bûm [467]

---

[463] Kelbê dergahê te me ey meẓherê nûrul-huda(X)
[464] Seraser gunbeda exżer siyehpoş mulemme‘ hat (M)
[465] Ji dûdê agirê dilsûz û tîrêjiyê dahînam (Z)
[466] Nehin qeṭ kes Xwedan xeyrek xeber dit ew ji şêrînam (A)
Nehin qeṭ kes Xwedan xeyrek xeber dit ji şêrînam(M)
[467] Di ḥebsa firqetê dûrê ji nageh ve muqeyyed bûm(M)

Memim îro di zindanê ku da çû gulruxa Zînam

5. Wekî koko dibêm koko şev û roj û seḥergahan [468]
Ḥelandî can û dil yekser firaqa serw sîmînam[469]

6. Were carek bi nazdarî bi ser çavê feqîrê xwe[470]
Te bir fîl cumle dîn û dil qerar û ṣebr û teskînam[471]

7. Binefş û sunbul û sosin seraser tên temaşayê [472]
Eger carek xwiyakî ey gula gulzar û nesrînam [473]

8. Qesem bîllah di vê dewrê nedî min dilberek wek te
Nizanim ḥûrî ya nûrî ela ey ḥûriya ‘înam

9. Di ẓahir da Żiyadîn î di baṭin Ẕul-cenaḥeyn î [474]
Ḥeqîqet qurretul-‘eynî tû yî hem fexr û temkînam

10. Tu quṭbê ‘alemê bûyî bi te ‘alem munewwer bû
Ji meşriq ta bi meġrib tev ne tenha xakê Nûrşînam

11. Żiyayê ṭel'eta enwer gelek qelban munewwer kir
Mu‘eṭṭer bûn bi rûyê mehliqaya pak nûrînam[475]

12. Di singê daġidarê min hezaran mecmerê ateş

---

468 Wekî koko dibêm koko şev roj û seḥergahan (M)
469 Ḥelandî can û dil yekser firaqa serwê sîmînam(X), (Z), (A)
Ḥelandî can dil yekser firaqa serw sîmînam (M)
470 Were carek bi nazdarî li ser çavê feqîrê xwe (Z)
Were carek bi nazdarî li ser çahvê feqîrê xwe(M)
471 Te bir fîl cumle dîn dil qerar û ṣebr û teskînam(M)
472 Binefş sunbul sosin seraser tên temaşayê (M)
473 Eger carek tecellî dit ey gula gulzarê nesrînam(M)
474 Di żahir da Żiyadîn î di baṭin Ẕulcenaḥeyn (A)
475 Mu‘eṭṭer bûn bi rûyê meh liqaya pak û nûrînam (X), (Z),

Te danî lew wekî quqnis ji dil tê dengê qêrînam[476]

13. Wefadara wefadarî di gel yaran wiha nîne

Xweş e ma ez bikim nalîn û seḥ kin ah û nalînam

14. ‘Eceb mame ji vê erżê ku şemsa bê zewala min

Çewan xef kir di nêv axê wiha lez wî ji nêrînam

15. Xwiya nabe ji min dilber çewan çêkim nehin ṭaqet

‘Elel-erz û qed żaqet di ev weqt û di ev hînam

16. Nehin min ḥîleya weṣlê nehin min ṭaqeta hecrê

Ji min winda ye sîmendam û hem sa‘id nigarînam[477]

17. E nabînim cemala wî feqîr mame ji wiṣala wî

Demadem te ji xiyala wî ṣeda û ṣewt û zarînam[478]

18. Dilê yaran gelek geş bû żemîrê wan ‘eceb xweş bû

Bi rû babê cemaluddîn gul û nazik nihalînam[479]

19. Ku dê bit ṣaḥibê weqtê celîsê kursiya bextî [480]

Bibe merkez ji bo yaran di cayê babê ‘alînam

20. Di vê fikrê de bûn eṣḥab ji kîna dehrê ġafil bûn

Ku dê bayê ecel rabit hilîne werd û nesrînam [481]

---

[476] Te danî lew wekî qeqnes ji dil tê deng û qêrînam(X), (Z)
[477] Ji min wunda ye sîmendam we hem sa’id nigarînam(Z)
Ji min wenda ye sîmendam we hem sa’id nigarînam (X),(M),(A)
[478] Demadem te ji xiyala wî ṣedayê ṣewt zarînam (M)
[479] Bi rû babê cemaluddîn gulê nazik nihalînam (M)
[480] Ku dê bit ṣaḥibê weqtê celîs kir te siya bextî(M)
[481] Ku dê bayê ecel bêtin hilîne werd û nesrînam (A),(M)

21. Xwedawenda me dil şake gelek quṭban ji wan rake

Bi ḥeqqê Ġews û Seyda ke bi medfûnê di Nûrşînam[482]

22. Ji wan me dûr meke ya reb di dunya û di ‘uqbayê[483]

Bibên amîn gelî yaran dema bê dengê amînam

23. Bibêj ey Fetḥiyê dilkul ku tarîxa wefata wan

Di sala mîm û bê dabû di piştî ġeyn û hem şînam[484]

**27[485]**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1. Her kesê carek diye ev qedd û ra‘naya Selîm[486]

   Ma muḥeyyer ew di fikra bejn û balayê Selîm

2. Soḥte wî can û ciger ṣebr û s̱ebata wî nema

   Ê ku yek carek neẓer da şekl û sîmayê Selîm

3. Zinde ma ḥeta ebed xweşḥal û fariġ balê bû [487]

   Ê vexwar yek cur‘ekî ez camê ṣeḥbayê Selîm

4. Hate reqṣê qelb û dil can û ciger wî bû kebab

---

[482] Bi heqqê Ġews Seyda ke bi medfûnê di Nûrşînam (M)
[483] Ji wan me dûr meke ya reb di dunyayê di ‘uqbayê (M)
[484] Di sala mîm we bê dabû di piştî ġeyn hem şînam(A)
Di sala mîm û bê dabû di puştî ġeyn we hem şînam(Z), (X)
[485] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne
[486] Her kesê carek diye ev qedd û balaya Selîm (M)
[487] Zinde ma ḥetta ebed xweşḥal û fariġ balê bû(M)

Şubhî serwê ê ku dî ev serwê balaye Selîm[488]

5. Ger çi bê ḥed mubtela mane li rûyê dilberan
Ṣed hezar dilber ġulama rûyê zîbayê Selîm

6. Arizûyê cennetul-me'wê ji dil avête der [489]
Ê bi ser da yek nesîmek hat ji me'wayê Selîm

7. Mulke 'alem ser bi ser nahêjitin yek neẓrekî
Ez kenarê goşeyê van çeşmê şehlayê Selîm

8. Nîne der eknafê 'alem ser bi ser yek ferdekî
Dilnewaz û dilkuşa emṣal û hemtayê Selîm

9. Lafê hemtayê ne meqbûl e ji şimşada çemen
Ya ji serwa musteqîm ya qeddê re'nayê Selîm

10. Ṣed qesem îro di mulkê me'rifet de bê xilaf
Fîl-ḥeqîqet aṣifê dewran e Seydayê Selîm

11. Ser bi ser afaq û eqṭaran munewwer kir ḥemî
Afitaba ṭel'et û şemsa muḥeyyayê Selîm [490]

12. Şubhî zêrê zer li pey hev besteyin yek silsile
Tev kerîm ibnul-kerîm ecdad û abayê Selîm

---

488 Şubhî serwê ê ku dî ev serw û qeddûxê balaye Selîm (Z)
Şubhî serwê ê ku dî ev qedd û balaye Selîm(M)
489 Arezû wî cennetul me'wa ji dil avête der (X), (Z)
490 Afitaba ṭel'et şemsa muḥeyyayê Selîm(M)

13. Mużmeḥil kir resm û aṣarê nevîn û munkiran [491]

Şubhî siḥrê Samirî ev destê beyżayê Selîm

14. Erdeşêrê mulkê dilhayê perîşan e yeqîn

Werne bin vê rayeta cem‘iyet efzayê Selîm[492]

15. Ey ṣifet Bîjin ji dest Efrasyabê abûgil [493]

Xweş kurê Zalê zerê dewran e mewlayê Selîm

16. ‘Eskerê darayê nefsê xweş perîşan e li pêş

Cebheta ayîneya Iskender asayê Selîm

17. Ġemzeyê wî ger çi teşbihê Hilag û xan dikin[494]

Lêykê ġazanê xan in enfasê mesîḥayê Selîm

18. Sunbul û nesrîn û sosin çîçek û gul tên ẓuhûr

Dest bidit ger dewleta coş û tecellayê Selîm

19. Yek bi yek feżl û kemalatê wî qeṭ nayêne ‘ed

Têk û têk feżl û kemalat in serapayê Selîm [495]

20. Ḥeżretî Ṣanî dizanî qedrê vê durra yetîm

Şahidê qewl û meqalê min muṣellayê Selîm

21. Ger dixwazin hûn muṣeffa bin ji emrażê nihan

Werne pêş ayîneya qelbê muṣefayê Selîm[496]

---

[491] Mużmeḥil kir resm û aṣarê nevîn û munkeran (X),(Z),(M)
[492] Werne bin vê rayeta hem‘iyet efzayê Selîm(M)
[493] Ey ṣifet Bîjin ji dest Efrasyabê abgul (M)
[494] Ġemzeyê wî ger çi teşbihê Hulag û xan dikin(Z)
[495] Têk têk feżl û kemalat in serapayê Selîm (M)
[496] Werne pêş ayîneya qelbê muṣeffayê Selîm (X),(Z), (M)

22. Leḥẕeyek rûnin di ṣoḥbet da bi ‘unwana edeb[497]

Dê li ber we keşfe bin esrarê walayê Selîm

23. Şehd û qend û nuql û şekker ger bibarîne ji leb

Xwûb û meḥbûb û perîrû tên temaşayê Selîm

24. Dewleta Cawîd û Baqî kê divêtin ger nevê

Ṭalibê cama mey û kasa ḥumeyyayê Selîm

25. Dê çi bit ya reb eger carek ji bo me dest bidit

Dewleta pabûseya payê semen sayê Selîm

26. Derdê min ya reb hezar in çare lê qeṭ nabitin

Ger nebit bo min ṭebîb Loqman û ‘Îsayê Selîm [498]

27. Nefsê de‘wayê ulûhiyet dikit fir‘ewn ṣifet [499]

Elmeded ya himmeta Harûn û Mûsayê Selîm

28. Fetḥiyê bêçare maye pir ẕelîl û ustuxwar[500]

Walih û sergeşteyê hicran û sewdayê Selîm[501]

---

[497] Leḥẕeyek rûnîn di ṣoḥbet da bi ‘unwana edeb (M)
[498] Ger nebit bo min ṭebîb ‘Îsa û Loqmanê Selîm (M)
[499] Nefsê de‘wayê ulûhiyyet dikit fir‘ewn ṣifet (X),(Z), (M)
[500] Fetḥiyê bêçare maye pur ẕelîl û ustuxwar(X),(Z)
[501] Walihê sergeşteyê hicran û sewdayê Selîm(Z)
Walih û sergeşteyê sewda hicranê Selîm(M)

## 28[502]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Hezar ḥemd û s̱ena her weqt her dem
   Ji bona ẕatê Rebbê ‘erşê ‘eẓem

2. Taḥiyyat û ṣelat û hem selaman
   Li ser pêġemberan û ṣeḥbê hemdem

3. Xuṣûṣen ṣedrê dîwanê risalet
   Şeh û şehbazê meydana besalet[503]

4. Meh û xurşîdê eywana celalet
   Ḥebîb û seyyîdê ewladê adem

5. Li ser enṣar û emhar û wezîran
   Li ser ezwac û ewlad û ẓehîran

6. Li mecmû‘ê kebîr û hem ṣeġîran
   Li cumle al û aṣḥabê mukerrem

7. Ḥeta bit kumbeda dewwar û ḥaḍira
   Wekî xergeh li ser vê ferşê ġebra

8. ‘Elemdarî bide eḥbab û yara
   Cemi’ kit hicr û weṣl û şahîyû ġem

[502] Ev helbest ji destnivîsa (M)yê hatiye wergirtin û di destnivîsên din de nîne
[503] Her wiha wisa jî hatiye nîşandan: “Şeh û şehbazê meydana şeca‘at”

9. Were ey qaṣidê dost û hevalan
Bibêjim te hinek qewl û meqalan

10. Beyan kim ez hinek ‘ecz û melalan
Ġem û derdê di dil pir derd û matem

11. Dixwaze dil hinek derdan birêje
Hinek esrar û eḥwalan bibêje

12. Murada wî eger çi ev ji mêje
Ji bo sirra dilan kes nîne meḥrem

13. Di dinyayê nemaye qeṭ ṣedaqat
Nehin qeṭ kes ji bo sirran liyaqat

14. Ji bo bêhemandan qeṭ nîne ṭaqet
Me‘az̠ellah ji ev derdê mu‘eẓẓem

15. Çi derdek bê dewa ye bê qerar e
Birîna dil birînan pir ġedar e

16. Ji bo bê çareyan qeṭ nîne çare
Tune carek ji bo vî derdî merhem

17. Ji derdan dil demadem her difûre
Birîna wî birînek dûr û kur e

18. Teḥemmul nakit û nabit ṣebûre
Meded ʿey xameya hemraz û hemdem

19. Meded ke ʿey qelem dîsa were pêş
Birêjim ez li te derd û ġem bi êş

20. Nehin kes ġeyrî te ġemxwar û dilêş
Dilefkar û wefadarek mukerrem

21. Ji bo teskîna narê îftiraqê
Ji bo teshîla kerb û îḥtîraqê

22. Ji bo teḥfîfê barî îştiyaqê
Beyan kim derd û kerb û ‘illet û ġem

23. Were guhde bi ‘unwana teleṭṭuf
Li ḥalê min bike ḥuzn û teʿessuf

24. Wegerne dê bikim ez bi teweqquf
Serê te şeq wekî dilhaz û ḍeyġem

25. Hebû bo min di ‘alem da hevalek
Ḥebîb û dilrûba û xweş meqalek

26. Şirîn meh û şew nazik nîhalek
Hevalê şahîyû ʿembazê matem

27. Ẓerîf dilkuşa û xweşneba bû
Di milkê dil şehê melîk seba bû

28. Dil û canim bi wê re her teba bû
Di her cayê mekan weqt û her dem

29. Eger rencûr bûma ew şifa bû

Eger mehcûr bûma ew liqa bû

30. Eger ġemdîde bûma ew ṣefa bû

Şeva min her bi wê roj bû demadem

31. Li şaxa dil çiwîkê derd û alam

Çi weqta daniya wan ṣubḥ û ya şam

32. Bi ḥeṣbakî wisala xwe dil aram

Dikir def'a çi wêk derd û hem ġem

33. Şeva ji bo roj bû ……………… ew

Bi roj nûrek li fewqê nûr bû ew

34. Li dil wek Mûsî li ser Ṭûr bû ew

Ji dil xalî nebû yek weqt û yek dem

35. Ez û wê em du cism û rûḥekî bûn

Ez û wê hemçû mah û yewḥekî bûn

36. Ez û wê geştî hem Nûḥekî bûn

Li ṭofana ġeman wek beḥra qulzem

37. Di ṣehne xane û hem bahû eywan

Di qeṣr û meḥfel û hem ṣedrê dîwan

38. Di baġ û baġçe û ṣeḥra û meydan

Di geştê gulşenan du meġzê badem

39. Felek nageh bi ser baġê wiṣalê

Reşand bayê ġem û derd û xeyalî

40. Ji min dûr kir ewê nazika nihalê

Kire dil derdekî bê kêf û bê kem

41. Bi hicranê ew ê dil mubtela kir

Bi bu‘da wê li min cewr û cefa kir

42. Li min cewr û cefake bê xefa kir

Pê dil kir hezaran qeyd û edhem

43. Muqeyyed kir bi qeyda firqeta wê

Mu‘ez̠z̠eb kir bi daġa ḥesrata wê

44. Diṣojim ez ji şewqa weṣlata wê

Niharê ebyeḍ û hem leylê eẓlem

45. Belê şev ṭarî yû roja mê jî tar

Ji derd û firqet û hicrana dildar

46. Me‘az̠allah ji ev eḥwal û eṭwar

Tereḥhum ya Resûlallah tereḥḥum

47. Nîhala baġê dil têkda ziwabûn

Kulîlk û çîçekê wan tev xera bûn[504]

[504] Ev misrê di heman nusxê de wek ‘Kulîlk û çîçekê wan tev xera bûn’ jî derbas dibe’

48. Ṣefa û ẕewq û şahî jê cuda bûn
Nema min mûyekî bê derd û bê ġem

49. Çisan bistanê qelban xoş dibîtin
Gul û nesrîn û sosin geş dibîtin

50. Ṭifalê sunbilan bê hiş dibîtin
Eger lê rabitin bayê ġem û hem

51. Ji bil pejmurdegî axir çi çare
Heye çare ji bo mehcûrê yar e

52. Firaqa dilberan teşbîhê nar e
Çi nar e ‘eynî wek narê cehennem

53. Qesem billah eger tîra firaqê
Hewaya weṣlet û hem iştiyaqê

54. Li dil da daġ û derdê îftiraqê
Dikit yekser eṣemm û lal û ebkem

55. Çi ġeddar e çi dijwar e çi ḥîr e
Li meydan çi rimbaz e çi şêr e

56. Diket bin dest meġlûb esîr e
Hezar Isfendiyar û Zal û Rustem

57. Ji derdê firqetê ṣed ah ṣed ah
Şev û roj û mesa û hem seḥergah

58. Ji ahînan tijî bû mahî ta mah
Ṣedayê ġulġulan dagirtî ‘alem

59. Felek kare wê her da’îm her wiha ye
Li mehcûran xuṣuṣan bê wefa ye

60. ‘Ez̤ab û şiddet û cewr û cefa ye
Tijî zehr e şebîhê marê erqem

61. Eger daġek di qelbek ew bibîne
Hezaran daġ û derdê dî jê tîne

62. Ne reḥm e ne înṣaf e ne dîn e
Cefakarî ji bo wê re müsellem

63. Di ẓahir reḥmekî ger jê xuya bit
Teleṭṭufkî ji ḥalê wê nemabit

64. Mebe meġrûr filḥalî dê cuda bit
Dibe eṣlan wefayê nîne muḥkem

65. Felek ji ġeyr ez în xwod nîst e karî
Key yarê re cuda sazed zî yarî

66. Nemî şayed be cuz în kar û barî
Koned gazî bêyî ferzend û adem

67. Tebeṣṣum ger bikit bê şibhe kîn e
Teleṭṭuf ger bikit bê şibhe şîn e

68. Evîna wê belê derd û birîn e

Bi herkes re çi kurd û tirk û deylem

69. Hezar cewr û cefayê êş û derdan

Dide herdem dike mecruḥ û giryan

70. Seraser wê dike teşbîhê biryan

Eger carek bike dil şad û xurrem

71. Tu nabînî bihara wan nihalan

Dixemlîne wekî ṣaḥib cemalan

72. Di payîzê bi bakî wan delalan

Dikit pejmurde dîsa ‘aqibet hem

73. Wîsala me eger çi kir muyesser

Zemanek ew ji bona me bû rehber

74. Muferreḥ bû dil û bextê me yawer

Kete destê Sileyman text û xatem

75. Ji dil çû êş û derd û kêf û şahî

Tijî bûn ew ji mahê ta bi mahî

76. Bi kêf û şahî em bûn mubahî

Li ser rûyê gulan barî çû şebnem

77. Bi meqṣûda dilê eḥbab û yaran

Ger ġema van bed endîşe û neyaran

78. Bi hev re ma gelek geşt û guẕaran

Dikir bê derd û renc û bê ġem û hem

79. Li textê şahê bêxuş şah bûn em

Li asîmanê ṣefa xweş mah bûn em

80. Di geşt û gulşenan hemrah bûn em

Şebîhê firqedeynan em du hemdem

81. Ji dil derhatî ew xarê fîraqê

Nema qeṭ ṣiqleta barê firaqê

82. Cuda bû dehşeta marê fîraqê

Şebîhê marê bîrê marê erqem

83. Şev û roj û mesa ḥalê me ev bû

Yeqîn ḥalê meh û salê me ev bû

84. Belê newroz û sersala me ev bû

Seraser leẕẕet û şahî demadem

85. Nehara weṣletê nageh şefeq da

Bihara weṣletê xweş xweş wereq da

86. Li mêrg û rewdeyan nûrîn teteq da

Cuda bû ẕulmeta deycûr û muẕlem

87. Li mêrgan reyyînîn nesrîn û sunbul

Binefş û sosin û gulçîçek û gul

88. Çû dilha ez nageh quṭbê kamil

Me burc ḥeqîqetê pê ra ‘eẓem

89. Belê xurşîdê tabanê ḥeqîqet

Gul gulzarê bostanê ṭerîqet

90. Me şem‘ û şebistanê şerî‘et

Îmamê ehlê dîn ustad û efxem

91. Ji her darek ṣedaya ẕikrê Ellah

Dihat û jê dihat banga enallah

92. Welê Mûse bîn ‘Îmran kakû nagah

Bibêje dengê vî ẕikrê mu‘eẓẓem

93. Ji ‘eqsa weṣleta me cumle eşcar

Hemî têk hamil we ba cumle bardar

94. Yeka yek wan didan enva‘ê eṯmar

Miṯala eḥnif û teşbîhê ḥatem

95. Bi dara hermiyan ve bûn muḥeqqeq

ji hingiv ṣed hezar kûhê mu‘elleq

96. Eger bawer nemî darî muṣeddeq

Tefeḍḍul û tekerrum û tenê‘‘um

97. Li ber van mîveyê xub û kesk û rengîn

Hezar eṭfal û ‘enqudê di sîmîn

98. Dikir wan imtiṣaṣê şîrê şêrîn
Ṣifet ‘Isa li ber pustanê Meryem

99. Bêyî ṭiflan baġê bostan incîr
Tijî ez şehdê nab û şekker û şîr

100. Hinek ṣefra hinek sewda wekî qîr
Hinek ḥemra şebîhê renge ‘endem

101. Hinan wek rûyê xûban erġûwanî
Hinan wek rûyê dewran ze‘feranî

102. Ji bo eḥbabê ra xweş û ermeġanî
Fereḥefzayê dilhayê muheyyem

103. Xulaṣe ‘eyd û hem sersal û newroz
Diçu bê şibhê ey dildar û dilsûz

104. Di mizgîna ewê weqta dil efrûz
Ewê weqta şerîf û hem mufexxem

105. Li ṭebqa ‘enaṣir bed eṣil menḥûs
Evê Zala felek teşbihê kabûs

106. Geran dîsa me wî meḥrûm û me’yûs
Tijî dil ez ṣedîd xwûn hemdem

107. Bi daġa firqetê min mubtela kir
Bi narê ḥirqetê min xwey cefa kir

108. Ji min şem‘ û cemala min cuda kir
Di dil danî hezar daġ û  ġem û hem

109. Li min ḥuzn û teḥessur bûne qatqat
Di meydana teḥeyyur mame ez mat

110. Şeh û ferzîn fikra min kiş û mat
Eṣem û exres û ‘e’ma û ebkem

111. Dibêjin go biya ew rojê ‘eydan
Li min renc û ġem û derd û ‘eydan

112. Çi rojê zor û eyyamê şedîd in
Ji bo curḥan nehin derman û merhem

113. Diket herkes digel dost û hevalan
Xîṭab hem xeberdan û hem meqalan

114. Welêkin ez dikim fikr û xeyalan
Di her ḥîn û di her weqt û di her dem

115. Li ba hev rûdinin şadan xandan
Ṣefa bexş û fereḥ bexşê dil û can

116. Bi vê qelbê ḥezîn zar û giryan
Dikim her dem girîn û şîn û matem

117. Ev e halê dilê min mah û salan
Di kerb û derd û hem fikr û xeyalan

118. Ji şewqa qameta ebrû hîlalan
Ji bona hin elemdarî musellem

119. Kerem ke ey qelem himmet bike tu
Li ser vê nameyê şiddet bike tu

120. Ji bo min carekê reḥmet bike tu
Di irsalê bike ‘ezmek muṣemmem

121. Bike teblîġ exbarê ḥezînan
Ṣeda û gaziya wan dilbirînan

122. Bi sûyê dost û eḥbab şêrînan
Di teblîġê tu yî mîrek mu‘ellim

123. Bike ‘erżê taḥiyyat û selamê
Bike tebrîk ‘îd û îḥtîşamê

124. Bike iẓhar ‘izz û iḥtiramê
Bû wechek la’iq û ṭerzek mu‘eẓẓem

**29**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1. Dil yek e dilber dê yek bit dilrûbayê her zeman
Dilnewazî gah gahe cewr û miḥnet her zeman

2. Furṣeta keyf û surûr û naziya şekerleban[505]

   Hemçû ‘enqaye welê hicran û firqet her zeman

3. Kîmyaye ji surşirînan surşirînî nazikî ji

   Nazenînan lê cefa û ṣedd û nexwet her zeman

4. Ê ji bo te qenc e teṭyîba qulûbê pare par[506]

   Wer ne teştîta qulûban bê meziyet her zeman

5. Bulbulê xweşneġme ew ṣewt û ṣedayê sînesûz

   Bo weye wer ne ber gulzîb û zînet her zeman[507]

6. Quweta te nîne ḥemlê nazişahan wer ne her

   Ez cenabê padişahan naz û ni‘met her zeman

7. **Fetḥiya** ger talibê feyżî ji yara namidar

   Wê li te leṭfe ṭeleb ke luṭf û himmet her zeman[508]

**30[509]**

fe‘ilatun / (fa‘ilatun) / fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilun(fa‘ilun)

Remel + + − −/+ + − −/+ + − − / + + −

1. Te bi nazan kirî mecrûḥ û birîndar û ḥezîn

   Bi niyazan ji neçarî dike pir ah û enîn[510]

---

505 Firṣeta keyf û surûr û naziya şekkerleban (X), (Z), (A)
Furṣeta keyf surûr û naziya şekkerleban(M)

506 Ê ji bo te qenc e teṭyîba qulûbê diyar(A)
Ê ji bo te qenc e teṭyîba qulûban diyar(M)

507 Bo weye wer ne ji ber gulzîb û zînet her zeman (X),(Z), (M),(A)

508Tu jî wê lutfê teleb kî luṭf û himmet her zaman(A)
Wê li te luṭfe ṭeleb ke luṭf û himmet her zeman (X),(Z), (M)

509 Ev helbest di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne

510 Bi niyazan ji neçarî dike pur ah û enîn (Z)

2. Ji firaqa te qerar û ne sukûnek wî heye

Ji wiṣala te di dil dane hezar daġ û birîn

3. Ji cemala te muḥeyyer û muqehher ji celal

Were inṣafê bike reḥmê li vî ‘ebdê kemîn

4. Ji qeda nazik û şimşadê hezar ahê di dil

Çi ‘eceb jar û neḥîfîme ji wan lêvê şirîn[511]

5. Ger çi der ṣûretê ẓahir heye dûrî emma

Kelbekê basiṭê destim bi weṣîdê kulle ḥîn

6. Kelb im û ṭalibê luṭfa te û ev nîne ‘eceb

Necmuddîn î tu di luṭf û neẓerê da bi yeqîn

7. Li te nazdarî û nazî be mubarek bi kemal

Çi xweş e **Fetḥî** bikêşe ji ewan kerb û evin

8. Necmeddîn î me di dil da heye ṣed daġ û qelem [512]

Ji cefa û eleman bûne cigerxwûn û birîn

9. Ji cefa te me nehin ṣebr û sukûnek di meyan

Bi Xwedê kî were carek tu evê nesxê bixwîn[513]

10. Were carek me ṣefa ke tu ji êş û kederan

Ku ji şe’nê te ye ev reng me nehin raḥê yeqîn

[511] Çi ‘eceb jar û neḥîfîme ji wan lêvê şêrîn (Z)
[512] Ev helbest ne ya Fethî ye û ji teref Mela Ebdulhey ve li ser vê helbesta Fethî hatiye zêdekirin.
[513] Bi Xwedê kî were carek tu evê nusxê bixwîn(Z)

11. Me nehin raḥ û selamet ji du çeşmê di belek
Ji du zulfê te xelek bûye cihan ah û enîn

12. Bi enîn û bi fiġanan me hesêb ke tu bi Ferhad
Hem bi feryad û niyazan tu bi nazan xwe Şirîn[514]

13. Ne ji şêrîniya te şehd û şeker çûne ʻedem
Tu bizane ku melayê te me wê perdê hilîn

14. Tu helîn perde ḥicabê me û ʻalem bike zew[515]
Ku ji nûra te ye xurşîd û hilal tev xemilîn

15. Ji cemala te meṣabîḥ û ṣebaḥ in di ẓelam
Qe tu ḥacet me ji wan rûḥ û cesed îro tunîn

16. Bi cemala xwe tu Yusûf di meʻna xwe imam[516]
Ku di ʻişqa xwe tu îro me şekerxayî werîn

17. Şah û sulṭan û emîrê mecmeʻa ḥusn û beha
Bendeyê zulfê siyah im zeqen û xeddê şirîn[517]

18. Raḥeta canê ʻUbeydî qa'id û hem destegîr
Ji meʻdena Şahê Hezan î me bi meqṣûdî bigîn

[514] Hem bi feryad û niyazan tu bi nazan xwe Şêrîn(Z)
[515] Tu hilîn perde ḥicabê me û ʻalem bike zew(Z)
[516] Bi cemala xwe tu Yusûf i di meʻna xwe imam(Z)
[517] Bendeyê zulfê siyah im zeqen û xeddê şêrîn (Z)

19. Luṭf û nazî te bi teşrîf û xelatan nadim
Li deret bendegî û ewcê Ṡureyya ne qerîn

20. Necmê se‘da te tereqqî ke nebîne qe zewal
La tuṣeyîrna îlahî ‘en du‘ana ya’îsîn

**31**[518]

fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilun
Remel + + – –/+ + – –/+ + – – / + + –

1. Te bi dildarî û elṭafê şehane bi yeqîn [519]
Te bi serpenceyê ḥusna ku li wî qeddê ḥesîn
Te bi wan weṣf û xiṣalê wekû emṡalê nehîn
Te bi nazan kirî mecrûḥ û birîndar û ḥezîn
Bi niyazan ji neçarî dike pir ah û enîn [520]

2. Dil ji ber ah û fiġanan ne subûtek wî heye [521]
Can ji mehra periyê qeṭne şuwûnek wî heye[522]
Ma ji bil yar û ḥebîbê qe hebûnek wî heye [523]
Ji firaqa te qerar û ne sukûnek wî heye
Ji wiṣala te di dil dane hezar daġ û birîn[524]

[518] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne û texmîsa helbesta ku Mela Ebdulhey nivîsandiyê ye
[519] Te bi dildarî elṭafê şehane bi yeqîn (M)
[520]Bi niyazan ji neçarî dike pur ah enîn(X),(Z)
[521] Dil ji ber ah fiġanan ne subûtek wî heye (M)
[522] Can ji mohra periyê qeṭ ne şuwûnek wî heye (Z)
[523] Dil ji bil yar û ḥebibê qe hebûnek wî heye (M)
[524] Ji wiṣala te di dil dane hezar daġ  birîn (M)

3. Ji şirînmeşrebê luṭfa te wekî abê zelal

Bûne mehcûr û ji ḥirmanê û hicrê di melal[525]

Dûriya te li feqîrî heye pir wizr û webal[526]

Ji cemala te muḥeyyer û muqehher ji celal

Were inṣafê bike reḥmê li vî ‘ebdê kemîn

4. Ne ji meṭbû‘î ṭeb‘ê te hezar payê di gil[527]

Ṣorgul û sosin û reyḥan û binefş û sunbil [528]

Pêşî bejna te ḥemî bûne çû men xwar û xecil

Ji qeda nazik û şimşad hezar ahê di dil

Çi ‘eceb jar û neḥîfî me ji wan lêvê şirîn[529]

5. Ne ji wê behcet û ḥusna te ye ez keftime ġema [530]

Ruḥ û can ber te bi talan di qitalê dikî yeġma[531]

Li feqîrê xwe ke reḥmê çiku ḥacet heye cemma

Ger çi der ṣûretê ẓahir heye dûrî emma

Kelbekê basiṭê destim bi weṣîdê kullî ḥîn

6. Dîtiye min di hewaya te hezar cewr û te‘eb

Min mudam ḥuzne ji dûrê qe nedîm keyf û ṭereb[532]

Bûme wek muḥteżirê nez‘ û min rûḥ hatiye leb[533]

Kelb im û ṭalibê luṭfa te û ev nîn e ‘eceb[534]

Necmuddîn î tu di luṭf û neẓerê da bi yeqîn

---

[525] Bûne mehcûr rû ji ḥirmanê hicrê di melal (M)
[526] Dûriya te li feqîrî heye pur wizr û webal (Z)
[527] Ne ji metbû‘î tebi‘ te hezar payê di gil (Z)
[528] Ṣorgul sosin û reyḥan binefş sunbil (M)
[529] Çi ‘eceb jar û neḥîfî me ji wan lêvê şêrîn(Z)
[530] Ne ji wê behcet ḥusna te ye ez keftime ġemma(M)
[531] Riḥ can ber te bi talan di qitalê dikî yeġma (M)
[532] Min mudam ḥuzne ji dûrê qe nedîm keyf ṭereb (M)
[533] Bûme wek muḥtezirê nez‘  min rûḥ hatiye leb(M)
[534] Kelb im ṭalibê luṭfa te ev nîn e ‘eceb(M)

7. Ṣed hezar çeşm li pey qamet û bejna te delal
   Ṣed hezar bedrê mukemmel di qibala te hilal
   Xûb î û nazik î û luṭfe li canê te ḥelal[535]
   Li te nazdarî û nazî be mubarek bi kemal
   Çi xweşe **Fetḥî** bikêşe ji ewan kerb û evîn

8. Ji firaqa te gelek dîtiye min êş û elem
   Ji xiyala te me mecrûḥ ji ser ta bi qedem
   Di cemala te yê ‘alî ḥeyyirîn ‘Urb û ‘Ecem[536]
   Necmedîn î me di dil da heye ṣed daġ û qelem [537]
   Fexr û teşrif û ḥeyat î tu ji bo ehlê zemîn [538]

9. Me gelek zarî ji dergahê ḥebîbê xwe dikir
   Me nedî feyde ji wî ṣewt û ṣedayê ku me kir[539]
   Dest bi ahîn û fiġanan û hezar nale me kir
   Me nema rah û ṭerîqet ne di bedwê ne şehir[540]
   Ji cefa û eleman bûne cigerxûn û birîn [541]

10. Me ne raḥet heye ey serwerê şêrîn dihenan[542]
    Ne selamet ne metanet dikin em ah û eman [543]
    Ṣed hezar nale û efġan û duṣed zarî heman[544]
    Ji cefaya te me nehin ṣebr û sukûnek di miyan[545]

---

[535] Xûb î û nazik î û luṭf li canê te ḥelal (Z)
[536] Di cemala te yê ‘alî ḥeyirîn ‘Urb  ‘Ecem(M)
[537] Necmudîn î me di dil da heye ṣed daġ qelem (M)
[538] Fexr û teşrif ḥeyat î tu ji bo ehlê zemîn (M)
[539] Me nedî feyde ji wî ṣewt ṣedayê ku me kir (M)
[540] Me nema rah ṭerîqet ne di bedwê ne şehir(M)
[541] Ji cefa û eleman bûne cigerxûn birîn (M)
[542] Me ne raḥet heye ey serwerê şêrîn dehenan(Z)
[543] Ne selamet ne metanet dikin em ah eman(M)
[544] Ṣed hezar nale efġan û duṣed zarî heman (M)
[545] Ji cefaya te me nehin ṣebr û sukûnek di meyan(Z)

Çi dibit ger tu bi luṭfê vekî lêvê şekerîn

11. Bulbula xûbî neġematê çi bê fayde tu didî
Bûyî sergeşteyê wê ṣorgula jê fayde nedî
Xwuziya te bidiya dilberî û serwe qedî
Te bi ahan bikira welwele û ne're zedî [546]
Bi Xwedê kî were carek tu evê nusxê bixwîn

12. Te bi wan çeşmê dilawîzê ġezalî neẓeran
Li me kir zeḥmet û rencûrî û cewr û ġederan
Bi Xwedê kî bike reḥm û wê bê bi luṭfî nigeran [547]
Were carek me ṣefa ke tu ji êş û kederan[548]
Bike tey perde Xweda ra tu ji mehtabê cebîn[549]

13. Kelbê dergahê te me meẓherê cûdî di wucûd
Bûm çavnêrê li luṭfê di qiyam û di qu'ûd [550]
Segê dergahê xwe ṣa ke tu bi eṭraf û xudûd
Bi 'uyûn û bi cufûn û zeqen û burh û qudûd [551]
Ku ji şe'nê te ye ev reng me nehin raḥê yeqîn[552]

14. Çiku bed ṭali'iya me heye ez dewrê felek
Dewrê dewwarê ḥesedkar e di ḥeqqê me gelek
Bûne sergeşte û pabesteyê wan zulfê xelek[553]
Me nehin raḥ û selamet ji du çeşmê di belek[554]

546 Te bi ahan bikira welwele ne're zedî (M)
547 Bi Xwedê kî bike reḥm û bi luṭfê nigeran(M)
548 Were carek me ṣefa ke tu ji êş kederan (M)
549 Bike teyyî perde Xweda ra tu ji mehtabê cebîn (Z)
550 Bûm çavnêrê li luṭfê di qiyam di qu'ûd (M)
551 Bi 'uyûn û bi cufûn û ziqen û burh û qudûd (Z)
Bi 'uyûn bi cufûn zeqen burh qudûd(M)
552 Ku ji şe'nê te ye ev reng me nehin raḥet yeqîn (Z)
553 Bûne sergeştê pabesteyê wan zulfê xelek (M)
554 Me nehin raḥ selamet ji du çeşmê di belek (M)

Heye carek ku bi meqṣûd û muradê bigehîn

15. Ne hezar şox û perîzade ku her yek bi miṡal [555]
‘Qemer û şemsê żuha ne di muqabil te hilal[556]
‘Aşiqan cumle yeka yek çiku dîn cah û cemal [557]
Ji evîna te verêtin hemiyan dem‘ê lu’al
Ji du zulfê te xelek bûye cihan ah û enîn [558]

16. Me du tayê ji kemanê ebrû dilsûzî ye mu‘tad [559]
Rastiya me ku dibînî ji qeda wek ney û şimşad[560]
Şubhî Mecnûnê zemanî ji te ra bûyîne munqad
Bi enîn û bi fiġanan me ḥisêb ke tu bi Ferhad[561]
Bi şirînî te sebeq kirye li Leylî û Şirîn[562]

17. Nedibûm ẕerre eger mehrê ji meşriq nedera[563]
Ẕerre her qeṣde li pey mehrê wekî nîlûfura [564]
Pêşî perwaneya xwe şemi‘ê ṣifet barî dera
Ḥalê ‘uşşaqê xwe her ṭeḥlî ye ji ah û kedera
Hem bi feryad û niyazan tu bi nazan xwe şirîn[565]

18. Bûme sergeşte û ḥeyranê te ser ta bi qedem[566]
Bûme sûzendeyê dildariyê te bi ah û nedem[567]

---

[555] Ne hezar şox perîzade ku her yek bi miṡal (M)
[556] Qemer şemsê żuha ne di muqabil te hilal (M)
[557] ‘Aşiqan cumle yeka yek çiku ḥazîn cemal (M)
[558] Ji du zulfê te xelek bûye cihan ah enîn (M)
[559] Me du tayê ji kemanê ebrûyê dilsûzî ye mu‘tad(M)
[560] Rastiya me ku dibînî ji qeda wek ney şimşad (M)
[561] Bi enîn bi fiġanan tu ḥisêb ke me bi Ferhad (M)
[562] Bi şirînî te sebeq kirye li Leylîyê Şirîn (M)
[563] Nedibûm ẕerre eger muhrê ji meşriq nedera (Z)
[564] Ẕerre her qeṣde li pey muhrê wekî nîlûfera (Z)
[565] Hem bi feryad û niyazan tu bi nazan xwe şêrîn(Z)
[566] Bûme sergeşteyê ḥeyranê te ser ta bi qedem (M)
[567] Bûme sûzendeyê dildariyê te bi ah nedem (M)

Di cemalê meh û xurşîdê me ‘ed kir ji xudum[568]

Ne ji şêrîniya te şehd û şeker çûne ‘edem[569]

Tune wek te di melaḥet bi yeqîn û bi yemîn[570]

19. Ne di ḥusn û ne şebaḥet ne di şêrîn ḥerekatî[571]

We dibînim ku di ewṣafê di e‘la derecatî

Me mekes warî ṭeleb kir ku me dî şehd nebatî[572]

Lê ji bed extereyîm be‘dê niqabek hatî

Tu bizane ku melayê te me wê perdê hilîn

20. Rojiya dûriya lêvê şekerîn ey mehê new

Me temam girt û bi derketne bi qeṣda mehê new[573]

Bi sebeb dîtinê ebrûyê li şeklê mehê new

Tu hilîn perdê ḥicabê me û ‘alem bike żew [574]

Ḥukmê ‘îdê ku bike ḥakimê vî dînê mubîn

21. Şah û şehbazî tu hem rehberî bo ‘ebdê kemîn[575]

Rah û rimbazî tu ey serwe sehê lebşekerîn [576]

Rewneq û rûḥ û ḥeyat î tu ji bo ehlê zemîn[577]

Kî ye inkarê bikit vê xebera ‘eynê yeqîn

Ku ji nûra te ye xurşîd û hilal tev xemilîn [578]

---

[568] Di cemalê meh û xurşîdê me ‘ed kir ji xedem (X),(Z)
Di cemalê meh xurşîdê me ‘ed kir ji xudum(M)

[569] Ne ji şêrîniya te şehd û esel çûne ‘edem (M)

[570] Tune wek te melaḥet bi yeqîn bi yemîn (M)

[571] Ne di ḥusnê şebaḥet ne di şêrînê ḥerekatî (M)

[572] Me mekes warî ṭeleb kir ku me dî şehd û nebat(X), (Z), (M)

[573] Me temam girt bi derketne bi qeṣda mehê nû (M)

[574] Tu hilîn perdew ḥicabê me û ‘alem bike żew (Z)

[575] Şah şehbazî tu hem rehberî bo ‘ebdê kemîn(M)

[576] Rah rimbazî tu ey serwe sehê lebşekerîn (M)

[577] Rewneq rûḥ ḥeyat î tu ji bo ehlê zemîn (M)

[578] Ku ji nûra te ye xurşîd hilal tev xemilîn (M)

22. Avrûyek te nehiştî ne ji bo xurd û humam

Bûne meftûnê li ḥusna te gelek xaṣ û ‘avam [579]

Ne kemalat û keramatê li te xetme temam[580]

Ji cemala te meṣabîḥ û ṣebaḥ in di ẓelam [581]

Ḥeq nigehdarê te bit Ḥeżretî Ṣanî te qerîn

23. Dil bil yarê evînê bi kesek dî nedirit [582]

Ne neẓer çeşm û bi cismê me ne raḥet digihit

Cesed û rûḥê ku raḥet ji bo wî ji ġeyrî te bit

Tu bes î ev cesed û rûḥê bi ḥeyranê te bit

Qe tu ḥacet me ji wan rûḥ û cesed îro tunîn[583]

24. Ji qeda serwe seha lebşekera ‘alî meqam

Diweşit naz û teleṭṭuf ku bikî meşî û xiram[584]

Li te ‘adet bûwe şêrîn rewiş û xûbiyê kelam[585]

Bi cemala xwe tu Yusûf di me‘na xwe îmam[586]

Bi Zuleyxayî bi dergahê xwe carek me bixwîn

25. Mahê Ken‘anî di Miṣra şeref û şehrê cemal [587]

Ji te da meġrib û meşriq hemî tîrêjê kemal [588]

Bûne pir nûr û ji nûra te xwedan cah û celal[589]

---

[579] Bûne meftûnê li ḥusna te gelek xaṣ û ‘am (Z)
Bûne meftûnê li ḥusna te gelek xaṣ ‘avam (M)

[580] Ne kemalat keramatê li te xetme temam (M)

[581] Ji cemala te meṣabîḥ ṣebaḥ in du ẓelam (M)

[582] Dil ji bil yarê evînê bi kesek dî nedirit (Z), (M)

[583] Qe tu ḥacet me ji wan rûḥ cesed îro tûnîn(M)

[584] Diweşit naz û teleṭṭuf ku bikî meşî û xeram (Z)
Diweşit naz û teleṭṭuf ku bikit meşî û xiram(M)

[585] Li te ‘adet bûwe şêrîn rewş û xûbiyê kelam (Z)

[586] Bi cemala xwe tu Yusûf û di me‘na xwe îmam (Z),(M)

[587] Mahê Ken‘anî di Miṣra şeref şehrê cemal (M)

[588] Ji te da meşriq meġrib hemê tîrêjê kemal (M)

[589] Bûne pur nûr û ji nûra te xwedanê cah û celal (Z)
Bûne pir nûr û ji nûra te xwedan cah celal(M)

Li ḥużûra te dikin ‘erzê bi ṣed ‘ecz û melal

Ku di ‘işqa xwe tu îro me şekerxayî werîn

26. Me nema quwet û ṭaqet bimeşin bal te nuha[590]

Çiku hember bûwe burca te bi keywan û suha[591]

Rewneq û fexrî ji bo cilwegeh û baregeha [592]

Şah û sulṭan û emîrî mecme‘a ḥusn û beha [593]

Çi dibit carekê luṭfek bikî ey şahê zemîn

27. Serwê baġê şeref î şaxê gulistanê cemal

Bedrê ewcê teref î mahê di bostanê kemal

Bûne perwane û bulbul li te perwerd û şemal[594]

Ne tenê ahê dikêşim ji ewan le‘lê delal

Bendeyê zulfê siyah im ẕeqen û xeddê şirîn [595]

28. Şahê şêrîn dihenanî gulê gulzara nežîr[596]

Sorgula baġê dilanî ḥeseda mahê munîr

Fereha qelbê elemdar î û mehbûs û esîr[597]

Raḥeta canê ubeydî qa’id hem destigîr[598]

Bi nebat û şeker û şehdê ji Nûrşîn û Hezan [599]

---

[590] Me nema quwet ṭaqet bimeşin bal te nuha(M)

[591] Çiku hember bûwe burca te bi keywan û seha (Z)
Çiku hember bûwe burca te bi keywan suha(M)

[592] Rewneq fexr î ji bo cilwegeh baregeha(M)

[593] Şah sulṭan emîrî mecme‘a ḥusn û beha (M)

[594] Bûne perwaneyê bulbul li te perwerd û şemal(M)

[595] Bendeyê zulfê siyah im ẕeqen û xeddê şêrîn (Z)
Bendeyê zulfê siyah im ẕeqen xeddê şirîn(M)

[596] Şahê şêrîn dehenanî gulê gulzara nežîr (Z)

[597] Fereha qelbê elemdar î ve mehbûs û esîr (Z)

[598] Raḥeta canê ubeydî qa’id û hem destegîr (X),(Z)
Raḥeta canê ubeydî qa’id û hem destigîr(M)

[599] Li te bûn can û dilê jarê xwedan şewq evîn (M)

29. Şaxê ṭûbay î dibêjim tu di nêv baġê cînan

Ter û têravî li ber çeşmeyê ḥeywanê cihan

Ya tu şehzadekî perwerdey ey nûra dilan

Bi şirîn şehd û şeker şîr î ni Nûrşîn û Hezan[600]

Ji me'dena şahê Hezan î me bi meqṣûdî bikîn[601]

30. Bi serê zulfê te ey serwê cihan azad im

Bi lebê te dixwe ṣûndê û dibêje xadim

Weṣleta te bi hezar fewz û necatan nadim

Luṭf û nazî te bi teşrîf û xelatan nadim[602]

Ne didim cewr û cefaya te bi xweş abê şêrîn

31. Feyż û luṭfa te divên em nedivên menṣeb û cah[603]

Menṣeb û cahê ku bê te bitin ew meḥbes û çah[604]

Feyżû luṭfa te bi 'erşê dibe eṭrafê kulah[605]

Me ġereḍ qeṣd e bibîn bende li ber dergehê şah

Li dert bendekî û ewcê Ṣureyya ne qerîn[606]

32. Kamuranî ji te ra bît û di gel 'iz û kemal[607]

Ẕerreyek bo te nebîtin ne ji 'ecz û ji melal[608]

Tu mudawa kî qulûban bi cemal û bi celal [609]

Necmê se'da te tereqîke nebîne qe zewal [610]

---

[600] Li te bûn can û dilê jarê xwedan şewq û evin(X)
Bi nebat şeker û şehdê ji Nûrşîn Hezan (M)

[601] Ji me'dena şahê Hezan î me bi meqṣûdî bigîn(M)

[602] Luṭf nazî te bi teşrîf xelatan nadim (M)

[603] Feyż luṭfa te divên em nedivên menṣeb cah (M)

[604] Menṣeb cahê ku bê te bitin ew meḥbes çah (M)

[605] Feyż luṭfa te bi 'erşê dibe eṭrafê kulah (M)

[606] Li dert bendegî ewcê Ṣureyya ne qerîn (M)

[607] Kamuranî ji te ra bît û di gel 'izz û kemal (X),(Z),(M)

[608] Ẕerreyek bo te nebîtin ne ji 'ecz û melal (M)

[609] Tu mudawa kî qulûban bi cemal bi celal(M)

[610] Necmê se'da te tereqqîke nebîne qe zewal (Z),(M)

Ṣedhezar canê çu **Feth̬î** li te ḥeyran û ḥezîn

33. Ez dibêm şemsî welê meṭle‘ û burca te Hezan[611]
Rebbê ‘alem te ḥifiẓ ke ji beliyatê zeman[612]
Ji qerînê bed û nifrînê bed û çavê bedan
Her ji bo qelbê ‘ibadan bibî me’wayê eman
La tuṣeyyîrna îlahî ‘en du‘ana yaisîn

**32**[613]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Te‘alellah ji van ṭel‘et çu mahan
Bi qeyda wan muqeyyed mîr û şahan

2. Gulê le‘l in di gulzarê melaḥet
Evan xurşîd cebîn û xeṭ siyahan[614]

3. Dema bêtin xeram û hem tebextur [615]
Diṣojin ew dilê me bê penahan

4. Ji ber żerba firaqa wan şev û roj
Dinalin ṣedhezar feryadxwahan

5. Çiqas sengîn dil û dil mermer in ew [616]

[611] Ez dibêm şemsî welê meṭle‘ burca te Hezan (M)
[612] Rebbê ‘alem te ḥifiẓ ke ji beliyyatê zeman (Z),(M)
[613] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne
[614] Evan xurşîd cebîn xeṭ siyahan (M)
[615] Dema bêtin xeramî û tebextur (M)
[616] Çiqas sengîn dil dil mermer in ew(M)

Dikin ẓulmê li bê sûc û gunahan[617]

6. Bi rux ṣed kiş didin axir dikin mat[618]
Şehemîr û wezîr û padişahan

7. Hezarê dil hezaran dil kebab in
Ji şewqa gulbena van keç kulahan

8. Bi yek ġemze ji wan çehvê ḥezalî
Ji sînê radikin nalîn û ahan [619]

9. Ji bo ṣeyda eḥibba û xelîlan
Dikin seyran di baḥ û cilwegahan

10. Nikarî red bikî dil ger çi rakî[620]
Li nik qażî li wan sêṣed guwahan

11. Dikin cewr û cefa herdem welêkin
Bi luṭf û merḥemet nakin nigahan [621]

12. Di çaha wan wekî Bîjen esîr in
Xwedan menṣeb û erbabê cahan[622]

13. Bi tîrê ḥemze ez qewsê du ebrû
Gelek kuştin şehinşah û sipahan

---

[617] Dikin ẓulmê li bê sûc gunahan (M)
[618] Rexê ṣed geṣ didin axir dikin mat (Z)
[619] Ji sînê radikin nalîn ahaṣan (M)
[620] Nikarî redd bikî dil ger çi rakî (M)
[621] Bi luṭf û merḥemet nakin gunahan(M)
[622] Xwedanê menṣeb û erbabê cahan (Z),(M)

14. Yeqîn zanim tu jî namînî Fetḥî

Ji ber cewra evan ṭel‘et çu mahan

**33**[623]

fe‘ilatun / (fa‘ilatun) / fe‘ilatun / fe‘ilatun / fe‘ilun(fa‘ilun)

Remel + +– –/+ + – –/+ +– – / + + –

1. Ji cefaya te gelek sîne û dil tev herişîn
   Ji kevanê ġeżeba te di hezar keşmekeşîn
   Her li dûv hev qedeha derd û ġema te diçeşîn[624]
   Dem bi dem nale û feryad û fiġanan dikeşîn
   Ey felek qeṭ me nedî kes ku bi ḥukmê te xweşîn

2. Te bi xwûnxwarî girêdayiye nava xwe gelek
   Dev û lêvê te ji zehrê tije wek marê belek
   Te gelek kuştine çehvê belek û zulfê xelek
   Ne tenê em ku ḥemî name çi cinn û çi melek
   Ji lebê badeyê ẓulma te ‘eceb cur‘ekeşîn

3. Dikî pujmurde û bê berkî tu serwa çemenan [625]
   Ṣorgula nazik û newreste dikî camediran[626]
   Ruwê dildar û ḥebîban xef û mestûr û nihan
   Qumrî û bulbul û ‘uşşaqê qewî ne‘re zenan[627]
   Her ji ber cewr û cefaya te ḥemî laşe weşîn

[623] Ev helbest di destnivîsên (A) û (M)yê de nînin
[624] Her li dûv hev derd û ġema te diçeşîn (Z)
[625] Dikî pejmurde û bê bergî tu serwa çemenan (X), (Z)
[626] Ṣorgula nazik û newreste dikî camederan (X), (Z)
[627] Qumrî û bulbul û ‘uşşaqê qewî ne‘re zeban (Z)

4. Bi kû da çûne şehinşahê xwedanê ceyş û ‘ebîd
Ji me wunda ne yekayek çi qerîb û çi ‘ebîd
‘Elemê rahê hûda şeyx û melayê di ferîd
Her wekî şaxê gulistana wefa xwace Se‘îd
Ji firaqa wî dil aşufte û bê ‘eql û heşîn

5. Ji firaqa te dikêşin gelekî êş û elem
Ji xiyala te ne mecrûh ji ser ta bi qedem
Her wekî bulbulê şeyda ne di ġemxaneyê ġem
Tu gulek nazik î ey xwace di gulzarê irem[628]
Ya tu rûḥ î û mucerred qefesa şubhê leşîn[629]

6. Te çira ateşê cansûzê cihan danî di dil
Sîne kir çak û ciger pare û dil nale û kul
Cameyê pakê ḥeyata xwe te wek ġunçeyê gul
Ṣedhezar pare kir û girt li me rah û subul
Qeṭ nema carekê êdî ku bi bal te bimeşîn

7. Me ne raḥet ji cigersûzê firaqa te heye
Dil demadem ji ġema rûyê te ḥesretzede ye
Çeşmê eḥbabê te wek çeşmeyê pir nabi‘eye[630]
Ne tenê nale û efġan û enîn karê me ye[631]
Ma çira berg û perê dar û beran tev diweşîn

8. Hin ji hicra tenê ḥeyretzede wek kûh û cibal
Hin cigerxwûn û birîn in ji te wek ġunçeyê al
Hin dilê aşufteyê weṣla te ne wek şem‘ û şemal

---

[628] Tu gelek nazik î ey xwace di gulzarê irem (Z)
[629] Ta tu rûḥ î û mucerred qefesa şubhî leşîn (Z)
[630] Çeşmê eḥbabê te wek çeşmeyê pur nabi‘eye(Z)
[631] Ne tenê nale û fiġan û enîn karê me ye (Z)

Hin dirêjin ji du çehvê xwe gelek dem‘ê lu’al
Tev hewaxwahê qeda nazik û çavê di reşîn

9. Bi te bû rewneqî baġ û çimenê şer‘ê Resûl
Bi te ḥey bû demekî ey gulê gulzarê qebûl
Sosin û sunbul û nesrînê didan lafê fużûl
Tu dema bûyî nihan bûn ḥemî ew jar û melûl
Man di leb teşnekî û her we di teyhê ‘aṭeşîn

10. Ez nizanim te çira terk kir eḥbabê qedîm
Bi xwe ra bir kemera me‘rifet û feyżê ‘emîm
Te me hişt bêfereḥ û bêkes û bêzar û nedîm
Man di çengala firaqa te feqîrḥal û yetîm
Bîjenê çahê ġem û girtiyê cenga Hebeşîn

11. Te dema bedrê kemalatê nihan kir bi niqab
Gencê fežla xwe te xef kir bi ṭilsimatê turab
Şem‘ê kafûrê ‘ilmê xwe gerand bê teb û tab
Şubhî perwane veman em ciger û sînekebab
Ger çi perwane hewadarê şemalê dikeşîn[632]

12. Ah ji serpence û destê feres û espê memat[633]
Wê çewan bir ji te ferzîn û rux û fîlê ḥeyat
Hem di vê ‘erşeyê pir neqşe du qanadê luhat[634]
Da şehê ṣebr û qerar û fereḥa me kiş û mat
Çi suwar û çi peya walihê ev mat û keşîn[635]

[632] Ger çi perwane hewadarê şemalê di geşîn (X), (Z)
[633] Ah ji surpence û destê feres û espê memat(Z)
[634] Hem di vê ‘erṣeyê pir neqşe du qanadê luhat (Z)
[635] Çi siwar û çi peya walihê ev mat û kişîn (Z)

13. Ṣed şukir Rebbî ji ew baġê ṣefa ‘alî cenab

Nûriyê nûrifeşan şaxê gulistanê şebab[636]

Xweş fereḥbexş û ṣefabexş e ji bo yar û ṣehab

Lê birêj Rebbî fuyûżatê te rêhtî bo lubab

Da gelek reşḥe ji feyża te ji wî jî bireşîn

14. Bike bes **Fetḥiyê** bulbulṣifetê dil bi şewat

Te bi neẓma xwe ḥelandin qelb û dil û canê civat [637]

Di meh û roj û sena dahiyeya fewt û memat

Tu bibêj bistê rebî‘ulewwelê çûye wefat[638]

Ku hezar sal û di gel sêṣed û sî sal û şeş in

**34**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1. Ey şehê sîmîn qedan û serweran [639]

   Meh liqa û mahitaba mehteran[640]

2. Bê te ger carek li ṣeḥrayê meşim

   Dê bibit ṣeḥra li min teng û mekan [641]

[636] Nûriyê nûrfeşanê şaxê gulistanê şebab (Z)
[637] Te bi neẓma xwe ḥeland qelb û dil û canê civat(X), (Z)
[638] Tu bibêj bîstê rebî‘ulewwelê çûye wefat (Z)
[639] Ey şehê sîmîn qedan serweran (A),(M)
[640] Mehliqa û mahitana mehteran (Z)
Mehliqayê mahitaba mehteran(M)
[641] Dê bibit ṣeḥra li min teng mekan (A),(M)

3. Wer di gel te bême zindana fireng[642]

   Ḥebs û zindan dê bibit cayê eman [643]

4. Xedd û xalê te ‘eceb xweş cem‘ bûn

   Ger çi el-żżidani la yectemi‘an[644]

5. Dil ji te her çendi nabit munṣerif

   Lê ji kesrê her dikit ah û fiġan [645]

6. La di enla kesre da hatî ġeleṭ[646]

   Ya nehin wek hev em û van neḥwiyan [647]

7. Pîşê bejna te xwiya bû şimşad û serwe[648]

   Zû ewan pejmurde kir badê xezan

8. Ger xwuya bîtin ji te engiştekî [649]

   Dê bibit her kes çû Mecnûnê zeman

9. Weṣfê ḥusna te nehin qabil ebed

   Ger çi ṣed ḥessan bitin gewherfeşan

---

642 Wer di gel te bême zindana fireng (Z)

643 Ḥebs û zindan dê bibit cahê eman(Z)
Ḥebs û zindan dê bibin cahê eman (A)
Ḥebs zindan dê bibit cayê eman(M)

644 Ger çi el-żżiddani la yectemi‘an(X)

645 Lê ji kesrê her dikit ah fiġan(M)

646 La di inla kesre da hatî ġeleṭ (Z)

647 Ya nehin wek hev em van neḥwiyan (M)

648 Ev malik di destnivîsa (C)yê de nîne
Pîşê bejna te xwiya şimşad û serw(A)
Pîşê bejna te xwiya bû şimşad serw(M)

649 Ger xwuya bîtin ji te enguştekî(X), (Z),(A)
Ger xwuya bîtin ji te engiştegî (M)

10. Ṣorgula xeddê te hinkî buşkuvî [650]

Fethî bû bulbulşifet feryadixwan

35

mefa'îlun / mefa'îlun / fe'ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Çi şahek min hebû şêrîn û şehbaz [651]

Bi qurban im bi qurban im bi qurban

Ḥebîb û dilruba û rah û rimbaz [652]

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

2. Nedî min wek wî yar û dilrubayek

Ṭebîb û dilnewaz û dil kuşayek [653]

Nebû wek wî ji derdan ra dewayek

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

3. Qesembîllah di dewrana dinê da

Nebû wek wî di qaf û qulzemê da[654]

Dibêjim lew di her ḥîn û demê da [655]

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

4. Bi qurban bim ji bona bejn û bala [656]

Bi ḥeyran bim ji bona çeşmê şehla

[650] Ṣorgula xeddê te hinkî bişkivî (Z)
[651] Çi şahek min hebû şêrîn û rimbaz(M)
[652] Ḥebîb dilrubayê rahê rimbaz (M)
[653] Ṭebîb dilnewaz dil kuşayek (M)
[654] Nebû wek wî di qaf qulzemê da(M)
[655] Dibêjim lew di her ḥîn demê da (M)
[656] Bi qurban bim ji bona bejn bala (M)

Bi qelb û rûḥ û can û mulk û mala[657]

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban [658]

5. Çira dar û beran pijmurde bûne[659]

   Çira her kes di dil da murde bûne

   Ji hicra dilberan efsurde bûne

   Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

6. Ji hicrana ḥebîba nazidarem [660]

   Kete ‘alem hewar û zarezarem [661]

   Dibêjim ka şirîn û şehsuwarem[662]

   Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban[663]

7. Li ‘alem da ṣedaya ṣoḥbeta wî [664]

   Dilan ḥey kir cemala ṭel‘eta wî

   Hebû ma ḥeżretek wek ḥeżreta wî

   Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

8. Xeyala wî demadem her Xweda bû

   Murada wî ji dil raha hûda bû

   Bi qelbê û dost û yaran aşina bû[665]

   Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban[666]

9. Żiya bû ew ji bona dîn û dewlet

---

[657] Bi qelb rûḥ can mulk mala (M)
[658] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran (A)
[659] Çira dar û beran pejmurde bûne(Z)
[660] Ji hicrana ḥebîba nazidaram (X), (Z),(A),(M)
[661] Kete ‘alem hewar û zarezaram (X), (Z),(A),(M)
[662] Dibêjim ka şêrîn û şehsuwaram (X), (Z),(A),(M)
[663] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran (A)
[664] Bi ‘alem da ṣedaya soḥbeta wî (M)
[665] Bi qelb dost û yaran aşna bû(X), (Z),(A),(M)
[666] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran (A)

Çira bû ew ji bona mulk û millet [667]
Şifa bû ew ji bona daġ û ḥesret [668]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban [669]

10. Nebû meyla dilê wî qeṭ bi ‘alem
Gulek bû ew di nêv gulzarê adem
Bi wî xweş bû dil û qelbê me her dem[670]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

11. Bi wî geş bû dil û qelbê murîdan
Di nav şêx û mêla û muste‘îdan[671]
Çi xweş gul bû melaẕa bê omîdan[672]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban[673]

12. Mucedded kir gelek eḥwal û eṭwar [674]
Gerand carî ‘ûyûnê ‘ilm û enhar [675]
Rîyażê ‘ilmê da ezhar û esmar [676]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

13. Ṭerîqa neqşebendî kir mucedded
Binaya ‘ilm û ḥikmet kir muşeyyed [677]
Gelek rewneq wî da dînê Muḥemmed
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

[667] Çira bû ew ji bona mulk millet(M)
[668] Şifa bû ew ji bona daġ ḥesret (M)
[669] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran (A)
[670] Bi wî xweş bû dil qelbê me her dem (M)
[671] Di nav şêx mêlayê muste‘îdan (M)
[672] Çi xweş gul bû melaẕa bê omîdan(M)
[673] Bi ḥeyran bim bi heyran bim bi heyran(A),(M)
[674] Mucedded kir gelek ehwal etwar (M)
[675] Gerand carî ‘ûyûnê ‘ilm enhar (M)
[676] Rîyażê ‘ilmê dan ezhar û esmar (A)
[677] Binaya ‘ilm ḥikmet kir muşeyyed (M)

14. Çi xweş xeyrul-xelefekî neqşiyan bû
Melaẕ û melce’a me ‘aṣiyan bû
Umîd û hîviya bêhîviyan bû
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

15. Di remzan ḥikmetul-‘ayn û işaret[678]
Di lefẕan ṣed şifa û ṣed bişaret
Işarat û şifa kir wî ‘ibaret [679]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban [680]

16. Eger çi meşriq û meġrib bû Nûrşîn
Ji bo vê afitaba dewlet û dîn
Ji meşriq ta bi meġrib kir wî nûrîn [681]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

17. Ji vê şemsê belê bê par bû xuffaş
Nedî S̱anî ji bo wî ġeyrê çav şaş
Te‘alellah çi xweş ẕatek bû şabaş
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

18. Çiqas Nûrşîn bû xweş erwaḫzarek
Çemengah û riyaż û murġizarek[682]
Diçû ‘erşî ji wî xweş zarezarek [683]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban [684]

---

[678] Di remza ḥikmetul -‘ayn û işaret (Z)
Di remzan ḥikmetul-‘ayn işaret(M)
[679] Işarat şifa kir wî ‘ibaret (M)
[680] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran(A)
[681] Ji meġrib ta meşriq kir wî tezyin(M)
[682] Çemengah riyaż murġizarek (M)
[683] Diçû ‘erşê ji wî xweş zarezarek (M)
[684] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran(A)

19. Gelek wek quṭbê Besṭamî û Menṣûr [685]
Gelek wek xwaceyê eḥrarê meşhûr
Dihatin ew dibûn yek mecme‘ek nûr[686]
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban[687]

20. Fiġan û ḥesret û ṣed ah û feryad [688]
Çewan rabûn ji nav me şah û şehzad [689]
‘Imaret xaneya dil kirine berbad
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

21. Bi der hatin ji nava mulk û mala [690]
Kirin wan ‘ezmê nezhetgah û pala[691]
Der û dîwan kirin xalî û vala
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban[692]

22. Bihêle naṣir û me‘ṣûm û lawa[693]
Teqiyyî û baqî û sulṭan û ṭaha [694]
Veke ya Reb bi wan dergahê şaha
Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

23. Edim fîhim zemanen ġeyrê meḥdûd

[685] Gelek wek quṭbê Besṭammî Menṣûr(M)
[686] Li dîwanê dibûn yek mecme‘ek nûr (M)
[687] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran(M)
[688] Fiġan û ḥesret ṣed ah feryad (M)
[689] Çewan rabûn ji nav me şah şehzad(M)
[690] Bi der hatin ji nava mulk mala (M)
[691] Kirin wan ‘ezmê nuzhetgah û pala (Z)
Kirin wan ‘ezmê nezhetgah pala(M)
[692] Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran(A)
[693] Bihêle naṣir û me‘sûm lawa (M)
[694] Teqiyyî baqî sulṭan ṭaha (M)

Bihim yeḥya rusûm el-fežli wel-cûd[695]

Miqamul-ceddi ‘enhum ġeyru mecdûd

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban [696]

24. Mueyyed ke tu eṣḥabê wî xanî

Xuṣûṣa neclê şehbazê Hezanî

Berê luṭfa wî de **Fetḥiyê** canî

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

**36**[697]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1. Merḥeba ey peykê ‘uşşaqê ḥezîn û dilbirîn[698]

   Zûve muştaq in ji bo te wek mekes bo engebîn[699]

2. Xeyrê meqdem xweş tu hatî ṣedhezar keyf û fereḥ [700]

   Her bibe ji bo te di gel ‘izz û selamet hemqerîn

3. Dê çi bêjî ka ji eḥwalê şepala nazidar

   Lefẓ û guftarê te ne ew şekker û qendê şirîn [701]

---

695 Bihim yuḥya rusûm el fežli wel cûd (Z)

696 Bi ḥeyran bim bi ḥeyran bim bi ḥeyran (A)

697 Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne

698 Merḥeba ey peykê ‘uşaqê ḥezîn û dilbirîn (X)
Merḥeba ey peykê ‘uşşaqê ḥezîn dilbirîn (M)

699 Zûve muştaq in ji bo te wek mekes in bo engebîn(M)

700 Xeyrê meqdem xweş tu hatî ṣedhezar keyfê fereḥ (M)

701 Lefẓ û guftarê te ne ew şekker û şehdê şirîn (Z)
Lefẓ guftarê te ne ew şekker û şehdê şirîn(M)

4. Ez dibêm ṭûṭî di dunya ger hebîtin ew tu yî

   Xweşxeram î xweşkelam î canfezayê nazenîn

5. Nefḥeya miskê te teşrîf kir ji seḥraya xoten

   Ya demê ‘Îsayî ya badê ṣebayî bil-yeqîn

6. Tê ji nik wî dilbera ṣorgul xeda qamet elîf

   Hem muşerref hem mu‘eṭṭer bi zulf û xalê ‘enberîn

7. Ṭûtiyayê çehvê korî merhema qelb û dil î [702]

   Xweş tu tiryaq î ji bo melsû‘ê çehvê nergisîn

8. Ez qewî îro birîndar û feqîr im sîneçak[703]

   Lew serapa ateş im herdem dikim ah û enîn [704]

9. Sîneçak û derdimend û mustemend û derbider[705]

   Çav li rê û guh li dergeh zar û giryan û ḥezîn [706]

10. Ṣed hezar ‘illet ji hicrana ḥebîba çavġezal

    ‘Edd û iḥṣa nabe mumkin qeṭ bi sogend û yemîn [707]

11. ‘Erżiḥala **Fetḥiyê** bêçare ba ḥusnê edeb

    Tu bibe wî ḥeżreta wek rewżeya xulda berîn

[702] Ṭûtiyayê çehvê gorî melhema qelb û dil î (M)
[703] Ez qewî îro birîndar û feqîr û sîneçak (M)
[704] Lew serapa ateş im herdem dikim ah enîn (M)
[705] Sîneçak derdemend mustemend derbeder(M)
Sîneçak û derdemend û mustemend û derbeder(C)
[706] Çav li rê û guh li dergeh zar û giryan ḥezîn (M)
[707] ‘Edd û iḥṣa nabe mumkin qeṭ bi sowgend û yemîn (X), (Z),(M)

## 37[708]

mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun

Recez – – + –/– – + – /– – + –/– – + –

1. Dîsa ji nû leb şekkerîn avête dil ‘işq û evîn[709]
   Lew bûye mecrûḥ û birîn her dem dike ṣed ah û ah[710]

2. Ṣed ah û nalîn û fiġan her dem ji dil tên bêguman [711]
   Ji destê wê ḥûra cinan ebrûhilala hemçû mah

3. Qamet neya xurşîdê rû reş kakila mişkînê bû
   ‘Enber ṣifet zulfê li rû ferwar û hem ‘ewn û penah

4. Şêrînleba dil mustened ẓulmê dikit pir bê ‘eded [712]
   Dad û meded dad û meded kuştî feqîrê bê gunah

5. Ey dilrubaya nazenîn ey gewher û le‘lê s̱emîn
   Napirsî qe li ḥalê ḥezîn karê te her cewr û cefah [713]

6. Ger pirs bikî ḥalê dil e mesrûr e ew ya dilkul e[714]
   Ey nazika xed ṣorgul e dê li ‘erşê ‘ela bê kulah

---

708 Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne
709 Dîsa ji nû leb şekerîn avête dil ‘işq û evîn (X),(Z),(M)
710 Ev riste di destnivîsa bingeh de wek şêweza ‘Ji destê wê selwa ciwan’ jî hatiye diyarkirin
711 Ṣed ahê nalîn û fiġan her dem ji dil tên bêguman(X),(M)
712 Şêrînleba dil mustened ẓulmê dikit pur bê ‘eded (X),(Z)
713 Napursî qe li ḥalê ḥezîn karê te her cewr û cefah(X),(Z)
714 Ger purs bikî ḥalê dil e mesrûr e ew ya dilkul e (X),(Z)

7. Bayê firaqa dilberan zerkirye wek bergê xezan
Cism û cesed hem rûḥ û can qeṭ carekê nakin nigah

8. Nakit neẓer ew mahitab qelbê ‘elîl bûye kebab
Nalîn û efġan bêḥisab tên da’ima bê gah û gah [715]

9. Bûm mexzena derd û elem derd û elem nayê qelem
Ji wê dilbera ṣaḥib ‘elem ew surxê rûya keç kulah

10. Beyża yeda sûr peyker î lebşekera xweş menẓer î [716]
Serdeftera sîmînber î şêrîn dihana ‘eṭresah [717]

11. Dil da’ima dilber divê ṭûṭî di leb şeker divê [718]
**Fetḥî** perî peyker divê qeṣd û mirada mihr û mah[719]

**38[720]**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1. Fîl-ḥeqîqet rindî we ḥusna ḥebîban her heye
Lê ziyade ger bibînet ‘aşiqê rencûr dil e[721]

2. Dilbera mexmûr qebaya nazika hişyar û mest
Zulf û xalan tu xwuya ke da xwuya ke ṣorgul e

---

715 Nalîn û efġan bêḥisab tên da’ima bê gah gah(M)
716 Beyża yeda hûr peyker î lebşekera xweş menẓer î(Z)
Beyża yeda sûr peyker î lebşekkera xweş menẓer î (M)
717 Serdeftera sîmînper î şêrîn dihana ‘eṭresah(Z)
718 Dil da’ima dilber divê ṭûṭî di leb şekker divê (M)
719 **Fetḥî** perî peyker divê qeṣd û murada mihr û mah (X), (Z)
Ev riste di destxeta bingeh de bi şêwaza “Qeṣd û mirada zerre mah”, “Qeṣd û mirada mihr” , “Qeṣd û mirada zer” jî hatiye nişandan.
720 Ev helbest di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne
721 Lê ziyade ger bibînit ‘aşiqê rencûr dil e (Z)

3. Ger bibîne zulf û xalan ‘aşiqê sewda û dost

Dê li afaqan belav bit ev ṣeda û ġulġul e

4. Weṣf û nîşan dê belav bit ger çi bê hemtayî tu

Çunke bê hemtaye ‘aşiq ew di weṣfan bulbul e

5. Ḥubbê dêm bê şek belaye cismê dal û nûn dikit

Her ji derdan ew dibêje ah ji destim çû dil e

6. Cismê bê dil derdemend e yek ḥebek cu nakitin[722]

Lew ji neqṣa qîmetî ah û fiġan radihile

7. Ah û efġan tê ji nik wî her wekî lehb û pereng

Lê nizanit ê nedîtî firqeta weṣla gul e

8. Dê li wî sewdayî û ṣed lewmekar hem rabitin

Dîn û sewda ye cunûne ew ne merdek ‘aqil e

9. Dînî û sewdayiyek dê lê ẓuhûr be wî demî

Ger bibînit zulf û xal û ebrû û reş kakul e[723]

10. ‘lşqê derdek bê dewa ye nîne qeṭ îla wiṣal[724]

Ġeyrê weṣla ê ku bûyî qeddê miḥrabê dil e

11. Ya reb ez badê xezaneş zulf û xalan hifẓidar

Ta nemî yabed teṭawul ber çu ewraqê gule[725]

---

[722] Cismê bê dil derdimend e yek ḥebek cu nakitin (Z)
[723] Ger bibînit zulf û xal û ebrû û reş kakil e (Z)
[724] ‘lşq derdek bê dewa ye nîne qeṭ îlla wiṣal (Z)
[725] Ta nemî yabed teṭawul bur çu ewraqê gule (Z)

12. Zulfê pabendê muḥibban qeyd û zencîrê di xal
Her dikêşe van belayan ba ṣeda û welwele

13. Der muqasatê hewa çend salekî têk ṣerf bûn[726]
Lew ʻilel yek yek muretteb bûn ji destê ṣorgul e

14. **Fetḥiyê** naçarê bê endam ṭaqet qeṭ nema
Lê ke yek reḥmek Xweda ra nazika bû sunbul e

**39[727]**

mefaʻîlun / mefaʻîlun / feʻûlun
Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Teʻalellah ji vê aba zelal e
Teʻalellah ji vê xemra ḥelal e

2. Hebûya carekê ger min vexwara
Ku têr av bibwa ev ezmanê lal e

3. Me bikra ḥemdekî xaliṣ ji bona
Xwedayê ẕul celalê layezale

4. Bide min saqiya kûza şerabê
Mede guh van ṭebîbê bed fiʻal e

---

726 Der meqamatê hewa çend salegî têk ṣerfe bûn(Z)
727 Ev helbest di destnîvîsa (A) û (M)yê de nîne

5. Nehin ẕu nef ‘û żer wellahî wallah[728]

   Ji ġeyrî ẕatê pakê bê miṣal e

6. Kesê xwuy şibhe bit yek ẕerrekî tê

   Biṭirse ew bira ji werṭa webal e

7. Kerem ke saqiya bîne şerabê

   Ela ey çav li dest û dil li bal e

8. Li ser reġma ḥekîmanê zemanî

   Bi qanûn û bi şer‘a ẕul-celale

9. Di enwara ṭebîban da me dîtî [729]

   Digo ṣed cur‘e bo xeste ḥelal e

10. Welêkin puştî teftêşek ‘eca’ib

    Me jê fehm kir ku ferż e lamuḥal e[730]

11. Li ser ṣidqa evê de‘wa me şahid

    Cemî‘ê şerḥ û ḥaşî ey heval e

12. Bes e **Fetḥî** ji ḥeddê xwe meçe der

    Te‘alellah ji vê neẓma delal e

[728] Nehin ẕu nef ‘û żer wellahî bîllah (Z)
[729] Di enwara ṭebîban da mi dîtî (Z)
[730] Mi jê fehm kir ku ferż e lamuxal e (X)

## 40[731]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec + − − −/+ − − − /+ − − −/+ − − −

1. Ji hecra dilbera nazik me pir efġan û nalîn e[732]
   Muferreḥ qeṭ nebûn carek bi weṣla yarê şêrîn e
   Di dil hilbû qewî narek ji ber wî me qerar nîn e

2. Kesî ku dil mu‘elleq bit bi damana dilawîzan
   Çisan dê dil muferreḥ bit ji xwûnrîziyê xwûnrîzan
   Peyapey dê mukedder bit ji hecra şekkeramîzan

3. Necat û raḥeta canî me can şabaşê canan e
   Bi nisbet mahê tabanî żiyabexşê dil û can e
   Ji me’yûsî û ḥirmanî me nalîn kahê keywan e

4. Belê bo dil heyîn raḥet welê ḥirman û me’yûsî
   Li wan ev reng bûwe ‘adet di gel neyreng û salûsî
   Bi ‘aşiq qeṭ neẓer nadit meger îlla bi casûsî

5. Qeba surxê ‘eṭirsayî li mehrûya şekerxende[733]
   Li canê bê dilê mayî ‘eceb renc û ‘eceb derd e
   Li pêşber wî dilarayî qewî meḥcûr û şermende

[731] Ev helbest di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne
[732] Ji hecra dilbera nazik me pur efġan û nalîn e(X),(Z)
[733] Quba surxê ‘eṭirsayî li mehrûya şekerxende(X),(Z)

6. Seraser têk û têk nalîn dikit can û dil û dîde

Ji ber cewra wî dil bû xwîn çu şaxê bîdê lerzîde

Bi ev de’ib û bi ev ayîn dibî **Fetḥî** tu ġemdîde

**41**[734]

mef‘ûlu / fa‘ilatun / mef‘ûlu / fa‘ilatun

Behra Muzarî – – + / – + – – / – – + / – + – –

1. Buhar bi ser me hatî lê fayde nîne eṣla

Yar ger wiṣalê nîne baġ û buhar nexweş bû

2. Lew baġ û beġçe bostan ṣorgul di nav gulistan

Bê wan di destê mestan eṣla qewî nexweş bû

3. Yar ger firaqê ḥaṣil ger bê di nav gul û mul

Ṣorgul bi mis̱lê sunbul bê ṣoḥbeteş nexweş bû

4. Ger nûşî mey di camê wellah bizan peyamê

Bê tîn û selamê dildarê qeṭ nexweş bû[735]

5. Ger zulf û xalê zînê dildarê wek şirînê[736]

Der cennetê nebînê cennet qewî nexweş bû

[734] Ev helbest di destnivîsa (M)yê de nîne
[735] Bê dîtîn û selamê dildarê qeṭ nexweş bû (X),(Z), (A)
[736] Ger zulf û xalê zînê dildarê wek şêrînê (Z)

6. Wellah ḥeram e kewṣer bê rûyê yar û dilber

Bê rûyê yar û dilber kewṣer ji xwe nexweş bû

7. Haşa ku der cehennem an yarê mûyê dirhem[737]

Bînî xwe destê berhem pêşber li şahê xweş bû

8. Cana meke firaqet ez ṣaḥib iştiyaqet [738]

Wellah nehin liyaqet firqet jî pir nexweş bû[739]

9. ‘Ewrê firaq û hicran ez baġê weṣl û bostan

Bavê nebit li meydan lewra ku ew nexweş bû [740]

10. Cerg û ciger meke xwîn ḥeta bi kengî çendîn

Ẓulm û te‘eb bixwendîn ẓulm û te‘eb nexweş bû

11. Ṭali‘ nekir ṭulû‘e ṭulû‘ê pir sutû‘e [741]

Ta key verêm dumû'e di gel me pir nexweş bû[742]

12. Yar ji li rengê kewkeb inṣaf nekir di yek şeb

Neda me camê meşreb meşreb li me nexweş bû

13. Meşreb me telx kam kir xwab û neẓer ḥeram kir [743]

Ta hudhudî peyam kir peyamekî çi xweş bû

---

737 Haşa ku der cehennem an yarê mûyê derhem (Z)
Haşa ku der cehennem an dildarê mûyê dirhem(A)

738 Cana meke firaqet ez ṣaḥibê iştiyaqet (Z)

739 Wellah nine liyaqet firqet jî pur nexweş bû (Z)
Wellah nehine liyaqet firqet jî pur nexweş bû (A)

740 Bavêt nebit li meydan lewra ku ew nexweş bû(A)

741 Ṭali‘ nekir ṭulû‘e ṭulû‘ê pur sutû‘e (Z)

742 Ta key verêm dumû'e di gel me pur nexweş bû (Z)

743 Meşreb me telix kam kir xwab û neẓer ḥeram kir(Z)

14. Mizgînê da me weṣlet nageh ji xwabê ġeflet

Wiṣalê nîne firqet firqet çi marê reş bû

15. Rabûn di kûh û deştan xweş kir me seyr û geştan

Dest best û pê vemiştan gihane cayê xweş bû[744]

16. Weṣlet me kir bi yar e derhat ji payê xare[745]

Ṭali‘ jî bûyî yar e dil jî ‘eceb çi xweş bû

17. Ey **Fetḥiyê** ḥezîne carek were bibîne [746]

Bê ah û bê enîne Xalê li rûyê geş bû

## 42[747]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1. Gul xweş in sosin xweş in sunbul xweş in

Ew zî çû ew zî çû ew zî çû

‘Endelîb û kumrî û bulbul xweş in[748]

Ew zî çû ew zî çû ew zî çû

2. Ṭel‘eta xûban û mehparan xweş e[749]

Muḥbeta rindan û dildaran xweş e[750]

---

[744] Tali‘ ji bo yarê ‘aşiq dilet çi xweş bû(A)
[745] Wuṣlet me kir bi yar e derhat ji payê xare (Z)
Ev malik di destxeta (A)yê de nîne
[746] Ey ‘Aşiqê Ḥezîne carek were bibîne (A)
[747] Ev helbest di destnivîsa (A), (X) û (C)yê de nîne û ji destnivîsa (Z)yê hatiye girtin
[748] ‘Endelîb kumrî û bulbul xweş in(M)
[749] Ṣoḥbeta xuban û dildaran xweş e(M)
[750] Ṭel‘eṭa rindan û mehparan xweş e(M)

Luṭf û goftara şekerbaran xweş e
Ew zî çû ew zî çû ew zî çû

3. Ḥeyf û ḥesret min li ew dewr û zeman
Dewr û ewqatê wiṣala dilberan
Pur xweş e adar û nîsan û gulan
Ew zî çû ew zî çû ew zî çû

## 43[751]

mef'ûlu/ mefaîlun/ mef'ûlu/ mefaîlun
Hezec − − +/ + − − − / − − +/ + − − −

1. Ey dil bi ġemê ḥicran ta kengî binalî tu
Wî mecmerê pir nîran da'im di xiyalî tu[752]

2. Ev ah û fiġanê te çûne felekê 'alî [753]
Bêzar û birîndar î ji wan qewsê hilal î tu

3. Ev cism û cesed pêkve zerbûne ji destê te
Sergeşte û bîmarî bê mal û menal î tu [754]

4. Ġemperwer û ġemnakî herdem tu elemnakî [755]
Ṣed pare û ṣed çakî muştaqê wiṣal î tu

5. Can bû ji te fersûde carek nebû asûde

[751] Ev helbest di destnivîsa (A)yê de nîne
[752] Wî mecmerê pur nîran da'im di xiyalî tu (X), (Z)
[753] Ev ah fiġanê te çûne felekê 'alî(M)
[754] Sergeşte bîmarî bê mal û menal î tu(M)
[755] Ġempurwur û ġemnakî herdem tu elemnakî(Z)
Ġemperwer û ġemnagî herdem tu elemnakî(M)

Wek murġê ġem alûde her weqti dinalî tu[756]

6. Perwaneyê xweş reng î bê ṣewt û ḥes û deng î[757]
   Geh gahê bi aheng î ḥeyranê şemal î tu

7. Xweş murġekî demsaz î şehzade û şehbaz î [758]
   Pur ṭalibê perwazî lê bê per û bal î tu

8. Ev per û balê ṣûrî ḥeta te hebin dûrî [759]
   Bêçare û mehcûr î meḥrûmê kemal î tu [760]

9. Rabe xwe mu‘erra ke van bal û peran rake [761]
   Wek xalê xwe sewda ke ger ṭalibê xalî tu

10. Du gav e riya dilber yek serser û yek derber
    Belkî yek e ya ser ser ger nemri miṯal î tu

11. Bê şubhe şibhî lax î dê tu bibê bin axî [762]
    Cismê xwe ji vî kaxî er çende delal î tu[763]

[756] Wek murġê ġem alûde her weqt dinalî tu (M)
[757] Perwaneyê xweş reng î bê ṣewt û ḥiss û deng î (Z)
[758] Xweş murġekî demsaz î şehzade şehbaz î (M)
[759] Ev bal û perê ṣûrî ḥeta te hebin dûrî (X), (Z)
Ev bal perê ṣûrî ḥeta te hebin dûrî(M)
[760] Bêçareyê mehcûr î meḥrûmê kemal î tu(M)
[761] Rabe xwe mu‘erra ke van bal peran rake (M)
[762] Bê şubhe şubhî lax î dê tu bibê bin axî (Z)
[763] Ev helbest di temamê destnivîsan de kêm e.

## 44[764]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec + − − −/+ − − − / + − − −/+ − − −

1. Ji ‘işqa vê şekerxayê şev û rojan dinalim ez[765]

   Şev û rojan dinalim ez ji ‘işqa vê şekerxayê[766]

2. Firaqa serwê belayê dil can hinavan ṣoht

   Dil can hinavan ṣoht firaqa serwê belayê

3. Wucûda min serapayê bi hicrana xwe texrîb kir

   Bi hicrana xwe texrîb kir wucûdê min serapayê

4. Delal û xûb û zîbayî ji weṣla xwe me meḥrûm kir

   Ji weṣla xwe me meḥrûm kir delal xûb û zîbayî

5. Çi tîrek bû li dil dayî ji qewsa firaqê hicranê

   Ji qewsa firaqê hicranê çi tîrek bû li dil dayî

6. Ji nav me şibhetê bayê bilez çû cennetul-fîrdews

   Bilez çû cennetul-fîrdews ji nav me şibhetê bayî

7. Çi ni‘met bû ji mewlayî di luṭfê reḥma îḥsanî

   Di luṭfê reḥma îḥsanî çi ni‘met bû ji mewlayî

8. Muleqqeb bû seydayî di nava xaṣ hem ‘aman[767]

[764] Ev helbest di destnivîsa (A), (X) û (C)yê de nîne û ji destnivîsa (M)yê hatiye girtin

[765] Ji ‘işqa vê şekerxayê şev û rojan dinalim ez (Z)

[766] Şev û rojan dinalim ez ji ‘işqa vê şekerxayê(Z)

[767] Di nava xaṣ hem ‘aman muleqqeb bû seydayî (Z)

Di nava xaṣ hem ‘aman muleqqeb bû seydayî[768]

9. Şebîhê wî li dinyayê qesem billeh nebû qeṭ kes[769]
   Qesem billeh nebû qeṭ kes Şebîhê wî li dinyayê[770]

10. Bi qedd û bejn û balayî esef da serw û şimşadan[771]
    Esef da serw û şimşadan bi qedd û bejn û balayî[772]

11. Wekî wî xûb û ra‘nayî nehin qeṭ kes di dewrê da[773]
    Nehin qeṭ kes di dewrê da wekî wî xûb û ra‘nayî[774]

12. Ji bona wî simensayî çira **Fetḥî** nebû qurban[775]
    Çira **Fetḥî** nebû qurban ji bona wî simensayî[776]

**45**[777]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1. Hewar e hey hewar e min ji vê qêrîn û ġewġayê[778]
   Nema min quwwet û ṭaqat ji hicra wê dilarayê

---

768 Muleqqeb bû seydayî di nava xaṣ hem ‘aman (Z)
769 Qesem billeh nebû qeṭ kes şebîhê wî li dinyayê (Z)
770 Şebîhê wî li dinyayê qesem billeh nebû qeṭ kes (Z)
771 Esef da serw û şimşadan bi qedd û bejn û balayî (Z)
772 Bi qedd û bejn û balayî esef da serw û şimşadan (Z)
773 Nehin qeṭ kes di dewrê da wekî wî xûb û ra‘nayî (Z)
774 Wekî wî xûb û ra‘nayî nehin qeṭ kes di dewrê da (Z)
775 Çira **Fetḥî** nebû qurban ji bona wî simensayî (Z)
776 Ji bona wî simensayî çira **Fetḥî** nebû qurban (Z)
777 Ev helbest di destnivîsa (M), (X) û (Z)yê de nîne.
778 Hewar e hey hewar e min ji vê qêrîn ġewġayê(A)

2. Ji ‘işqa wê şekerxayê nikarim ez teḥemmul kim
   Kû da çû ye xuya nabe delal û xûb û zîbayê

3. Ji hicra nazenînan min dil û can û ciger kûl bû
   Di dil hil bû qewî narek ji şewqa bejn û balayê

4. Dema wecha munewwer tête fikra min dibim serxweş
   Dibim medhûş û bêhiş ez ji fikra çeşma şehlayê

5. Kete ‘alem enîn û nale û feryad û hem efġanem[779]
   Seraser bêheş û mestin ji wan keyfek qewî nayê

6. Ji qelban derketî keyf û fereḥ dil ma dinalînî
   Nema qeṭ leẕẕet û ‘uşret di piştî rûyê seydayê[780]

7. Çi san dî dil muṣeffa bit çi san dî dil muferreḥ bit
   Di piştî rûyê seydayî nemînim ez li dunyayê

8. Fiġan û ḥesret û feryad û ahîn û hezar nal[781]
   Dikin cumle xela’ik ji hicra mahê sîmayê [782]

9. Ji vê dewra ku dewwarê ne ev ma’mûl bû îro
   Ji nageh ateşê hicrê ḥebîban girt serapayê

10. Der û dîwan û eywan cumle bûn mey’ûs û hem meḥzûn
    Melûl û ustûxwarin tev ji hicra wê semînsayê

[779] Kete ‘alem enîn û nale û feryad hem efġanem(A)
[780] Nema qeṭ leẕẕet û ‘işret di piştî rûyê seydayê(A)
[781] Fiġan  ḥesret û nalîn û feryadû we ahîn e (A)
[782] Digo cumle xela’ik ji hicra mah sîmayê(A)

11. Qed û bala û ruxsar û xeṭ û xal û leb û qamet
Niqab û perde û pêçe biser hatin ji ġebrayê

12. Qe mumkun nîne êdî cilwedarî ez xeṭ û xalan
Xwedavenda muyesser ke ji bona me di ‘uqbayê

13. Nehin kes bêkes û bêçare û bêdil wekî **Feth̤î**[783]
Meke ya Rebb ewî meḥrûm ji luṭfa şêx û seydayê

## 46[784]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun
Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1. Hilak bûm ez ji destê te revandî dil ji destê me[785]
Ji zulfan lew bi efġan im bi ahîn im hezar zarî

2. Teżerru‘ ṣed hezar caran me kir ez dergehê barî
Wiṣalê ku muyesser ke bi wan ṭurreyê ṭerrarî

3. Dilê min reftî û burdî ela ey dilbera nazik
Bes e ẓulm û cefaya te di gel vê qehr û azarî

4. Me meqṣed nîne ez dunya ji ġeyrî nazenîn ḥûrî
Te meqṣed nîne ġeyrî ẓulm li vî azar û rencûrî

5. Ṭulu‘ kir ṭali‘ê bedbext zuhel derket bi nehsî lew
Di mabeyna me da çêbû hezaran bu‘d û hem dûrî

---

[783] Nehin kes bêkes û bêçare û bêdil wekî **Baqî** (A)
[784] Ev helbest di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne
[785] Helak bûm ez ji destê te revandî dil ji destê me (Z)

6. Firaq çêbû di mabeyna du meḥbûban ‘eceb renc e [786]
Li kû ma ew di ewṣafan ‘ezîz û nazenîn ṣûrî

7. ‘Ezîz û lebşeker xende çu zuhre bi lewn û hemrenge
Munewwer kir bi sîma wî hemî afaq û eqṭarî

8. Hemî afaq û eqṭaran minewwer bûn bi rûyê wî
Bi rûyê nêrgiza nazik ḥebîb û yar û dildarî

9. Di mabeyna me da ha’il hezar ha’il hezar ha’il
Bi yarê xwe nebûn waṣil me xew nîne şevê ṭarî

10. Wiṣala şox û merġûbî muyesser qeṭ nebû bo me
Dibînî lew bi efġan in dibinin ṣed cefa dûrî

11. Eya dewra ku dewware ḥeta kengî ji te **Fetḥî**
Bikêşe ṣed hezar cewr û cefa û qehr û rencûrî

## 47

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun

Remel − + − −/− + − − /− + − −/− + − −

1. Ey siracê dûrbînan ṣebr û raḥa hemnişînan[787]
Merhema qelbê ḥezînan naziya şêrîn leban î [788]

[786] Firaq çêbûn di mabeyna du meḥbûban ‘eceb renc e (X)
[787] Ey siracê dûrbînan ṣebr û raḥa hemnuşînan (Z)
[788] Melhema qelbê ḥezînan naziya şêrîn leban î(A)

2. Ey keremkarê nedîman xweşkerê qelbê seqîman
Meqṣeda her musteqîman ṣorgula baġê cînan î

3. Ey dewayê derdimendan musteġasê mustemendan
Sosina bostanê werdan ṭûṭiya şekerdihan î [789]

4. Dilruba û tabnak î şu'leya Yezdanê pak î [790]
Daruwê derdê helak î merhema qelb û dilan î [791]

5. Merhem û hem me'ber î tu melce' û hem rehber î tu [792]
Meymen û hem meyser î tu çeşmeya teşneleban î [793]

6. Rewneq û teşrîf û rûḥ î şehriyarê pir futûḥ î [794]
Bo me xweş raḥ û ṣebûḥ î hîviya me dilkulan î[795]

7. Hemnişînê mahitab î hemqerînê afitab î [796]
Hadiyê nehca ṣewab î Ṣedefa gewherfeşan î

8. Ey delîlê pêşiwayan muqtedayê rehnumayan
Destegîrê bê newayan kewkeba ṣubḥa şevan î

9. Mehweş û hem mehcebîn î nazidar û surşirîn î [797]
Naṣirê dînê mubîn î neclê şehbazê Hezan î

---

[789] Sosina bostanê rindan ṭûṭiya şekerdihan î(M)
[790] Dilruba tabnak î şu'leya Yezdanê pak î (M)
[791] Daruwê derdê helak î melhema qelb û dilan î(A)
Daruwê derdê helak î melhema qelb dilan î (M)
[792] Melhem û hem me'ber î tu melce' û hem rehber î tu(A)
Merhem hem me'ber î tu merhem hem me'ber î tu(M)
[793] Meymen û hem meyser î tuçeşmeya teşneleban î (M)
[794]Rewneq teşrîf û rûḥ î şehriyarê pir futûḥ î(M)
Rewneq û teşrîf û rûḥ î şehriyarê pur futûḥ î (Z)
[795] Bo me xweş raḥ û ṣebûḥ î hîviya me dilkulan î(M)
[796] Hemnuşînê mahitab î hemqerînê afitab î (Z)
[797] Mehweş û hem mehcebîn î nazidar û surşêrîn î (Z)

10. Neclekî ‘aşiq gudaz î menbe‘a esrar û raz î
Pir bi şox û şeng û naz î ṣorgula nêv sunbulan î [798]

11. Gulşena baġê hidayet çeşmeya ḥilm û melahet[799]
Kûhê tewqîr û fexamet meṭmeḥa çeşm û dilanî

12. Qelbê ‘uşşaqan li qamet ma muḥeyyer bê metanet
Nayte heş ḥeta qiyamet ta gehe axir zeman î

13. Dilnewaz û pêkve naz î canfeza û ġunçe baz î[800]
Şahizad û şahibaz î ferruḥ û hem şadiman î [801]

14. Textê irşadê te mesned tekyegaha te ji serḥed
Ḥeżretî Ṡanî mumecced şehnişîn û dileman î [802]

15. Dil hewaya te dixwazit da bi wê fexrê binazit
Kî bi dildarî bibazit dê bibîne kamuranî

16. Kamuran û ber murad bit ger ne bed eṣl û fesad bit[803]
Wer ne teb‘ê wî ‘inad bit nagî qeṣdê yek zemanî [804]

17. **Fetḥiyê** naçarê Wamiq Ew bi teb‘ê xwe muwafiq
Goti çend ferdê ne la’iq Li bejn û bala dilistanî

---

[798] Pur bi şox û şeng û naz î ṣorgula nêv sunbulan î(Z)
Pir bi şox şeng naz î ṣorgula nêv sunbulan î (M)
[799] Gulşena baġê hidayet çeşmeya ‘ilmê melahet(M)
[800] Ev malik di destxeta (A)yê de nîne
Dilnewaz û pêkve naz î canfiza û ġunçe baz î (Z)
[801] Şahizadê şahibaz î ferruḥ hem şadiman î(M)
Şahizad û şahibaz î ferreḥ û hem şadiman î(Z)
[802] Ḥeżretî Ṡanî mumecced şehneşîn û dileman î(Z)
[803] Kamuran û ber murad bit ger ne bed eṣl fesad bit(M)
[804] Wer ne teb‘ê wî ‘inad bit nakî qeṣdê yek zemanî(M)

18. Bejn û bala qedd û qamet ev qeder ‘izz û şehamet [805]
Ḥifẓ ke ḥeta qiyamet Ya Reb ez badê xezanî

**48**

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun
Hezec + − − −/+ − − − /+ − − −/+ − − −

1. Gelek îro birîndar im ji hicra Ḥeżretî S̱anî
Gelek mecrûḥ û bîmar im gelo kan Ḥeżretî S̱anî[806]

2. Feqîr ḥal im xerab mal im eṣemm û ebkem û lal im
Ji hicra yarê bê ḥal im gelo kan Ḥeżretî S̱anî [807]

3. Dilêm ṣohtî ji hicranê ji hicra şêxê dîwanê
Esîr im ez di zindanê gelo kan Ḥeżretî S̱anî

4. Gelo kan rehnumaya min delîl û pêşewaya min [808]
Ṭebîb û muqtedaya min gelo kan Ḥeżretî S̱anî[809]

5. Xwuya nabit şepala min ḥebîb û hem delala min[810]
Żiyabexş û şemala min gelo kan Ḥeżretî S̱anî[811]

6. E nabînim cemala wî feqîr mame ji wiṣala wî
Dikim her dem xiyala wî gelo kan Ḥeżretî S̱anî

[805] Bejn bala qedd û qamet ev qeder ‘izz û şehamet(M)
[806] Gelek mecrûḥ bîmar im gelo kan Ḥeżretî S̱an(M)
[807] Ji hicra yarî bê ḥal im gelo kan Ḥeżretî S̱anî
[808] Gelo kan rehnumaya min delîl û pêşiwaya min (X),(Z), (A)
Gelo kan rehnumaya min delîl pêşewaya min (M)
[809] Ṭebîb muqtedaya min gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)
[810] Xwuya nabit şepala min ḥebîb hem delala min (M)
[811] Żiya bexş şemala min gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)

7. Rewaca mulk û millet bû żiyaya dîn û dewlet bû [812]
Belê şêxê şerî‘et bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

8. Ji bo qelbê murîdan e nehin wek wî tu Loqman e
Di mulkê dil de sulṭan e gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

9. Di babê luṭf û reḥmê da di ḥalê ‘ilmê qelbî da [813]
Nebû wek wî di dewrê da gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

10. Di babê feżl û ‘irfanê nedî min wek te xaqanî
Te‘alellah ji iḥsanê gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

11. Ḥeyat û raḥeta dil bû di nav ṣaḥib dilan gul bû[814]
Di zikrê ḥeq de bulbul bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

12. Bi dil beḥra me‘anî bû bi ḥusnê mahê Ṣ̱anî bû
Ji mewla ermeġanî bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

13. ‘Eceb zîba û re‘na bû ‘eceb şox û dilara bû
‘Eceb meḥbûbê mewla bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

14. Bi ġemze afetê can bû bi qamet serwê bostan bû
Bi xedd û rû gulistan bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî[815]

15. Ḥebîbê rûḥ û hem can bû ṭebîbê daġ û derdan bû[816]
Binefşa baġê werdan bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî

---

[812]Rewaca milk millet bû żiyaya dîn dewlet bû(M)
[813] Di babê luṭf reḥmê da di ḥalê ‘ilmê qelbî da(M)
[814] Ḥeyat raḥeta dil bû di nav ṣaḥib dilan gul bû(M)
[815] Bi xed werda gulistan bû gelo kan Ḥeżretî Ṣ̱anî(X),(Z),(M),(A)
[816] Ḥebîbê rûḥ  hem can bû ṭebîbê daġ û derdan bû(M)

16. Bi ismê xwe Żiyadîn bû bi cismê xwe Żiyadîn bû
Żiya û rewneqa dîn bû gelo kan Ḥeżretî S̱anî[817]

17. Çi xweş ḥeblul-metîn bû ew çi xweş miṣbaḥê dîn bû ew[818]
Çi xweş i'zazê dîn bû ew gelo kan Ḥeżretî S̱anî[819]

18. Meḥellê ṣoḥbeta dilber ji baġê cennetê xweşter[820]
Weqara wî ji wî geştir gelo kan Ḥeżretî S̱anî

19. Şev û roj û seḥergahan dikêşim ḥesret û ahan [821]
Ji feqda mîr û hem şahan gelo kan Ḥeżretî S̱anî

20. Di mulkê ġem şehinşah im ji kerban Yusûfê çah im [822]
Şeva ṭariyy û hem mah im gelo kan Ḥeżretî S̱anî[823]

21. Ketim vê ẕulmeta hicran wekî Bîjen di nêv zindan
Kuda çû Ristemê Kurdan gelo kan Ḥeżretî S̱anî[824]

22. Kuda çû nazenîna min enîs û ġemrevîna min[825]
Nehin kes dilḥebîna min gelo kan Ḥeżretî S̱anî

23. Feqîr û jar û 'uryan im di nava pêt û nîran im[826]
Ḥerîqê narê hicran im gelo kan Ḥeżretî S̱anî

---

[817] Żiya rewneqa dîn bû gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)
[818]Çi xweş ḥeblul-metîn bû ew çi xweş i'zazê dîn bû ew (A)
[819] Çi xweş miṣbaḥê dîn bû ew gelo kan Ḥeżretî S̱anî
[820] Meḥellê ṣoḥbeta dilber ji baġê cennetê xweştir (X),(Z),(M),(A)
[821] Şev roj û seḥergahan dikêşim ḥesret ahan(M)
[822]Di mulkê ġem şehinşah im di giryan Yusûfê çah im (A)
[823] Şeva ṭariy û hem mah im gelo kan Ḥeżretî S̱anî(X),(Z),(A)
Şeva ṭariyy bê mah im gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)
[824] Kuda çû Rustemê Kurdan gelo kan Ḥeżretî S̱anî (X),(Z),(A),(M)
[825] Kuda çû nazenîna min enîs ġemrevîna min (M)
[826] Feqîr û zar û 'uryan im di nêva pêt nîran im (M)

24. Gelo kan Ḥeżretî nûrîn celîsê mesneda Nûrşîn
Xwedanê ‘izz û hem temkîn gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

25. Celîsê mesneda dil bû di baġê dil de ew gul bû
Ji ber feqda wî dil kul bû gelo kan Ḥeżretî Ṣanî[827]

26. Ne tenha dil ji ber bû kul kete deşt û çiya ġulġul
Dibêjin tev wekî bulbul gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

27. Hinek bûn xa’if û ha’il hinek bûn ‘aşiq û ma’il[828]
Ji kar û kesbê bûn ‘aṭil gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

28. Hinek bûn mest û hem sekran hinek bê xwab û bê xew man[829]
Hinan ṣoht agirê hicran gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

29. Ji bayê hicrê rûzer bûn ji dil ah û enîn der bûn [830]
Çiku bê yar û dilber bûn gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

30. Nebû qeṭ kes tesellî ke ku qelbê wan teḥerrî ke[831]
Ji daġan wan teberrî ke gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

31. Çiku ṣebra dilan ṣed ah gula gulzara fetḥullah
Ji pêşve ‘ezm kir ev rah gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

32. Di şehraha liqayê da bi bal şehra beqayê da
Sulûk kir wî firaqê da gelo kan Ḥeżretî Ṣanî

[827] Ji bo feqda wî dil kul bû gelo kan Ḥeżretî Ṣanî
[828]Hinek bûn xa’if ha’il hinek bûn ‘aşiq û ma’il(M)
[829] Hinek bûn mest hem sekran hinek bê xwab û bê xew man(M)
[830]Ji bayê hicrê rûzer bûn ji dil ah enîn der bûn(M)
[831] Nebû qeṭ kes tesellî ke ku derdê wan tecerrî(A)
Nebû qeṭ kes tesellî ke ku derdê wan teḥerrî ke(M)

33. Firaq da yar û eṣḥaban esef da dost û eḥbaban [832]

Meşî çû kûhê mehtaban gelo kan Ḥeżretî S̱anî

34. Gihan nik merqeda ‘alî der û dîwan kirin xalî

Ji derdan dar û ber nalî gelo kan Ḥeżretî S̱anî

35. Mela û şêx ‘Elaeddîn Selîmullahê şemsa dîn[833]

Çewan dê ew bikin teskin gelo kan Ḥeżretî S̱anî[834]

36. Çewan dê ew teḥemmul kin çi reng dê ew teġaful kin [835]

Ḥeqe da’im teġelġul kin gelo kan Ḥeżretî S̱anî [836]

37. Xwedawenda tu ṣebrê de tu iḥsan û tu luṭfê de[837]

Demadem feyż û reḥmê de gelo kan Ḥeżretî S̱anî[838]

38. Derê şahan mehêl vala ji quṭb û ġews̱ û ebdala [839]

Ji nalîna xwedan ḥala gelo kan Ḥeżretî S̱anî [840]

39. Cemaluddîn û hem Baqî di gel ṭanê leb saqî

Bide wan tu meya baqî gelo kan Ḥeżretî S̱anî [841]

40. Di ‘ilmê baṭin û ẓahir bigîn wan rutbeya axir[842]

[832] Firaqa yar û eṣḥaban esef da dost û eḥbaban(M)
[833] Mela şêx ‘Elaeddîn Selîmullahê şemsa dîn(M)
[834] Çewan dê ew bibin teskîn gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)
[835] Çewan dê ew teḥemmul kin çi reng…………………A)
[836] Ḥeqqe da’im teġelġul kin gelo kan Ḥeżretî S̱anî(M)
Ḥeqe da’im teġelġul kin bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî (Z)
[837] Xwedawenda tu ṣebrê de tu iḥsan tu luṭfê de (M)
[838] Demadem feyż û reḥmê de bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî (Z)
[839]Derê şaha mehêl vala ji quṭb ġews̱ û ebdala (M)
[840] Ji nalîna xwedan ḥala bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî (Z)
[841] Bide wan tu meya baqî bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî (Z),(A)
[842] Di ‘ilmê baṭin ẓahir bigîn wan rutbeyan axir (M)

Di dehrê wan bike nadir gelo kan Ḥeżretî S̱anî [843]

41. Di ġeyn û şîn û mîm û ba li **Fetḥî** ḥuzn û şîn serda[844]
Reha ke wî ji van derda bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî [845]

## 49

mef‘ûlu / fa‘ilatun / mef‘ûlu / fa‘ilatun
Behra muzarî − − + / − + − − / − − + / − + − −

1. Ya Reb çi ev ṣeda bû da ‘alem ev mis̱alî
‘Alem ji ber fena bû şah û wezîr û walî

2. Şah û geda û ‘adî nêv meḥfelan û nadî
Bûn yek bi yek munadî her yek ji dil dinalî

3. Gulbangê nale nalan awazê ehlê ḥalan
Dagirti gund û bajar deşt û çiyayê xalî [846]

4. Rakir ji xanedanan şehbaz û şahizadan[847]
Xefkir meh û nucûman subḥane ẕîl-celalî

5. Ye‘nî ku şahê Nûrşîn neclê delalê nûrîn
Hem neclê neclê nûyîn çûn mulkê layezalî

[843] Di dehrê wan bike nadir bi ḥeqqê Ḥeżretî S̱anî (Z),(A)
[844] Di ġeyn şîn mîm û ba li **Fetḥî** şîn û ḥuzn serda(M)
[845] Reha ke wî ji van derda Gelo kan Ḥeżretî S̱anî (M)
[846] Dagirti gund û bajar deşt çiyayê xalî deşt çiyayê xalî (M)
[847] Rakir ji xanedanan şehbazê şahizadan (Z)

6. Fîlê firaq û hicran rahişt Ke‘beya dil[848]

Lem edrî eynî raḥet ibbaletul-wiṣalî

7. Lem yebqe min humumî ruḥî we ẕabe cismî[849]

Ferruḥ kel-xiyalî wel-cismu kel-hîlalî[850]

8. Her şeng û şoxê dehr î lat û menatê ḥusn î[851]

Hatin ji bo tesellî lê dil nebû qe salî[852]

9. Gul hat û go gul im ez hemrengê rûyê yar î[853]

Min go belê welakin ka qedd û qamê ‘alî[854]

10. Serwa çîmen xeram î qametek nişan da[855]

Min go bike te’eddub ka çehvê mestê ġalî

11. Nêrgiz bi çavê mestan xweş xweş li min neẕer kir[856]

Min go ti bê neşatî ka lefẕê wek lu’alî [857]

12. Sosin temam zeban bû da şerḥê raz û esrar[858]

Min go tu bê neşaṭî her çendê pir meqal î [859]

---

848 Fîlê firaq hicran rahişt Ke‘beya dil(M)
849 Lem yebqe min humum ruḥî we ẕabe cismî(M)
850 Ferruḥ kel-xiyal wel-cismu kel-hîlal(M)
851 Her şox û şengî dehr î lat û menatê ḥusn î(Z)
Her şox û şeng dehr î lat û menatê ḥusn î (M)
852 Hatî ji bo tesellî lê dil nebû qe salî(Z)
853 Gul hat go gul im ez hemrengê rûyê yar im(A)
Gul hat û go gul im ez hemrengê rûyê yar im (X),(Z),(M)
854 Min go belê welêkin ka qedd û qamê ‘alî(M)
855 Serwa çemen xeram î qametek nişan da(X),(M),(A)
856 Nêrgiz bi çehvê mestan xweş xweş li min neẕer kir(M)
857 Min go tu bê zeban ka lefẕê wek lu’alî (Z), (A)
Min go tu bê zebono ka lefẕê wek lu’alî (X), (M)
858 Sosin temam zeban bûn da şerḥê raz û esrar(Z),(M)
859 Min go ti bê neşaṭî her çendê xweş meqal î(A)
Min go tu bê neşaṭî her çendê pur meqal î(Z)

13. Dan ḥukmê keyf û ‘îdan van ḥakim û serefraz [860]

Min go te wan delalan ka ebruwê hilalî

14. ‘Îdê gelek nişan da ‘eyş û neşaṭ û şahî[861]

Lê min ji dil fiġan da ka yarê çav ġezalî

15. Ḥaṣil ji qîl û qalê dil zêde pir melal bû[862]

Dil zêde pir melal bû ḥasil ji qîl û qalî [863]

16. Daġa di dil tu caran naket tu tiştekî xweş

Îlla ṣedayê bulbul gava ji dil dinalî

17. Beḥṣ̱î ji ṣorgula xwe ji yar û dilbera xwe [864]

Ji remz û raz û nazan xweş xweş bike bi delalî [865]

18. Ye‘nî şehê ruḥ û can murġê dil aşiyane[866]

Mahê semayê qelban mîrê melek miṣ̱al î [867]

19. Efrasyabê me’na Iskenderê ḥeqîqet

Darayê textê irşad serdefterê mewalî

20. Ş̱êrê ṭerîq û ṣoḥbet neclê şehê Hezanî [868]

Seydayê Ṡaniyê ma meḥbûbê çarde salî

---

[860] Dan ḥukmê keyf û ‘îdan van ḥakimê serefraz(M)

[861] ‘Îdê gelek nişan da keyf û nişaṭ û şahî (Z),(M)
Ev malik di destnivîsa (A)yê de nîne

[862] Ḥaṣil ji qîl û qalê dil zêde pur melal bû(Z)

[863] Dil zêde pur melal bû ḥasil ji qîl û qalî(Z)

[864]Beḥṣ̱î ji dilbera xwe ji yar û sorgula xwe(A)

[865] Ji remz û raz û nazan xweş xweş bike binalî(A)

[866] Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîn e

[867] Mahê semayê qelban mîrê milkê miṣ̱al î (X),(M),(A)

[868]Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîn e

21. Weqta ku bête coşê bîne dilan xuroşê[869]

Ṣoḥbet bike bi def û saz merdane laubalî[870]

22. Peywendê can bi can bit ṣed can li wî mecan bit[871]

Bit şah û bête meydan dê rabitin melalî

23. Ya Reb bide dewamê i‘zaz û iḥtiramê[872]

Ṭûla beqa û muddet ṣed salekî celalî

24. **Fetḥî** eger bimîrid ber xaki asitaneş [873]

Qed ṣare ẕa heyatin kanet bîla zewalî

**50**[874]

fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun

Muteqarib + – –/+ – –/+ – –/+ – –

1. Dinalim bi ṣewtek ḥezîn û bi zarî

Bi feryad û efġan û pir bê qerarî [875]

2. Bi roj û şevan û seḥergah û salan

Dikêşim hezar ḥesret û ustuxwarî

3. Nehin ku kes ḥalêm bibêje ḥebîbî

Leqed ża‘e ‘umrî we żaqe iṣṭibarî

[869] Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîn e
[870] Ṣoḥbet bike bi def saz merdane laubali(M)
[871] Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîn e
[872] Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîn e
[873] **Fetḥî** eger bimîrid ber xakê asitaneş(M)
[874] Ev helbest bi Kurdî û Erebî ye û di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne
[875] Bi feryad û efġan û pur bê qerarî(X),(Z)

4. Ferifqen biṣebbi ḥelî fil-ġeramî

   Be‘îdun ‘enil-xillî z̠îl-inkîsarî

5. Ġeda mustehamel-fuadî ze’îfen[876]

   Enil'eqlî wel-fehmî wel-derkî ‘arî

6. Erûmu qudûmel-ḥebîbê fe eżḥa

   ‘Ukufet ṭerîqî me‘el-iftîqari

7. Feyaleytenî z̠erretun iz̠ tecellet

   Bimeşriqi weṣlin biz̠a el-iḥtîqarî[877]

8. Fee‘lu iz̠a ma eraha te‘alet

   We illa eṣir ma’il elinxidarî

9. Le‘ellî efuzu bima qed erumo[878]

   We men rame faze bihî bîntîẓarî

10. Bi zare binale tu **Fetḥî** ji derdan

    Xweşe ji derdemendan nalîn û zarî [879]

[876] Ġeda mustehamul fuadî ze’îfa (Z)
[877] Bimeşriqi weṣli biz̠a el iḥtîqarî (Z)
[878] Ev malik di destnivîsa (C)yê de nîne
[879] Xweşe ji derdimendan nalîn û zarî(X),(Z)

**51**[880]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Bi can û dil dema min te hebandî
   Ji xwe came wekî gul min qetandî

2. Di baġî da gula rûyê te dîtî
   Dibêm ez ġunçe lew came dirandî

3. Kesî dî qameta re‘na û nazik
   Yeqîn selwa ciwan ya rûḥ û can dî

4. Ji destê wê nikarim can xelaṣ kim
   Ji destê min te çawan dil revandî

5. Bi qewlê van bedendîş û neyaran
   Dilê yaranê ṣafî dil şikandî

6. Bi remz û awirê çavan dilê min[881]
   Hezar şîşê di ṣor têda ṭewandî

7. Bi pêta agirê hicranê cansûz
   Hinav û cerg û dil têkda kewandî

8. Te carek guh nekir yek nalê min
   Eger çi ser bi keywanê gihandî

[880] Ev helbest di destnivîsa (A), (M), û (X)ê de nîne

[881] Bi remz û awurê çavan dilê min (Z)

9. Gelek caran di rê da **Fetḥî** bû xak

   Çi fayde ku te damen jê kişandî!

## 52[882]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1. Felek yek koremarek ejdeha ye

   Murada wê ji me cewr û cefa ye

2. Demadem em di dûvê wê giriftar

   Dikêşin jê cefa û ew di reftar[883]

3. Çiqas zor awir û zor azima bin

   Ji dûvê wê çi karin em reha bin

4. Nehin qeṭ kes ku lê zexmek nekir wê

   Ji ṣed kes qeṭ li yek reḥmek nekir wê

5. Heye ma kes ku ẓulma wê nekêşa

   Çi singe ji sengê ẓulma wê neyêşa

6. Ji wê her exterek rewşen çiraġ e

   Welê her yek di dil da derd û daġ e

[882] Ev helbest di destnivîsên (A) û (M)yê de nîne

[883] Dikêşin jê cefa û ew di riftar (Z)

7. Hezar daġ û nehin qeṭ merhema wê

Ji vê bê merhemê nîne ġema wê

8. Dibit ẓahir di nîva leylê deycûr

Di ‘alem da hezaran rewzenê nûr

9. Çi fayde ku ji wan nîne me nûrek

Di qelb û xaṭiran nîne surûrek

10. Ji ev erż û sema çêkirye ṭaḥûn

Ecel ger çeqçeqa xwe dewrê gerdûn

11. Di nêv van herdu sengan ca binêre

Şev û rojan çewan ew me dihêre

12. Diger nekî de rojan şêrê reng in

Di gel me şev du reng û reng piling in

13. Demadem wê di gel me ḥerb û ceng e

Di gel me roj şîr û şev piling e

14. Ji ‘eyşê tengê xwe ḥeqqe binalin

Ji van şîr û pilingan pur bikalin

15. Çi keskî ku di gel wê aşinayî

Bikî axir dibinî jê cudayî

16. Teḥerruk kir gelek ev dewrê dewwar

Gelek pir tab bûn ev seb‘ê seyyar[884]

17. Ḥeta her çar ṭebayi‘ girtin aram

Ji ṣeyda murġê can ra bûne xweş dam

18. Ji damê murxê bê kam û serencam

Bi destê xwe nexust hêj daneya dam[885]

19. Ṭebayi‘ bend û peywendan qetandin

Yeka yek xwe bi eṣlê xwe gihandin

20. Ji hêlîna xwe ma murġê me mehcûr

Ji feqda av û ḥeb dilxwûn û rencûr

21. Mebîn ev mah û ev mehra we ya germ[886]

Ji kîna merdiman qeṭ naketin şerm[887]

22. Ke rûniştî li ber maha wê carek

Beden şubhî kitan bû pare parek[888]

23. Bi mihra wê ke dil da ṣubḥ û êvar

Di xwûnê wek şefeq rûnişt ṣubḥê war

24. Ji sozê wê kesek yek leḥẓe bê ġem

Nehin lêkin di dil da daġê me’tem

[884] Gelek pur tab bûn ev seb‘ê seyyar(X),(Z)
[885] Bi destê xwe nexist hêj daneya kam(X),(Z)
[886] Mebîn ev mah û ev mihra we ya germ (X),(Z)
[887] Ji kîna merduman qeṭ naketin şerm ((X),(Z)
[888] Beden şubhî ketan bû pare parek (X),(Z)

25. Were nav baġê ca feṣla buharan

Temaşa ke li nav van cuwîbaran

26. Çira pîrahenê xwe ġunçe kir çak[889]

Çera sebze bi xwarî ketye ser xak

27. Çera derra'eyê gul parepar in

Di dev şu'le di dil da pir şerar in[890]

28. Çera efkendeye ser warê wan jî

Çera ġerqe di xwûn da erġuwan jî

29. Çera sunbul perîşan û bi ġem hat

Çera terçavê nêrgiz ji eşkê nem hat

30. Çera reşpoş û bêçar in binefşe

Ji xwûnê daġidar in lale kifşe[891]

31. Dilê şaxa ṣenewber ṣed hezar şeq

Ji şûrê rojê ten têkda muşeqqeq[892]

32. Bi ṣed daġê kulan gulben birîndar

Binaxun rûyê sîmabê simen zar [893]

33. Ṣeba reqṣa ġeman da taze şaġan

Dilê murġan ġemalûd in bi daġan[894]

[889] Çera pîrahin xwe ġunçe kire çak (Z)
[890] Di dev şu'le di dil da pur şerar in (X),(Z)
[891] Ji xwûnê daġidar in lale kufşe (X),(Z)
[892] Ji şûrê rojê tin têkda muşeqqeq (Z)
[893] Binaxin rûyê sîmabê simen zar (X),(Z)
[894] Dilê murġê ġemalûd in bi daġan(Z)

34. Ji her canib newayê qumrî ku ku
Dibêje raḥet û asûdekî kû

35. Hezaran ṣed hezaran neġmeyê ah
Dikêşin ew ji vê ġemxaneya çah

36. Feqîra faxite kerden muṭewweq
Ji gerdûn kes reha nabî muḥeqqeq[895]

37. Te ‘alem dît û ev feṣla buharê
Ji payizê jî bigre i‘tibarê

38. Bibîn dem serdiya badê xezan jî
Bibîn rûzerdiya bergê rezan jî

39. Ṣebûrî nîne dûrî belki dûrî
Ji dildaran nehin illa żerûrî

40. Di baġan bûne ‘uryan taze şaġan
Demê ṭawûsî bûne pencê zaġan[896]

41. Nema xemla ‘erûsa buġçe aray
Dikit şîna wî zaġa reş girêday

42. Ji ferqa nisterînan rabû çenber[897]
Ji çenber narewin jî rabû çû der

[895] Ji gerdûnê kes reha nabî muḥeqqeq (X)
[896] Dimê tawûsî bûne pencê zaġan(Z)
[897] Ev malik di destnîvîsa (Z)yê de nîne

43. ‘Eceb tacê hinaran bûne tarac[898]

Bi bal yek qiṭrekê avêne muhtaç[899]

44. Dehanê wan dema xendan bibînî [900]

Hezaran pare xwûn tê dibînî [901]

45. Şemamoka mue‘ṣfer came dîba

Di baġê nazikê re‘na û zîba

46. Ġubara ġem ruxê zer kirye mestûr

Belê maye ji rûyê dilberek dûr

47. Mu‘ettel bû ji karê zirxe sazî

Dema rûḥşikiya yex dîte bazî

48. Ṣedaya ‘eskerî serma kirin gûş

Di baġan van çinaran belgê pûş

49. Ji xewfa dest birîna bayê ṣerṣer

Nehat destê çinaran ji asitîn der

50. Xezan ev renge ‘alem ra buhar ew

Ġem evzater ji wê evya ji ev ew[902]

51. Di vê ġemxaneyê bê ġem nehin kes

Reḥet dilkê fereḥ dilkê nehin kes

---

[898] Ev malik di destnivîsa X û Zyê de bi vî awayî jî hatiye nivînsandin:‘Ecep tacê hinaran payimal in
Ji sorxî û zerdî pur melal in

[899] Bi bal yek qeṭrekê avêne muhtaç (X),(Z)

[900] Dihanê wan dema xendan bibînî (X),(Z)

[901] Hezaran pareyê xwûn tê dibînî (X),(Z)

[902] Ġem evzatir ji wê evya ji ev ew (Z)

52. Nişanê raḥetê nîne di ‘alem
Hebe ger nîne heẓẓê ibnî Adem

53. Di vê żeyqet sera kaxa ġirîbî [903]
Neṣîbê ademî bû bê neṣîbî

54. Dilê xwe tu bi şadî qeṭ meke şad [904]
Dimaġa xwe ji azadî ke azad

55. Tu xurrem be bi daġa namuradî
Bi ġilla bendekî ke keyf û şadî [905]

56. Çi tiştê ku bi qelbê xwe bikî ṣeyd
Bi ḥubba xwe dilê te ew dike qeyd

57. Di axir da dema dil jê bikêşî
Hezar ḥesret ji hicra wî bikêşî [906]

58. Derîn dest û veke qeyda piyê dil
Veke îro ji van bê ḥaṣilan dil

59. Weger ne ê ku bûye dil girêday
Ji bo fetḥa wî nîne dest girêday

60. Di xwaba ġefletê hişyar e lê ew
Yekayek her çi da te dê bibe ew

903 Di vê żeyqet sera kaxa ġerîbî (X),(Z)
904 Divê xwe tu bi şadî qeṭ meke şad (X)
905 Bi ġilla bendekî ke keyf û şadî(X)
906 Hezar ḥesret ji hicra wî dikêşî (X),(Z)

61. Belkî wê taze şaxa qameta te[907]

Bi bayê ṣerṣerê qudret şikeste

62. Ji ewcê ẕirweyê ‘izz û tuwanî

Te bavêje ḥeżîżê natuwanî

63. Piyê mêraniya te bîne ser sing [908]

Di meydana celadet te bike leng

64. Bi quwet penceyê te wergerîne

Ji pence neqdê zanînê derîne

65. Tu destê xwe çiqas bavêjî karek

Ji vî destê te êdî nayê karek

66. Ji destê te dema çû zorê pence

Mebe êdî bi zorê pence rence

67. Ji çavê te biderxe cewherê nûr

Çira surme dikî ev çavê bê nûr[909]

68. Eve madem ji bo çavê te sîret

Meke surme ji bil çavê beṣîret [910]

69. Di dîwarê suraya ġunçeya mîm[911]

Esasê wî ‘eqîqê nab û sersîm

907 Bike wê taze şaxa qameta te (X),(Z)
908 Piyê mêraniya te bîne ser seng (X),(Z)
909 Çira ser me dikî ev çavê bê nûr (X),(Z)
910 Meke serme ji bil çavê beṣîret (X),(Z)
911 Di dîwarê seraya ġunçeya mîm (X),(Z)

70. Bi ev yaqûtê renga perdeya leb

Ku bûn meknûnê van xiştê ‘eded leb

71. Dikit waqi‘ ji ṣed kesran ziyade

Wekî cisra ji ber kesran futade[912]

72. Evan kesran dema nuṭq û xemûşî

Ji wan ra tu bi lêvan perde poşî

73. Beyreqa pîriyê mûyê reşê qîr[913]

Ji nageh dê sipî ke şubhetê şîr

74. Ji hêlînê xwe zaġan bibne meḥrûm

Cihê wan bigirin ev bûmê di pir şûm[914]

75. Bi ev ayîn bi sextî ha bi sistî

Duristî dê here bê her şikestî

76. Xwuya ke her şikestinkî ji cakî

Li her cakî bibî jê macerakî

77. Ji ruḥyaten çi tiştî ku dibe kim

Ji esbaban dikî ẓenn û tewehum[915]

78. Te ev me‘na ji ṭeb‘ê te nezaye[916]

Ku van tiştan dibe ew kes ku daye

[912] Wekî cisra ji ber kesran fetade(X),(Z)
[913] Bi berqa pîriyê mûyê reşê qîr (X)
[914] Cihê wan bigrin ev bomê di pur şûm (X),(Z)
[915] Ji esbaban dikî ẓenn û tewehhum (X),(Z)
[916] Qe ev me‘na ji ṭeb‘ê te nezaye (X),(Z)

79. Te ev dunya li xwe kirye gelek ṭeng

Qe bal ‘uqba ve nakî qeṣd û aheng

80. Nizanî ‘alemek dî jî li pêş e

Ḥeqîqet ger neẓer dî ew li pêş e

81. Diṭirsim qaṣidê mîrê ecel bê

Felek saqî ji cama pur zelel bê[917]

82. Dilê te hêj ji ġurbetxaneya xak

Neke perwaz wek bazan bi eflak[918]

83. Tijî can û dil û sîne ji weswas

Ji ev ‘alem herî tu nakisurras[919]

84. Di wê weqta ku calînusî can da

Bi ṣed ḥesret ji destê xwe me can da

85. Li pêş min ku ji furcê hêstira min

Xwuzî yek furceyek bo menẓera min

86. Hebûya da di pey kasa mematê

Mi tê bidya evê darul-ḥeyatê [920]

87. Li dil yek lem‘eyek nûrê nedabû

Bi vê kaxa denê pur mubtela bû [921]

[917] Felek saqî ji cama pur zelel bê (X),(Z)
[918] Neke perwaz weke bazan bi eflak(X),(Z)
[919] Ji ev ‘alem herrî tu nakesurras (X),(Z)
[920] Mi tê bidya evê darel ḥeyatê (X)
[921] Bi vê kaxa denê pir mubtela bû (Z)

88. Kuşada dil nebû jê ra muyesser
Ferecgaha xwe va wî fercê hêstir

89. Heye rahek di vê ġurbet zemînê
Ferecgaha şibe tê da bibînê

90. Qe nayê xaṭirê te ku tu geh gah
Te'emmul ke di halê ew ferecgah

91. Hewaya vê dinê ye ṣolekî ṭeng
Di vê ṣolê ji tozê ṣed hezar reng

92. We qence ku tu vê ṣolê derîni
We ger ne xeste lingek dê bimînî

93. Veke tu qeyd û bendê zend û ricleyn
Bi mêranî bike hem xel'ê ne'leyn

94. Ji pêş xwe perdeya çerxan hilîne
Ji nûra perdekî meḥrûm memîne

95. Di pey perdê heye nûrek ne meḥdûd
Ji her lem'e hezaran nûrê mewcûd

96. Bibe wunda ji her ummîd û amal
Di wê nûrê ṣifet ẕerre meh û sal

97. Rehabî dê dema tê da bibî gum
Ji derdê firqet û daġa te'ellum

**53[922]**

mef‘ûlu / mefa‘ilun / fe‘ûlun

Hezec – – +/+ – + – /+ – –

1. Ey sa‘iyê rahê namê name
   Me’murê bi emrê mîrê xame

2. Kana guheranê raz û esrar
   Ceyba dil û ‘eqlê pir ji exbar[923]

3. Wuṣlet dihê razê her feqîran[924]
   Yek yek bi ḥużûrê şah û mîran

4. Ḥifẓa te Xwedê bike di her gah
   Bilxaṣe ji te‘b û afeta rah

5. Rabe tu ji xakê pakê Heżro
   Purs ke reh baregahê Xusro

6. Qeṣda der cilwegahê şeh ke
   Rewşen xwe bi ṭel‘eta çu meh ke

7. Deyne tu duṣedhezar merqî[925]
   Perwaz ke aşiyanê ‘enqa [926]

---

[922] Ev helbest di destnivîsa (A) û (M)yê de nîne
[923] Ceyba dil û ‘eqlê pur ji exbar (Z)
[924] Wuṣlet deh razê her feqîran (Z)
Weṣlet dihê razê her feqîran(X)
[925] Deyne tu duṣedhezar merqa (Z)
[926] Perwaze ke aşiyanê ‘enqa (Z)

8. Paşê tu kerem ke ḥeżreta mîr

Şayesteyê text û tac û teqdîr

9. Zîbende bibe bi ḥeżre pak

Ferxende bi ṭel‘eta şerefnak

10. Şayeste bike tu iḥtiramê

Destbeste bike tu hem selamê

11. Ṭûṭî şifetan şeker şeken be

Bulbul şifetan xeber ḥesen be

12. Bêje ku cemî‘ê ehl û cîran

Têkda reḥetin bi ḥeqqê Quran

13. Bil-cumle divêtin selameta te [927]

Daxwazî dikin se‘adeta te [928]

14. Paşî bi du‘ayê lebkuşa be

Leb pur ji medîḥe û sena be[929]

15. Bêje tu mudam kamiran bî

Bedxahê te jar û natuwan bî

16. Şaxa fereḥa te serwê azad

Esbê emelê muṭi‘ û munqad

[927] Bilcumle divên selameta te (Z)
[928] Daxwaz dikin se‘adeta te (Z)
[929] Leb pir ji medîḥe û sena be(Z)

17. Der baġê meḥafilan tu gul bî
Nik ehlê dilan tu ehlê dil bî

18. Dînê te durist û mulkê abad
Cismê te ṣeḥîḥ û saġ û dilşad

19. Sergerm bibe bi van meqalan[930]
Serbest bibe di nav hevalan[931]

20. Lakin mede ṭeb'ê pake imlal
Imlal nehin muwafiqê ḥal[932]

21. Dîsa bike 'erżê 'izz û ḥurmet
Teqbîl bike zemînê xidmet

[930] Sergerme bibe bi van meqalan(X),(Z)
[931] Serbestî bibe di nav hevalan(Z)
[932] Imlal nehin muwafiqê ḥal(Z)

## ENCAM

Mela Ebdulfettahê Hezroyî yek ji wan helbestvanên klasîk ê Edebiyata Klasîk a Kurdî ye û di serdema modernîzmê de bi helbestên ku bi sê zimanan nivîsandiye tradîsyona Edebiyata Klasîk a Kurdî domandiye û her wiha bi van helbest û helbestvantiya xwe balan kişandiye li ser xwe. Piştî xebateke hûr û kur re em hêvî dikin ku xebata ku me li ser Dîwana Mela Ebdulffettahê Hazroyî kiriye xebateke kamil û tekûz be. Me di vê xebata xwe de jiyan û berhemên Mela Ebdulffettahê Hazroyî da nasîn û dû re me li ser dîwana wî lêkolîna xwe kir. Me bingeha xebata xwe bi tevahî li ser 4 beşan avêt; di beşa yekem de me cî da Jiyan û Berhemên Fethî, Di beşa duyemîn de me hewil da kesayeta edebî ya Fethî û her wiha ziman û şêwaza wî tehqîq bikin û bînin zimên, di beşa sêyemîn de Dîwana Ebdulfettahê Hezroyî ji hêla teşe û ruxsarî ve hat tehqîqkirin, helbestên di dîwanê de ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin û di beşa çaremîn de jî ji metna bi tenkîd a dîwanê re cî hat dayîn û temamê helbestên wî li gor 5 nusxeyan hatin muqayesekirin û bi şiklê transkirîbkirî hatin nîşandan. Ev xebata me ya bi navê Ebdulfettahê Hezroyî û Dîwana Wî; Metn, Edîsyon û Krîtîk ji destpêk, çar beş û encamê pêk tê. Di netîceya xebatê de em dikarin van encaman bi rêz bikin.

1. Navê Fethî ya rastî Mela Ebdulfettah Yazici ye. Yazici li heremê û derdora wê bi navên Seyda, Seyda Hecî û Fethî jî dihat binavkirin. Fethî di h. 1310/ m. 1892an de li Taxa Camiya Hazroya ku di wextê xwe de girêdayê Farqînê bû hat dinyayê. Seyda hêj 10-12 saliya xwe de dest bi tahsîlkirina ilmê kir û piştî ku 12 salan telebetî kir re 52 salan li medreseya ku bavê wî jê re ava kir jî muderrîstiyê kir. Seyda di nava van 52 salan de bi sedan telebe perwerde kir. Ji van telebeyên wî hinek ji wan di diyanetê de hinek ji van di zanîngehan de wezîfe kirin. Seydayê ku emrê xwe bi tahsîlkirina ilmê û muderristiyê borand û di Sibata sala m.1975an de li Hazroyê wefat kir. Medreseya ku Seyda lê ders dida feqiyan hêj heye.

2. Seydayê Mela Ebdulfettah di helbestên xwe de exlebe mexlesê *Fethî* bi kar aniye, lê digel vê kêm caran be jî mexlasên bi navê *'Aşiqê(39/18) û Baqî (45/13)* jî bi kar aniye.

3. Fethî di hêj di biçûktiya xwe de ango 10-12 saliya xwe de li medreseyan dest bi tehsîlkirina ilmê kiriye. Di wan medreseyan de li ber destê seydayên navdar ên serdema xwe yên li him Hezro û derdora wê û him jî ji yên heremê dersê wergirtiye.

Seyda li ba seydayên bi navê Mela Huseynê Qiçik, Mela Abdullahê Meylanî, Mela Faîq, Mela Muhammedê Hadî û kesên mîna wan ilm tehsîlkiriye.

4. Dema ku em li helbestên Mela Ebdulfettahê Hezroyî dinêrin em dibînin ku Mela Ebdulfettahê Hezroyî ji seydayên ku li ba wan ilmê tehsîl kiriye gelek feyde wergirtiye û ji aliyê tesewifê ve di bin bandoran wan de maye. Lewra di dîwana xwe de li ser van kesan helbest nivîsandine. Wek mînak li ser Şêx Muhammed Selîmê Hezaniyê ku murşîdê wî ye helbesta *'Her kesê carek diye ev qedd û ra'naya Selîm'(*27/1-28) nivîsandiye. Em dikarin van mînakan zêde bikin.

5. Helbestên Fethî ji hêla edebî bi hêz in. Fethî digel ku çar zimanan zanibûye jî di dîwana xwe de tenê sê zimanan bi kar anîye ku ew jî Erebî, Farîsî û Kurdî ne. Seyda di dîwana xwe de çawa ku helbestên xwerû Farîsî, Erebî û Kurdî nivîsandibe jî bi heman awayî di hinek helbestên xwe de du zimanan wek Kurdî-Erebî an jî Kurdî- Farisî bi kar aniye. Ev taybetiya wî jî diyar dike ku Fethî jî wek wan helbestvan û alimên din şexsekî pir ziman e.

6. Di encama vekolîna ku li ser dîwanê hat kirin de û di encama agahiyên ku hatin wergirtin de derket holê û hat fêmkirin ku Fethî di warê edebiyatê de gelek berhem xwendine. Ji ber vê xwendine ye ku kesayetên mîna Melayê Cizirî, Ehmedê Xanî, Mewlana Camî, Hafizê Şîrazî û kesên mîna van li ser Fethî tesîr kirine ku ev tesîr di helbestên wî de xwe nîşan dide.

7. Di dîwana Fethî de 53 helbestên bi Kurdî hene û temamê van helbestan bi teşeyên nezmê hatine nivîsîn. Di nav van 53 helbestan de 15 qesîde, 24 xezel, 9 mesnewî, 3 murebba, musellesek û muxemmesek heye.

8. Fethî 53 helbestên xwe bi erûzê nivîsiye. Di dîwanê de 5 cure behr hatine bikaranîn. Her wiha hemû helbestên dîwanê bi 16 qalibên erûzê hatine nivîsîn. Behrên ku zêdetirîn hatine bikaranîn bi rêzê: behra remel, behra hezec, behra recez, behra muteqarib û behra muzarî ye.

9. Dema ku naveroka helbestên Fethî tê nihêrtin tê dîtin ku helbestên Fethî li ser mijarên mîna eqîde, îman, pêxember, evîn, tesewûf, pesn û hwd. ava bûne. Ev yek jî nîşan dide ku helbestên wî ji hêla mijarê ve dewlemend in.

10. Di seranserê dîwanê de nexasim di xezel û qesîdeyan de hûnerên edebî gelek zêde hatine bikaranîn ku ev yek jî asta helbestvantiyê ya Fethî nîşan dide ka çi qas dewlemend û baş e.

11. Weke ku berî niha jî me gotibû Mela Ebdulfetttahê Hezroyî ehlê medrese û terîqetê bû û her tim întîsabî murşîdekî kiriye ku em tesîra vê yekê ji hêla tesewûfê ve di helbestên wî de dibînin. Di helbestên wî de hêmanên tesewûfê bi şikleke eşkere tên dîtin ku ev yek helbestên wî xemilandiye û bûye wesîleya dewlemendiyê.

12. Fethî, alim û seydayekî pir ziman e. Di dîwana wî de çawa ku helbestên Kurdî hebin bi heman awayî helbestên Erebî û Farisî jî hene. Ji bilî vê yekê Fethî di helbestên xwe yên bi Kurdî de gelek peyvên Erebî û Farisî bi kar aniye, lê ev bikaranîn herikbarbûn û watebarbûna helbestên wî xera nekiriye; berewajî dewlemend kiriye.

13. Ji ber sedemên cûrbicûr, gelek dîwanên Kurdî yan wenda bûne, yan nîvco mane yan jî tam negihîştine roja me ku yek ji van dîwanên Kurdî jî ya Mela Ebdulfettahê Hezroyî ye. Heta Xweda qewet da me, me hewil da temamê helbestên wî berhev bikin û dîwana wî bi şikleke herî kamil û tekûz derxînin holê.

## ÇAVKANÎ:

### Pirtûk:


Acar, Hayrullah*: Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, Metn û Lêkolîn*, weş. Nûbihar, Stenbol 2016.

Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol 2014.

Amedî, Fîkrî: *Qur'ana Kerîm û Meala Wê Ya Pîroz*, weş. Ensar, Enqere 2014.

Dilovan, Selman: *Dîwana Melayê Cizîrî,* weş. Nûbiharê, Stenbol 2014.

Dilçin, Cem: *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara 2016.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm: *Dîwana Melayê Cizîrî*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm: *Dîwana Mela Mihemedê Licêyî*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012

Doğan, Ehmed: *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi*, weş. Akçağ, Ankara 2013.

Ergin, Mehmet Cevat: *Son Yüzyılda Silvan'ın Yetiştirdiği Âlimler*, Uluslararası Silvan Sempozyumu, Mardin: Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012.

Işık ,İbrahim S.: *A'dan Z'ye Kürtler Kişiler-Kavramlar-Kurumlar, weş*. Nûbihar, İstanbul 2013.

Jiyan, Rênas: *Wêjeya Kurmancî- Pênûsên Çardehderb*, weş. Belkî, Amed 2015.

Korkusuz, M. Şefik: *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, weş. Kent, İstanbul 2004.

Epözdemir, Şakir: *Medreseyên Kurdistanê di Dewra Mîran û Neqşebendiyan de*, weş. Nûbihar, İstanbul 2015.

Sağnıç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Sadînî, M. Xalid: *Mela Huseynê Bateyî- Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Stenbol 2013.

Serdar, Bamed: *Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî- Metn û Vekolîn,* weş. Nûbihar, Stenbol 2015.

Tarînî, Mela Birhan: *Dîwana Şêx Evdilqadirê Hezanî*, weş. Nûbihar, Diyarbekir 2016.

Yalar, Mehmet: Hazrolu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği, *Uluslararası Silvan Sempozyumu*, Mardin: Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012.

Yıldırım, Kadrî: *Baba Tahirê Uryan, Hayatı Görüşleri Dîwanı*, weş. Avesta, Stenbol 2013.

Zivingî, Necat: *Stêrkên Edebiyata Kurdî,* weş. Banga Heq, Stenbol 2014.

Zivingî, Mele Ehmed: *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. û wer. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2013.

**Gotar&Hevpeyvîn**

Ertekîn, M. Zahir: Mela Ebdullahê Hezroyî(Fethî) û Qesîdetu'l-Qelema Wî(Metn-Lêkolîn), *Nûbihar Akademî,* Stenbol 2017, c. II, j.6, r.81.

Ertekin, M. Zahir, Zafer Açar : *"*Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi,* c.1, j.1, Ocak 2015.

Ergin, Mehmet Cevat: Hazrolu Seyda Hacı Abdulfettah Yazıcı, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi,* Diyarbakır 2006, c. VIII, h.1.

Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, *"Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects"*, Kurdish Studies, j. 2, no: 2, Cotmeh 2014.

**Tez:**

Aykaç, Yakup: *Dîwana Hezîn Metn, Lêkolîn û Ferheng*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol 2015.

Beyter, Önder: *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013.

Gezer, Semih: *Dîwana Mela Yasîn Yusrî, Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Çewlîg,2015.

**Ferheng:**

'Amîd, Huseyn: *Ferhengê Farisî 'Amîd*, Weş. Emîr Kebîr, Tahran 1391

Cebecioğlu, Ethem, *Tasavvud Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ağaç kitabevi Yayınları, İstanbul 2009.

Guldiken, Kadir: *Rahnama Farsça- İngilizce-Türkçe Sözlük*, weş. Rahnama Pres, Tahran 2007.

Îzolî, D.: *Ferheng Kurdî – Tirkî, Tirkî – Kurdî*, weş. Deng, Stenbol 2013.

Kanar, Mehmet: *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü,* weş. Say, İstanbul 2011.

Pala, İskender: *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı Yayınları, İstanbul 2004.

**Çavkaniyên Dîjîtal:**

*e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-şarkiyat.com- ISSN: 1308–9633 h: III/Nisan 2010, http://sarkiyatarastirmalari.dergipark.gov.tr/download/article-file/115949 10 Nîsan 2017.

*e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-sarkiyat.com- ISSN: 1308-9633 Sayı: VI, Kasım 2011, http://dergipark.gov.tr/download/article-file/115982 10 Nîsan 2017.

http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c11/c110040.pdf 15 Hezîran 2017.

http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c22/c220119.pdf 15 Hezîran 2017.

http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c10/c100066.pdf 19 Hezîran 2017.

**Çavkaniyên Ku Jê Sûd Hatine Wergirtin**

Ateş, Ehmed: *Metin Tenkidi Hakkında*, http://dergipark.gov.tr/download/article-file/172979 10 Gulan 2017.

Bahçıvan, Seyit: *Yazma Eserlerin Tahkikinde Metodolojik Problemler* http://dergipark.ulakbim.gov.tr/neuifd/article/view/5000125452/5000115272 10 Gulan 2017.

Bolelli, Nusrettin: *Belağat*, İfav yay., İstanbul,2016.

Bulut, Ali: *Belâgat Meânî Beyân Bedî‘,* İfav yay., İstanbul 2013.

Ceylan, Ömür: *Dîvânlar Üstüne –Eleştiriler-* http://turkoloji.cu.edu.tr/ESKI%20TURK%20%20EDEBIYATI/ceylan_divanlar.pdf 10 Gulan 2017.


Doskî, Tehsîn Îbrahîm: *Dîwana Fethî,* weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.

Erünsal, İsmail E.: *Divan Neşirlerinde Karşılaşılan Güçlükler I: Güvenilir Bir Metin Te'sisi* http://dergipark.ulakbim.gov.tr/oa/article/view/5000116413/5000108342 10 Gulan 2017.


Köksal, M. Fatih: *Metin Tamiri(Usul ve Esaslar, Uygulamalar ve Bazı Teklifler)* http://devdergisi.com/Makaleler/1005770035_5.pdf 10 Gulan 2017.

Yıldırım, Ali : *Metin Tenkidi İle İlgili Hususlar ve Kâmî Divânı Örneği,* http://www.turkishstudies.net/dergi/cilt1/sayi5/sayi5pdf/yildirimali.pdf 10 Gulan 2017.


**PÊVEK**



**Pêvek 1**: Destxeta Seydayê Mela Ehmed Cewzî



**Pêvek 2**: Destxeta Mamoste Mehmet Yalar



-٩٤-

ژنا لینا خدان حالا ∴ بحق حضرت ثانی
جمال الدین هم باقی ∴ دکل سلطان لب ساقی
بده وان تو میا باقی ∴ بحق حضرة ثانی
دعلم باطن و ظاهر ∴ بگین وان دنیا اخر
ددهری وان بکه نادر ∴ بحق حضرت ثانی
دغین و شین و میم و با ∴ لفتحی حز نوشین سردا
رهاکه وی ژ قان دردا ∴ بحق حضرت ثانی

وله ایضا رحمه الله تعالی

بومه ژ دستی غمان ∴ زار و ضعیف و هبا
هون بحدیکن بیین ∴ قبله نما بام کا
قبلهٔ عالم نما ∴ صور کل باغ وفا
حضرت ثانی لقب ∴ رهبری راه هدا
رهبری دانا و خام ∴ پشت و پناها عوام
دار بقا کر مقر ∴ بحری لقاءا خدا
بحری لقا اختیار ∴ کرشبه عصمت شعار
چو ژ فی دنیا دنی ∴ یاری وفاداری ما

(عزم)


-٩٥-

عزم نعیم و جنان ∴ کرشه نورشین مکان
کوهی غمان دامه و ∴ روی زری شبه کا
اف چه مصیبت بو هات ∴ ماه ژ مشرق هلات
خف بو د مغرب زمین ∴ چو بستاری کها
یعنی شه نیک نام ∴ نجل دلالی تمام
هردو دیک هفتکی ∴ زیری زمین کرنه جا
چو بون بهف شادبون ∴ ژ قید غم ازاد بون
کرب و فغان و انین ∴ حظ و نصیب مه ما.
هشتی مه وی استخوار ∴ زار و نحیف و نزار
حسرت و دردو الم ∴ شین و گرین و بکا
شین و بکا و گرین ∴ دایه مه اومه جبین
صحبتو فیضو طریق ∴ بر بخورا وی تبا
مسکن و دیوان و در ∴ مان صدفا بی گهر
حبیا خوبالی تژی ∴ کر ژ دری بی بها
رفعت و ناموس و ناف ∴ بروی ژ کیوان تفاق
دایه وی کیوان حسد ∴ اه و اسف دا سها

**Pêvek 3**: Destxeta Zeynelabîdîn Amedî



**Pêvek 4:** Destxeta Nusxeya Bênav



**Pêvek 5:**Destxeta Mamoste Ehmed Yalar